Shota Rustaveli's immortal poem translated into Kurdish possibly would not have seen the light if it were not the private initiative of the outstanding Georgian writer, translator and public figure, the head of the Centre for Cultural Relations of Georgia - "Caucasian House", Naira Gelashvili, known for her tolerance towards the representatives of different religions and nationalities. She took a keen interest in the Kurdish version of *The Knight in the Panther's Skin*, and correctly determined the importance of publishing the poem in Jardoe Assad's translation not only in the cause of satisfaction of spiritual needs of Georgia's Kurd population but also for strengthening of literary and cultural relations between the Georgian and Kurd peoples. Naira Gelashvili has bent every effort to raise funds for publishing the translation and she is still doing everything in her power for the implementation of this project.

If today we are proud of this book - Shota Rustaveli's *The Knight in the Panther's Skin* translated into Kurdish, this, first of all, should be regarded as a merit of Naira Gelashvili, and the grateful Kurd people, especially the Kurd literary society, are much obliged to the prominent Georgian writer.

At the same time, particular mention should be made of the problems posing obstacles to publishing *The Knight in the Panther's Skin* translated into Kurdish in up-to-date form. Firstly, the point was that Jardoe Assad translated Rustaveli's poem into Kurdish by using the Cyrillic script, which was established

for the Kurdish language in the Soviet period. Nowadays the alphabet based on the Cyrillic characters is out of use and has been replaced by the Latin characters for the written language of Kurdish that is widely applied by the Kurds living abroad.

Under the circumstances mentioned above, it was necessary to change the script of the original translation and replace it by an adaptation of Latin and only after that type the new version on a computer.

As a consequence, taking into consideration new requirements, there was a pressing need to carry out a thorough editing of the translated text and to adapt it to the original as well as to the Russian version, as the papers of the scribal copy were so old that some places were almost illegible.

The procedure of editing the Kurdish text implied not only some textual corrections but also the alterations made with regard to the grammatical structure, mainly relating to the dialectal and phonetical forms.

The translated text of Rustaveli's poem is supplemented with a vocabulary comprised by us, providing explanations for some expressions, personal names and place-names in Kurdish. The analysis of Jar DOE Assad's hand-written text showed that the translator had not made this kind of comments.

The presented translation of *The Knight in the Panther's Skin* in Kurdish is a tribute not only to the Kurdish fiction, but also to the Georgian Rustvelology generally.

It is our hope that *The Knight in the Panther's Skin* rendered into Kurdish by Jar DOE Assad will occupy a fitting place among the translations of Rustaveli's immortal epic poem in various languages.

We would like to recognize the help and participation of the staff of the "Caucasian House" and everyone who contributed to printing and publishing this book.

Publication of Shota Rustaveli's *The Knight in the Panther's Skin* in Kurdish is a valuable gift of historical importance to Kurdish society.

Karim Anqos



JÎ ALIYÊ T'ERCMEÇÎ DA

Min hê di xortaniya xwe da qirar kiribû sert'aca litêratûra gurcaye qurnêd navîn bi zimanê xweyî dê t'ercme kira. Û aha, meremê min hate sêrî. Ez devedevî 25 sala ser her xeberekê, xetekê û cumlekê çerçirîm – qacqicîm. Ew xebateke p'ir' çetin û giran bû. Min ce'dandiye, ku h'îmî orîgînalê r'a amin bimînim, dêmek, bîn – buxsa diniya poêmêye bedewetiyê anegorî çend têt'stêd orîgînalêd bi zimanêd ermenî û ûrisî danîne ser t'extê xweyî nivîsarê. Gele cara bona azur'û kirina xet, xeber û cumlêd çetin ez berbir'î r'ûst'avêlîzan û nivîsk'arêd gurcaye başqe – başqe bûme. Lema jî r'azîbûna xwe e'lamî kolêk'tîva (k'oma) înstîtûta litêratûraêye ser navê Şot'a R'ûst'avêlî, başqe gotî – dîrêk'torê (serk'arê) wê Gêorgî Sîsîşvîlî û T'ifaqa nivîsk'arêd Gurcistanê dikim.

Belê, xebata mine t'arcme kirinêye sala îdfî ser t'extê weye. Ez ze'f baş dizanim, ku ew bêqusûr nîne. Lê ewê bibe h'îmê t'ercma poêmêye paşwextyêye diha baş û t'am.

Cerdoê Esed



DESTPÊK

1. Wî, yê ku ev e'rş û e'zman bi h'unirê xwe sêwirand,
R'uh' û nefes da r'uh'bera, r'uh' li dinê wî xuliqand,
Da merivayê, diniyalîkê bêqeyase h'ezar t'ewnî,
E'seyî kir nîsla p'adşa xût mina xwe û wî r'engî.
2. T'ek te, Xuda, te sêwirand sirafet li her r'uh'berî,
Alîk'ar be, bide h'unur – cinê xirab bikim xwefî,
Sur'a h'ibê tu bide min, h'eta mirinê qûlê wê bim,
Sivik ke tu vî gunê min, ta wê dinê xwe r'a bibim.
3. Şêrî, yê ku bejnê tê tîr û kevan, şûr û mert'al,
P'adşa e'gal, T'amara şexs, p'or'ê şebe bi sûrtê lal,
Nizam çawa qursax bikim bi beyt' bidim ez met'h'ê wê,
K'îjan bendê lê dinihêr'e t'irê qende li ser lêvê.
4. Hêsrê xûnê em bir'êjin, bidin met'h'ê T'amar p'adşê,
Boyî k'îjanê k'îlamêd nûr min sêwirandiye vê hewatê,
Bikim h'ubrê gola şebe, qamîşê ter' bikim qelem,
Li guhdara dil vejenim mîna zerga tîra kelem.
5. T'eslîm kirin ku ez şêrkî bidim met'h'ê wê bi k'ubir,
Bijangê kêr', birû, kezî, lêvê sore xur'îya agir,
Diranê wê hûre sedef, cêrga dur'ê nebînayî,
Wê p'etle kin selê kevir, nerm kin demrê mîna zirî.

SOT'A R'ÛST'AVÊLÎ

6. Xeb erê dur', pirsê alav, nifûs, qursax min lazime,
Xudê, k'elê tu bide min, p'irtî eşq jî têkme gujme,
Alîk'arê Tariyêl bim ez, bidim met'h'ê wî r'onayîdar,
Biratiya sê e'gîta – hevra xulam, muh'bet, ît'bar.
7. Were r'ûnên bona Tariyêl hêsrê xûnê em bir'êjin,
Heye gelo yekî mayîn bext û felek jê r'a dijmin,
Ezê r'ûnê R'ûst'avêlî, têkim k'îlam birînê k'ûr,
Vê serhatiya hane sade, têkim şirdan ji dur'ê nûr.
8. R'ûst'avêliyê h'unirim ez, zor û cefê mîyaser kim,
Boyî wî dîn bim, bibim şeh'id, k'îjan ordî ber r'adiwestin,
K'esîb bûme boyî evîndar, h'aş da derman ez diger'im,
Yan min aş ke, yan bîkuje, h'izkiryê vê neyaz dikim.
9. Ev dast'ana farsiye kevn min welger'and zarê gurcî,
Derbaz bibû çîqa desta mîna dur'a nûr narincî,
Min dî – hil da û welger'and, kir şuxulkî ûrt' miqer'm,
Şexsa fikirê bira silh'am bike bê k'în û dilê germ.
10. Şewqa wêya ez kor kirime, dîsa lême wê bibînim,
Dilê h'uba wê şewitiye, ç'îya û baniya dik'udrînim,
Bese laşê min bişewte, dia' bikim bi dil şa bim,
Met'h'ê sê r'eng bikim xet, beng, h'ezar r'engî p'erwede kim.
11. Çi bide k'ê bext ji jorda, ji bextê xwe bibe r'azî,
P'ale miqîm ger bixebite, esker şer'ke bi e'gîfî,
Evîn bextê evîna xwe gere bibe bi çetnayî,
Ne xiraviya xelqê bike, ne jî bîr bê bi xiravî.
12. Şayîrvanî serê serda çîqa nûra zanînêye,
Xudê xaş tê, boyî guhdara k'ara wêye mezin heye,
Ew dil bende û kêrhatî boyî meriyê aqil, zane,
Pesindare ew şayîra, fikra dirêj kîn hev tîne.

13. Beza hespê t'im dicêr'be li ser r'iyar'aste dirêj,
Zerpa gûclî, nîşana cî, meyîdana baş boyî gorzavêj,
Usane ha, beyît'a dirêj, cêr'bandine bona şayîr,
Wexta gotin lê çetin tê û kêmbin bangê h'erîr.
14. Îdî ew çî, çî şayîre ku şêrê wî sist bin betr'eng,
Ku haj xizna ziman nîbe û lê kêmbin xeberê p'eng,
Wexta e'zman neke qalib, jê kêmbin neke xeberê h'aş,
Dest li silh'a xwe nexew nebe e'gît, mêrxaskî baş.
15. Ne şayîre, k'ê nişkêva beyît'kê, duda disêwrîne,
K'ubar nebe, nevê xurtim, xwe şayîr tu neh'esbîne,
Pirs – xeberê dûr û nêzîk bigire, yek – yek heva dayîne,
Wek qant'r'ê serh'işk nebê: „T'aê beyît'a min t'unîne“.
16. Hene şayîr, bê h'unurin, bi bangê sist ew dinvîsin,
Nikarin ew bibne nîze, pirsê alav dila bend kin,
Dixazim wan nuxsan kim wek xortê xişîm kevan dêst da,
Qursax nakim de'bê mezin, xenîmin nav r'ewira da.
17. Hine k'ilam hinkî başin, dibin xemla k'êfû sivra,
Bi evîntî xort û cahil dîkin hebin boyî laqirdiya,
Yê sadene bi fikir, nêt, zanî ew jî me qiniyatin,
Lê k'ê beyît'ê dirêj navê, ne şayîrin, bê biniyat'in.
18. Şayîr h'unrê şureta xwe badîhewa bela nake,
Yekê h'iz ke, bih'ebîne, wê xwe r'a şexs tu h'esav ke,
Şureta xwe wê r'a r'o ke, bide met'h'ê wê bê qusûr,
E'mrê xwe tu boyî wê bide, bide met'h'ê gulavî nûr.
19. Ya xwe niha we r'a bêjim, met'h' dayîne xwe qels nakim,
Hurmeteke mezine ew boyî k'îjanê ez şerm nakim,
Çawa bende bê îsafe, e'mir û r'uh'e ew bona min,
Xetê xwe da min veşartîye ew navê ku jê h'iz dikim.

SOT'A R'ÛST'AVÊLÎ

20. Met'h darê h'ubê me ez, h'uba bê şik û ziyaretî,
Çetine ku ziman bidî met'h'ê horiya şexs fêriştî,
Ew şuxula Xudê da ne, h'unirê xeyîbe, r'uh' dar dike,
K'ê ku peyî vî şuxulî her'e, zor û cefê xwe gêr' dike.
21. Çiye h'uba bê şik, bê bend carna aqil nar'icmîne,
Ziman meriya h'ub bend dike, fikir û guh jî gur'ê nîne,
H'erça k'ulfet tima dibe – berbi wê dibe nêta xirab,
Herge setî dest wan nayê, k'ir' wan dûrva dibin alav.
22. Evîndar r'a niha bibhên bi e'rebî dibên mecnûn,
Boyî h'iz kiriyê unda dikin h'iş û sewda, dibin beyît'ûn,
Hinek r'astî difr'in e'rşa, dih'elin nav hêşnaya wê,
Hinek jêrê qive – qivin dor bedewê li r'û dinê.
23. Lê evîndar bi qirafet gere mîna r'oja nûr be,
Merd û qihar, e'gît, zane, xweyî îsaf û milûk be,
Zarê şîrin bi dilê r'e'm, şêr' da bêxof û mêrxas be,
Ev yekana k'ê r'a t'une, ew evîndar h'esab nabe.
24. H'uba t'emîz gere mîna e'rşê zelal û bik'ir be,
Dilhavêjîyê û evîntiyê berewir kin, ew qe nabe,
Ort'a wan da be'r bê qeyas, usa dûrin yek ji yekê,
T'ucara hûn xwe şaş nekin, r'ind guh bidin wê gotinê.
25. Heger evîn h'elaliye, ne zindêqiya xiraviyê,
T'imê axe ser zarê wî waxta dûre ji h'izkiriyê,
Bi dil t'enê wê h'iz dike, ew çiqajî cefê bidê,
Dibêm ne'let wê evîniyê, r'amûsanê dilhavijiyê.
26. Bira t'u kes wê zindêqiyê nav neke bi navê h'ubê,
Îro yekê, sibê yekê bixapîne boyî k'irêtiyê,
Mîna xortê xişîm, nezan, ku bilize ew h'olmaçkê,
Evîn ewe, evîn jê r'a fêriştî be li r'ûyê dinê.

27. Evîn derdê h'uba mêlît' nîşan nade, k'ûr vedşêre,
E'yan nake, ku h'izkiriye qe deqekê ew bîr nake,
Dişewite, dik'ewgire, dimre ew sewdaserî,
Ji p'adşa jî bê minete, t'enê h'ube t'acê sêrî.
28. Borcdare ew sur'a h'ubê ber t'u kesî ku veneke,
Dîtinê r'a neke axîn, t'u qûl – benda şikber neke,
Siyê navê ser navê wê, k'îjanê ku ew h'iz dike,
Bişewite agrê h'ubê, bextê mezin ew h'esab ke.
29. Ît'barê k'ê wê wî bîne yê dîhar ke navê yarê?
Ew jî, yar jî, ji wê yekê wê bibînin zor zirarê,
Çiqa jî ew pesna bide, wê qîlebe ser navê wê,
Çi cayîze ku evîndar li sur'a xwe neke sit'arê.
30. E'cêbmayî ez dimînim li ser kîrnê mervê neçê,
Ça dikare ew qusûrê têke e'yîba h'izkiriye,
Ku h'iz nake, bira neke, çi cayîze şilt'ax, e'êfî?
Meriyê xirav, pîrsa xirav bela dike bi şanetî.
31. Heger evîn boyî evînê dişewite ç'e'vê girî,
T'ek dik'eve ç'iya, baniya ewe k'arê kêr pesnî,
Bi fikra ew t'evî yarê, t'evî wêye bi şev û r'o,
Nav meriya da ku biger'e, sur'a xwe ew nake zar'o.





**SERHATIYA R'OSTÊVANÊ
P'ADŞÊ E'REBA**

32. R'ostêvan bû p'adşê e'reb bi xastina yekê jorîn,
Xayê e'slê giran û merd, xayî p'ir' esker, xiznê zemîn,
Serwêrekî ze'fi aqil, alîk'arê şuxulê r'astî,
Bêxof, qursax bû şer'a da, zarşîrin bû bi serbestî.
33. Bêyî ewledê nêrîn bû ew, hebû qîzke wîye t'enê,
Mîna r'oja nûr û neder şemal, geş bû li r'û dinê,
K'ê ku didît unda fikir xew, hêsa bûn, h'iş û sewda,
Zane gere p'ir' şuret biya yê ku met'h'ê wêya bida.
34. Bira herkes wê bizan be, navê wêya T'înat'în bû,
Ku mezin bû, bi bedewiyê bengzemîşî r'oê dibû,
P'adşê gazi wezîra kir, hêsa r'ûnişt ser t'extê xwe,
Dîwanê da dan r'ûniştin, wa dest pê kir giliyê xwe.
35. „Pirske min heye, - wî got, - dixazim ku we bibihêm,
Wexta gulek diç'ilmise, dewesê digre gulke ne kêr,
Gulek diçe û dewesê guleke din bişkok dide,
R'oja me çû, şeva me r'a şewqa hîvê k'arê nade.
36. Delîletê extiyariyê min r'a bûye derdê lap zor,
Îro, sibê ezê bimrim, e'mir û mirin dinêne dor,
Çi lazime ew r'onayî, ser be h'ukmê şeva tarî,
T'acê bidine serê qîzê – wê şemala geşe nûrî!“

37. Wezîra got: „Xaş bî p' adşa, ji extiyariyê xeber nede,
Em siyaneta gulê zanin, geş be yanê ç'ilmisî be,
Gul çiqas jî ç'ilmisî be, çêtire h' ezar kulilkê bîn,
Siteyîr çîqa geş û nûr be, nade şewqa hîva bê tîn.
38. Usa nebê p' adşaê me, tu hê gulî, naç'ilmisî,
Şîreta te lape xirav, çêtire qenciya h'emû kesî,
Hilbet gere usa bikin, çawa dilê te vir dibê,
T'ext, t'acê xwe tu bide wê, şemçiryaxa t'aê r'oê.
39. K'ulfete ew, ji Xudê da p' adşatiye jê r'a k'erem,
P' adşatiyê ew dikare, me gotiye ew yek herdem,
Bi şuxulê kêr û dilê r'e'm wê bive nûra demê,
Ç'êja şêra ew jî şêre, bê şubeye, nêr be, yan mê“.
40. Kur'ê Amîrspasalar bû Avt'andîlê serek esker,
Bejina taylan darç'ira bû, dêm wek r'oê û hîva zer,
T'ûre bû bê ber û simêl, bedew mîna şûşa bîlar,
Ç'e'v û buriyê T'înat'înê dil hêngavtibû zerga xedar.
41. Evîntiya xwe k'ûr veşartibû li k'ûraya dilê xwe da,
Ji yarê dûr diç'ilmisî mîna gula nav k'ûrê da,
Wexta didît, hê gur' dibû k'ûra dilê wî bi alav,
H'ub meriya sêfil dike, azare h'ub, azar bi nav.
42. Wexta bavê wê h'uk'um kir, t'ext û t'acê xwe da qîzê,
Dil Avt'andîl baristan bû, hinkî vemrî k'ûra cezê,
Wa fikirî: „Niha, carna demê bîlar t'êr bibînim,
Birîna dilê xweye xedar dibe hinkî bik'ewînim“.
43. P' adşê e'reb, xayî h'uk'mê zor, fermaneke ha bela kir:
„Min qîza xwe – T'înat'îna bi t'extê xwe ew r'ewa kir,
Mîna r'oja nûr û şemal şewqê bide ser her kesî,
Herkes wê r'a pesindar be, siyaneta wê nizan be sî“.

44. E'rebê xas hatin t'op bûn, wir bû lêmişt ordiya aza,
Hat Avt'andîl, dêmnî şemal, ew serekê p'ir' h'ezara,
Wezîr Sograt jî hate wir, e'slê xwe da nisla p'adşa,
Wan nihêr'î t'extê xemilî, gotin: „Nûre batin da“.
45. Bavê qîzê bir T'înat'în, ç'e'vbeleka gendî horî,
Ser t'extê xwe da r'ûniştin, bi destê xwe t'ac da sêrî,
Wî wek'azê h'ukuma dayê, avît namilê e'ba heqiyê,
Qîza bik'ir baş mêze kir li cime'ta hazire çê.
46. Paşda k'işyan, t'emene bûn, him p'adşa, him eskerê wê,
Dia' kirin, pîroz kirin, t'ext û t'acê p'adşatiyê,
Bor'iya lêdan, def, k'er'ane kire zîwîn, lîlandinê,
Bijangêd r'eş – baskê teyîra, şil bûn hêsirê h'erd ç'e'vê wê.
47. Wê xwe hêja h'esab nekir, ku r'ûnê ser t'extê bavê,
Û gulistan dihat avdan hêsirê dur'e ji ç'e'vê wê,
P'adşa fikirî: „T'ek ewlede guman û ç'ar bona bavê,
H'eta min qîz kire p'adşa, şewifîm ez nav alavê“.
48. Wa got p'adşa: „Negrî, baş bibihê şîreta min,
Îro p'adşa E'rebistanê k'ivş kirî ji aliyê min,
T'ext û t'acê p'adşatiyê min daye te, te gumanim,
Tu aqilî, sirafetî, pêciryayî, ez wê zanim.
49. R'o bê firqî şewqê dide him ser gulê, him gemarê,
Biç'ûk, mezin cem te yek bin, wan k'erem ke bi qirarê,
Bi merdayê dîna bend ke, bi çikûsiyê tuyê bend bî,
Him hildan, him dayînê da, mîna be'rê gere merd bî.
50. Merdayî li p'adşatiyê da mîna bax'ê cinetêye,
H'eta meriyê qelp û qomsî ber merdayê destûrdaye,
K'ê xar – vexar, wî lezet dî, çi e'mir dî yê timaye,
Çi ku te da ew ya teye, çi te hêvşand, ew undaye“.

51. Qîz guhdar bû û wê dibhîst şîretê ku bavê dikir,
Her xeberek jê r'a ders bû, wê hedayî h'esab dikir,
P'adşa bi eşq dixar – vedixar, şa disitra li ber sivrê,
T'înat'în bû mîna r'oê, dixeyîrî r'o ber wê.
52. T'înat'înê gazî kirê, anî cem xwe cariya amin,
H'ukum kir, go: „Here veke derê t'emam k'îlerê min,
Te bi destê xwe mor kirne, ewe t'emam hebûna min“.
Wexta anîn, wê bela kir, merd – merdane destê êgin.
53. Wê bela kir, biç'ûktiyê da çi veşartibû xiznê amin,
Cime'ta xwe pê r'azî kir, wê nepirsî biç'ûk – mezin,
Wê go: „Aha diqedînim çi şîreta bavê da min,
Zilekî hûn nehêvşînin, ji hebûna van xiznê min“.
54. Paşê wa got: „Niha herin vekin derê t'emam xizna,
Serekseyîs bajo bîne tu kih'êlêd meye hêja“.
Wexta anîn, wê bela kir bê h'ed, h'esav û ne westiya,
Esker ji dest hev dir'evand hebûn mîna zibêniya.
55. T'alan kirin, usa birin xizne, mîna malê t'irka,
R'evo birin, bela kirin hespêd kih'êl yê êrdeka,
Bûbû bager bi merdayê, r'e'm – k'erema jin p'adşae,
Wê r'azî kir him mêr, him jin, wê r'isqê her kesî dayê.
56. R'o derbaz bû bi eşq, sitran, bi xarin û vexwarinê,
Ordî çawa be'r – bêqeys, r'ûniştibû li ser k'êfê,
Xeyîrî bû dêmê p'adşê û melûlî hêwirî bû lê,
Hev pirs kirin bendê li wir: „Çi qewimîye gelo p'adşê?“
57. Avt'andîl jor r'ûniştibû, ew h'izkiryê h'emû kesî,
Seresker bû xayî siyanet, şêr bû, ser nav t'une bû sî,
Wezîr Sograt qedrê giran r'ex Avt'andîl bû r'ûniştî,
Hevr'a gotin: „Çi h'ukum kir, gula dêmê p'adşê xeyîrî“.

58. Fikirîn ew : „Çi derde ku h'ukum kiriye li ser p'adşê,
Vê şayê da ne qewimiye tişkî xirav, tişkî net'ê“.
Avt'andîl go: „Sokrat were em jê pirs kin, çi qewimiye?
H'enek bigirin, em jê pirs kin, çima usa xeydîye ji me?“
59. Hevr'a r'abûn Socratê kal, Avt'andîlê bejin çinar,
T'as dagirtin bi şeravê, ew berbir çûn mîna hercar,
Çok dan e'rdê li ber p'adşê beşera xaş, dêmê bihar,
Wezîr serê giliya vekir, xeberê dur' bi zarê nar.
60. „Melûfî wê te hêwirye û xaş nabe beşera te,
P'adşa r'aste, te unda kir him xizne, him hebûna xwe,
Qîza te bi merd mêranî t'emam da bê û unda kir,
Badîhewa te da ser t'ext, ner'ih'etî, te xwe gur' kir“.
61. Ev giliya p'adşê bihîst, k'en ser lêva wan nihêr'î,
E'cêbmayî wa got p'adşê: „We çava got, çi qursaxî?
Te ze'fr'ind kir, - gote qîzê, dia' lê kir bi dilşayî, -
Derewîn jî qursax nake, gunek'ar ke min timayî.
62. Wezîrê min, ew derd nîne, derdkî din min dide cefê,
Cahiltiya min derbaz bûye, ez bend kirme extyariyê,
Welatê xwe da nabînim ez kesekî himberî xwe,
Mîna min bûya bi sirafet, merdanî û mêraniya xwe.
63. Qîzke mine delal heye, nazik hatiye xweyî kirinê,
Bexte, Xudê şa nekirim lawê kur'în li r'û dinê,
Ku mîna min tîr bavîta û bilîsta hol û t'opê,
Avt'andîle ku hinekî min k'işandiye li wê şopê“.
64. Lê Avt'andîl hêsa dibhîst xeberdana p'adşê e'gal,
Ber xwe da k'eniya beşerxaş, ew e'gîtê dêmî şemal,
Cêrga diranê çîle sedef şewq dan mîna nûra r'oê,
„Xeber de, tu çi şerm dikî, - Avt'andîl r'a wa got p'adşê, -

65. Dibe tu min dik'enî, xastina xwe bêje bibhêm".
Avt'andîl go: „Ezê bêjim, dixazim te bidim sondê,
Çi ku bêjim tu nexeyîdî, hêrs nek'evî li vê şayê,
Min bê şêkir h'esav nekî, gunek'ar nekî boyî gotinê“.
66. P'adşê wa got: „Çi jî bêjî, ez naxeyîdim, ad, qîrar be,
Bi mirazê T'înat'înê ez sond duxum, tu bawer be“.
Avt'andîl go: „Niha bêjim ez te r'a pîrsa r'astiyê,
Başê hêsa em xeber din, xwe nepesne tîravêjîyê.
67. Ez xweliya bin p'iyê te me, ser te r'a me ça tîravêj,
Bira şe'dê leca me be t'ev eskerê hazîrî mêj,
Tu dibêjî ku mîna te kesek t'une, ez qayîlim wê,
Bira meyîdan bibe qaziyê him tîrê, him lîstina t'opê“.
68. P'adşê gotê: „Nabaxşînim ku min dijmin tu h'esav kî,
Were hildin tîr û kevan, lecê da tu xwe şaş nekî,
Çava şe'de xwe r'a bibin em eskerê e'gîte xas,
Û leca me wê e'yan ke meyîdanê da k'êye mêrxas“.
69. Avt'andîl jî qayîl bû, hev nihêr'în k'en li ser lêva,
Dîsa şayî, eşq û sitran her yek şa bû t'ivdîrê va,
Û sond xarin ku her yek wan gotina xwe biqedîne,
K'ê ku alt' bû, sê r'oja t'am gere serqot ew bimîne.
70. H'ukum kir ser nêç'îrvana: „Dora mêşe bibin h'eşar,
Terewila ji nav mêşe berbi me hûn berjêr kin xar,
Hûn jî werin sîlh'a hildin“, - wa h'ukum kir wî ser esker.
T'exte, sivre cîda hîştin, xitim kirin şayî yek ser.





NÊÇ'ÎRA R'OSTÊVAN P'ADŞA Û AVT'ANDÎL

71. Şebeqê r'a hat sekinî ew e'gîtê bejin çinar,
Nedîra nûr, dêmê bîlar, e'bê qiliç bi nexşê nar,
Başlixê wî ser namilê, piştê şûrê hêşîn xumar,
Hîviya p'adşê sekinî bû hespê xweyî şînboz siyar.
72. Sîlih' girêda, hespê syar bû, p'adşa hat, çûn r'aw-nêç'îrê,
Bûne heleq best û baniya bona r'aê û t'ivdîrê,
Dengê esker dihat bihîstin, e'sq distiran çol û baniya,
Lec bû ort'ê, tîr – kevana dibariyan herdu aliya.
73. P'adşa wa got: „Donzde xulam bira ji me dûr nek'evin,
Tîr – kevana bigihînin me, lecê da em êgle nebin,
R'ast h'esav kin, r'astî bêjin her yekê me çend h'ev kuştin“.
Bûne lêmişt, ji her aliya terewil berbi wan hatin.
74. R'ev pê k'etbû, usa dihatin qelfe – qelfe bê h'ed, h'esav,
Gak'ûvî û pezê k'ûvî, kar xezalê mêrgê bi av,
P'adşa, xulam lê dixistin bi k'ela dil tîrê xedar,
Ayî tîravêj, zendê qewat û e'gîtê bedewe nar.
75. T'oz – xubara hespa r'adikir, dibû p'erde dêmê r'oê,
Şingîna tîr – kevana bû, xûn dik'işiya mîna avê,
Tîr qubûra ku kêmbûn, xulama zû digîhandê,
Nêç'îra ku wan lê dida, dadnix'ilîn ew li e'rdê.

76. R'ik'êv kirin li ser cola, bestê da ew kirin semtê,
Haqa xûn wir hate r'êtin, zendegirtî jor ma Xudê,
Best sor kirin xûna gevez, xûn k'îşiya ji nêç'îrê.
Go: „Avt'andîl hûn binhêr'in, e'ynî bax'e ji buhuştê“.
77. Bi kih'êla h'icûm kirin û gihîştin serê bestê,
Wîyalî bestê ç'em dik'îşiya, devê ç'êm da zanga hasê,
Nêç'îr r'evî nava mêşe, lê t'une bû r'îya p'îya,
Herdu e'gît westiyayî bûn, wir peya bûn ji ser hespa.
78. „Min alt' kirî“, - hev r'a digotin, dik'eniyan, k'en ser lêva,
Heyî diçûn û disekinîn , xeber didan bi laqirdiya,
Wexta xulam gihîştin wan, tîr û kevan destê wan da,
„We h'esav kir, r'astiyê bêjin“, – ji wan pirsî aha p'adşa.
79. Xulama go: „P'adşaê me, r'astiyê bêjin em bê şube,
Em nikarin we t'a bigrin, ewî pêş bû, pêş bû ji te,
Dixazî tu me darda ke, r'astî heye Mala Xudê,
Çi nêç'îra wî lê dixist, îdî nedikir gava duda.
80. Nêç'îra we herda kirî gihîştîye deh car bîstî,
Lê Avt'andîl te zêdetir bîst jî kuştîye eve, r'astî,
Ji tîrê ku wî avîtye, yek neçûye badîhewa,
Gele tîrê te avîtî, ew gut bûne nav xweliyê da“.
81. P'adşa bihîst gotinê wan, şîr'inaya dengê nerdiyê,
Şa dibû ku wî mezin kir û gîhande wê siyanetê,
Wî Avt'andîl ze'fh'iz dikir, çawa bilbil gul – biharê,
Dik'eniya, h'enek dikir, xem hêç' dikir bi wê k'arê.
82. Û r'ûniştin herdu hêsa wê ber siya darke mezin,
Esker dor wan hat civiya, mîna le'sê simlê genim,
Nêzikî wan r'ûniştibûn donzde xulam mêrê mêrxas,
Şa dibûn bi ç'emê avzîv û bi mêşê hêşîn, hewas.



P'ADŞÊ E'REBA DIBÎNE WERGIRÊ P'OSTÊ PILING

83. Dîtin xortek r'ûniştiye k'enarê ç'êm ç'evê hêsir,
Gendî şêr bû ew e'gîta, dest da gema hespê qemer,
Diç'ûrisin bi lal û dur' gem û hevsar, zîn û bûsat,
Dilê alav, gula mêlît, dihat avdan hêsirê ferat.
84. Libaseke p'ostê piling wî e'gîti wergirtibû,
K'umê sêrî hema gendî ji wî p'ostî dirûti bû,
Qamçiyê dêst da miqerm, qewîn, qalînya zendekê bû,
K'ê ku ew di h'ijmek'arî, dîndara wî t'êr ne dibû.
85. Qûlek şandin bal wî xortî, pîrs, h'ewala ku bike jê,
Yê ku usa şewat digriya, xwe sipart bû melûliyê,
K'anê ç'e'va dibariyan hêsrê dur' mîna te'vî,
Qûl çû nêzîk, turiş nekir, laloma k'et zîmanê wî.
86. Qursax nekir ewî qûlî ku devê xwe ber wî veke,
Zendeğirtî lê dînihêr'î, paşê hînkî dil da ber xwe,
Wî go: „P'adşa h'ukum kiriye“, - îdî zar lê neger'îya,
E'fat digriya, tişt nedibhîst, qe nebihîst dengê wîya.
87. Wî e'fatî qe nebihîst xeberdana qûle li wir,
Wî ne dibhîst, nedighîstê hewar gaziye eskerê wê,
Hêlepîtkî dil r'abûbû, dibû gewlaz t'ev axîna,
Teyê bigota ç'eme dik'şe, ç'emê xûnê t'ev hêsira.

88. Fikra çûbû alîkî din, h'îş sipartibû wî xemê xwe,
Ewî qûlî car din wek'iland wir fermana p'adşaê xwe,
Wî nebihîst çî ku qûl go, ne jî bir'î hesirê xwe,
Ne jî gula nava t'ûma bi naz vekir al belgê xwe.
89. Bê cav ma qûl, zivir'î û p'or' û p'oşman hat cem p'adşê,
Go: „P'adşa, min t'ercube kir, ew naxaze ku te bibhê,
Mîna r'oê ez kor kirim, wî dil min kir lana sawê,
Badîhewa min wek'iland fermana te, êp'ê mam wê“.
90. E'cêbmayî hêrs bû p'adşa û fikirî ew wê demê,
Donzde qûlê e'gît şandin bi ç'ek – sîlih', mêrê kulê,
Wa h'ukum kir: „Hil din her'in ç'ek – sîlih'ê xweye cengê,
Wî e'gîtî hil din bînin, pîrs – h'ewala em bikin jê“.
91. Qûl çûn nêzîk, hat bihîstin xirmîn dengê ç'ek – sîlih'a,
R'abû ser p'ê ew e'gîta, wî t'emiz kir hêsrê ç'e'va,
Dor nihêr'î wî ber xwe, dî k'oma esker sîlih' dêst da,
T'ek carekê go: „Weyî li min“, - îdî zêde xeber neda.
92. Dest bire ber ç'e'vê xwe wî, t'emiz kir hêsirêd germ,
Şûr, kevanê xwe r'ast kir, qolan û mil şidiya ç'erm,
Hespê syar bû, wî guh neda ne hewar, ne gaziya qûla,
Ajoyt û çû alîkî din, wan xaş nekir xema dila.
93. P'ê – p'ê dan peyî, kirin bigrin wî e'gîtê dilşewat,
Wan zivir'î û usa kir, gunê k'afira bi wan dihat,
Cot – cot digirt û hev dixist, wan dişkênand qolan û mil,
Derba qamçî wî k'ê dixist, hema cîda dit'eqiya dil.
94. P'adşa bi hêrs eskerê xwe kire gazî: „H'icûm kin ser!“
H'eta esker nêzîk nebû, ser milê xwe nezivir'î ew,
K'ê nêzîk bû cîda bû laş, ciniyazê wan mane e'rdê,
Yek hil dida yê din dixist... axîna k'ûr hate p'adşê.

95. Avt'andîl û p'adşa syarî ajotin, dan peyî wî şêrî,
Lê ew k'ubar li ser pišta hespê kih'êl dimilmilî,
Ew û hesp va e'yînî şemal, bûbûne nûr deşt û bestê,
Wî dît wekî p'adşa bi xwe hespê syar wê peyî wî tê.
96. Û wê demê wî qamçî kir hespê kih'êl wek werzeba,
Herbê da ew beta vebû û unda bû ji ber ç'e'va,
E'rdê da çû, yan çû e'zman, bû e'cêbke sêr, nedîfî,
Lê diger'iyar, ne didîtin îz û t'oza wî e'gîfî.
97. Badîhewa ew ger'iyar, îz û t'oza wî hil nedan,
Merî usa unda nabe... miliyak'et bû ew, ne îsan.
Esker giriya ser şeh'îda, ardimî dan birîndara,
P'adşê wa go: „Min xeyrîn r'ojê şayî, k'êlma zara.
98. Şabûna min bêfityaye, ew xaş naê Xudaê min,
Awa çima bi te'layî p'erwede kir şabûna min,
Da min derdkî bê dû – derman, h'eta mirinê xwe r'a bivim,
Şikir ji wî, qirara wî nikarim ku qebûl nekim“.
99. Wa got p'adşê, dêmî melûl zivir'i û wî da ser r'ê,
Ser axîna ax zêde kir, wa t'er'ibî dem nêç'îrê,
Nêç'îr hîştin, esker t'op bû, t'ax'bûr – t'ax'bûr k'etin cêrgê,
Hineka go, p'adşa r'aste, hineka go, r'aste Xudê.
100. Dêmî melûl, dilî bi xem, p'adşa k'ete herema xwe,
Kes nehîşt wir, t'ek Avt'andîl jê h'iz dikir wek lawê xwe,
T'ev bela bûn, kes wir nema, ne jî malî hatine wê,
Nêç'îr û k'êf wan t'er'ibî, ker' bûn def û zur'nê.
101. Zûtirekê T'înat'înê bihîst derheqa derdê bavê,
Hat sekinî ber heremê, ew şemala t'aya te'vê,
Xulam pirsî, go: „Bavê min h'îşyare, yan ew r'azaye?“
Wî go: „Melûl r'ûniştiye, r'eng li dêmê wî nemaye.

102. Avt'andîle t'enê cem wî, r'ûniştiye li ser k'ursî,
P'adşa îro xortek dîtiye, ew bûye derd û xema wî".
T'înat'înê go: „Veger'im, çûyîna min bê feyîdeye,
Herge pirsî, bê, hat û çû, çûyîna wê çend deqe".
103. Zûtirekê p'adşa pirsî: „K'a qîza min, ew çi dike,
Ewe şabûn, cewahira min, kaniya e'mire, min e'sq dike".
Xulama wa go: „Şemala te hinkî pêşda hate vira,
Wê bihîst ku ne r'ih'etî, zivir'î ew pêra – pêra".
104. H'ukum kir, go: „Zû gazî ke, bêyî wê e'mir çetine mi r'a,
Bêjê çima tu zivir'î, ne tu e'mirî bavê xwe r'a,
Were birîna min derman ke, xemê dilêm bide ber bê,
Bibh'ê me'na derdê min tu, k'a çi derd min dide cefê".
105. Çawa gotna bavê bihîst, T'înat'în hat sekinî wê,
Nûr difûriya ji dêmê wê şemçiryaxa mîna r'oê,
Bavê r'ex xwe da r'ûniştin û r'amûsa dêmê nazî,
Go: „T'im gere tu r'ex min bî, mecbûr nîbim bikim gazî".
106. Qîzê wa go: „P'adşaê min, k'ê wa dex'ûl te bibîne,
K'ê qursax ke te binhêr'e, bira ew xwe bipesnîne,
Mir'ûzê te û bengzê te r'onaya r'o dîtemrîne,
Başê şuxul r'ê bibîne, melûliyê xwe nehêwrîne".
107. P'adşa wa go: „Ewleda min, çiq giran be derdê min,
Gava ez ç'e'v te dik'evim, baristan dibe dilê min,
Derdê dilêm bela dikî bi sirafet, bedewiya xwe,
Me'na derdê min bizanbî, gunek'ar nekî bavê xwe.
108. E'cêbeke wa r'astî min hat, xortkî mêrxas, e'gît min dî,
Şemala wî dinê hilda, li e'rşa bû nûra findî,
Gelo çima ew digiriya, çi lê mereq min nebihîst,
Wî nexast ku min bibîne, min da peyî û xûna min lîst.

109. Wî e' gîfî ku ez dîtîm, hespê syar bû, hêsir bir'î,
Eskerê min şande pêşyê t'ev kire laş, yek ne zivir'î,
Nêzîk nebû, nehat cem min, nişkêva ew beta vebû,
H'eta niha nizanim ez, miliyak'et bû yan merî bû.
110. Gelo çi bû, çi ku min dî... wê e'cêbê anîm bendê,
Eskerê min ewî qir' kir, ew best avda hêsrê xûnê,
Çi îsanet wê mina bûya ji ber ç'e'va deqîqê da,
H'eta niha ezî şa bûm, niha neyare mi r'a Xuda.
111. K'erema ku mi r'a kirbû, Xuda min kir t'ev kul û derd,
Usa kir ku min bîr kirin r'ojê şayî, jîfîna merd,
Bira xaziyê kes min neyîne, bextê minî kor r'a bigrîn,
Çerxa bextêm ç'ep zivir'îye, r'ojê şayî min buhurîn“.
112. Qîzê wa go: „Îznê bide pîrskê bêjim, p'adşaê min,
Çima gere xiraviyê bike, ê bo qencyê t'im camêre.
K'ê şîrnayî te dinhêr'e, tu te'layî lê nenhêre,
Çima gere xiraviyê bike, yê ku qencî t'im dinhêr'e.
113. Ez wê dibêm, p'adşayî tu û serdestî li ser p'adşa,
Sînorê te bêqeyase, h'ukumê te r'a t'une bergah,
Meriya bişîn tu her alî, bira her'in pê bih'esin,
Wê bèn bêjin, ew îsan bû yan miliyak'et bûye batin“.
114. Merî t'op kir, merî şandin p'adşê herçar qulbê dinê,
Go: „Her'in hûn û nebin qûl t'ucar hûn ber çetnayê,
Wî e'gîfî hûn biger'in, şuxulê din va mijûl nebin,
K'u nikaribin hûn bigîjnê, bi ne'ma hûn lê pîrsyar bin“.
115. Ew merî çûn, çûn heralî, ger'îyan h'eta sal xitim bû,
Hinek gihîştin p'er'ê dinê, salxê e'gît agah nebû,
Qe merîkî usa nedîn derheq wî da tişt zanibiya,
Badîhewa paşda zivir'in, derdê giran dan ser r'îya.

116. Hatin gotin: „P'adşaê me, em ger'iyan yêr, welata,
Em şa nebûn, wî e'gîfî salix – sûlix me hil neda,
Tu bawer ke, me kes nedî yê bihîstbiya derheq wî da,
Me nikarbû tu şa kirayî, bifikire r'êke din da“.
117. P'adşê wa go: „R'astî ew bû qîza min got aqilbendî,
Ew r'uh'ekî ne t'emiz bû, cinê xirav dibe min dî,
Nêta xirav ew hatibû ku r'uh' va min bizêrne,
Derd ji dilê xwe davêjim, dilêm xema qe nebîne“.
118. Wî awa got û dest pê kir e'sq û şayî bi def – zur'ne,
Ji her alî wî gazî kir dengbêj, sazband anîn cem xwe,
Hatî mêvan ji her alî, r'azî kir t'ev bi hedayî,
Bin şikevta Xudê da kes nedighîştê bi merdayî.





**T'ÎNAT'ÎN AVT'ANDÎL DIŞÎNE
KU WÎ E'GÎTÎ BİGERE**

119. Te'na kiras r'ûniştibû Avt'andîl li herema xwe,
Bi eşq distra û şa dibû, zîvîn danî ji sazê xwe,
Hat heremê e'rebê zeng ew xulamê T'înat'înê,
Go: „Nazika bejin çinar gazî dike li heremê“.
120. Avt'andîl wa r'uh' va şa bû, h'esav kir ew be'sa xêrê,
R'a bû zûzka wî li xwe kir libsê xweye hêja kêrê,
P'ir' şa bû ew boyî dîtina gula bedew, h'esîna xwe,
Zeyînete ew ku serxweş bî bi dîndara h'izkiriya xwe.
121. Avt'andîl bi k'ubar k'et r'ê, t'u kesî ew nedik'işîya,
Diçû dîtina horiya xwe ya r'uh' va boyî wê dizûziya,
R'ûniştibû me'de kirî mîna e'wrê ku birq vede,
Xeyrî bû ber birqa wê hîva zere r'engê sade.
122. Xwe kiribû libasê şevê p'ûrta qirqûm k'erge kirî,
Jorda xêlê dihate ser dêmê qerqaş, ç'e'vê tîrî,
K'ê lê dinhêr'î dil dihêngavt tîra bijangê kil kirî,
Gurzê guliya nitirandibû gaz – gerdenê mawer kirî.
123. R'ûniştibû dêmî mir'ûz, libas namlê sor bû sayî,
K'ubar, şîrîn go: „Avt'andîl, k'erem ke r'ûnê hêsayî“.
Xulam anî k'ursiyê layîq û Avt'andîl r'ûnişt li wir,
Dil da şabûna bêqeyas dinihêr'î dîndara wê.

124. Qîzkê wa go: „P'ir' çetine çi dixazim te r'a bêjim,
Min dixast ku dîhar nekim, lê nikarim ku nebêjim,
Gelo zanî ku bona çi min tu anî herema xwe,
R'ûniştîme dêm melûl û bûme qûla fikirê xwe?“
125. Û xort wa go: „Ez ditirsim ku pirske h'aş neyê gotin,
Li ber r'oê şewqa hîva kêmtayaxê, nayê dîtîn,
Me'ne çiyê, dibe ezim... ji vê me'nê tê dernaxim,
Bêje me'na derdê xwe tu, bêje çawa ez derman kim“.
126. Lut'vê şîrîn qîza p'adşê gotina xwe wa anî zar:
„H'eta niha çîqa nêzîk haqa hev dûr bê giliyê sar,
E'cêbmayî tu nemîne, dixazim dil ber te vekim,
Te r'a bêjim bi çi derdî xema dilê xwe bêr dikim.
127. Tê bîra te, tu û p'adşa wexta çûne r'aw - nêç'îrê,
We xortek dî, ç'e'vê girî r'ûniştîbû devê zerê,
Ewê yekê t'im bîr tînim, r'uh' va nikarim hêsa bim,
Gere her'î wî bibînî, dikarim ez te guman bim.
128. Te k'eserek dilê xwe da k'ûr veşartîye, ne aniye zar,
Lê h'uba te min e'yane, zûda mi r'a bûye azar,
Zanim h'ubam şewitandî, hêsrê xûnê te r'êtine,
Zergê h'ubam bûne nîze û dilê te hêngavtine.
129. Îro şûnda qulxa cem min ducara te borcdar dîke,
E'wil ewe mêrxasî tu, t'une bende ku te alt'ke,
Ya duda ew bê şubeye, wekî tuyî h'izkiriyê min,
K'u jî hebe biger' bibîn wî e'gîtî, aminê min.
130. Bi wê yekê dilê mi da h'uba xwe tu hê gur', geş ke,
Ji wê xema cinê xirav bi mêranî min xilaz ke,
Av de gulê gumana min, nûra e'şqê p'erwede ke,
Veger'e tu mîna şêra û xweyîtiyê h'uba xwe ke.

SOT'A R'ÛST'AVÊLÎ

131. Wî e' gîfî bi xwestina min biger' e tu sê sala,
Te dît veger' alt' indarî, tu qise ke gale – gala,
Ku nebînî, ezê bêjim, batinî bû, ne benîadem,
Veger' iyayî, min bibîne mîna gula geş bê kelem.
132. Ez sond duxum pêştirî te navê mêra neynim ser xwe,
R' o bik' eve qilxê mêra, p' êpes nakim ez sonda xwe,
Bi cinetê ez şa nebim, k' ûpê ce' nmê be p' ara min,
Û h' uba te bibe nîze, bixeşbîne ew dilê min“.
133. Avt' andîl go: „Tu şexsa min, bi bijangê mîna şebe,
Qursax nakim cabê bidim, ku xeber bin babetî te,
Ez hîviya mirina xwe bûm, lê te r' uh' ê şîrîn da min,
Dik' evim r' ê ez çawa qûl, wê gumana ku te da min“.
134. Dîsa wa go: „Gendî r' oyî, Xudê tu r' o xuliqandî,
Destûr dane ber te siteyîr, siteyîrê geşe, nûra findî,
Bi merdayî xeberê dur' p' ir' r' o kirin te bona min,
Gulam t' ucar naç' ilmise, tu p' ir' merdî şemala min“.
135. Herda sond xar û ad kirin, wir dane hev soz û qirar,
Dîndara hev t' êr ne dibûn, beşera xweş hevr' a ît' bar.
Derdê dilê wan sivik bû, mîna meriyê xewnê da be,
Ji diranê wane sipî nûra siteyîra bela dibe.
136. K' îp r' ûniştin herdu rex hev û xulxulîn xeber, h' enek,
Li hev aliyan dur' û bîlar, lal û şebe û lêva berk',
E' gît wa go: „K' ê te dinhêr' e h' îş û sewda unda dike,
Te dilê min kiriye k' ûre, h' ub - alavê zêde dike“.
137. Û ew k' et r' ê, wî zanibû ber wî derdî tamîş nake,
Peyî xwe dinhêr' î, wê diger' iya, ku dilê xwe baristan ke,
Mîna gula zîpkê k' utayî, dir' icifand wî e' gîfî,
Dilê xwe wan sipartibûn hev, ort' ê da ad, ziyaretî.

138. Wî go: „R’oê, xerîbiyê da dibe gulam biçilmise,
Beqem bûne bîlar û lal, r’engê k’arbar min dipirse,
Çawa bibim ez ji te dûr, ku xerîbî dirêj bibe,
Ku bimirim boyî evînyê, qirara min p’êpes nabe“.
139. K’ete nav cî û giriya, barand te’viya hêsirê şor’,
Mîna dara sipindarê ku dih’eje ber bayê zor,
Gava ç’e’vê xwe bida hev, h’izkirî bû li ber ç’e’va,
H’işyar dibû fikir axîn, derd k’ûr dibû h’izingava.
140. Dûr k’etina ji dilk’etiyê derd serbarî derda dikir,
T’e’viya hêsira ku dibarand, gula dêm wî betr’eng dikir,
Barbangê r’a k’inc xwe hêwrand, k’ê lê nihêr’î, aqil birand,
Hespê syar bû çû ber bircê, h’akim, maqûl wî xwe civand.
141. Şand dîwanê wî xulamek, xizmetk’arê xweyî qedîme,
T’eslîm kirê ku wa bêje: „P’adşaê min, wa fikrîme,
Te kiriye bindûr’a şûr yêr û welat li vê hênê,
Wê hê baş be, ku vê yekê bibhên herçar qulbê dinê.
142. Ezê her’im û h’icûm kim, bidme bin p’ê yêr û sînor,
Dengê h’ukumê T’înat’înê bikim dila ça zerga zor,
Ç’e’vê xirav hêsira bidmê, bidme momina k’erem, şayê,
Hedayê p’ir’ ez bişînim û silav kim sidqê qencyê“.
143. P’adşa awa cava wî şand, mîna bavê ewled guman,
Go: „Şêrê min, e’gîtî tu, te şer’a da xwe neda yan,
Çi fikirî e’gîtiye, layîqe t’ek boyî te e’gîtî,
Tuyê her’î we’de lazime, dibe hinkî derengî bî“.
144. Wexta e’gît dêrî da hat, t’emene bû li ber p’adşê:
„P’adşaê min, pesnê te da, borcdar kirim h’eta mirmê,
Heger Xudê r’oja tarî ser min sahil ke bi r’onayî,
Bextê min jî wê bik’ene, bibînim te dilê şayî“.

SOT'A R'ÛST'AVÊLÎ

145. P'adşê bi dil ew h'emêz kir û r'amûsa çawa ewled,
Kesî dinê nedîtîbû h'iz kirina usa bê h'ed,
E'gît r'abû û k'ete r'ê, xatrê xwe xast dêmî melûl,
P'adşê boyî wî hêsir r'êtin, fikra xwe da ew bû dex'ûl.
146. Avt'andîl wê hespê syar bû û da ser r'ê meşa k'ubar,
Best şev û r'o r'ê k'udirand ew ox'ira xwe bû ît'bar,
T'înat'îna wî dilalav dilê wî da bê cudayî,
Ew bû eşqa ser dêmê wî, xizna bêh'ed nebînayî.
147. Ew gihîşte yêr, t'apiya xwe, wur dest pê bû şayînet şayî,
Gire – gira anîn pêşiyê bê h'ed, h'esav dur'hedayî,
Lê wî şêrê dêmî şemal xwe ne hêvşand ji ox'irê,
Cime'ta wî dorê t'ov bûn, bûn mihum wek pêlê be'rê.
148. Şiherekî wî p'ir'berk'hebû bi birc serê qayîm zir'î,
Ban gihîştîbûn e'zmanê şîn, dorê zer bû r'ê lê bir'î,
Wur sê r'oja wî nêç'îr kir, derd û xemê xwe da bêrî,
Paşê gazî Şêrmadîn kir, li t'ivdirê kir seferî.
149. Go: „Şêrmadîn, tu min bibhê r'aste ji te p'ir'şerm dikim,
Haj pê heyî her r'ojeke qenc yan xirav derbaz dikim,
Lê nizanî ku bona çi hêsirê ç'e'va betal nakim,
Ax, hema wê, k'ê hingavtim, da ev eşqa ku ez dikim.
150. H'ub, evîntiya T'înat'înê, h'esîna dil ez h'eilandim,
Nargîsa bi hêsirê germ, gula ç'ilmisî vege'andin,
Min derdê xwe h'eta îro qûl, bende pê neh'isandiye,
Niha wêya guman da min, boyî wê yekê dilêm şaye.
151. Wê go: „Here bibhê , k'ê bû ew e'gîtê beta vebû,
Tu zivir'î, ez te şa kim, çi xiyala dilê te bû,
Mêr ku bibin dar buhuştî, pêştîrî te qebûl nakim“.
Wê guman da ber dilê min, birîna xwe pê derman kim.

152. R'astî jî ez xulamê wê me, biqedînim ger h'ukmê wê,
Em t'emamiya e'mrê xwe da p'adşê r'a ît'bar bin t'imê,
Agirê dilê min vemirand, vemirand wê cefa min,
Ber cefê em ger nesenin, bi e'gîtî wan mina kin.
153. K'engê aha ax'a, xulam mîna min te hev h'iz kiriye,
T'eweqa min tu baş bibhê, te li min guhdariye,
Dewsa xwe ez te dihêlim, serek bî ser eskerê min,
Pêştirî te ser t'u kesî r'astî t'une ît'bara min.
154. Tu serwêriyê gere bikî him esker, him sereskera,
Haj her tiştî gere hebî, meriya bişînî k'oç'k û sera,
Dewsa min tu nema binvîs, merd bişîne tu hedaya,
Usa bike neyê k'ivşê ku nevirim, bêyî kêmaya.
155. Mîna min be him şer'a da, him jî r'aw û nêç'îrê da,
Sê sala tu hîviya min be, sur'ê xayîke dilê xwe da,
Dibe r'okê ez veşer'im, çinara min neç'ilmise,
Ku nehatim ser min bigrî, agir hêsrê germ vêdise.
156. Wî çaxî tu caba nexêr here bêje p'adşê xwe r'a,
E'lam ke tu mirina min, berxwe nek'ev tu herbê r'a,
Bê: „Gor', k'efen bû p'ara wî, k'îjan p'ara her kesiye,
Zêr' û zîv xizna min derxe, bela ke nefsê yasiye.
157. Alîk'ariya tu bidî min, ewe r'uh' va hê e'gît bî,
Mîn bîr nekî, t'im bîr bînî, t'ucar gere bîrsar nebî,
Şînam bike, boyî r'uh'ê min bike dia' û dirozga,
Mîna dayîka emekdar bî, şêkra qencyê teva aga“.
158. Wexta xulam ji wî bihîst, e'cêbmayî ew k'ewgirî,
Û hêsir bûn te'viya dur'a ji herd kaniyê ç'e'va barî,
Wî go: „Çawa ji te dûr bim, çawa şa bim û çi tehrî,
Turiş nakim bêjim bise, zanim ese tuyê her'î.

SOT'A R'ÛST'AVÊLÎ

159. Derheq mi da te çawa go: „Ku dewsa xwe te dihêlim“,
Ez dewsa te û mîna te serwêriyê çawa bikim,
T'enêbûna te bîr bînim, bira xwelî min mîna ke,
Ya baş ewe em t'evayî bik'evin r'ê, bextê çi bike“.
160. E'gît wa go: „Giliyêm bibhê, ez r'ast dibêm ne ê'rîfî,
Evîndar t'im ger t'enê be, ç'îya, baniyê saw ne safî,
K'ê lal û dur' dest xistiye bê cefa û bê fiyatî,
Boyî qomsî û nemerda gere bive zerga r'astî.
161. K'ê r'a bêjim ez derdê xwe, k'êye hêja pêştirî te?
Ît'bara xwe ez k'ê bînim, ku amin be mînanî te?
Tu sînore xwe mih'kem ke, sawê bihêl tu ser dijmin,
Dibe r'okê ez vege'rim, Xudê mirnê dûr xe ji min.
162. Berge t'une ber derpa bext, çi yek, çi sed, cem yeke,
Xerîbiyê da tişt min nayê R'ebê E'lamê ku h'iz neke,
Sê sala da ez ne hatim, wî çaxî tu şînam bike,
Ezê k'ax'ezkê bidim te, ku herkes te serek nas ke“.





NE'MA AVT'ANDÎL R'IE'TA XWE R'A

163. Wa nivîsî: „R'ie'ta min emekdarî, emek şêkir,
Cêr'bandin û aminayî şer'a da we nav qazanc kir,
T'imê mi r'a amin bûne, bûne siya xastina min,
Niha t'op bin, t'op bin ser hev û bibhên hûn ne'ma min.
164. Avt'andîlê xweliya p'ê we, bibhên, we r'a çi dinvise,
Vê ne'ma ku ez dişînim, min bi destê xwe nivîsiye,
Qirar kiriye ku we'dekî bir'evim ji k'êf û şaya,
Bi tîr – kevan, bi zendê xwe r'isq destxim li ç'îya, baniya.
165. Olecaxek min qewimî, ez avîtim p'er'ê dinê,
Gere salkê ez biger'im xerîbiyê da tik' û t'enê,
Hûn qebûl kin gotina min, t'ewêqa min mûaser kin,
T'extê welat dijmin xayî kin, h'eta r'oja hatina min.
166. Şêrmadîn ez we r'a dihêlim li dewsa xwe çawa serek,
H'eta salixê min hil nede saxim, mirî ew be gerek,
Nahêle gul biç'ilmise, wê r'onayê bide ser we,
Mîna mûmê bih'elîne, ew neyar û dijminê we.
167. Hûn jî zanin min xayî kiriye çawa ewled, çawa bira,
Qedir bigrin ça qedrê min, wî h'esav kin dewsam xwe r'a,
Bor'iyê lêxe... gur'ê da bin, gur'ê bikin borcdarin hûn,
Şînê bikin ku nehatim, bit'er'bînin e'sqa xwe hûn“.

SOT'A R'ÛST'AVÊLÎ

168. Aha nema xwe xitim kir zarşîrînê, lut'if nazî,
K'embera zêr' wî girêda, mêrê ox'irê kire gazî,
Go: „Bestê da hespê syar bim“, û wî esker r'akir ser p'ê,
Ox'ira xwe ne p'oşman bû, wî banzda ser pişta hespê.
169. Wî go: „Niha hûn bizivir'in, ez ne h'ewcê ardimiyê me“,
Ji xwe dûr xist eskerê xwe û go: „Niha ez t'enê me“,
Serê hespê xwe zivir'and mîna tîrkê k'et nav mêrgê,
T'înat'in bû ber ç'e'vê wî, pê r'a mîna mêrê mergê .
170. Ajot buhurî besta fire, wî peyî xwe hişt eskerê xwe,
K'ê ku ew dît, qursax nekir ku bide peyî bi h'emdê xwe,
Sawa şûrê wî ser benda, her kes li wê hate r'aê,
Bi wê yekê saw dila da dibû lerzek mîna t'aê.
171. Esker nêç'îr da sekinandin, dîtin serek t'une li wê,
Wana nedî r'oja şemal, xeyîrî r'eng e'gîtêd çê,
Şayî li wan bû şîn, girî û ew hil dan melûliyê,
Hespa syar bûn û ajotin, her alî çûn, çûn ger'iyân lê.
172. „Şêrê Xudê, k'ê dewsa te Xudê ser me k'ivş ke xayî“,
Diger'iyân, hev dipirsîn wir eskerê wî t'evayî,
R'astî t'u tişt nebihîstin, wî peyî xwe hişt ç'iya – banî,
Diger'iyân e'gîtêd wî boyî wî şêrê dêm nûranî.
173. Şêrmaîn wir t'op kir dor xwe wî serekêd esker, e'gît,
Ewî nema wî şêrî xand, hêsrê ç'e'va lê kir k'ilît,
K'ê ku bihîst dilê kovan k'ûr kir axîn, hêsir barand,
Derdê giran dil wan vejand, bi axîna ewan nivand.
174. Hevr'a gotin: „Bêyî wî şêrî e'mirê me ne t'u e'mire,
Lê Şêrmaîn pêştirî te k'ê wê dewsa wî bigire,
To h'ukum ke, em qûlê te, îro da tu serekê me“ .
T'emene bûn ew ser berjêr, gotin: „Bav be tu bona me“.





AVT'ANDÎL DIÇE WÎ E'GÎTÎ BİGER'E

175. Şe'dê gotnam Dîyonîse t'acê ulma Yêzras zane,
H'eyîfa gulê ku ji xûsiyê diç'ilmise ew beyane,
Ew yê ku dêm xeyîriye, bejin mêl bûye qamîşê ter',
Ew ji xweliya xwe dûr niha dik'işîne cefê bi ker'.
176. Avt'andîl bi hêbet dajot, mezîlê dûr wî dik'udrand,
Xwehiya e'reb ew derbaz bû berbi welata r'ê diqedand,
Lê dûrk'etina ji Şexsa nûr ew dimaşiya, sekinî, wa go:
„Hêsirê ç'e'va min ne dir'êt, ku bidîta Şexsa dêm r'o“.
177. Kuliye berfê jor da barîn, dîsa xeyîrî şewqa gulê,
Destê lerizî şûr digeriya, dil da cî ke mîna kulê,
Wî go: „Bextêm bê îsafî, sedcar dike ew derdê min,
Min hîştiye k'êf û şayî, hîviya minin saz – meya min“.
178. Ji Şexsa xwe dûr diger'iya, r'engê gulê hê dixeyîrî,
Wî go: „Dilo, tu tamîş ke, çetinaya r'a tu ne qûlî“.
Xerîbiyê da ser r'ê – dirba dîsa ew lê diger'iya,
Nasiya xwe dida r'êwiya, pirs dikir, guh dida giliya.
179. Diger'iya, hêsirê ç'e'va dibûne ç'em û dik'şiya,
Binr'axa wî e'rd bû jê r'a, zenda wî bû dewsa be'lgiya,
Û wî digot: „Evîna min, qalibêm vire, r'uh'êm cem te,
Ew k'ereme ji Xudê da ku r'uh'ê xwe bidim boyî te“.

SOT'A R'ÛST'AVÊLÎ

180. Çerxa dinê ewî dayê, cî nema ku lê neger'îya,
Bin şikevta Xudê da wî t'u cî nehîşt neda bin p'îya,
Lê ewî t'u bende nedî, bida salxê k'ê diger'îya,
Çawa sê meh lê derbaz bû, sê salê wî serê r'îya.
181. K'et welatkî xikî xalî, bê e'vd – îsan, t'ik û t'enê,
Mehê merîk wî ne didît xêncî e'zav, cefa dinê,
Cefa usa ne dîtîbûn ne R'emîn, ne jî Vîs,
Ber ç'e'vê wî dêmê yarê mîna xewna dibû îs.
182. Serê ç'iyakî bilind hêwirî û wir hespê xwe peya bû,
Jêr nihêr'î bestek fire, mezîl r'îya h'evt r'oja bû,
Ç'emek dik'şîya p'êşa ç'iyê, t'u ciya p'ira lê t'une bû,
Lê herd aliya darê mêşe li k'enarê wê h'esar bû.
183. Dor xwe nihêr'î, vep'eşîrî, wî h'esav kir r'ojê buhurî,
Kire axîn: „Du meh mane ji h'esavê qîrar kirî,
Dibe nêtam neyê sêrî, - h'izing k'işand û k'ewgirî, -
Cara duda k'ê sugurî, k'ê wê xiraviyê têke qencî“.
184. Fikirî ew, xem da bêrî û xem lê bûn mîna r'efa,
„Ku destvala ez vege'rim, îdî çîma dît ew cefa?
Şexsa xwe r'a ez çî bêjim, çîma k'etim ç'îya – baniya?
Çawa bêjim, tişt ne bihîst derheqa e'vd û beniya.
185. Ku niha ez veneger'im û dirêj kim we'dê ger'ê,
Badîhewa ez lê ger'iyam, haqa we'de min da ser r'ê,
We'dê min wê xitim dibe, Şêrmadînê bike şînê,
Derheqa mi da, paşî mi r'a ewê bêje cava mirinê.
186. Ne axir min jê r'a gotiye e'lametiyê bide p'adşê,
T'evê bigrîn û h'eznî bin, bona min wê bikin şînê,
Paşî wêya sax – silamet mîna xewnê dîhar be wê“.
Wa fikira da melûl diçû, te'laya te'l dabû gewriyê.

187. Wî go: „Xuda, k'erema xwe çima boyî min te hêvşandiyê,
Cefa min bû bê feyîda, mirazê min nivî maye,
Çima eşqa min te birand, dewsê cefa te daye min,
Hema aha ser r'ê, dirba t'im hêsir bin herd ç'e'vê min.
188. Ya baş ewe, ku tamîş dim, - wa xwexwe wî dil dida xwe, -
Berhûm nebim, we'de zûtir, neh'eyrînim ez e'mrê xwe,
Bêyî Xudê em çi bibînin, t'ev h'aş da ne giriyê bê k'ar,
Yaziya k'ê wê biguhêr'e, nebînatiyê bike sit'ar.
189. Dinê da min t'u cî nehîşt, ç'iyâ, banî min da bin p'ê,
Bendekî ku ew bidîta, min nedît li ser vê ox'irê,
Hilbet r'ast bûn yê ku gotin, h'esav kirin dewsa cina,
K'arê nade ç'emê hêsira boyî e'cêba ku bû mina“.
190. Avt'andîl ji ç'iyê peya bû, derbaz bû ew ç'em û mêşe,
Û hespê wî seglavî bû, meqes dikir besta dêşe,
Îdî t'aqet lê kêmbû, wê yekê r'a nedihat r'ayê,
Mîna şebe qeyîtana r'eş xemla dêm bû li ber lêvê.
191. Wî qîrar ku bizvir'e, bi dilê xem kire axîn,
Ç'e'va çap kir r'iyâ buhurî û mezîla bê qeyas şîn,
Ew mehek bû ku nedîbû wî li ser r'ê e'vd û î'san,
Bê h'esab wî terewil dî, lê li yekê negirt nîşan.
192. Bi xwe bûbû ew beyanî, hêsir dir'êt bi dilê xem,
Birçîbûnê li wî zor kir, teyax nade benîadem,
Nêç'îrkê xist zerga tîrê mîna zerga R'ostemî Zal,
Ber zinarkî ew peya bû, heste vêxist agrê şemal.
193. H'etanî goşt biqedîya, hespê xwe wî berda ç'êrê,
Wî dî şeş syar berbi wî tîn, peyî hevr'a ew k'etine cêrgê,
Fikirî go: „Ew h'eravînin yan xalîfine ev e'seyî,
T'u qûl, bende turiş nake bik'eve nav vî mêşeyî“.

194. Tîr, kevanê xwe hazir kir, dît ku ew jî nêzîk dibin,
Dît du extiyar bi r'îdan cinyazekî cahil dibin,
Birîna wî ji sêrî bû, xwe va çûbû r'eng zenane,
Cahil îdî ber r'uh' da bû, bira bir'î bûn gumane...
195. Kire gazî: „K'êne bira, min t'urê hûn h'eravîne“.
Wana wa go: „Bibhê bira, em h'ewceyê ardimiyane,
Ku derdê me derman nekî, bi derdê me tu jî bigrî,
Şînê bike tu t'evî me, ku dilê xwe baristan kî“.
196. Avt'andîl ji wana pirsî, çi li wana qewimiye,
Û wana go ç'e'vê hêsir, çi e'cêba wana diye...
„Sê birane em hersê kin, niha bibhê tu derdê me,
Ser xweliya Xataêt'ê heye şêher û kela me.
197. Derheqa vî mêşeyî da me bihîst û em jî hatin,
Bê h'esav bû eskerê me li r'ex ç'êm em r'ahatin,
Meheke t'am me nêç'îr kir, kir û vexar k'êf û şayî,
Zêrzelat me kirbû mêşe t'ev eskerê xwe t'evayî.
198. Hersê bira hatin k'ivşê çawa e'gît, çawa mêrxas,
Hevr'a k'etin em h'ucetê, k'êye ji me mêrxasê baş.
Yekî go, „Ez“, yê din go, „Ez“, ser wê yekê em hev hatin,
Hev xeyîdîn, qedr û r'ûmet ort'a me da hat hilatin.
199. Eskerê xwe me ver'ê kir, barê p'ostê kar xezala,
Me go, emê niha k'ivş kin k'îjan meye wan e'gala,
Li vê bestê em hersêkê t'enê derên r'aw –nêç'îrê,
K'ê me çi dî, ewê lêxe, xelqê nakin em t'ivdîrê.
200. Em hersêk man, her yek ji me t'ev xulamkî xweyî amin,
Eskerê xwe me ver'ê kir, me nizan bû bexte dijmin,
Ç'iya, banî me da bin p'ê, em dak'etin zang û geliya,
Mê qir'kirin h'eyîwan, de'be, zîwan kire ç'iya, baniya.

201. Me nişkêva e' gîtek dî, dîlkovanî dêmî bi saw,
Li hespekî qemer syar bû, mîna nûra r' oê bû k' aw,
Libasê wî bûn p' ostê piling, k' umê sêrî jî wî p' ostî.
Keskî nediye li r' û dinê bedew mîna wî e' gîfî.
202. Me lê nihêr' î, şemala wî ç' e' vê me lê hilnedihat,
Me go: „Eve nûra r' oê“, û ew nava li wî dihat,
Em çûn nêzik, me xwe bîr kir, em r' ahîştê, ku bigirin,
Ayî bona çi wa dilşewat em digir' in, şînê dikin...
203. Min ji bira t' eweqe kir ku degmîştî wiya nebin,
Birê minî ort' ê wa go: „Hespa qemer ew bona min“,
Birê biç' ûk wir qure bû, h' icûm kir ser, derbê lêxe,
Em nêzik bûn, cî ne leqiya, me go: „Wê birê bip' elêxe“.
204. Qeyî te digo, gula nazik bi lal û dur' hev hûnaye,
Nişkêva li ser dêmê wî nûra şemal birq vedaye,
Qedir negirt, ne go, r' ûnên, strûyê kelem berbi me kir,
Qamçiyê qalin ji cî hilda, îdî qamçî bilind nekir.
205. Birê biç' ûk ji cî p' ekiya, em herd bira cî ne h' ejyan,
„Bisekine!“, lê kir gazî û dest avît şêrê e' yan,
Şûr ne k' îşand wî e' gîfî, em hinekî baristan bûn,
Wî qamçîk da serê birê û ji sêrî k' îşiya xûn.
206. Derbek lêda, derb usa bû – serê birê wê h' incir' î,
Mîna p' elê xweliyê serî hev berda û wir p' îşîrî,
Yê dijminayî dest avîtê, wî saxe – sax kire gor' ê,
K' ubar, bê xof hespê syar bû, milmilî û da ser r' ê.
207. Veneger' iya, nenihêr' î, hespê qemer ajot û çû,
Wa binhêr' e awa diçe, hîv bû yan r' o, ew e' cêb bû“,
Ew nîşanî Avt' andîl dan dûrva mîna ç' irakê bû,
Qeret' ûyê wî û hespê melemê da mina dibû.

SOT'A R'ÛST'AVÊLÎ

208. Bext k'eniya Avt'andîl r'a, ç'e'v ziha bûn ji hêsira,
Sê salê ku lê diger'iya derbaz nebûn badîhewa,
Ew gihîşte merema xwe, wî dî ew li k'ê diger'iya,
Îdî çima wê bîr bîne cefa xweye serê r'iya.
209. Avt'andîl go: „Gelî bira, ez xerîbim, ne van dera,
Gendî bona wî e' gîtî bûme firar, daye ser r'iya,
K'erem bû, hûn r'astî min hatin, we da min çi diger'iyam,
Îro şûnda bê xiravî, Xudê we r'a k'erem be t'am.
210. We gîhandim ez miraza, Xudê bike mirazê we,
Ç'e'vê ziha ji vir herin, belkî qenc be birayê we“.
Wî go: „Her'in ber siya han, hûn hinekî wir hêsa bin,
Xudê bira we bê r'e'mê, birînê wî hûn derman kin“.
211. Hê xeber bû li ser zara wî nişkêva hesp zengû kir,
Ji cî p'ekiya mîna teyîra, besta fire wî r'ik'êv kir,
Mîna hîvê dikudirand, ku bighîje r'oja şemal,
Hênîkayê ditemirand agirê dilê wîyî k'emal.
212. Nêzîk dibû, difikirî, çi teherî wî silav ke,
Pirseke ne dilê dîna, meriyê dîn hê dîn dike,
Meriyê aqil şuxula çetin aqilayî mîaser dike,
Dilê hêsa bifikire, ew ji sawê fedî nake.
213. Wekî usa ew beyantî wa diger'e bi dînanî,
Nahêle ku kes nêzîk be, xeber nade t'u zimanî,
Berê xwe ku em bidin hev, şer'ê çê be lap bê me'nî,
E'se yek me wê bê kuştin, ew yek nabe mêranî.
214. Wa fikirî: „Cefa min dî badîhewa unda nabe?
Her r'uh'berek li r'û dinê naqewime bê hêlûn be,
K'uda her'e, ezê peyî bim, her çetinayê ezê bibim,
E'se ezê r'ê bibînim, hê lazime bifikirim“.

215. Yek pêş, yek paş, du şev û r' o hespê kih' êl ajotin wan,
Qe deqekê hêsa nebûn, ne jî xarin ne' met û nan.
Cem wan yek bû çî şev, çî r' o, mezîla dûr diqedandin,
Ser r' iya xwe wan best û mêrg bi hêsira av r' eşandin.
216. R' o dibuhurî dibû êvar, k' or û kendal hatin xuyan,
Sîngê kendal şikevt hebûn, berda dik' şiya ç' emkî qeyt' an.
Li ber çêm da qamîşê six çipixî hev mîna mêşa,
Bax' ê bilind hebûn li wir, bilind bûbûn berbi e' rşa.
217. Ç' em derbaz bû ew e' gîta, k' et r' ê û çû berbi şikevtê,
Ber bax' ekî bilind, mezin Avt' andîl wir banzda e' rdê,
Hesp bax' ê va wî girêda, bi xwe r' abû serê darê,
Wî dî, e' gît dimilmile dilî kovan li ber zerê...
218. Ew wergirê p' ostê piling wexta mêşe jî derbaz bû,
K' ulfetek ber dêrî sekinî, k' incê r' eşe h' eznî lê bû,
Usa şewat ew gir' iya, hêsir bûne ç' emê dur' a,
E' gît ji hespê peya bû, ew h' emêz kir mîna bira.
219. Wî go: „Asmat' p' iraya me be' rê hilda bê îsafî,
Ne gihîştin wê bi derdê, k' ê xurêm maye şîn û girî“.
Vê gotinê r' a da sîngê xwe, barand ç' e' va hêsirê dur' ,
Wê xwe da ber sîngê birê û hêsir bûn wir ç' emê gur' .
220. Haqa p' or' ê xwe veçirîn pê six kirin mêrga li wê,
Xwe dabûn ber sîngê hev, wek cot çinar bin, ew li ber bê.
Usa şewat ew digiriyan, deng dik' ete zang, mix' ara,
Avt' andîl li wan dinhêr' î, e' cêbmayî ma dîtinê r' a.
221. Wê k' ulfetê dil da ber xwe, sêk' in bû derdê dila,
Zin, bûsatê hespê hil da, hesp bir t' ewlê, wê girê da,
Ç' ek, sîlih' ê wî e' gîfî piştê ve kir û hil da wê,
Herdu k' etne wê mix' arê, der nek' etin h' eta sibê.

SOT'A R'ÛST'AVÊLÎ

222. Avt'andîl wa difikirî – çawa azr'o kim vê sur'ê,
Sibe r'on bû, k'ulfet der k'et, dîsa k'incê h'eznî bûn lê,
Zîn û bûsat li hespê kir, dezmała xwe ştaf dayê,
K'ember, sîlih'a ber e'gît girt, derdê dil dêm nehat r'ayê.
223. Keysetê wî e'gîtî bû, r'oê mal da ew ne dima ,
K'ulfet digriya, p'or' vedir'ût, felek jê r'a bûbû tima.
E'gît dîsa ew h'emêz kir, r'amûsa û hespê syar bû,
Dêmê Asmat'a dilkovan hê xeyrî û melûl bû.
224. Avt'andîl ze'f nêzîk va dî dêmê xortê lê diger'iya,
Simêlê r'eş û bê r'îdan, go: „Ew şexse nava beniya“.
Baê hênîk ji dêmê wî misk û mawer xur'a dibir,
Ewî şêrî wê e'rdê da şêr, mîna bizneke k'ir'.
225. Wî e'gîtî da ser wê r'ê, k'îjanê r'a duh ew hat mal,
Ew derbaz bû mêşê qamîş, berbi bestê ajot ker', lal,
Avt'andîl li wî dinhêr'î, bax' xwe r'a kiribû mert'al,
Go: „Xudê, te mîaser kir, deya neçûn ew r'oj û sal.
226. Vê k'erema Xudayê xwe zêdetir ez çî bixazim,
Çî teherî be ji vê k'ulfetê serr'astî sur'ê bih'esim,
Derheqa xwe da ezê bêjim, îsafa xwe unda nakim,
Çîma şûrê wî bik'evim, yan çîma ez wî unda kim“.





**XEBERDANA AVT'ANDÎL
T'EV ASMAT'Ê ŞIKEVTÊ DA**

227. Ji ser darê ew peya bû, hespê xwe ji darê vekir,
Lê syar bû berbi şikevtê ajot çû, xwe egle nekir.
K'ulfet der k'et ji şikevtê ç'e'vê hêsir, şîn û mih'êl,
Wê t'irê ew yê dêmşewqe, şêrê syarê hespê kih'êl.
228. Lê k'êye ev? ...Bi wergirtin bengzemîşî wîya nabe,
Wê kir qîr'in, paşda r'evî, k'et şikevtê ew e'zabe.
Banzda e'rdê Avt'andîl, wê r'ahîstê, girt kewa gozel,
Zarîna wê k'et ç'iya, baniya, wek gur'îna e'wrê e'nzel.
229. K'ulfet pê r'a nehat r'aê, piştta xwe daê, xeber neda,
Mîna kewa ku bik'eve nava p'encê teyîr qot'ir da,
Wê dengekî go: „Tariyêl!“, lê ardimî wê ji k'u biya.
Avt'andîl li ber çok dabû û dihatê bi lavaya.
230. Wî go: „Ker' be, çi te qewmî, ez merî me, benîadem,
Ber ç'e'vê min gulê ç'ilmisî û beyîbûn jî hatine qedem,
Mi r'a bêje k'êye r'astî ew e'gîtê bejin çinar,
T'u zirarê ez nadim te, h'aşda neke tu zare – zar“.
231. Ç'e'vê girî k'ulfetê go: „Wek fermana t'am e'seyî,
Heger dînî bifikire, aqilî dûr k'ev bi hêsayî,
Çi ku mi r'a p'ir' çetine çawa bêjim dil, e'dlayî,
We'dê xwe h'aş tu didî bê, k'arê nakî dijminayî“.

SOT'A R'ÛST'AVÊLÎ

232. Wê dîsa got: „Bêje, e' gît, çi dixazî tu vê demê,
Vê serhatiyê kes nikare t' ertîb bike bi qelemê,
Tuyê çarkê bêjî: „Bêje!“ , ezê sed carî bêjim – na,
K'en çêtire ji hêsira, lê şîna min ji k' ilama“ .
233. Go: „Nizanî serê vê r'ê çi çetnayî min k' îşandiyê,
Bona hildim salixekî, kesî salix hê nedayê,
Xulese, min îdî dîfî, zanim boyî te çetnayîye,
Te bernadim, min sil nebe, gotina min t' eweqeye“ .
234. K' ulfetê go: „Çi xetayî, ez k'ê, tu k'ê... tu hafî k' u,
Sed h' eyîf şexsê min ne vire, h' aş da cefê didî min tu,
Kurt dibêjim zêdeyîye ev xeberdana h' aş û net' êyî,
Çi dixazî, wî jî bike, salix tu ji min nabhêyî“ .
235. Ç' e' vê hêsir ber k' ulfetê, dîsa ew wir k' et ser çoka,
Wî k' ulfet neanî ser r'ê, ne bi sonda, ne dîleka.
Û gunekî te' l hate wî, ç' e' v t' ijî bûn şelt' ê xûnê,
Guliyê wê girt û şûrê xwe k' îşand da ser sitûyê wê.
236. Wî go: „Haqa derd û cefa çawa dikarim bibexşînim,
Bes nîne ev hêsirê xûnê û tu cefa wa didî min,
Ya baş ewe salix bidî, îdî ez te nadim cefê,
Xudê nede dijminê te, çi bibînî vê k' elefê“ .
237. K' ulfetê go: „Bifikire, bêh' emd cefê tu didî min,
Min nekujî ez namirim, bê qeziya be wê e' mrê min,
Bê qeziyaye ku e' mrê min, çi cayîze ku qise kim,
Min bikujî, tuyê çi bibhêyî, wexta îdî ez t' unebim“ .
238. Dîsa wa go: „Bêje, e' gît, badîhewa tu pirs dikî,
Sur'ê ber te azir' o nakim, h' eta dinê heme zêndî,
R' ezadilî mirinê dixazim, dikarî tu min bikujî,
Mîna ne' ma nexêrxaza biqelêşî û bavêjî.

239. Evê cefa tu didî min, te t'irê boyî min e'zabe,
Ji derd kula ez xilaz bim, gola hêsirê wê zîha be,
Ji qirşekê siviktire ber ç'e'vê min eva dinya,
Te nas nakim, yan k'êyî tu, bispêrme te sur'a dila“.
240. Wa fikirî: „Vê k'ulfetê badîhewa didim cefê,
Gere r'êkê ez bibînim ku şuxul da bîne k'arê“.
Ew cîda hîşt, çû û r'ûnişt, dîsa barand hêsirê xûnê.
Go: „Bibaxşîn, ez bend kirme qelpê dil û vê îsafê“.
241. K'ulfet r'ûnişt pêşberî wî, dêmê melûl dil ner'ih'et,
Hêsir dibarand Avt'andîl, xeberek ji dêv dernek'et,
Gola hêsira k'işande xwe gulistana nûr, qudretê,
Boyî Avt'andîl hêsir barand, şewitî dilê wê k'ulfetê.
242. Gune pê hat boyî derdê wî, wê k'ulfetê k'ûr kir axîn,
Dîsa xerîb h'esab dikir, cî ne h'ejya ew dilbirîn...
E'gît fikirî, wê h'emlandim, îdî nîne mîna berê,
Ji cî r'abû ç'e'vê hêsir, çû ser çoka zûr bû ber wê.
243. Wî go: „Zanim dil nazikî, tu navî xûşk îdî mi r'a,
Destê xwe ez êt'îm bûme, min qazanc kir ew yek xwe r'a,
Lê dîsa ez ît'maz dikim, bawer bike sitqê h'elal,
Badîhewa ne gotine, bibexşîne gunek'ara.
244. Aliyê mi da xişîmî bû, te nas kirim ez xiravî,
Lê bizan be evîndarim, evîndar bike sihabî,
Bê t'aqetim û bê kesim li vê diniya dêşe fire,
Boyî te r'uh' jî ezê bidim, guhdarî tu, bifikire“.
245. Wê k'ulfetê wexta bihîst pîrsa „evîn“ devê e'gît,
Kire îskîn, şewat giriya, agirê dil şuxulî mêlît,
K'eserê k'ûr r'ahişt, wê barand hêsirê şor'e aqît'.
Go: „Dengê min Xudê bihîst“, bi dil şa bû xortê e'gît.

246. Fikirî, dêmê wê k'ulfetê carekê r'a hat guhastin,
Hilbet yekî bi h'uba xwe daye vê ev derdê çetin,
„Xûşkê, dibhêyî, gune lê tên wexta dijmin dil evîne,
Ew li mirina xwe diger'e, lê ji ox'ira xwe namîne.
247. Ez e'wt'erê evîniyê me, boyî evîniyê daye ser r'ê,
Şexsa min ez şandime, ku bibhêm derheq şêrê Xudê,
E'wrê ger'ok jî nizane, gihîştme ez çî yêrê,
Min hûn dîtî dilê hevda, hûn mi r'a bûn dergê xêrê.
248. Dêmê wî min dilê xwe da xweyî kiriye wek ziyaret,
E'wt'ar bûme ez bona wî, derdê giran bê herek'et,
Niha bibjêr çawa dixazî, yan xeza ke yan jî aza,
Yan e'mir tu bide min, yan derd cem ke tu li ser derda“.
249. Wê k'ulfetê nerm xeber da vê carê wa me'rifetî:
„Niha pirsê te ku dibhêm, ewin layîqî te e'gîfî,
Hinkî pêşda te dilê min t'ije kir bi dijminayî,
Niha xwe r'a xûşk h'esav ke, lê bona min tu birayî.
250. Boyî wê yekê, evîniya xwe ziyaretî te anî zar,
Ez nikarim qulix nekîm sidqê qencî û tengezar,
Qûla te me... bibexşîne, p'ir' cefa min te kir azar,
Boyî bextê te ez hazirim bimrim her'im ax, berê sar.
251. Niha çî ku ezê bêjim, biqedîne bi dil şayî,
Bê fityaye tuyê bibînî wî yê ku lê diger'î...
Ku nebhêyî, k'arê nakî, çîqa hêsirê xûnê r'o kî,
R'oja teyê bitemire, e'mrê dirêj dinê nakî“.
252. E'gîf wa got: „Gotina te r'a min bîr anî ev serhatiya,
Du hewal t'ev r'ê da diçûn, nenas bûn ew li wan r'iya,
Yê dû dî yê pêşya wî k'ete k'orke k'ûre li wê,
Ser'a sekinî, k'orê nihêr'î, hêsir barand mîna te'viya.

253. Go: „Hevalo, hîviya min be, binhêr' neçi, dilezînim,
Her'im malê şîrîte bînim, ji vê k'orê te derînim“.
Yê k'orê da xwe zevt nekir, k'eniya go: „E'ferim,
Vê k'orê da hîviyê nîbim, bêje ezê k'uda her'im?“
254. Niha, xûşkê, dest te da ne şîrîta pê girêdayîme,
Kes nikare pêştirî te min xilaz ke, gumanim te,
Bike çi dikî, çi tu zanî, birîna mi r'a tu dermanî,
Serê bê êş k'ê wê girêde, xwe qels ke bi nezanî“.
255. K'ulfetê go: „E'gît, r'astî, min xaş hatî xebardana,
Tu merîkî p'ir' eznaî, hêjayî tu pesnê zana,
Dilê kovan, derdê giran cefê te diye van çend sala,
Çi diger'iyayî te ew dîtîye, şîreta min bibhê hela.
256. Lê t'u ciya tu hilnadî salixê wî şêrê Xudê,
Qisa mine badîhewa, ji zarê wî gendî bibhê,
Tu sebir ke û hîviyê be h'eta ew bê – tu mêvanî,
Bi hêsira neh'eyîrîne dêmê gulî, gula e'ynî.
257. Ezê bêjim heger dixazî ku bizan bî tu navêd me,
Tarîyê le navê e'gît, şêrê Xudê, tu bizan be,
Bira, navê min Asmat'e, ez h'elandim bêriya derda,
Ne derdekî, h'ezar derdî nîze k'utan dilê mi da.
258. T'u xeberê ji min nabhêyî derheqa wî da vê zêdetir,
Ew diger'e best û ç'iya dilê kovan, k'ûra agir,
Bê nêç'îr ew venager'e, t'enê goşte xurek boyî min,
Ez nizamim k'engê wê bê, dibe em ze'f hîviya wî bin.
259. Ya baş ewe tu hîviyê bî, bes biger'î ç'iya – baniya,
Gava ew bê, şuxul ezê mîaser kim bi lavaya,
Nasiya xwe ku hûn bidin hev, e'se hûnê hev begem kin,
Serhatiya xwe ewê bêje, ku Şexsa te miraz şa kin“.

SOT'A R'ÛST'AVÊLÎ

260. Pê r'a qayîl bû Avt'andîl, gotina wê wî begem kir,
Wana bihîst dengê avê, syarekî ç'em meqas dikir.
Mîna hîva çardeşevî dêmê e' gît wan qeter kir,
Herdu k'etin wê şikevtê, şuxula xêrê wan t'ivdîr kir.
261. K'ulfetê go: „Ax, zarê te Xudê bihîst, ew ax'aye,
Xwe sep'e ke, te nebîne, h'eta bêjmê sur'a teye,
Şêrê Xudê t'u qûl, benda ber xwe sekinî nah'emlîne,
Ezê şuxul mîaser kim, wê bixaze te bibîne“.
262. Wê k'ûraya şikevtê da Avt'andîl bir da seknandin,
E' gît ji hespê peya bû, bû şingîna ç'ekêd h'esin.
Dîsa ne'liya û k'ûr kir axîn, wî kire gol hêsirê xûnê,
Avt'andîl ji qelşa dêrî dinhêr'î dêm nûra dinê.
263. R'engê k'arbar hêsira şûşt, birqa bîlar da dêmê wî,
Herdu giriyan, kirin zarîn, deng gihîşte e'wrê r'êvî,
E' gît vekir ç'ek, sîlih'ê xwe, Asmat'ê hesp bire hundur',
Herdu ker'bûn, şûrê şebe bir'î berga hêsirê dur'.
264. Avt'andîl bû dîlê aza, ker' dinhêr'î wê dîdemê,
Lê nihêr'î, wê k'ulfetê p'ostê piling r'axist e'rdê,
Melûl r'ûnişt Tarîyêl li wê, derdê giran dida cefê,
Hêsirê xûnê bend kiribûn birû, bijangê mîna şebê.
265. Şikevtê da agir vexist wê k'ulfetê kevir heste,
Wê t'irê wê goşt bixve ew e' gîtê p'ir' serbeste,
Cî goşt hilda ç'e' vê hêsir, lê nihêr'î me'de kirî,
Bi t'iliyê sist bir devê xwe, necût danî ser kevir'î.
266. Hinekî p'alda, ç'e'v çûn ser hev, car din xewê ew h'işyar bû,
Hêvilmîş bû, ji cî r'abû, kire qîr'în, ew e'zab bû.
Dikir qîr'în, serê xwe dixist, sîngê xwe k'uta bi kevir,
Wê k'ulfetê dêm xwe h'er'işand û digiriya derdê bira.

267. „Bêje, çima pajda hafî, çima mayî r'a - t'ivdîrê?“
E'gît wa go: „P'adşak îro derk'etibû r'a - nêç'îrê,
Ordiya wî bêh'esav bû, barxane p'ir' malê dinê,
Wî hilda bû best û mêşe û k'ulfet bûn hevalê r'ê.
268. Merî dîtîn, birînê min t'eze vebûn, alav k'etê,
Ez nêzîkî wana nebûm, nexast herim li ser xetê.
Paşda zivir'îm dêmê melûl û mêşe da min xwe veşart,
Wa fikirîm: „H'eta sibê ewê h'er'in, r'ê nabin qet“.
269. Û ji ç'e've wê k'ulfetê ç'emê hêsira ha gur' p'êl da,
Wê go: „Sed h'eyîf, tu diger'î t'enê nava de'bê h'ar da,
Keskî nahêlî tu nêzîk, pîrs - pîrsyara sêk'in navî,
Usa k'arê nadî şuxul, tu e'mrê xwe dibihurî.
270. Daye bin p'ê te ev diniya, t'opa dinê tu ger'iyayî,
Te kes nedî çawa heval, bibiya hevalkî h'izkirî,
T'ev te bûya nedibûyî de'be, dilê teyê sêk'in bûya,
Tu bimirî, ew bimîne, k'ara teyê tê da çi biya“.
271. Wî go: „Xûşkê, xeberê te mîna dilê te sahilin,
Dinê t'une dû û derman birînê dilê m'ew bigirin,
Ku bibînim yekî usa, dibe hê ne hatiye dinê,
Ezê şa bim mirina min bê, r'uh' qalbê min bihêl t'enê.
272. Bin siteyîra min nexulîqiye yekî usa, bawer ke min.
Min jî dixast ku dilê xwe ez ber vekim, lê bim amin,
Bêje, k'ê wê bixaze t'ev min nîvîke derdê dilê min,
Sed h'eyîf, xûşkê, pêştirî te t'une kese mi r'a amin“.
273. „Hêrs nek'eve, - Asmat'ê go, - lava dikim ez dilê sar,
Xudaê min ez k'ivş kirme te r'a wezîr û şîretk'ar,
Ez naxazim te veşêrim çi ji e'mr min hildaye,
Nebaşe ku çapê derêyî, lê te çapê jî gav daye“.

274. E'gît wa got: „Çi dixazî, fer'ih' bêje, ez nizanmê,
Bêyî xastina Xudê çawa ez merîkî bînim dinê.
Xudê xastiye ku bêbext bim, îdî çi r'ê ez biger'im,
Îdî bûme ez beyanî, mi r'a bêje k'uda her'im“.
275. K'ulfetê go: „Bibaxşîne, min vir zêde ze'f xeber da,
Ku merîkî bînim bal te, yê xof nake ji t'u qeda,
Bi gotina wî tu p'ir' şa bî, pê r'a bikî tu gale – gal,
Sond buxwe ku wî nekuji, tuyê wî r'a bibî heval“.
276. E'gît wa go: „Wî dîhar ke, ezê şa bim ku bibînim,
Sond duxum ez bi h'uba wê, derdê k'îjanê dik'şînim,
Pirske xirab ez navêjmê û tiştêkî xirav nakim,
Çi bixaze ezê bikim û biratî ez jê h'iz kim“.





R'ASTHATÎNA TARÎYÊL Û AVT'ANDÎL

277. Asmat' r'abû çû k'ûrayê ku Avt'andîl t'ev xwe bîne,
Go: „Hêrs nebû şêrê Xudê, tu ît'bara xwe lê bîne“.
Destê wî girt, ew e'gîtê mîna hîva çardeşevî,
Tarîyêl ku dî, go: „Ev r'oye, gendî r'oye ev e'seyî“.
278. Herdu r'ex hev ku sekinîn, herdu bûn r'o li wê şikevtê,
Wek du hîvê e'zmanê şîn, wana nûr da li wê bestê,
Sipindara li r'ex wan da qels bû, ber ç'e'v nehat xuyan,
H'evt pîlanê wê bixeyir'iyan ku r'ex wan r'a derbaz bûyan.
279. Qe xerîbiyê mukur' natin, bi dilê e'sq hev r'amûsan,
Gul qelişîn, diranê sipî mîna mircan hatin xuyan,
Dest situyê hevr'a birin, mîna bira hevr'a giriyan,
R'engê qîmtî bûne k'arbar, dur' û lal bû qîmetê wan.
280. E'gît destê Avt'andîl girt û k'işîyan ser alîkî,
K'êleka hev ew r'ûniştin, r'ê dan hêsira wan awakî.
Lê Asmat'ê r'uh' dida wan bi xeberdan û gotinê:
„Xwe nekujin, bi tariya xwe tariyê navên hûn ser r'oê“.
281. Gula Tarîyêl qer'imî bû, lê hê sur'ê ew ne birbû.
Go: „Sur'a xwe tu dîhar ke, dilêm zûda hîvîyê bû.
K'êyî ji k'u, k'î welatî, çi teherî tu hatî virda?
Mirin îdî min bîr nayne, te îza min çawa hilda“.

SOT'A R'ÛST'AVÊLÎ

282. Avt'andîl wa cava wî da bi xeberê fer'ih', meh'bûb:
„Bibhê Tarîyêl, şêrê Xudê, r'uh' va nazik bûyî mesh'ûb.
E'rebim ez, welatê min bi birc, serê nexşûnayî,
Dişewitim ez bê guman, zerga h'uba nebînayî.
283. Dil k'etime Şexsê e'rşa, qîza p'adşê xwe bê şube,
Xulam, p'adşa wê nas dikin wê horiya h'ukum cube...
Te carekê ez dîtime, lê niha tu wê bîr nayînî,
Bi qançiyê xwe r'okê bal me qir'a esker te me anî.
284. Wê bestê da me tu dîtî, me xast nêzîk te bibînî,
Wî çend xulam şand pêşiya te ku te bigrin, bigrin bînî,
Deng dane te, tu nehatî û wî esker şand pêşiya te,
Te bi qançî ew best sor kir, xûna sore eskerê me.
285. Te bi qançî, wir bê qeme, dipekandin serî li wan,
P'adşa syarî wir da peyî te, lê îza te wan hil nedan,
Mîna cina unda bûyî, esker li wir ma p'eşmûrde,
Zendegirtî wira sekinîn, bûyî xişûş li dilê me.
286. P'adşa hêrs k'et, tu xwe zanî, her p'adşa ji xwe r'aziye,
Li her ciya ew te ger'îya, boyî wê ferman nivîsiye,
Ne ahîla, ne cahîla, kesî salxê te wir neda.
Niha jî wê ez şandime, k'îjan şemse, şexsa Xuda.
287. Wê h'ukum kir, here biger', bibîn tu wî şêrê Xudê,
T'ek wî çaxî mîaser be çi dilê te te r'a dibê,
Here biger' tu sê sala, bir'êj bêyî min tu hêsira...
E'cêbmayî tu nemîne, çi teyax bûm dûr ji dila.
288. H'eta îro min kes nedî ku mi r'a bide salxê te,
K'urd min dîtin k'îjana xast ku bizan bin binyat'a te,
Birîndar bû yek bê guman, lê k'etibû qançiyê te,
Birayêd wî nişan min dan dûrva r'êç'a qeret'ûyê te“.

289. Tarîyêl ew yek wir bîr anî, ku zûda ji bîrê çûbû...
Go: „Niha min va bîr anî, ew şuxuleke buhurî bû,
Min hûn dîtî, tu û p’adşa hevr’a diçûn, r’o bûn e’yînî,
Ez digiriyam, min we dinhêr’î û h’uba xwe min bîr danî.
290. Çî we hebû t’evî min, yan bi çî em bûn mîna hev,
Hûn e’şq bûn û dik’enyar, hêsirê min hilda bûn ç’e’v,
We ku xulam şandin bal min ku min bigrin û bikin dîl,
Min wa sond xar ku dewsa min hûn ciniyaza bibin bertîl.
291. Paşda nihêr’î, wexta min dî ku p’adşê te wê peyî min tê,
Qêmiş nekir, dest ne dayê, p’adşatî jî gendî lê tê,
Min deyîn nekir, ber ç’e’vê wî ez unda bûm mînanî ba,
Hespê min jî e’cêbeke, nebînaye, ber bûm unda.
292. H’eta yek ç’e’va bigre, h’eta bijang bigîjin hev,
Ji ber ç’e’va ez û hesp va elbelê da mina bûn t’ev.
Min nedixast wan k’urda r’a bi dil bikim xiravîyê,
Lê hêrs k’etim, gava min dî sîlih’a k’işand bêfe’mîyê.
293. Lê tu nêta qencyê hatî, dilê min te baristan bû,
Bejna çinar, dêmê te r’o, bengzê te t’ek e’gît bû,
Derd û cefa te ze’f dîtîye, te xistîye ba, baranê,
Xudê jorda meriya bîr ke, dîtina wî çetine dinê“.
294. Go: „Tarîyêl, pesnê min didî, wexta tuyî hêjayî pesna,
Min çî kirye, bêje bi çî, ez bûme hêjayî pesna,
Tuyî t’enê mîna r’oê, me r’a şandî jorda Xuda,
Dilê te jî kêmt’aqet bû, zîha nekir hêsrê ç’e’va.
295. Hema bona vê r’ojê bû, min bîr kir k’ê jend dilê min,
Ez hatim ku biqedînim, xem û xîyal min wir hîştin,
Yaqût usa jî nabe dur’, h’ezar şûşe ber r’adweste,
Derdê min ewe ku cem te bim, h’eta bimrim vira bal te“.

296. Tarîyêl awa cava wî da: „Ez şa kirim gotina te,
Zendegirtî ez dimînim, çi deyîndarî, min çi da te,
Dilê evîn sade, zelal, gunê xwe t'im evîn tîne,
Te evîna te biqetînim, bêje, wê çi k'arê bîne?
297. Hatî tu li min diger'î bi xastina evîna xwe,
Xudê te r'a wa lev anî, dîtîm h'unrê mêraniya xwe,
Lê li ber te k'ê wê veke guloka derdê serê vê r'ê!
Ez ku bêjim, ezê bimrim, bibim xwelî, herim ber bê“.
298. Asmat'ê got: „Şêrê Xudê, hêsira agir natemrînî!
Nakim ser te ku tu bêjî, ne cayîze, wê tu zanî,
Lê dinhêr'im ku derdê te ev e' gîta cinû kiriye,
Bira derdê te bih'ese, dibe ç'are destê wîye.
299. Wî cêr'iband bi hêsira ku qise kim ez ji wî r'a,
Xudê zane, çawa min bir, ker' bûm, jê r'a neda ç'êr'a!
Ez fikirîm, dibe bibhê û nişkêva ew bê r'aê,
Ya baş ewe mîaser be him qirar û xastina Xudê“.
300. Baristan bû wan xebera ew e' gîtê dilişewat,
Wî go: „Xûşkê, wê r'ojê da ku t'ev minî, hêsir ferat,
Tu xwe zanî t'une derman boyî derdê ku ez dik'şînim,
Niha hêsirê hê t'eze bûn, derdê e' gît ku dibînim“.
301. Mêvan r'a go: „Merî yekî r'a go, bira, yan go, xûşkê,
Wê r'ojê da derd û mirinê t'ev bik'şînin gere dinê,
Xudê çawa yekî xayî ke, ku unda neke yekî dinê,
Qise kim ez – p'ir' çetine, beranbere t'ev mirinê“.
302. Got Asmat'ê: „Were r'ûnê, hine av jî xwe r'a bîne,
Te dî sih'et min buhurî, avê mi r'a bigihîne,
Heger mirim, şînam bike, ciniyazê min şil ke avê,
Hûn min heq kin û vê xweliyê têkin bêşik hûn vê gavê“.

303. P'êşîra xwe ewî vekir, cêr'iband agirê xwe bitemrîne,
Wir dêmê wî şewq unda kir, wek r'o bin e'wr da bimîne,
Çenê wî li hev hasê bûn, t'aqet nekir lêva veke,
Wî kir qîr'in, hêsir barand, bi hêşira sîng xwe şil ke.

304. Kire gazî: „Evîna min, tu bona min unda bûyî,
E'mr û guman, tu dil û r'uh' t'ac û xizna bona min bûyî,
K'ê tu birî, dara miraza cinetê da mezin bûyî!
Ax tu çawa nebûyî xwelî, dilo h'ezar carî şewitî“.





TARÎYÊL SERHATIYA XWE AVT'ANDÎL R'A DÎBÊJE

305. „Serhatiya xwe te r'a bêjim, tu bibhê û baş guhdar be,
Te r'a vekim ez sur'a xwe heger zimanê min karibe!
Ax, wêya ez dîn kirime, îdî hîviya şayê nînim,
Wê t'ek cefa mi r'a hîştiye, van hêsira dibarînim.
306. Li welatê Hindistanê h' evt p'adşa bûn her kes zane,
Şeş p'adşatî Hindistanê ew bin qolê P'arsadane,
P'adşê p'adşa merd bû bi nav, wî qirara xwe datanî,
Seresker bû mîna şêra, dêm va r'o bû, r'o nûranî.
307. Bavê min bû p'adşê h' evta, sam û saw bû ser dijmina,
Sarîdan bû navê wîya, ew samûm bû nava p'adşa,
Kes nikar bû serda bihata ne dizîva, ne aşkela,
Nêç'îr dikir û k'êf dikir, bê minet bû derd û kula.
308. Lê t'enêbûn wî h'iz nedikir, ew yek jê r'a wir bûbû derd,
Go: „Hildaye min bi zorê ji cînara welat û e'rd,
Niha jî ez p'adşa me bi sîyanet û xiznê bê h'ed,
Başê bighîjim P'arsadan bi e'gîti, welat û e'rd“.
309. Wî qirar kir ku bişîne bal P'arsadan qasidê xwe,
Wa go: „Bêje p'adşê Hinda – tuyî xayê welatê xwe,
Niha dixazim bighîjim te bi welat-û p'adşatiya xwe,
Dixazim ku nav bihêlim aminayî bal p'adşê xwe“.

310. P'arsadan ku ew yek bihîst, vekir t'extê ne'z, ne'metê,
Cava wî da: „Ez – P'arsadan şikrîma xwe tînim Xudê,
Tu jî wek min p'adşayî, mîaser bû xastina min,
Niha çawa bav û bira gazî te dikim bêyî cem min“.
311. P'êşk'êş kirê wî welatek û qulixa Amîrbarî,
Amîrbar li nav Hinda da mîna Amîrspasalarî,
Ku bilind bû ser t'extê xwe, qulixa xwe anî sêrî,
Her tiştê wî îdî cî bû, pêştirî navê Kêyîsarî.
312. Beranberî xwe h'esav kir, wî girt qedrê zor bavê min,
„Amîrbarkî mînanî te, go, t'une li welatê min“ ...
Diçû cenga, nêç'îr fikir, kir ser çoka çîqa dijmin,
Heyî wax, mîna bavê nînim, çawa t'une kes mîna min.
313. P'adşa û jin bê me'de bûn û t'une bû ewledê wan,
Eskerê wî jî derd fikir, eşq t'une bû li dêmê wan.
Nebixêrê r'a ez li mala Amîrbar da hatim dinê,
P'adşê go: „Ji nisla meye, xweyî kim ewled h'eta mirinê“.
314. P'adşê, jinê t'evayî ez birim malê çawa ewled,
Mezin dibûm çawa xayê welatê wî, esker bile't,
Bi qîrara p'adşatiyê dame xwendin, bûme zane, mîr,
Ku mezin bûm, dil va şêr bûm, dêm va mîna r'oja nedîr.
315. Asmat', tu jî xwe şe'deyî – çawa hatme guhastinê,
Bedew bûm ez mîna r'oê, berbanga şewq dida dinê,
K'ê ku didît, wana digo, – „Eva bax'ê cinetêye“.
Ji bedewiyê niha t'enê siya wê li ser min maye.
316. Îdî ez pênc salî bûm, jina p'adşê h'emle derk'et,
„Qîzek anî“, - wî kir axîn û diranê wî li hev k'et.
Hidik dima xweva her'e, Asmat'ê av li ser r'eşand.
Go: „Ew r'o bû hate dinê, ya ku dilê min şewitand.

317. Na, pesinê wê ez nikarim bi xeberê sade bidim,
P'arsadan r'ûnişt k'êfê, go: „Şikir ji te, Xudaê min!“
Bê h'ed p'adşa bi hedayî hatin bona wê şayê,
Zêr' nignac kir, pê r'azî kir, esker nema wî zêr' dayê.
318. We'de ze'f wê derbaz nebû, wan em herdu dan xwendinê,
Wî wextî wê, qeyî te digo, sêcar dikir nûra r'oê.
Him p'adşê û him jinê h'iz dikirin em beranber.
Niha ezê nav kim wêya, ya şewitand dilêm yekser“.
319. Ku cêr'iband wêya nav ke, wir çû h'işê wî e'gîfî,
Avt'andîl jî hêsir dir'êt, wî bîr anî wir evîntî,
Asmat'ê av serda kir, ew ser h'emdê xwe da anî,
Ku h'işyar bû, ewî wa go: „Gihîştme r'oja axir“...
320. Navê wêya Nêstan – Darêcan bû, navê şîrin bû lê,
H'evt salê wê ku t'emam bû, kes nedighîştê bi bedewiyê,
Mîna hîva çardeşevî r'oê r'a ew dik'et h'ucetê,
Tamîş nade dilê almaz li ber derdê dûr k'etinê.
321. Qîz zû gihîşt, min k'emla xwe çawa esker hilda şêr' da,
Bavê qîza xwe hazir kir ku bibîne ser t'extê p'adşa,
Wî ez şandim bal bavê min, ez qanix bûm wek dar çinar,
Min t'op dilîst, şêr dixenqandin, wek p'işîka ew bê ît'bar.
322. P'adşê çê kir bo qîza xwe k'oç'k û sera, ode h'ezar,
Karêta wê lal, dur' çê kir, k'oç'k û sera kevirê p'azar,
Jêrê bax'çê gulêd geş bûn, h'ewzê avê çîl û mermer,
Wir dima ew, k'îjanê h'eta îro kirme e'wt'er.
323. Şev û r'oê wir dişxulî xûng derdana xûngê da,
Yan k'oç'kê da ew r'ûdinişt, yan diger'îya ew bax'çe da,
Xûşka p'adşê – Davara bî, mêr kiribû yêra cina,
Ulm, zanebûn ders didayê, ulmê t'am wê jê hil dida.

324. T'ev bi p'erdê zêr' nexş kirî xemilandibûn şûşebend,
Bik'ra bûbû gul û bîlar, kesî nedî, ne diqet'rand...
Asmat' bû û du carî bûn, t'ek nardî bû sebira dinê,
Bejin dik'işand, mezin dibû mîna bax'ê Gabaonê.
325. Panzde salêm ku t'imam bû, p'adşa mîna kur'h'iz kirim,
Şev û r'oê ez cem wî bûm, nedihîşt ku berbi mal her'im,
Qewat va şêr, mîna r'oê, e'yinî bax'ê cinetê bûm,
Derba min cî, nîzanam cî, ez hêjayî pesina dibûm.
326. Tîrê ku min wir davîtin, pê dik'etin de'ba, xezal,
Ez dighîştim meyîdanê wir t'opê dilîst mîna şemal,
Dik'etim ez k'oç'k û serê k'êf datînî dinê e'yan,
Niha e'mirê min kin kiriye horiya dêmê bîlar, mircan.
327. Bavê min mir, hatin r'ojê şîn û h'eznî, r'ojê çetin,
Li dîwana P'arsadan da şayî û k'êf betilandin.
Şa bûn ew yê ku bavê min saxiya xwe da ser wan saw bû,
Xêrxaz gîriyan û xwe k'utan, şa bûn yê dil li wan me'r bû.
328. Nêzîkaya salekê bû, ez k'etibûm oda tarî,
Şev û r'oê ez digiriyam, hêsir dir'êt bi qîrarî,
P'adşê merî şandin bal min, mi r'a anîn giliyê bi dil,
Wî gotibû: „Bese, kurêm, wê odê da daxî niqil.
329. P'ir' mezine derdêm niha, min unda kir helqebê xwe...“
Bê h'esab zêr' min r'a şandibû, gotibû bêxim h'eznîtiya xwe.
Wî dabû min qulixa bavê, hebûna me kir navê min,
Go: „Amîrbar tuyî niha, qulix bike, ewledê min!“
330. Unda kirina bavê min hê dilê mi da gur' bû, k'eliya,
Ji wê tariyê ez derxistim, bi gire – gir, k'oma meriya.
Şîn xitim bû û k'êf danîn gire – girê Hinda t'evî,
Mîna ewled ez r'amûsam û r'amûsan kirin t'evî.

331. R'ex t'extê xwe dam r'ûniştin mîna ewled bi min şa bûn,
Ji bavê min wan xeber dan, t'eve li wir dua' çî bûn.
Ez berk' sekinîm, min go, wekî qulixa bavê ez nîkarim.
T'eva hevr'a go, dikarî, îro şûnda Amîrbarî.
332. Sal derbaz bûn, min bîr kiriye, ze'f tişt îdî bîram çûye,
Serhatiya xwe te r'a bêjim, e'mir li min çetin bûye,
T'im xiraviyê me r'a tîne ev diniya p'ûç' û derewîn,
Hê wê ze'fa bişewtîne, çawa şewtand dilê evîn“.





QISA DERHEQA H'ÎZ KIRÎNA TARÎYÊL DA

333. E' gît giriya û melûlî serhatiya xwe wa dest pê kir:
„Ji nêç'îrê ez û p'adşa vediger' iyan, min t'erc nekir,
Destê min girt, wa h'ukum kir – meher'in em, qîzam bibîn,
Zende ewe ku bîr tînim, lê hê saxim, ber mine bîn.
334. P'adşê wa go: „Van k'ax' lîtka hilde bibe qîza mi r'a“,
Em çûn wira k'u ku bext ez avîtime nav agira.
Wê r'ojê da deynê xwe da, çi hil da bû min ji e'mir,
Tîr gere ji almas bûya, wekî qul ke dilê kevir.
335. Bax'çek min dî, bedewiya xwe ew e'cêb bû û buhuştî,
Qiveqîva teyîr û tûya merî dima zendegirtî,
H'ewzê mermer t'ije avê, p'êl dida bi misk û mawer,
Ber dêrî da darda kirî p'erdê bedew qut'nî, mexmer.
336. Min zanibû, h'iz nedikir p'adşa qîza wî binhêr'in,
Ez sekinî bûm ber dêrî, ew çû hundur', p'erda dinhêr'in,
Lê min nedî, min deng bihîst, xeberdaneke sivik se kir:
„Asmat', here tu k'ax' lîtka hil de destê Amîrbar wir“.
337. Asmat'ê ku p'erde hil da, ez sekinî bûm wir ber dêrî,
Min ku ew dî, tîrke xedar wê hêngavtim demê horî,
Lê Asmat'ê k'ax' lîtka hil dan, ber ç'e'vê min wir bû tarî,
Ew bû û ew ser r'uh'ê min te'viya agirê h'ubê barî.

338. Niha tariyê wê hildaye Şexsa mine şemale nûr...“
Ku bîr anî, kire axîn, k'et, seh'etê ji xast destûr.
Dor – berê wî deng didanê û digiriyan ew bê guman,
„K'engê unda kir qewata xwe bîlekê te“, - awa pirs dan.
339. Asmat'ê av serda r'eşand, Tariyêl hate ser h'işê xwe,
Ji derd dilê wî qer'imî bû, r'ûniştibû bê h'emdê xwe,
Digriya, hêsirê wî şil dikir e'rdê ber wîyî qer'ame.
Go: „Ez wêya ku bîr tînim, derdê dilê min p'ir'dibe.
340. Ew yê qûlê vê dinêye, bi dayîna dinê dijî,
Pêşiyê dik'ene, paşê dibe şeh'idê wê, îdî najî,
Didim pesinê aqîlbenda, yê e'mir da miqabilin,
Serhatiya xwe ezê bêjim h'eta ku bîn heye ber min.
341. Min k'ax'lîtk dane wêya, bû meleme ber ç'e'vê min,
Qudûm şkest, h'işê min çû, ber mi da hat herd milê min.
Ku ser h'emdê xwe da hatim, min dî dor min t'emam digrîn,
Qeyî te digo, hîviya gemiyê ew k'ulfeta wir sekinîn.
342. Oda mezin da p'aldayî ser t'extekî p'ir'î bedew,
P'adşa ser min hêsir dir'êt, hêsirê xûnê, melûl bûn ew,
Diqelaştin dêm û sifet, qelş dik'ete lêvê gulî,
K'oç'ek anîn, wana t'irê, min dîhar bû cin, ew terfî.
343. Wir p'adşa ez h'emêz kirim, ku dî ç'e'vê xwe min vekirin,
„Şikir p'akî, ewledê min, xeber de, tişkî bêje min“...
Ez lerizîm mîna dîna, xeber ser lêvê min betilî,
Dîsa k'etim, h'işê min çû, xûna dilê min qer'imî.
344. Nobedar bûn ber ciyê min him k'oç'ek û him jî p'îldar,
Dest wan da bû, dixandin wan, k'it'êb – mish'eb danîne zar,
Wana t'irê ez cinû me, dipekiyan dev wan xeber,
Sê r'oja t'am h'işêm çûyî dişewitîm agirê xedar.

345. H'ekîm mane e'cêbmayî: „Ev çi êşe, me ev çi dî,
Nexweşiya wî tişte t'une, tişteki dine xem, derdê wî“.
Cî banz dida bê h'emdî xwe û xeberê haş digot min,
Hêsirê jina p'adşê bûn be'r, wê wir dir'êt bona min.
346. Ew sê r'oj bûn nav cîda bûm ez, ne sax bûm, ne jî mirî,
Ser h'emdê xwe da hatim û min fe'm kir, çi qewimî,
Min go: „Heyî wax, ev çi yek bû, mirin min bi ç'e'vê xwe dî.
Bira Xudê sebrê bide, ji min dîr xe derdê e'yîn“.
347. Min go: „Xudê, min nekuje, guh bide tu lavaya min,
Ku tamîş dim ber vî derdî, zor qewatê tu bidî min.
Mayîna vira min bide der, bihêl hêsa bighîjim mal“.
Gunê Xudê wir bi min hat, dil û qewat da min bê qal.
348. Ez r'ûniştîm û bê h'esab merî dor min bûn muhumet,
Ku bihîstin ez p'ak bûme, jina p'adşê berbi min hat.
Lez k'etibû p'adşa bi xwe, serqot dabû wî serê r'ê.
T'ev ker'bûbûn, t'enê p'adşê şikrîma xwe danî Xudê.
349. Dor min t'op bûn, dan min derman, ku xilaz kin min ji qedê.
Min go: „P'adşa, şikir îdî qewîne dilêmin ciyê xwe da,
Ez dixwezim hespê syar bim, t'enê ewe xwestina min“.
Hesp anîn, lê syar bûm û p'adşa jî wir t'evî min.
350. Ji meyîdanê em derbaz bûn û gihîştîm devê avê,
Min veger'and li wê p'adşa, ku gihîştîm nêzik malê.
Çûme malê, êşê min girt, ser derdê min derd zêde bû,
Min go: „Xazil ez bimrama“, - t'enê mirin xwestina min bû.
351. Bi hêsirê dêmê xwe şûşt, r'engê r'oê hate guhar'tin.
Deh h'ezar k'êr dilê mi da, bi saw cî girt û r'ûniştîm.
Dergevanê herema min hat gazî kir, xiznedar bir,
Min go: „Gelo çi h'ewale“, - dîsa sekinîm dil û agir.

352. „Ew xulamê Asmat'êye“, min go: „Bêje, çi dixweze“.
Hate hundur', nema h'ubê wî da min û go, ku leze.
Nişkêva mam e'cêvmayî, dil da vêxist agirê h'ubê,
Min ew hîvî jê r'a nedikir, ser dilêm bû kevîrê t'îrbê.
353. Ev e'cêbe, çawa h'iz kir, ça qursax kir ber min vebe?
Lê nave ku cavê nedim, wê h'esav ke, ne hêja me.
Wê gumana xwe min bibir'e, gunek'ar ke min bê îsaf,
H'izkirîyê r'a min nivîsî caveke hêja, cavke eznafe.
354. R'o buhurîn, dilê mi da hê geş vêk'et agirê h'ubê,
Ber ç'e'vê min îdî nedihat eskerê min dikir h'erbê,
Çi birc, sera... çîqa h'ekîm derê mi r'a hatin û çûn.
Û wî wextî hêdî – hêdî deyîne dinê ser min bêr bûn.
355. Qe t'u tiştî alîm nekir, dilê mi da xem zêde bûn,
K'ê wê zanîbiya dilê mi da dişuxule agirê êt'ûn.
Wira gotin: „Xûnêye“, p'adşa go: „Xûnê berdîn!“
Min deyîn nekir, ku nizan bin, çîye me'na vê êşa min.
356. Dest vekirî û evîndar k'etibûm ez nav nivîna,
Xulamê min dêrî da hat, min jê pîrsî bî e'mîna,
„Ew xulamê Asmat'êye“, min go: „Berde, bira ew bê!“
Ez fikirîm, wa ne r'azî wê çi bêje gelo ku bê.
357. Xulam ne'mek da min, min xand, usa kir ku k'es nebîne,
Û min fe'm kir ku ew k'ulfet dixweze ki min bibîne.
Cavam ev bû: „Sozê teye, hîviya min be, e'se ez têm,
Gazî te r'a bê sebirim, h'esab nekî k'efa ser ç'êm“.
358. Min go: „Milo, çîne ber te h'ezar tîr û h'ezar nîze,
Ne axir tu Amîrbarî, Hind ya teye, bext dilîze,
Ku têk'evin şîkê, h'ezar carî çep, r'ast lê binhêr'in.
Lê hema ku e'seyî kirin, wir hazîre te r'a mirin.

359. Merî şandibû cem min p'adşê, xastibû bibhê h'al – wextê min,
Hat û awa te min pirsî, hildane xûn ji milê min.
Min go: „Erê hildane û êşa min jî sivik bûye,
E'se ezê bêm cem p'adşê eşq û k'êfam îdî ciye“.
360. Gihîştim cî, p'adşê wa got: „Car din tiştê usa nekî!“
Bê sîlih' ez syar kirim, go: „Seyîran kin em hinekî“.
Ew jî syar bû û teyîr berda, li k'ax'lîtka r'ê hat bir'in,
Nişandara kir xurtoşe, - „Şa be, şa be!“ - kirin qûr'in.
361. Zivir'in mal ji nêç'îrê westiyayî, dest k'êfê kirin,
Wê dengbêja û mirtiba saz – k'ilama dil bend kirin,
P'adşa p'êşk'êş bela kirin kevirê qîmet hev bihatir,
Li wir k'ese bê p'ar nema, p'adşa merdî t'ev r'azî kir.
362. Min cêr'iband, lê nikaribû derdê dilê xwe veşarta,
Çiqa min ku ew bîr tanî, dax'ê dilê mi da şax da.
Hevalê min dor min t'op bûn, go: „Çinarî tu bê e'dû“.
Bi vexarinê dixwest bîr kim ez derdê xwe, lê ne dibû.
363. Xiznedarê guhê mi da wextê k'êfê pirske wa go -
„Kulfetek wê hîviya teye, bedewe dêm mîna r'o,
Wê dêmê xwe sep'e kiriye bi çarşeva r'engê şebe“.
Min gotê: „Min t'eglif kiriye, berbi herema jêrin bibe!“
364. Cîda r'abûm, mêvanê min dixwestin ku hev bela bin,
Min go: „K'êf kin, ez va hatim, h'eta sibê emê şa bin“.
Derk'etim ez, çûm heremê, hê xulamê sekinî bû wê.
Ez difikirîm, Amîrbaro, xeberdanê xwe zevt ke wê.
365. Çûme hundur, k'ulfet r'abû, serberjêr ew pêş mi da hat.
Wê go: „Xudê e'mir bidê, ya dîtina te ne kire qat“.
Ez wir şaş mam, hizkirinê r'a hurmeteke mezin bû ew.
Min got, ku ew hê xişîme, h'uba bik'ir ew kiriye kew.

366. Ez r'ûniştîm ser t'extê xwe, ber xalîçê ew sekînî,
Wê xwe negirt r'ex min r'ûnê bi qîrarê û mêvanî.
Min go: „Heger min hiz dikî, çima usa dûr r'ûniştî?“
Wê caba min wira neda, wê ew bihart ker' û laltî.
367. Paşê wê go: „Şermê dilêm hildaye nav agirê gur',
Te jî t'irê ku hatina min aşkelaye, heye duhur',
Lê xeyîsetê te gumanim, loma te tê amîniya min.
Ez hêjayî wê yekê me, Xudê şuretê hê bide min“.
368. R'abû û go: „Ber we qûlim û hûn min qûl h'esab bikin,
Tiştî mayîn nefikire, ez carî me, ew xanima min“.
Xeberdana wêye berzeq r'astî t'enê li wê dihat.
„Ne'ma hanê te r'a bêje, guhdar be tu, pirsîn xelat“.





**NE'MA NÊSTAN - DARÊCANÊYE E'WLÎN
DÎLK'ETIYÊ WÊ R'A**

369. Aha min dî ne'ma wêya, bi agirê k'ê dişewitîm,
Wa dinvîsî nûra r'oê: „Badîhewa cefê nebîn,
Ez ya te me, xwe nekuje, min xweş naên qe kirinê te.
Wê Asmat'ê te r'a bêje, çi dixwezim bêjime te.
370. Bê sewda bûm, mirina haş şêrê evîn ne cayîze,
Başê şuxulê xwe e'gîfî tu nîşanî dîlk'etiyê da...
Lê cime'ta Xatayêt'ê xerc dida me bi aminî.
Bêje, niha em çi bikin, naxwezin xerc bidin îdî.
371. Xwestina mine ze'f zûdane, t'enê tu bibî mêrê min,
Feqet we'de me ne dîtiye ku t'evayî em xeberdîn.
Bin sîdangê duh min dîfî, bê r'eng bûyî û bût'alî,
Wir min bihîst cefê dibînî, min dît k'etî tu çi h'alî.
372. Tu guhdar be û r'ind bibhê, bibhê ez çi dibêjim te,
Her'e şer'ser Xatayêt'ê, wir k'ivş ke tu mêraniya xwe.
Bi hêsirê badîhewa neç'ilmisîn tu gula xwe,
Çi te r'a ne r'oja şemal, h'esav ke min r'o bona xwe“.
373. Û Asmat'ê wa bê xof her tişt mi r'a azir'o kir,
Derheqa xwe da ez çi bêjim, şabûna min wir k'ê çap kir.
Dilê min wa zerp dik'uta û qeyî te digo, dide baska,
Şabûna dêm min kir bîlar, sûret mîna h'inaroka.



NE'MA TARÎYÊLE E'WLÎN DÎLK'ETIYÊ R'A

374. Min hilda da ser ç'e'vê xwe ne'ma ku wê nivîsiye.
Min nivîsî: „Hîva şemal, r'o li ber te r'awestiyaye,
Xudê neke ez wê bikim, ew çi ku te qe xweş nayê,
Û min t'irê ku xewne ev, bihar nakim xilazbûnê...“
375. Min wa gotê: „Asmat' binhêr', wir da ne t'emam r'uh'ê min,
Wê r'a bêje, Şexsa mine, dîsa beşere bona min.
Îdî h'işêm t'ucar naçe, lê te e'mirê t'eze da min,
Çi bixwezî, ezê bikim, p'oşman bûne mi r'a mirin“.
376. Asmat'ê go: „Wê h'ukum kir, başe tişkî awa bikim,
K'ê ku r'astî te bê, t'ucar derheqa me da giliya nekin.
Ku tê cem min bira şikber zanibin ku te h'iz dike,
T'eweqe kir, bê Amîrbar, bira qedrêm bilind bigre“.
377. Min begem kir ew şîreta, aqilbendiya gula bik'ire,
H'ijmek'are r'o dîtina wê, siyanetê jê r'a digire,
Ez hêjayî wê yekê bûm, pîrsa şîrin ji dêv bibhêm,
Siya k'îjanê r'onaya r'on melûl dike bê r'eng û dêm.
378. Min p'êşk'êşî Asmat'ê kir t'aca zêr'în bi lal û dur'.
Wê go: „T'êr'im ez ji wana, hesab nekî tu min p'ir' h'ur“.
Wê gustîlek t'enê hilda ya hêja bû bi çend p'era,
Ev jî bese ça bîranîn, t'une h'esab xişrê mi r'a“.

379. Ew k'ulfeta r' abû û çû, ji dilê min tîr derk'etin,
Şaiyê xem min dûr xistin, agirê dilê min vênêk'etin.
Dîsa k'êf kir û min vexar t'evî heval û mêvana,
Bi merdayî p'ara vekir zêr' û zîv bû, dida wana.





NE'MA TARÎYÊL XATAYÊT'ÎYA R'A Û ŞANDINA QASID

380. Min dewsa xwe merî şandin Xatayêt'ê çawa qasid,
Min nivîsî: „Mîna Xudê mezine r'e'm p'adşae Hind,
K'ê xwe r'a wî sit'ar h'esav ke, wê aza be derd û bela,
Yê bê şêkir û anîzaz wê bine'le r'oja xwe da.
381. Birayêd me, xayê welat t'u car em we nexeyîdîne,
Vê fermanê ku bixûnin, berbi me werin, r'ê vekirîne,
Lê ku nayên, emê bên wir, ne ku dizî, bi aşkera.
Başe hûn bên r'ezadilî, nebin bayîsê xûnê wira“.
382. Qasida dan serê wê r'ê, şabûn t'eze k'et dilê min,
Wa şandibû dîwan pêda, temirî jana nav dilê min,
Bext r'uh'ê min t'ijî kiribû eşq û şaiya mîna be'rê,
Niha dibe berbi min naên, sawdaserî ç'e'vê min r'ê.
383. Min xast her'im hinkî dûr... r'ih'et dibû wir dilê min,
Hevalê min bi eşq û şa k'êf dikirin xwe r'a cem min,
Xwestina min p'ir'ze'f bûn, hêsabûn ne didane min,
Carna derdêm ez hil didim, dixulxulîn hêsirê min“.





NÊSTAN TARÎYÊL T'EGLÎF DÎKE

384. K' oç' k û serê ez derk' etim, gihîştim mal, çûm heremê,
Xew ji ç' e' vê min r' evî bû, min bîr danî ew wê demê.
Destê mi da ne' me hebû, ew guman bû, r' uh' va şa bûm,
Wir dergevan gazî qûl kir, awa gotê, ezî wir bûm.
385. Go: „Xulamê Asmat' êye“, min go: „Berde, egle neke!“
Wa dinvîsî: „Ya bendkirî bi dil û ce' d gazî te dike“.
Şabûnê xem min bela kir, qeyîd û zincîr r' uh' êm vekir,
T' evî xulama ez wêda çûm ker' e – ker', min deyn nekir.
386. K' etime bax' û lê tu were, wir jî t' u kes r' astîm nehat,
Nişkêva wê min dîhar bû Asmat' a eşq, lêvê nebat,
Wê go: „Derdê dilê te da mîna sitrû derxist îdî,
Were gula xwe bibîne, vebûye gula teye cindî“.
387. Wê xalîçe da alîkî, ew xalîçe p' ir' giran bû,
Darebestke sore li wir bi lal û dur' nitirî bû,
Darbestê da r' ûniştibû nazîka dêm, nûra sebirê,
Wê bi nazî min dinhêr' î bi ç' e' vê r' eş gola h' ubrê.
388. Sekinî bûm t' îyê h' ubê, wê qe pîrsek ne gote min,
Beşere xweş omidayî wê dinhêr' î li dêmê min,
Asmat' ê r' a wê tiştêk got, Asmat' ê go guhê mi da:
„Her' e, nikare xeber de“, û melûtiyê dilêm hil da.

SOT'A R'ÛST'AVÊLÎ

389. T'ev Asmat'ê ez derk'etim, ji xalîçê em derbaz bûn,
Min go: „E'mir, deqê pêşda te melh'em da, birînê qenc bûn,
Guman da min, çî bê Xudê te bela kir xem, eşqa min“.
Te'laya hev dûrk'etinê derba xedar da dilê min.
390. Asmat'ê wir guman da min, derbaz dibûn em nav bax' da,
Wê go: „Boyî zû derk'etinê derd t'êj neke dilê xwe da,
Tu k'uleka xema dade, veke dergê eşq û şayê,
Xeberdanê ew dik'işe, xeyîset va ew qûla şermê“.
391. Min go: „Xûşkê, t'enê ji te ez hîviya dermana me,
Be'sa xêrê tu min şa ke, bitemirîne agirê dilê me,
Zû tu ne'ma mi r'a bişîn, zû bişîn ez hîviyê me,
Heger be'ske xêrê bibhêm, zanim ku borcdarê te me“.
392. Hespê syar bûm, ji ç'e'vê min hêsir bûne lêyî, k'işyan,
Şeva t'am ez r'anezam, mîna dîna xem min ne'liyan,
R'engê bîlar, sûretê h'inar li min şîn bûn mîna denê,
Xazila şev dirêj bûya, sibe min r'on nebiya t'enê“.





NE'MA P'ADŞÊ XATAYÊT'Ê TARÎYÊL R'A NIVÎSÎ

393. Merî hatin Xatayêt'ê, wextê hatina wan hatibû,
Wan xeberê net'ê anîn, k'îjan gotin ne cayîz bû:
„Me tirsonek h'esab nekin, kelê kevir me çê kirine,
Bêjin k'êye ew p'adşê we, ku sert'ac be ser serê me“.
394. Nivîsî bû: „Tarîyêl te r'a dinvise R'amaz p'adşa,
E'cêvmayî min ne'me xwend, çi qeleme destê te da.
Çi teherî te wa qursax kir mi r'a nivîsî ne'me wa berk',
Îdî nebhêm t'ev yekî din tu binvîsî dîsa ne'mek“.
395. Fermana xwe min nivîsî, bela kir nav sereskera,
Hindistanê esker t'op kir mîna siteyîrê r'û e'zmana.
Ji dûr, nêzîk sîlih'kirî dihatin bi t'ax'bûr - t'ax'bûr,
Deşt û besta bûne lêmişt, distiran bi saz û t'embûr.
396. Hatîn, kese egle nebû, t'ev bi sîlih' û h'erbê da,
Û min xaş hat cejna esker û t'e'lîma bin sîlih'ê da,
T'erbetê wan û e'gîtî, r'uh'ê wanî wet'enh'izî,
Bi ç'ek û sîlih'ê Xorêzmê bûn, meşa hespa cirîd bezî.
397. Min bilind kir beyîraqa r'eng ya p'adşatiyê sor û sipî,
Min h'ukum kir li ser esker – „Sibê r'a r'ê bin e'gîtî!“
Lê dilê min heznî digiriya ji bextê xwe ez ne r'azî:
„Ax, Şexsa xwe ku nebînim, çi dilî esker bikim gazî“.

SOT'A R'ÛST'AVÊLÎ

398. Veger'iyam mal, dilêm t'ijî bi h'ezara derd û kula,
Herdu ç'e'vêm bûbûne ç'em û p'êl didan derdê dila.
Min go: „Bextê minî hêsîr, nebû r'ûnêm ser t'extê xwe,
Sefî çima gihîşt gulê, ku nikaribû biçine boyî xwe...“





R'ASTHATÎNA TARÎYÊL Û NÊSTANÊ

399. Xulamêm hat, e'cêbmayî min go, dilê min sekinî,
Ne'me da min, go: „Asmat'ê“, û dilê min wir sekinî.
Nivîsî bû: „Gazî te dike, dîtina k'ê r'a t'î şewitî,
Were, bese tu bigrî, bext, şuxul tu bike sêfî“.
400. Dilê min wir eşq t'ijî bû, mîna dilê ûlê h'ubê,
Bû tarî ez k'etime r'ê çûm, gihîştîm bax'ê p'adşê.
Asmat' li wir hîviya min bû, ku carekê me hev dî bû,
Wê go: „Hîva çardeşevî hîviya teye“, û tuya bû.
401. Wê ez birim birc û serê, xemilî bû nexşê mexer'm,
Wîra şewqa hîva zerîn dor t'ijî kir bi eşqa germ.
R'ûniştîbû k'esk wergirtî nav xalîçê h'ezar r'engî,
Bedew, k'ubar bê t'a bû ew, nîze bû boyî dilê bengî.
402. K'etim hundur' ber xalîçê agirê dilê min temirî,
Şabûn bû nûr, sitûnekê tariya dilêm wê hilç'inî.
Mîna r'oja nûra zêr'î mil avîtîbû li ser be'lgî,
Heyî dêmê xwe sep'e dikir, heyî dizîva min dinhêr'î.
403. Wa h'ukum kir ser Asmat'ê: „Bê, Amîrbar bira r'ûnê!“
Be'lgî danî pêşberî wê, Şexsa nûre li r'û dinê.
Ez r'ûniştîm, bext k'ifirîm, dilêm bûbû şana şayê.
Ax, gotina wê ku bîr tînim, çawa saxim hê r'û dinê.

SOT'A R'ÛST'AVÊLÎ

404. Wê mi r'a go: „Ker'bûna xwe min wê carê te kir azar,
Mîna gulkê ji min dûr tu ç'ilmîsî ji xema bêzar,
Te cefa dî, hêsir r'êtin, nergîz û gul hêsira vê kin,
Lê cayîze ji Amîrbar him bik'işim, him şerm bikim.
405. Ber e'gîta k'ulfet gere şerma xwe da xwe bigire,
Lê xirave ku derdê xwe, dilê xwe da bixenqîne,
Ber xwe da tu vedp'eşirî, agirê h'ubê ez hil didam,
Min k'ulfet şand, wê te r'a got, ne'ma şandî go pirsar t'am.
406. Wê r'ojê da me tê derxist, çi fe'in kir me yek ji yekê,
Ya te bûme, ez ya te me, soz didim ez ber felekê,
Tu bihar ke, Xudê şe'de, ne xeberin, sonde, qirar,
Heger ku ez pozmiş bikim, bibim xwelî, bê cî, sit'ar.
407. Her'e, şer'ke tu ber Xataya, bi şer' derbaz be tu sînor,
Xudê bike bibim şe'de ku veger'î tu eşq û zor.
Lê çi bikim h'eta bibhêm ez mizginiya hatina te,
Han dilê min xwe r'a hil de, dilê xwe min sep'e neke“.
408. Min go: „T'u car h'eyîf pê naêm ku saxî min bikin k'ibab,
Lê te ku ez hêvişandim, e'mrêm zeyî nekir bê sihab,
Tuyê bibî r'onaya min, miqîm Şexsî tu bona min,
Niha her'im ber Xataya şêrkî şer'kim, îşqa min.
409. Ew çi ku te daye min, t'u benîadem hê nestandiye,
Nişkêva bext dide Xudê, ew k'erema nebînaye,
Û nûra te ez hildame, wê dilê min kiriye xinê,
Ez yê te me, yê te dimînim, h'eta saxim heme dinê“.
410. Ser k'it'êba r'uh'anî da min jî, wê jî me wir sond xar,
H'uba wê û h'iz kirina wê hê berk' kir ew sonda me xar:
„Pêştirî te yekî h'iz kim û dilê xwe ku bispêrmê,
Bira Xudê min bikuje, dinê da nebînim xêrê“.

411. Êp'êce wext mame wira û kinêzî me xeber da.
R'ez û fêkiyê şîrîn me xar, şîrnayî bûn em bê sewda,
Paşê min go: „Xatirê te“, - bi ç'e'vê şil, t'aqet unda.
Nûra h'ubê wê kir bertîl, miqer'm war dî dilê mi da.
412. P'ir'çetin bû dûrk'etina wê, wê nazika dêmê bîlar,
Lê gumanê mi r'a anî eşq û şayî, me'ne h'ezar.
Gurzê nûrê r'oê barîn, qeyî te digo, nûra mine.
Çawa ji wê dûr dimînîm, dilêm kevirê bêamine.





ÇÛYÎNA TARÎYÊL BERBÎ XATAYÊT'Ê Û ŞER'Ê MEZÎN

413. Sibê r'a ez hespê syar bûm, min go: „Lêxin, def, ker'ana!“
Eskerê min bê h'esab bû, bê minet bûn ji dijmina,
Mîna şêra min da ser r'ê, berê xwe da Xatayêt'ê,
Ç'iya, banî dane bin p'ê, t'êrê nekir p'êge û r'ê.
414. Sînorê xwe em derk'etin, mîna lêyê pêşda diçûn,
Wir qasidê R'amaz şandî bi hedayî berbi me bûn,
Wan caveke xêrê anî û dilê min baristan bû,
„Wê gurê me bibin xurê biznê Hinda“, - wa gotibû.
415. Hedayê p'ir' mi r'a anî ku şandibû R'amaz p'adşê,
Lava dikir wa saw t'ijî: „Me r'estîkin qe we naê,
Bide sondê bi wê yekê, tu nigê me zincîr dikî
Me qir' neke, yêr – hebûnê t'emam ya xwe h'esab bikî.
416. Bibaxşîne boyî kirina me, niha em bi xwe p'oşmanin,
Were r'e'mê mîna Xuda, eskerê xwe pêşda neyînin,
Welatê me k'ambax neke, nebarîne agir ser me,
Bi eskerê sivik were, şîher, kela em bidin te“.
417. Wezîrê xwe min t'op kir û kir civateke p'ir'e mezin.
„Cahilî hê, - mi r'a gotin, - bibhê extiyar çi dibêjin,
Cêr'ibandina e'mir dibên mixenetin, bihar nekin,
Ew dixwezin te bikujin û me bavên nava agir.

418. Eve t'enê şîreta me mêrêd mêrxas xu r'a bibe,
Eskerê xwe nêzîk xweyî ke, deng bighîjê ku lazim be.
Heger te dî ku dilsaxin, bira te r'a sondê buxun,
Heger qelpî te dorê dî, e'fatê te hev r'a lêxin“.
419. Gotina wezîra min xaş hat û wê demê r'abûm ser p'ê,
Ne'ma nivîsî: „R'amaz p'adşa, bawer dikim te wê gotinê,
E'mir çêtire ji mirinê, ber me çine ew kelê we,
T'ax'bûreke sivik ez têm, eskerê min vir dihêwire“.
420. Xwe r'a hil da sêsid e'fat, t'eve amin qursax şêrî,
Û t'evî wan ez pêşda çûm, eskerê min wir hêwirî.
Min wan r'a go: „Peyî min r'a hûn ji r'ê derên dizîva bên,
Usa nêzîk hûn bihêwirin, ku lazim be hewarî bên!“
421. Sê r'oja ez r'ê da diçûm, - qasidkî din hat pêşiya min,
K'inc û r'ih'al R'amaz p'adşa mi r'a şandibû çawa amin.
Wa gotibû: „Ez dixwezim te e'gîfî zû bibînim,
Me ku hev dî, tuyê bibînî, çi hedaya te r'ewa kim“.
422. Wa gotibû: „Xeberê min tu qebûl ke bê şîk, qerez,
Were, ezê bêm pêşiya te, dîtina te r'a p'ir' t'îme ez“.
Min go: „Xudê, alîk'ar be vê sefera ku serim ez,
Şîmayî r'astî hev bên, tu bav, te r'a ewled bim ez“.
423. Pêşda diçûm, zûtirekê ez gihîştim devê mêrgê.
Dîsa qasida sekinandim, siyanet kirin li ser çokê...
Çawa p'êşk'êş mi r'a anîn hespêd kih'êl yê e'rebî,
Gotin: „P'adşa hîviya teye, bê sebir r'ê dike sêfî“.
424. Paşê gotin: „P'adşê gotiye, - sibê ez têm pêşiya te,
Berbangê r'a ezê bi xwe pêşda bêm bo dîtina te“.
Wê êvarê qasid man wir, min çadirke bedew dayê.
Çawa bira ew r'ex hevda hêsa, r'ih'et k'etin xewê.

425. Were binhêr', unda nabe şuxula xêre, meriyê dilr'e'm,
Ji qasida yek berbi min hat dizîva, wa dêmi bi şerm.
„Ez borcdarim bi mêranî cava qencyê bidim qenci,
Çawa dikarim ez bîr bikim qenciya min bavê te dî.
426. Hê biçûk bûm ku bavê te mi r'a bav bû, xayî – xudan,
Mixenetiya wan min bihîst, ne sekinîm hatim e'yan.
Şêrê Xudê ez nikarim ku mirîfî te binhêr'im,
Hêsa bibhê, çi bihîtsiye bê şik, şibat te r'a dibêjim.
427. Haj xwe hebe, tu nexapî van meriyê r'uh' va je'rî,
Ser r'iya te girtiye heşar bi ordiya sed h'ezarî,
Sî h'ezar wan başqe kirine ku nişkêva bavên ser te,
Hergê ç'arekê nebînî, sibê çetine r'oj bona te.
428. P'adşê bê t'ax'bûrekê, şik nek'eve ku dilê te,
Bin k'inca da zirîne lê, wê xeberdin, şa bin bi te,
Wê dû r'ake, dûya nîşan, herçar aliyê te bêne hev,
Ku h'ezar bê pêşiya yekî, bê fitiyaye, kuştîye ew“.
429. Xeberdana wiye amin ez bend kirim, r'azî mam jê:
„Sax bimînim ez bîr nakim, qedire cava vê qenci bê,
Her'e bighîj tu hevala ku ew te nek'evin şikê,
Qenciya te ku ez bîr kim, ewê bibe nifira Xudê“.
430. Kesekî r'a min tişt nego, ew giliya min k'ûr veşart,
Bira bibe çi wê bibe, û fikrekê sewdêm hingavt...
Lê min qasid mîna teyîra şandin nava eskerê xwe,
H'ukum dikim, sibê r'a bîn ew ardîmiya serekê xwe.
431. Sibê r'a min ver'ê kirin bi şîrnayî qasidê p'adşê,
„Bêjne R'amaz berbi wî tîm, bira ew jî berbi min bê“.
H'eta nîvro hêdî ez çûm, kes berbi mirinê nak'udrîne.
K'uda bir'evî qirara Xudê, xalî jî te nah'emlîne.

432. R'abûm ç'iyakî, p'êşa ç'iya min dî t'oz bilind dibe,
Ewe ku tê R'amaz p'adşa, yê pêşiyê min daniye t'ele,
Wê singê wan biqelêşin tîr – kevanê meye pola.
Min h'ukum kir li ser esker, h'erbê da bin hûn ber tola.
433. Wan r'a min go: „Biraêd min, mixenetî em xapandine,
Qewata xwe hûn ducar kin, şêre gendî her yek ji we,
K'ê boyî p'adşê e'mirê xwe da, r'uh' va diçe ew cinetê,
Miqabilî Xatayêt'ê daneyînin em sîlih'a e'rdê“.
434. Min h'ukum kir ziriya xwe kin, hazir bin ew bona h'erbê,
K'incê zirî, polayê xas, mil û serçok pola bûn lê,
Kire cêrgê, pêşda çûm ez, k'ubar û bê minet bûm ez,
Wê demê min t'irê bi şûr mixeneta qir' dikim ez.
435. Em nêzik bûn, dûrva wan dî, ku eskerêz zirîne lê,
Yek ji wan hat mi r'a anî ev gotinê R'amaz p'adşê,
Wî gotibû: „Niha e'yan bû, em merivayî hatin cem we,
Berxwe dik'evim ku dibînim, h'erbê da ne eskerê te“.
436. Ê min gotê: „Ez baş zanim, çi t'ele te daniye ser r'ê,
Ew nêta te naê sêrî, pêşda naçî mixenetiyê.
Tu h'ukum ke were şer' kin, ez hazirim evê le'zê,
Wa min jî wê şûr hildaye ku nemama bînim xezê“.
437. Wexta qasid gihîşte wan îdî r'îya paşda nedîn,
Dû r'akirin, nîşan bû ew, eşkere bû û bû r'ingîn.
Ji her aliya esker derk'et, herdu aliya zeft kirin r'ê.
Cêrge – cêrge pêşda hatin, tişt me nehat e'mirê Xudê.
438. Tîr û kevan min hilda, k'umê pola kir serê xwe,
Xast nîşanî wana kim ez h'unirê herd zendê xwe.
Pêşda diçûm, şûrê destê min mîna me'rê qijî teyîr,
Pêşberî min eskerê wî six sekinî bûbû h'eşar.

439. Ku nêzik bûm wan ez dîtîm, gotin: „Eve agirê kulê“.
Min banzda wir k'u ku esker six sekinî bû me'rê gilê,
Derbekê r'a syar û hesp hevrâ gulol kire e'rdê,
R'imam şikest, min şûr k'işand, bûm dia'çiyê yê saw dayê.
440. Usa lêxist mîna teyîrê ku bik'eve nav k'ax'lîtka,
T'ev dik'etin hesp û syar, dibûn laş wek ç'ivîka,
Meriyê derba min lê digirt, dik'et hêsa devgirtî,
Du t'ax'bûr wê bestê bû laş, yek ciyê xwe nelipitî.
441. Herçar aliya hildam nav xwe, çîqa çû wê şer' giran bû.
Derbam k'ê k'et, k'et bê guman, wir xûn bû cew, k'işiya û çû.
Wek çewalê sist bê kêr, nig zengiya da darda dibûn.
K'iyalî ez dizivir'im, ber min esker berhûm dibûn.
442. Ber êvarê serê ç'iyê qerewil wa kire qûjîn:
„Zû bir'evin, xwe xilaz kin, Xudê li me kiriye k'in,
Herçar aliya wê esker tê wek siteyrkê li r'ûyê e'zmîn,
Mîna lêyê wê me bibe, ev e'cêbe li r'ûyê zemîn“.
443. Ew eskerê min bû dihat, k'îjan qasid min şandibû wê,
Bin şevê va ew hatibûn melkemotêd mêrê kulê,
R'ê – dirba t'êrê nekir, r'ast û best wê wan hil dane,
Dengê def û ker'anê wan ç'iya – banî lerizandine...
444. Ev ku dîtîm, r'ev k'ete wan, hewar – gazî me da peyî wan,
Dîsa bi şer'em pêşda çûn, bûne şep'e ciniyazê wan.
R'amaz p'adşa ji ser hespê bi şûrê xwe min anî xar,
Esker kir dîl, min go: „Bese bir'êjînin xûna neyar!“
445. Eskerê min dabûne peyî, gihîştin wan yê dir'evîn,
Ji ser hespa peya dikirin, derb lê didan bi dilê k'in.
Herçar bê xew ku şev mabûn, r'eng lê çûbûn, ew digiriyan.
Hêsîrê dîl bê birîn bûn, destê sawê k'ûr dik'eliyan.

446. Em derbaz bûn besta xûnê ku bibînin ciya hêwra,
Destê min wê h'e'rişî bû, şûr lê k'etibû, birîn bû lê,
Dihatî ku min bibînin, pirsêd pesnî şêrê Xudê,
Digotin ku pirs t'unene, layîbin boyî vê e'fatîyê.
447. Ze'fbûn bona merîkî ew pesinê ku wan didane min,
Hineka dûr va dia' dîkir, k'ê nêzîk bû dihat r'ûyê min.
Wan mezinê ez xayî kiribûm, hêsira şil bûn ç'e'v, şabûnê,
Meriyê ku min danix'landbûn, bûn e'cêba li r'û dinê.
448. Min wa gote eskerê xwe: „Her'in hildin hûn t'alana!“
Ku zivir'in t'evê r'azî, min go: „K'êf kin, gelî birana!“
Paşê cardin best sor kirin min bi xûnê wan dijmina.
Îdî bi xwe r'ezadilî dispartine min şîher, kela.
449. Min wa gote R'amaz p'adşa: „Xeyîsetê te zanim, nemerd,
Bi qeyîd – çîdar xwe e'fû ke, bike şuxula kêrhatî merd,
Qewîn neke îdî kela, bide xizna xwe p'adşatiyê,
Yan na, çawa bihar bikim, car din nekî mixenetiye“.
450. R'amaz wa go: „Bê t'aqetim, car din şer' kim ez nikarim,
Sereskerekî min bîne tu, bira bibhê çi dibêjim.
T'evî meriyê te bişînim şîher, kela k'u ku berk'in,
Bi ferman te têkim xayî, t'ev qulxê te r'a bikin“.
451. Min wezîrek dayê û çend xortê e'gît, êgin, serxwe,
Xayê kela hatin cem min, berev bûn û hatin bi xwe.
T'eslîmî min kirin kela, şerm kirin qeletiya xwe,
T'u xizne ne dibû t'aê xizna wana da min bi xwe.
452. Paşê k'etim xweliya Xata û nasiya xwe min da welat.
Wan k'ilîte xizna dan min, e'wrê r'eş ser wana hilat.
Herçar dîl bû min aza kir, min go: „Her'in bijîn xwe r'a,
Hûn nekuştin, ne şewitandin, ev jî bira ders be we r'a!“

453. Min bi sirê nihêr'î wê xiznêd mezin, xiznê fihar,
Ku h'esav kira, min nikaribû, wir lazim bû çend xiznedar.
Cîkî min di k'incê jina, e'cêb bû ew nebînayî,
Hê t'u k'esî nedîtibû, nebihîstibû navê e'yînî.
454. Min fe'm nekir çi t'êlî bû yan ew çawa k'erge kiribûn,
K'ê ku didît zende digirt, ciyê xwe da qur'mîş dibûn.
T'êlê wê ne r'aste r'ast bûn, ne jî jorda bûn berbi jêr,
Mîna zirî ew qewîn bû, xarang bûbû bi agirê sor.
455. Min ew hil dan, min go: „Ev jî bona Şexsa mine bi nûr“.
Û xizneke hêja hil da, p'adşê xwe r'a min da destûr.
Paşê hil da h'ezar deve û qant'ir'ê xurte sitûr,
Min bar kirin û min şandin hedayî ji welatê dûr.





**NE'MA TARÎYÊL P'ADŞÊ HÎNDA R'A.
VEGER'ANDÎNA WÎYE ALT'ÎNDARIYÊ**

456. Ne'me nivîsî p'adşê xwe r'a: „Bi şabûn min tu şa kirî,
Xataya kir mixenetî, îro r'oja r'eş digirî,
Min ser te da cav nedişand ku çi dikim, me'ne ew bû,
P'adşê wan va ez dîl tînim û bê h'esab mal û hebûn.
457. Her tişt min kir, anî serê welatê wan, ez derk'etim,
Welatê wan min t'am – tax kir, xizne, hebûn, ez r'ê k'etim,
Çi ku deva t'êrê nekir, min qant'ira bar kir anî,
Çi min dixast usa dikir, min qanûna t'eze danî.
458. P'adşê Xata xu r'a danî bi qeyîd, çîdar çawa girtî,
Ez gihîştim Hindistanê, min û p'adşê xwe me hev dî.
Ew p'aê ku p'adşê da min, ez gîhandim e'rşê h'evta,
Vekir birîna destê min wî, bi dest xwe birîn pêç'a.
459. Wî meyîdana ji şêher der çadir – xêbet lê xistibû,
Bona mi r'a t'êr xeber de, zûda bîra min kiribû,
Wî k'êfeke usa danî, t'u p'adşayî ne dîtibû,
Ez r'ex xwe da dam r'ûniştin, r'uh' va bi min ew şa dibû.
460. T'emamiya şev em r'ûniştin, me k'êf dikir xwe bîrkirî,
Sibê r'abûn em çûn şîher, dî h'eşara berk'çê kirî.
P'adşê wa go: „Esker t'op kin, bira îro xwe r'a k'êf kin.
Çiqa dîlê Xatayîne û p'adşê wan her'in bînin!“

SOT'A R'ÛST'AVELÎ

461. R'amaz p'adşê dîl min anî û ber p'adşê da sekinandin,
P'adşê min wa lê nihêr'î, çawa zar'a ku dinhêr'in.
Ew nep'akê mixenet, min bi mêranî nîşan wî da,
R'uh' mezinaya mêraye ew, R'amaz sekinî hêsa cîda.
462. Boyî p'adşê Xatayêt'ê p'adşê min zor hurmet kir,
Bi p'adşayî wan xeber da, xeberdana xwe dirêj kir.
Berbangê r'a gazî min kir, bi xeberdan dilêm k'irî:
„Em e'fû kin p'adşê Xata, dijminayî ort'ê fir'î“.
463. Min wa gotê: „Gunek'ara Xudêye ku e'fû dike,
Vî p'adşê qewatk'etî tu jî îro e'fû bike“.
R'amaz r'a go: „Tu bizan be, niha ez te aza dikim.
Her'e, îdî ez nebih'êm ku şûrê xwe ber me r'akî!“
464. Xerc li ser wan e'seyî kir bi drahkana sed car sed,
Dîsa heqa zêr'ê Xata, him jî etles, qut'nî bê h'ed.
Paşê dilê p'adşê r'abûn, bi k'inca ew r'ewa kirin.
Ewî dewsa dijminayê bi dilê r'e'm ver'ê kirin.
465. R'amaz p'adşa bi r'azîbûn serê xwe li ber wî hêngavt:
„Miqabilî we mixenet bûm, Xudê mi r'a qe ne dûmand,
Car din heger biwek'ile, tu min saxî nehêl dinê“.
Eskerê xwe wî da peyî xwe û serberjêr ew k'ete r'ê.
466. Berbangê zû, meleme bû, meriyê p'adşê hate cem min,
P'adşê gotibû: „Sê meha tu xerîbiyê bûyî, ne dîtî min.
Sê meha min te'm nekiriye goştê nêç'îra çolê,
R'aste, tu p'ak hêsa nebûyî, gotina mi r'a were yolê“.
467. Îdî hazir ez gihîştîm cî, min dî k'oma maqûl, zana,
Bê h'esav bûn teyîrê bazî li ser destê nêç'îrvana,
P'adşa li wê r'ûniştîbû mîna r'oja bi nûr neder,
Şabûn wexta ku ez dîtîm, bedewiya min bûn sewdaser.

468. Dizîva wî jinê r'a go, usa gotina wî nebihêm,
„Binhêr', Tarîyêl şêr' hatiye, çi bedewe, ez wê dibêm,
Nûre, wexta lê dinhêr'î dila dike k'ana şayê,
Çi ku ez te t'eweçe kim, tu jî mi r'a were r'ayê.
469. Bêyî te min wa qîrar kiriye, wê yekê tu jî zanibe,
Me qîza xwe k'ivş kiriye ku dewsa min ew p'adşa be.
Hergê yekî wê bibîne, dara miraza eve jê r'a,
Hîviya mebe t'evî qîzê, emê bizvir'in r'oê r'a“.
470. Me nêç'îr kir li bestê da, p'êşa ç'îya, li neqeva,
Te'jî û teyîrê nêç'îrê nedihatî ber h'esava.
Em zû zivir'in, îdî neçûn ciyê nêç'îrê li dûraya,
Me îdî bi t'opê nelîst, mijûl nebûn lîstina va.
471. Boyî dîtina min şêher t'emam r'abûbûn ser sûk û bana,
Çawa e'fat li min dihat ç'ek – r'ih'elê nêç'îrvana.
R'astî jî ez p'ir' bedew bûm, mîna gula sore berr'o,
K'ê didîtim xweva diçû, digotin ku evaye r'o.
472. Çi r'ih'ela Xatayêt'ê nevsaxwe r'a min anî bû,
Min xwe kiribû, û min dihat, k'ê ku didî xweva diçû.
P'adşa banzda, em çûn serê, t'ev wî yê ku mi r'a bav bû.
Ez wir bend bûm, wexta min dî r'oja xweye sebra min bû.
473. Wê bedewê xwe kiribû r'ih'elê xwe r'eng narincî,
Peyî sekinî bûn cêrge – cêrge cariyêd wêye p'ir' birincî,
Wê nûra xwe t'ije kiribû dor û berê xwe li serê,
Mîna dur'a diç'ilvilî bi xwekirin û r'ih'elê.
474. Destê minî birîndar bû, situyê mi va girê dabûn,
Jina p'adşê berbi min hat, wir t'emam ber mi va r'abûn,
Mîna ewled wê r'amûsam, sûrtê mine sore gulî,
Wê go: „Îdî bihar nakim, dijmin ber te hilde milî“.

475. R'ex xwe da ciyê min kirin, wir h'ukum min p'ir' xaş dihat,
Pêjberî min Şexsa min bû, boyî k'ê dilê min dinvat.
Lê me hevr'a xeber neda, lê dizîva hev dinhêr'î,
Min ç'e'vê xwe jê dûr dixist, t'irê yekî e'mirê min bir'î.
476. Dest pê kirin xarin û k'êf, çawa babetî wana bû,
K'êfa usa, bihar bikî, kesî ç'e'va hê ne dî bû.
Fîncan, camê destê wan da t'eva p'irûz û ji lal bûn,
P'adşê wa go: „Ku bernedîn, herç'î k'êfa wane xweş bûn!“
477. Evîntiyê ez biribûm, şabûna min bê qeyas bû,
Wextê me ku hev dinhêr'î, agirê dilêm min sar dibû.
Min dilê xwe t'ewaqe kir, ji meriya xwe dûr xayî ke,
Ç'e'vê h'izkiriye binhêr'e, bextkî mezin ew h'esav ke.
478. „Ker' bin!“ – gotin dengbêja r'a, mirtiba dengê xwe wê bir'î.
Got: „Tarîyêl ewledê me, eşqa me bi eşq zivir'î,
Îro xaziya xwe me tînin, dijminê me t'ev nik'isîn.
Badîhewa nîne ku tên, te dibînin dilê h'esîn.
479. Layîqe tu bi r'ih'ela ku r'ewa bî, e'fatî tu,
Na, r'ih'elê me jî te tê, mîna gula ber'ayî tu,
Boyî e'fatiya nebînayî sed xizneyî ez didim te,
Tu şerm neke, hilde bidrû libasa hêja layîqî xwe“.
480. Sed k'ilîtê xizna da min, ew jî xiznê p'adşatiyê,
Min serê xwe li ber danî, dia' lê kir h'elaliyê,
R'abûn ser p'ê, ez r'amûsam, bi xwe r'o bûn, hatibûn dinê,
Çi ku esker wan bela kir, îdî nedihat ew gotinê.
481. Dîsa r'ûnişt li ser k'êfê û dest pê bû eşq û sitiran,
Dîsa li wê k'êf dirêj bû, kirin zîwîn çeng, sazê wan.
Jina p'adşê r'abû û çû, çawa ku r'o diçe ava,
K'êf nedighîşt wê k'êfa me, xew giran bû li ser ç'e'va.

482. Em cî r' abûn, giran bûbûn, haqa cam me vala kiribûn,
Wexta gihîştîm herema xwe îdî ç' e' vêm hev r' anebûn,
Qewat mi da qe ne mabû, agirê dilêm ne temirî,
Min bîr danî, xu va diçûm, dîsa h' îş min dizvir'î“.





**NE'MA NÊSTAN –
DARÊCANÊ H'ÏZKIRIYÊ WÊ R'A**

483. Xulam hat û mi r'a anî xebereke aha r'astî:
„Derheqa te da pirs dike k'ulfeteke sep'e kirî“.
Min fe'm kir, ez cîda r'abûm, dilê min lez wa dik'uta.
Hate hundur', min dî r'astî Asmat'e ew, wê silav da.
484. H'uba yarê, cariya wê ez şa kirim ji qeyas der,
Min nehîşt ew silavê bide, min r'amûsa sûretê wê zer.
Destê wê girt, r'ex xwe da min ser t'ext ew da r'ûniştandin:
„Te ji dara mirazê min aniye çi gilî – gotin.
485. Derheqa wê da tiştî bêje, dirêj neke tu giliyê xwe“.
Wê go: „Bêjim çi ku heye, zêde nakim gotina xwe.
Îro we hev nêzîk dîtibû, bi dil we hev begem kiribû.
Te r'a bêjim evê yekê, wê wa h'ukumî ser min kiribû“.
486. Ne'me da min, lê nihêr'i, ji şemala r'û dinê bû,
Nivîsî bû: „Siya te dî, nûra te wek ya dur'ê bû,
Te hespê xwe k'ubar dajot, veger'iyabûyî şer'ê giran,
H'eyîf, pê nayêm ku bona te h'esîna dil ez diger'iyam.
487. Ziman da min Xudayê min, te dûr bidim ez p'aê te,
Dilê minî wa hêngavî dine'liya boyî bextê te,
R'o dide şêr gul û şebe, dewsa bax' û bax'çê gula.
Ez sond duxum bi e'mirê te, nah'ebînim ez t'u dila.

488. Hêsira ze'f dibarîni, bese îdî nebarîne,
Negirî îdî, îro şûnda derd ji dilê xwe derîne,
K'ê tu dîtî, min dibîne, nêta xirav difikire,
Xirxê, îro te xukiribû, bişîn r'oja te wergire.
489. R'ewayî min ke wî xirxeyî, ew îro ze'fli te dihat,
Min bibînî, bi dil şa bî, hedaya te bûme t'awat,
Vê bazbendê tu girêde, hedaya em didine hev,
H'izrete şeva îşevîn, dereng r'on be bira ev şev“.





GIRIYÊ TARÎYÊL Û XWEVAÇÛYÎNA WÎ

490. Mîna de'bê hurlemîştî Tarîyêl derdê xwe digiriya,
Wî wa go: „Ayî, ev bazbende“, wî milê xwe hilbir'iya.
Derxist û da wî destê xwe, r'astî jî ew ze'f bû biha.
Da ber dêmê xwe, xweva çû, qeyî te go, k'et cêrga miriya.
491. Veleziya bû, ne dih'ejiya, r'eng lê bûbû r'engê miriya,
Ser sîngê wî deqê r'eş bûn, heqa dabû ew ber k'ulma.
Lê ji dêmê Asmat'ê nûr şorîn xûn bû dik'işiya,
Av pê r'eşand ku h'işiyar ke, zarîna wê k'etibû ç'iya.
492. Avt'andîl jî k'ûr kir axîn, ji dêmê wî guman bir'i,
Asmat'ê wir dikir zarîn, hêsir dibarand mîna zirî,
Ku ser h'emdê xweda ew hat, agirê dil evê vêsand.
Wî go: „Saxim, ax bextê min, çend cara wa sed min birand“.
493. Ancax r'abû, r'ûnişt bê r'eng, dor – berê xwe wî nihêr'i,
Gula narîn bûbû k'irkût, dêm sipî bû mîna hirî,
Wî nikaribû me binhêr'e yan jî me r'a ku xeberde,
H'eyîf pê dihat ku nemir bû, jîyîn wî r'a bû bê feyîde.
494. Awa wî gote Avt'andîl: „Sewdalî me, guh bide min,
R'astiyê ez te r'a bêjim, k'ê ç'e'l kirim û gula min.
Şabûne boyî min, ku r'astî pizmankî, kinêzkê bêm,
E'cêbe ku h'eta îro heme, dijîm vê diniya dêm.


495. Şa bûm dîtina Asmat'ê r'a, mîna xûşka guman da min,
Min ku ne'me xand, wê demê ev bazbenda ewê da min,
Min ew avîte milê xwe û xirxe ji xwe anî xar,
R'engê wêya hinkî r'eş bû, gul meriya r'a dihatin zar“.





NE'MA TARÎYÊL H'IZKIRIYÊ R'A

496. Min nivîsî: „Tu Şexsa min, nûra te ji nûra zêde,
Dilê min k'et min unda kir, e'fatî û e'gîtiya xwe,
Ez ku boyî te sewdaser bûm, bedewiya te ez bend kirim,
Dewsa r'uh'ê xwe te daye min, bêje dewsê ez çi bidim.
497. Tu carekê mi r'a bûyî guman, te ez xilaz kirim,
R'oja îro wê carê r'a ez beranber t'a digirim.
Bazbenda te min stendiye, wê avîtiye min milê xwe,
H'uba dilêm ji şabûna derk'etiye k'enarê xwe.
498. Sed h'eyîf ku min zû fe'm nekir, ez xêliya te dişînim,
Û zebûnkî p'ir'î bedew t'a dinê da ez rabînim.
Min bê guman tu nehêle, bese hêsira bibarînim,
K'ê r'a bêjim pêştirî te, ku derdê xwe sivik bikim“.
499. Asmat' ku çû û wê şevê xewa şîrin k'etim xewê.
Ez h'îşiyar bûm, xewnê da dî min neder a h'izkiriye,
Ç'e'vê xwe vekir, ew t'une wir, min go: „Çirane ku dijîm“.
Îdî nebihîst min dengê wê, h'eta sibê xew min r'evî.





ŞÊWRÊ DİKÎN KU NÊSTAN – DARÊCANÊ BÎDÎN MÊR

500. Şebeqê r'a gazî min kirin hê şems t'eze nedîr dida,
Û ez r'abûm k'etime r'ê, çûm dîwana p'adşê Hinda,
P'adşa û jin r'ûniştibûn, sê carî bûn li dora wan,
Gotin: „R'ûnê“, - k'ursî danîn, ez r'ûniştim pêşberî wan.
501. Gotin: „Xudê ber me vekir dergê extiyariya te'lebext,
Zûtirekê emê kal bin, cahiltiya me buhurî bedbext.
Xudê neda ewledê nêr, t'enê qîzek da h'eka h'inêr,
Dewsa kur'a me ew xweyî kir, ewe derdê meyî bêsixbêr.
502. Em dixwezin wê bidin mêr ku bibînin yekî hêja,
Ku t'extê xwe em bispêrinê, mîna me be r'aw û r'êza,
Têkin xayê him t'ext, him p'aş, xweyê welat û hebûnê,
Ku sist nebe, nebe qewat boyî dijminê me r'ûyê dinê“...
503. Min go: „Naê veşartinê ku ewledê nêrîn t'une,
Çawa guman ew jî bese, r'oje, nûre ew bona me,
Kurê k'ê jî têkim ze'va, şabûna me dirêj nakim,
Ez çi bêjim, şuxulê weye, çawa dixwezin usa bikin“.
504. Me şêwr kir, - lê dilê min bû h'ezeka ser r'û avê,
Duşurmîş bûm, - „Ne cayîze, bibim berge ez vê gavê“.
P'adşê wa go: „Ku Xorêzmşah, p'adşê e'gît Xorêzmêye,
Kurê xwe bide me r'a ze'va, ji wî baştir qe t'uneye“.

505. Hate k'ivşê ku wan îda soz û qirar kirine yek,
Hev dinhêr'în, xwe didan der, ku qirara wane ev yek.
Ne cayîz bû min xeber da, miqabilî wan r'abûma,
Ez bûbûm wê t'oz û xweli, ew bû ku ez bit'eqiyama.
506. Jina p'adşê wira wa go: „Zor p'adşaye Xorêzmşah,
Ji kur'ê wî baştir t'une, em nabînin k'esî niha“.
Çi bigota min miqabilî, wextê ew bû xwestina wan.
Ez jî wan r'a qayîl bûm, wek mirinê ew bû giran.
507. Merî şandin cem Xorêzmşah, t'eweqe kir ku kur'bide,
Gotin: „Welat û xweliya me badihewa neşer'ide,
Dewsa kur'a qîzam heye, mal û ciyê xwe naguhêr'e,
Ku kur'ê xwe tu bidî me, ser t'eweqa me bifikire“.
508. Qasid zivir'î bi hedayê bê h'ed, h'esab ç'ek û r'ih'el,
Xorêzmşah wir p'ir'şa bûbû, xemê dila wî kiribû ç'e'l.
Wî gotibû: „Çi h'esîn bûm, Xudê da min herdu desta,
Bûka usa me nedîdît ne ku hêsa, xewna şeva“.
509. Ew car din qasid şandin ku zû her'in ze'vê bînin,
T'eweqe kir: „Egle nebin, h'ukumê min hûn biqedînin“.
Ji lîstina t'opê westiyayî k'etime nav cî, lê bêfeyîde,
Melûl min hêwirî bû, xemê xarim ez bê qeyîde.





**ŞÊWRA TARÎYÊL Û NÊSTAN – DARÊCANÊ.
QÎRARA WAN**

510. Melûliyê ez hilda bûm, ew bû k'êrê dilê xwe xim,
Wexta xulamê Asmat'ê hat, min go, yanê xwe dernaxim,
Ne'me da min: „Bejna tîtal, dara çinar hîviya te me,
H'ukum dikim, egle neve, gumana min, h'uba te me“.
511. Hespê syar bûm, gihîştim bax', ku h'uba xwe şa bim e'yînî,
Bax' derbaz bûm, min Asmat' dî, li ber k'oç'kê bû sekinî.
Ew giriya bû, herdu ç'e'va şop'a hêsira xûya dibû,
Min deyîn nekir, wir e'yan bû zûda hîvîyam sekinî bû.
512. Usa melûl dîtina wê h'ukumê giran hîşt ser dilêm,
Ne dik'eniya ew beşerxweş mîna berê ku ser hilêm.
Xeber neda, pirsek nego, dişewitand hêsira dêm wê,
Ne ku birîna min derman kir, hê t'eze kir, mir'ûzê wê.
513. Ewê fikirê min bela kir, kir h'ezarî wê xema min,
Wê ez birim li wê k'oç'kê, qulç'ê p'erdê vekir ber min.
Hîva geşe çardeşevî mi dî, dilêm k'ûr ne'liya,
R'onaya wê dêmêm hilda, cemed dilêm neh'eliya.
514. Ser xalîçê mîna berê nûr ji dêmê wê nedibarî,
Xêliya min wê r'a şandibû pê veşartibû dêmê narî,
P'alda bû ser t'extê bedew, libasê wêye k'eske lê bûn,
P'ir' bedew bû, dêmê nazik ç'e'vkaniyê hêsira bûn.

515. Wê p'alda bû mîna piling devê zangê li harbê da,
Ew çinara cinetê bû, mîna hîva nav e'rşa da,
Dûrva cî da min Asmat'ê, dilê min bû gumanbir'î,
Ji cî r'abû me'dekirî, pirîsk ji ber ç'e'vêm fir'î.
516. „E'cêbmayî ez dimînîm, çi r'ûyî tu hafî cem min,
Tu qomsî û t'ecalî, xayînî tu, e'yînî dijmin,
Gola hêşîn silh'ê bike û nehêle te bê cune“.
Min go: „Çawa cavê bidim, çi te mi r'a kiriye gune.
517. Ez çi bêjim şemala min, ku haj tişkî ez t'une me,
Yan çi gune min kiriye, aliyê bext da lêdayî me“.
Wê go: „Nep'ak û derewîn, ez hîviya çi ji te bikim,
Dişewitim ku xapiya me, sistiyê da ez dîsa jinim.
518. Tu nizanî, kurê p'adşê Xorêzmşah wê tînin ze'va,
Yek ji wanî yê r'ûniştî, te jî wan r'a qayîl da,
Te p'êpes kir qirara me, da bin p'îya ad û sond te,
Bira Xudê qe r'ast neke û hev neyîne şuxula te.
519. Te bîr kiriye axîna xwe, bi hêsira best av dida,
Çiqa h'ekîm, çiqa zane te r'a derman dikir p'eyîda,
Nemamiya mêrê e'gît, t'ev çi dikarî bera wur'kî,
Te ez hîştîm, te dihêlim, zîrarê k'ê bibe heqî.
520. Dengê bibhê, wê zanibe, k'ê be xweyê Hindistanê,
E'se gere ez bim serek, k'uda bibe ba gemiyê,
Tu şaş bûyî, xwestina te naê sêrî tu wê bîr ke,
Û fikirê te mîna te ne, dur'ûtiya xayîn bike.
521. H'eta heme, Xudê şe'de, tu bê cîyî Hindistanê,
Bicêr'binî ku bimînî, tuyê her'î ji vê dinê,
Ya mîna min tu nabînî, e'rşa bikî tê seyîranê“.
Ev ku bihîst, e'gît giriya, k'ûr kir nalîn t'ev axîne.

522. Wa go: „Dîsa gumana min hat cî, wexta ev ku bihîst,
R'onayî min hat ser qedam, min dî nûrê dêmê wê list,
Mîn unda kir, zende nagirî, sewdalî me, hê bîn ber min,
Heyî diniya p'ûç', çima vedxuyî herr'o, herr'o tu xûna min.
523. R'ex t'extê wê min dî daniye mûsafeke ziyaretî,
Mîn hilda da met'h'ê Xudê, paşê met'h'ê wê fêrîştî,
Mîn go: „R'oê, te şewtandim, bihêle ku bibim xwefî,
H'eta ku te nekuştîme, bibhê ez çi dikim gilî.
524. Ezê çawa qursax bikim, ber te bikim gilîkî haş
Bira r'o jî nede ser min, e'zman hilşê ser mi da k'aş,
Guh bide min, t'u xiravî min nekiriye, haj pê nînim“.
Wê go: „Bêje, xwestina mine nemamiya te bibînim“.
525. Mîn go: „R'oê, hergê ku min p'êpes kiriye soz û qirar,
Bira Xudê bihingêve dilê mi da zergê xedar.
Dê m şemala bejin çinar, k'ê r'a bêjim ez xêncî te,
Çawa îdî bi te bijîm, ku min k'eve derb bi dest te.
526. Gazîm kirin li dîwanê, şewir kirin, min bihar ke,
Îdî ze'va k'ivş kiribûn, hevr'a dabûn qayîliya xwe,
Ezê xirav derk'etama, ku miqabil min xeber da,
Mîn xwe r'a go: „Xeber nede, xwe zeft ke, tu şêrê Hinda“.
527. Çawa miqabil ez biçûma, çima p'adşa nefikirî,
Çima nizane, Hindistan bêxweyî nîne, neşewirî,
Tarîyêle xweyê welat, xweyîkî din ew nas nake,
Ew k'ê tîne, ez nizanim gumana çi ew wê dike.
528. Ez fikirîm, şuxule bê r'ê, bifikire r'ê bibîne,
Mîn xwe r'a go: „Xwe bicivîn, xema dilê xwe derfîne“,
Dilê m r'abû wek de'bê nu û besta da k'ete gezmê,
Wekî bidin te yekî din, çi min r'a ne bêyî te dinê.

529. Kela guhart min kire sûk, firot r'uh'ê xwe h'uba te,
Barana sar hêsa barî, wê ne xeyîrî gula şerte,
Min dî çawa cewahira xeml dida cêrgê dur'a".
Wê go: „Bibhê, ku ev gilî-cûrekî din anîn mi r'a.
530. Bi çi dilî ez difikirîm, ku sozp'oşman û xayînî,
Yan Xudê xwe te bîr kiriye, yan şuxul da ne aminî,
Niha her'e tu xazgînî û bibe p'adşê Hinda,
Bi p'adşayî em t'evayî, wê k'erem dike Xuda“.
531. Milahîm bû, min nihêr'î p'erça dilê wêya danî,
Dêmê wê bû mîna hîvê, mîna r'oya nûr gulanî,
Hêjayî wê yekê kirim, çi ku xewn bû nebînayî,
T'ev min ewê wa qise kir, dilêm t'ijî kir bi şayî.
532. Paşê awa xeber da wê: „Lez nak'eve meriyê aqil,
Hêsa e'mir ew dinhêr'e, r'iya r'ast ew dibjêre dil,
Ku ber ze'vê wî va r'abî, hêrsa p'adşê wê ze'fr'abe,
Tu û ew va ku hev k'evin, Hindistanê k'ar – k'ambax be.
533. Hergê nebî berga hatnê û de'wata min, wî bikin,
Ez û tu jî hev dûr k'evin, gere k'incê r'eş li xwe kin.
Bi siyanet, hurmet wê bên, derdê meyê bibe h'ezar,
Ew şuxula bûyînê nîne, fariz li me bibin azar“.
534. Min go: „Bira Xudê ji te dûr xe ewî ze'vayê te,
Çawa k'etin xaliya Hinda, bicêr'bînim qewata xwe,
Mêraniya xwe wir nişandim, bikim şer'ekî ez e'fatî,
Usa qir'kim, ku nebînim wan ser h'emdê xwe da hatî“.
535. Wê cavam da: „Çiqa nebe, xeyîset va jin t'imê jine,
Ez nahêlim xûn bir'ije, dîwarim ez, t'ewqa mine,
Ze'va ku hat tu bikuje, çi gunek'are pê r'a hatî,
Dara h'işkê jî hêşîn be, wexta qirar dibe r'astî.

536. Usa bike tu şêrê min, destê te ser desta r'a ne,
Ze'va bikuj tu dizîva, veneke herba şer'ane,
Tu qir'neke eskerê wî, mîna naxirê haj xwe nîne,
Neke situyê xwe tu qet'la wan meriyê bê sûc, gune.
537. Wexta te kuşt, bavê mi r'a her'e bêje tu mêranî:
„Ez nahêlim wekî Fariz Hidistanê bibe xweyî,
Welatê min, ez nahêlim, ku jê bibin axçe, şeyî,
Qayîl nînî, ezê bikim şîherê te ax û xwelî“.
538. „Ji devê te dernek'eve, min h'iz dikî, min bistînî,
Bi wê yekê gotina xwe tuyê mêranî e'seyî kî,
Û wî çaxî p'adşê bi xwe bi lavaya bê berbi te,
Tuyê bibî xudanê min, ezê r'ûnê hêja r'ex te“.
539. Bi dil pê r'a ez qayîl bûm, min ku bihîst şîreta wê,
Xastina min bû zûtîrekê dijmin bidim ez ber r'imê.
Ez r'abûm ku her'me mal, wê go: „Hinkî jî bisekine“.
Min ze'f dixast, qursax nekir, ku h'emêz kim, dil bik'ene.
540. Hinekî mam, paşê r'abûm mîna dîna k'etime r'ê,
Hêsir ç'e'vê min dip'ekiyan, Asmat'ê ez kirim ver'ê,
Derdê min bûn bi h'ezara, şabûna min yek bû dila,
Min ne dixast jê dûr k'evim, nig giran bûn, bûne pola.





HATINA KUR'Ê XORÊZMŞAH LI HINDİSTANÊ BOYÎ ZEVACÊ Û KUŞTINA WÎ BI DESTÊ TARÎYÊL

541. Merîk hat go, ku ze'va tê, aha anî wî mizgînî,
Çi zanibû ku yaziyê, heyîwax, çi bîne pêşiya wî.
P'adşa r'abû bi dilê şa wî wa bilind xeber dida,
„Were vira!“ – gazî min kir, dam r'ûniştin li r'ex xwe da.

542. Wî go: „Îro bona min ev şabûneke p'ir' mezine,
De'watê em dîkin îro, tu jî xûşka xwe bipesine,
Meriya bişîn tu her alî, bira xizna, eşiya bînin,
Merd bela kin em hedaya, merivaya xwe em nîşandin“.

543. Şandin merî min her alî ku xizna û eşiya bînin,
Ze'va jî hat gihîşte cî, ku zûtirekê hev bibînin.
Yê Xorêzmê ji der hatin, hundur' da me qebûl kirin.
Eskerê wî r'ast, best hil da, wek siteyîrka bêh'esabînin.

544. P'adşê Hinda wa h'ukum kir: „Bestê têkin bin çadîra,
Bira ze've me hêsa be t'ev wezîra, gire – gira,
Bira meriyê me her'in wê, lê tu çawa xweyî – xudan,
Û tu vira wî qebûl ke, nelazime ordiya giran“.

545. Meyîdan hildan bin çadirê bêqisûre, etlese xas,
Ze'va hat wir peya bû, şayînet bû meyîdanê nenas,
Wir dest pê bû, qelfe – qelfe hatin wezîr, meriyê cindî,
Cêrge, cêrge esker sekinî bi qanûnî, çawa ordî.

546. Ez dûr k'etim ku min her tişt anî sirê, şuxul qedand,
Çûme malê, ze'f westiya bûm, serê xwe danî, deng xwe birand.
Xulam hat û ne'mek anî, dest Asmat'ê bû nivîsî:
„Tu zû were, eve h'ukumê darçinara te bê nevsî“.
547. Ez wir hespê xwe syar bûm, k'etime r'ê nesekinîm.
Ç'e'vê girî Asmat' min dî, min go: „Çima tu giriyayî?“
Wê go: „Ç'e'vê zîha k'engê dî me, r'oja r'astîm hatî,
H'eta k'engê ez pêş te va sonda bixum bi wek'îltî“.
548. Em çûn hundur', r'ûniştibû, p'alda bû ser be'lgiyê qut'nî,
Mîna r'oê nûr jê dibarî, p'irç' û mir'ûzê wê min dî,
„Çi sekînî, - wê mi r'a go, - haj xwe hebe, hatiye we'de,
Vê carê xwe paşda negirî, xwe bîr nekî, Xudê şe'de“.
549. Ez xeyîdîm, pêr'a – pêr'a zivir'îm û mal derk'etim,
Min kir gazî: „Wê belû be, h'izkiriya xwe ku h'iz dikim!“...
Ew k'ulfet min dişîne şêr', dibe ku usa nimiz k'etim.
Gihîştîm mal, min xwe r'a go, îro gere wî bikujim.
550. „Bona şer' hûn xwe hazir kin!“ – ferman min da sed eskerî.
Syarî şher em derk'etin, ser r'ê nedî me t'u merî,
K'etime çadirê, r'aza bû ew, oh, çi teherî ez gilî kim,
Bê xûn ew kuşt, lê lazim bû ku ez li wir xûnê r'o kim.
551. Tejê çadirê min bir'î wê û r'ê vekir berbi hundur',
Nîgê wî girt, herdu desta sitûnê xist û avît wir.
Ersawilê ku devr'a bûn, dîtin, giriyan bi şîn mşot.
Me t'ev zirî li xwe kiribû, hespa syar bûn û me ajot.
552. Deng li wan k'et, kirin gazî, dan peyî me bi hewarî,
K'ê ku mi r'a xwe digîhand, derba min r'a ew bû mirî.
Şîherekî min berk' heye, sîngê ç'iyê û ze'f hasê,
Zûtîrekê gihîştin wê, bêminet bûm hewar, gaziyê.

553. Merî şandin min her alî, e'şaret da esker t'evî:
„Bilezînin werin vira, k'ê dixweze bide ardimî!“
Wir eskerê Xorêzmê bû muhum, şev û r'oê k'îşiya.
Ku bihîstin ezim sebeb, şikest şeka Xorêzmiya.
554. Şev buhurî, berbangê r'a em r'abûn, me sîlih' hilda,
Sê giregir hatin cem min, ew şandibûn p'adşê Hinda.
Wî gotibû: „Xudê zane, min xweyî kirî çawa ewled,
Çima te hîşt dilê mi da eşq xiraviyê ku bibe bend.
555. Xûna kur'ê Xorêzmşah te kir lek'e ser mala min,
Heger qîza min te dixast, çima pêşda negote min.
Bav bûm, extiyar te ji e'mir zbêr kirim, yaziya min,
Wê çi bûya h'eta hebûm nekira birîn te dilê min“.
556. Min go: „Bêjnê, p'adşê min, ez ji sifir qewîntirim,
Agirê şermê ez hilda me, bê hurmet gere nemirim...
Lê qirara p'adşê gere xudêfî be, tu wê zanî,
Bihar bike min qîz nedixast, wê yekê tu neke me'nî.
557. Çend t'ext û t'ac heye li ser xweliya Hinda, tu wê zanî.
Nisleta wan ezim t'enê, tu niha lê xayî, xudanî,
T'ev ort'ê çûn, t'enê tu mayî ser xweliya wet'en xayî,
Pêştirî xwe ez navînim, peyî te r'a be yekî mayîn.
558. Ez sond dixum bi r'e'ma te, tu ne r'astî vê yekê da,
Xudê ku kur' nedaye te, t'enê qîze nisila te da,
Xorêzmşah lê bikî p'adşa, çi dighîje min wê yekê,
Yekî din lê bibe xayî, çi gumanim Hindistanê“.
559. Min go: „Qîza te naxwezim, bide mêr wê ku dixazî,
Lê Hindistan ya mine ew, yekî din lê nave xayî,
K'ê bixaze min bistîne, ezê r'uh' li wan bistînim,
Ardimiyê ku h'ewce bim, bi şûrê xwe bira qet bim“.



**TARÎYÊL DÎBHÊ DERHEQA UNDABÛNA
NÊSTAN – DARÊCANÊ**

560. Wexta min ew ver'ê kirin û fikirê min t'evî hev bûn,
Haj h'izkiriya xwe t'une bûm, xemê dilê min hê p'ir' bûn,
Ji h'ecarê ez derbaz bûm û k'etime deşta hêşîn,
Çawa min xwe unda nekir, tiştî e'cêb gava min dî.
561. Du peya wir hatin xuyan, ez derbazî wî yalî bûm,
K'ulfetek bû t'ev cariyê, min nas kir û nêzîk bûm,
Asmat' bû ew ser vekirî, dêm xûnê da bû mewicî,
Gazîm nekir, wê tişt negot, cîda sekinî ew k'ewgirî.
562. Min ku ew dî, xwe unda kir, xem û fikirê min h'ezarî,
Min deyîn lê kir, çi qewimiye, çi qeziyaye min qesidî.
Deng ancaxî gihîşte min, k'ûraya dil ne'lin k'ûr kir,
Wê go: „Heyî wax, Xudê diniya serê me da r'eş û h'eş kir“.
563. Ez nêzîk bûm, dîsa pirs kir: „Çi qewimiye, bêje r'astî!“
Dîsa giriya û kir nalîn, min nihêr'î dilê şikestî,
Ker' bû, ziman jê sitandibû kul û derdê wêye giran,
Sîngê wê sor dikir xûnê, dêm xûnê da nedihat xuyan.
564. Paşê wa go: „Ezê bêjim, çima ji te ez veşêrim,
Haqa tu min were r'e'mê, çîqa ku ez te şa dikim.
Min sax nehêl, min bikuje, xilaz ke ji vê ar û zarê,
Boyî Xudê be, min xilaz ke, min xilaz ke ji vê dinê.

SOT'A R'ÛST'AVÊLÎ

565. Hewarî ku gihîşte me, - „Ze' vê p' adşê hate kuştin“,
P' adşa bi hêrs ji cî r' abû, me destê xwe dinê şuştin.
Bilind zariya, gazî te kir: „Bêjnê, çima derengî bû!“
Ze' f te ger' iyan, tu mal nîbûyî, hêrsa wî hê qeyas der bû.
566. Jê r' a gotin ku vir nîne, ji şêher ew derk' etiye.
P' adşê wa go: „Zanim, zanim, zûda ew yek min fe' m kiriye,
Dil k' etibû ew qîza min, bi xûnê best wî sor kiriye,
Herda wexta hev dinhêr' î, te digo r' o derk' etiye.
567. Bi serê xwe ez sond dixum, xûşkam destê m bê kuştinê,
Min go, Xudê, ez wê zanim, ewe boyî min siya mirinê,
Wan nep' aka çi daye wê, ku wa anî wê serê min,
Ku bihêlim sax bimîne, Xudê bike tu sîliha min“.
568. H' ezar carî carekê ku serê xwe sond xar p' adşê,
Sond ku xar wî egle nedikir, diqedand ew bi qîrarê.
Yekî bihîst sonda p' adşê, dil, dîne wî ber hev neda,
Wî çû gotê Davara cin, wê bi sêrê r' o danî benda.
569. Xûşka p' adşê Davarê r' a wî go: „Birê teyî bê Xuda,
Bi serê xwe sond xariye te ji dinê bike unda“.
Davarê go: „Xudê zane, gur', gumanê min nagîjê,
Bona çi ez sax bimînim ku birê min hatiye xapandinê“.
570. Xanima min hê usa bû, çawa ku te ew dîtibû,
Axçawa lê dihat xêliya te p' êşk' êşî wê kiribû,
Davar li wê hêrs k' etibû, pîrsê ner' ê dida ç' êr' a:
„Qeh' bê, çima min dikuji, tu negîje bextê xwe r' a.
571. Bêje qeh' bê, dergîstiyê xwe te çi teherî girt şerjê kir,
Çima te pêş xûna wî va, xûna min bê hurmet kir,
Destê birê xwe bimirim, çi xiravî min te r' a kir,
Tu negîjî bext – miraza, t' evî k' ê te ev yeka kir“.

572. Ew gihîştê, avîte e'rdê, p'or'ê serê wê girt ver'ût,
Usa k'uta, r'eş û şîn kir, dêm lê kire r'engê k'irkût,
H'izî nedikir cavê bide, dikir axîn û ne'lînî,
Ez cariya r'eş, kêmt'aqet bûm, ku bidime wê ardimî.
573. Ji k'utanê Davar westiya, cîkî sipî tê da nehîşt,
Pêşda hatin du xulamê dêmî e'cêb, bijange çît.
Bû qûjînî, wana anî darebestek danîn wira,
Ew danîn ser darebestê û derk'etin p'encerê r'a.
574. Ji p'encerê berbi be'rê lez k'etin r'ê û unda bûn,
Davarê go: „Min bikujin bi kevira, ezim beyît'ûn,
Ez namînim, xwe bikujim, e'mrêm îdî bûye qeziya“,
Wê k'êr derxist, dilê xwe xist, cîda k'et û veleziya.
575. E'cêbmayî tu namînî ku hê min xwe nekuştîye,
Min bikuje, ne min cavê bêxêriyê te r'a aniye,
Boyî Xudê be, r'uh'êm bistîn, bîna min wê hê teng biye“,
Ji ç'e'vê wê belengazê hêsrê xûnê ne betiliye.
576. Min go: „Xûşkê, çi gunê teye, çima ezê te bikujim,
Lê tu bêje bona wê ku ez borcdarim ez çi bikim.
Bik'evime ç'îya, baniya, lê biger'im ku bivînim,
Wê dil min bûye kevirê r'eş, r'ê ji r'îya ez demaxim“.
577. Ez lerizîm û hejîyam, bûme lerzek li ber êşê,
Min go: „Dilo, tu nek'ele, k'ar naê ji r'ûniştinê,
Başê bik'evî ç'îya, baniya, undakirîya xwe bigerî,
We'deye ha, ew mi r'a bê, k'ê bextê xwe dike gorî“.
578. K'etîm hundur', sîlih' hilda, hespê syar bûm, r'ê kir k'are,
Xwe r'a hilda min sed û şêst e'gîtê çê yê bijare,
Ew berav bûn, mîna esker em ji şêher derk'etin der,
Gîhîştin be'rê, me gemîk dî, dilê min wir bû h'ezar ker.

579. K'etme gemiyê, da ser be'rê û ger'iyam wê xiyalê,
Min ne dihîşt bê nihêr'andin gemiyê r'êwiye ser be'rê.
Ez hîviyê bûm, salix – sûlix min hilneda, sewdalî bûm,
Ew xezeba Xudê mi kir, ez bûm wekî ku dîn nebûm.
580. Sal derbaz bû, ew donzdeh meh ber min bû wek bîst mehî,
Merîk nedî salix bida yan bigota xewnê da jî.
Hatine kuştin, t'ev unda bûn ew e'gîtê t'ev min hafî,
Min go: „Xudê, min dipirsî, min dipirsî bo belatî“.
581. Îdî ji be'rê ez a'ciz bûm, gemî ajot hatim k'enar,
Min guh neda t'u şîreta, r'uh' va bûbûm de'bekî h'ar,
Wan jî hîştim û dûr k'etin yê ku mi r'a p'ir' bûn amin,
Dibên, Xudê wî nakuje, yê bext jê r'a dibe momin.
582. T'enê Asmat' ma li cem min û t'evî wê du xulam man,
Hevr'a omîd û amin bûn, wana t'erka hev nedidan.
Ji Nêstanê salix t'une, ne jî cem me diraxm mane,
Giriyê min bû sebir mi r'a, hêsirê m barana e'zmane.





TARÎYÊL R'ASTÎ NÛRADÎN – P'ÎRÎDON TÊ

583. Şev derbaz bû, devê be'rê min dî bax'çekî bê qusûr,
Em gihîştibûn teherekî, alîkî ç'iya, kendal bûn sûr,
Ne dixwest meriya ez bibînim û dilê min xirav dibû,
Ji ser hespê ez peya bûm, nav bax' da hêsa dibûm.
584. Bin bax'a da k'etim xewê, xulamê min sifre danîn,
Ez jî r'abûm bi dilê kul, r'uh' va ji min hate nalîn,
Min ne bihîst derheqa wê da salix – sûlix serê wê r'ê,
Hêsir ç'e'vê min dibarîn mîna xûnê girê – girê.
585. Dengê bihîst, guhdarî kir, e'gîtek bû dengê wî dûr,
Wî hesp dajot dev be'rê r'a, k'ivş bû birînê wî ze'f bûn k'ûr,
Şûrkî şikestî dêst da bû, jê diniqîfî wê xûna sor,
Bilind dida wî xebera, jê r'a yek bû e'rdê r'ast, k'or.
586. Hespke qemer syar bû, k'îjan niha hespa mine,
Mînanî bê ewî dajot, hêrs bû, hêrsa wî mezine,
Xulamê xwe min şand pêşiyê, bêjê, bira ew bê vira,
Xulam gotê: „Şêrê Xudê, bêje k'ê tu dayî ber şûra“..
587. Nexast bibê, nesekinî û pirsek wî negot xulam.
Hespê syar bûm, cîda qil bûm, çûm sekinîm pêşiya zilam.
Min go: „Bise, mi r'a bêje, hela çi te qewimiye?“
Wî min nihêr'i, begem kirim, hesp sekinand ser qîç'êye.

588. Min nihêr'î, ewî wa go: „Xudê ev bax' te çawa şîn kir?“
Paşê wî go : „Ezê bêjim çi te ji min t'eweçe kir,
Dijminê min ku bizan bûn, were binhêr' ku bûme şêr,
Min kir sîlh'ê xwe ez hildim, bê sîlih' ez mam bêsixbêr“.
589. Min go: „Hespê tu peya be, bin siya bax' da hinekî r'ûnên,
Şêrê Xudê naên bendê şûr û qema, awa dibên“.
T'evî min hat û em çûn mîna bav û kur'ê amin,
Zendegirtî wî ez hîştim nazikayî, sirafet, êgin.
590. Lê xulamekî min h'ekîm bû, birînê wî zû girê da,
Serê fîra birîna derxist, wir k'ew dayê herbê da.
Min jî pirsî: „K'êyî tu, ew birîn k'ê te çê kir?“
Ji bextê xwe gazindar bû û serhatî wa dest pê kir.
591. Wî go: „K'êyî, ez çi zanim, te bengzemîşî çi bikim,
Çi h'elandî aha govde, wa zenane, bihar nakim,
K'ê dêmê te wa zer kiriye, r'engê gula jê biriye,
Xudê çima ew mûm vêsand, ya destê wî vêk'etiye.
592. Şîherê min vir nêzîke, navê wêye Mûlx'azanzar,
Ez Nûradîn – P'irîdonim, lê p'adşame t'ext û bê azar,
Ev xaliya t'ev ya mine, k'îjanê r'a hûn derbaz bûn,
Ze'f biç'ûke welatê min, xizneye bi mal û hebûn.
593. Wextê kalkê m sînor k'ivş kir boyî bavê min û birê wî,
Go: „Be'rê da adek heye, ew jî te r'a lê p'adşa bî“.
Apê m ew jî zevtî xwe kir, yê min xistin kur'ê wî bûn,
Min ne dida, lê wan hil da yêrê nêç'îrê û hebûn.
594. Îro derk'etim nêç'îrê ciyê nêç'îrê ev k'enar bûn,
Min teyîrê xwe hilda û çend xortê e'slî nêç'îrvan bûn.
Min wa go eskerê xwe: „Vir bisekinin h'eta ez têm!“
T'ev xwe hilda pênc nêç'îrvan bi teyîra va şêr bûn, bi dêm.

595. Û bi kelkê em pêşda çûn, bê minet me av diqelaştin,
Qerewil dî, min go, qeyî ew meriyê mene, deng wir dihat,
Min ew wa sist h'esab kirin, t'eve hazir, zirî lêbûn.
Nêç'îr dikir, me eşq distira, em wê eşq û bê minet bûn.
596. K'ivş bû, hêrsa wan min r'abû, ku em distirên û dik'enin,
R'iya min wan gemiya birîn, qe negotin ku bisekinin,
Kurapê min hespa syar bûn, ç'ek – sîlih'ê wane dêst da,
Wan h'icûmî ser me kirin, qûjîna wan best hilda.
597. Qûr'îna wan min ku bihîst û dî birqa sîlih'ê wan,
Ji gemîçiya kelik hilda, da ser be'rê min bê guman,
K'etime be'rê, dam ber tîra, mîna t'eviyê dane peyî min,
Wana dixwest min p'êpes kin, mi r'a k'eniya wir bextê min.
598. Eskerê wan dîsa hatin, usa hatin gihîştin min,
Dîtin pêşber tişkî nakin, her aliya va dane ser min,
Pêşber wana qels nekirim, tîrê jendin namila min,
Tîr xilaz bûn, bal min neman, şikest şûrê gumana min.
599. H'eşar kirim, hindik dima, min syarî xwe avît avê,
Be'r diqelêşt mih'îna min, zende girtî man wê navê,
Çi xortê ku t'evî min bûn birînê wan gîhandin hestî,
Negihîştin min, yê dighîştin dibûn xurê şûrê şikestî.
600. Niha bira ew biqewime, çawa ku xastina Xudaye,
Xûna min ew naha bînin, mêraniya min aqilaye,
Ezê r'oja wana r'eş kim, wan r'esît kim ji r'ûyê dinê,
Ser laşê wan bikim k'êfê, qijkê r'eşe, bêwa xûnê“.
601. Wî e'gîtî ez bend kirim, dilê min bê şer' wî hil da,
Min go: „Bira, lez nek'eve, badîhewa neke derda,
Ez t'ev te bêm, emê qir' kin, wan bavêjin ji wet'en dîr,
Em herdu jî e'gîtin zor, mêrxasî me dide destûr“.

602. Min wa gotê: „Derheqa min da nebihîstiyê tu nizanî,
R'okê hêsa te r'a bêjim, hêsbûnê bikim me'nî“.
Wî go: „Gelo ji vê baştir heye şabûn li dinê da,
Îro da ez r'ewayî te dikim e'mir, biratîyê wa destûr da“.
603. Em k'etine şîherê wî, ze'f biç'ûk bû, lê p'ir' bedew,
Eskerê wî hatin giriyan bona p'adşê xwe mêranî ew,
Sûrtê xwe wa danîne xar û dikirin wan zare – zar,
Dest û sîlih'ê me r'adimûsan, bal wana ew yek bû qîrar.
604. Begem kirim û h'iz kirim çawa piştîmêr bi mêranîyê,
Pesinê min dan: „R'oja nedîr bi te dîde ew r'onayê!“
Û em ger'îyan şîherê wî ku bedew bû avaya va,
Dêmê wana wir geş dibû libasê bedew û mixer'm va.





TARÎYÊL ALIYÊ P'IRÎDON DIKE

605. P'irîdon qenc bû, syar dibû, sîlih' dida wî xebatê,
Wî gemî û kelik çê kir, esker dida wî t'erbetê,
Çiqa merî dihatin wê ew dimane zendegirtî,
Niha bêjim wî e' gîfî, çawa dijmin kir sed p'irtî.
606. Hatîn mi r'a awa gotin, dijmin îdî daye ser r'ê,
Û wî wextî hatin xuyan h'eyşt gemî ser r'ûyê be'rê,
Min derbeke gûclî lê da, r'exê gemiyê wir anî xar,
Cara duda ew welger'and, bû hewerze û zare – zar.
607. Zivir'im ser gemîke din, pozê wê girt û bilind kir,
Paşiya gemiyê avê da çû, be'rê xwe da ew mina kir,
Yê din r'evîn berbi k'enêr, ji ber ç'e'va ew bûn unda,
K'ê didîtîm, zendegirtî wana pesin p'ayê min da.
608. Em gihîştin devê k' enar eskerê me k'ete herbê,
Şer' giran bû, me li hev da, berê wana k'ete r'evê,
Mêraniya P'irîdon wî şer'î da ze'f li min xaş hat,
Şêr' da şêr bû, dêm da r'o bû, xiraviyê r'a bûbû celat.
609. Derbê gûclî ji ser hespa herdu kur'ap wî anî xar,
Bi şûrê xwe dest wan bir'in, velezandin ser e'rdê sar.
Herdu kir dîl, da pêşiya xwe, ew serberjêr xwe r'a anî,
R'oja r'eş da serê dijmin, meriyê xwe r'a şabûn anî.

610. R'ev li wan k'et, me da peyî wan, bela kir r'ast û besta,
Şîherê ku wan hilda bû, me hilda bi zora desta.
Hestû wan da me sax nehîşt, t'emam hûr kir bi kevira,
Xiznê wane ku me hildan, nedihat birin t'u barbira.
611. Xizne ewî t'ev vekirin, lê nihêr'î û mor kirin,
Herdu kur'ap dan pêşiya xwe, k'udirand û ça dîl birin,
Dewsa xûna xwe bi xûna wan ew r'ast û best sor kirin,
Wî mi r'a go: „Şikir Xudê, yê mîna te ku çê kirin!“
612. Em dizvir'în, dî, şiheliya kiriye şayînet û şa dibin,
Libasê r'eng – r'engî xwe kirine, dilê meriya pê bend dibin,
Pesinê min û Nûradîn ew didin her cî, şa dibin,
Wana digo, ji derbê we ç'emêd xûnê wê p'êl didin.
613. P'irîdon r'a gotin „P'adşa!“, mi r'a gotin „P'adşê p'adşa!“
Ewan got: „Em qûlê we, Xudê bide we dilê şa!“
Dîsa dêmê min melûl bû, bax'çê gula ne boyî min bû,
Lê nizanibûn wan derdê min... çi bigota, ew ne dibû“.





**P'IRÎDON SALIXÊ NÊSTAN –
DARÊCANÊ DÎDE**

614. R'ojekê ez û P'irîdon derk'etine r'aw – nêç'îrê,
Dev be'rê da me ç'iyak dî, h'eta sêrî e'riş birê,
P'irîdon go: „Tişkî bêjim, bi syarî vir diger'iyam,
Tişkî e'cêb min dî jêrê, dîtîne r'a ez e'cêb mam“.
615. Min pirs kir, min go: „Bêje“, P'irîdon wa ew gilî kir:
„R'okê dilê min nêç'îr xast, hespê syar bûm, egle nekir,
Li be'rê da hespam qaze, r'eşayê da teyîre amin,
Ji vir be'rê min dinhêr'î, teyîrek fir'î ji aliyê min.
616. Min dinhêr'î be'ra hêsa, be'ra hêşîn, hema ji vir,
Û hêşnaya vê be'rê da dûr va tişteke min qet'er kir,
T'u r'uh'berî nîkarîbû usa lez be'r meqes kira,
Tê dermexist ku ew çi bû, e'cêbmayî mame vira.
617. Min go: „Çiye, mîna çiye, debeye yan teyre ne nas,
Ku nêzîk bû, dî, gemiye, dorê p'erdê girane xas,
Gemîçî min dîtîn wira wexta mij li wê sahil bû,
Çardarek ku jê derxistin, şemaleke nûr li ser bû.
618. Jê derk'etin du gemîçî, herdu jî r'eş bûn mîna qîrê,
Wana çardar gîhand k'endar, p'or'ê wê zer mîna nûrê,
Ji nûra wê şewqa r'oê wê melûl bû ew wê gavê,
Şewqa wê da e'rşê jorîn, nehat xuyan r'o wê navê.

619. Şabûnê ez lez êxistim, eşqa dilê min dik'uta,
Ew gula min dûr va h'eband, wê nedî bû berf bihata,
Min qirar kir, min go: „Herim û nişkêva h'icûm kim ser,
Beza qemer ez begem bûm, ku t'une t'u berge li ber“.
620. Hesp zengû kir, ç'iya peya bûm û deng k'ete li vê şewlê,
Hespa min bû çivîk fir'i, lê sed heyîf ku negihîştimê,
Ez gihîştim k'endar dûr va, min dî şewqa wê naê xuyan,
Ew îdî çû ji min dûr k'et, ez h'eyîrîm wir bê guman“.
621. P'irîdon wexta ev gilî kir, agir gur' bû dilê mi da,
Min nikaribû xwe zeft kira, dilê kul ji hespê banzda,
Xûna sore ji dêmê min, dîsa dêm ji min hilda,
Min go: „Paşê çî qewimî, tu neke xem dilê mi da“.
622. P'irîdon wir zende girt, çî ç'e'va dît, çî ji min bihîst,
Ew berxwe k'et û derdê min giriya, îdî tişt ne bihîst,
Hêsir r'ijyan herdu ç'e'van, mîna te'viyê dur'ê şîrdan,
Mîna ewled wî dil da min, şîret kirim ez bi guman.
623. P'irîdon go: „Ax, min çî go, çî qise bû, tişkî ne r'ê“.
Min go: „Bira, berxwe nek'ev, her tiştî r'a heye sirê,
Ew bû ya ez heyîrandime, ya min bû ew hîva zerîn,
Ku dixwezî bibî heval, bibhê çî dibêm ez dil birîn“.
624. P'irîdon r'a min qise kir çî ku serê min qewimiye,
Wî go: „Çawa ez şaş bûme, tişkî usa hê nebûye,
Ne, şuxul tu anî bal min, e'fatê zor, - p'adşê Hinda,
Hêjayî tene t'ext û t'ac, qesirê mermer, r'e'ma Xuda“.
625. Paşê wî go: „Xudê da k'ê bejna tîtal, qewata şêr,
Wî xayî dike tîr û nîza, pêşda dil da cî kiriye k'êr,
K'erema xwe ji e'zmana t'ev birûskê dibarîne,
T'u car ew me bîr nake, dewsa derda wê şayê bîne“.

626. Bi ç'e'vê şil em zivir'in, pêşberî hev em r'ûniştin,
Min jê r'a go: „Pêştirî te alîk'ariyê kes nade min,
Xudê dinê xuliqandî, t'une yekî din mîna te,
Ew k'erema Xudê da ne, r'ast hatina mine t'ev te.
627. Hergê we'de neve dijmin, bedsar nave merivaya me,
Alîk'ar be bi şîreta, aqil derman kin derdê xwe,
Ez çi bikim, çawa bikim k'arê bide him min, him wê,
Ku destê min tişte nayê, dinê namînim deqekê.
628. Go: „Ew bextê Xudê daye, ji her bextî ew zêdeye,
P'adşê Hinda hatî vira, xem min r'evîn, h'unrê teye,
K'erem ke, wa min nikaribû bifikiriyama xewna şeva,
Û ez ber te disekinim çawa xulam dil û r'uh' va.
629. Çiqa gemiyê ser be'rê ne, vî şehêrî r'a derbaz dibin,
Deng û be'sê dinê t'emam virda têne bihîstin,
Vira e'se tuyê bibînî birîna xwe r'a dû û derman,
Xudê bike ku cefa te vir xilaz be, ezim guman.
630. Em bişînin gemîçiya, bira her'in herçar qulba,
Ku hîva te ew bibînin boyî k'îjanê te dî cefa,
Tu sebir ke, te nehêwirin fikirê melûl û nexêriyê,
T'une derdek ku nikaribin ez tu alt' kin bi biratîyê“.
631. Û wî gazî meriya kir, gotina xwe bîne sêrî,
Go: „Bi gemiya bik'evin r'ê, biger'in hûn şuxulê xêrî,
Wê bibînin ya bona wê Tarîyêl bûye wa sewdalî,
Hûnê cefa p'ir' bibînin, cefa hindik bikin xwelf“.
632. Her alî da wî merî şand, nehîşt cîkî sekina gemiya,
Wa h'ukum kir: „Wê biger'in, hûn bibînin îza wêya!“
Derdê dilê min bû şabûn, dilê mi da ew bû guman,
Şerm ji mi r'a, bêyî wê şa bûm û fikirê min bîne dûman.

633. P'irîdon cîda t'ext, t'ac da min, welat kire bandûra min,
Wî go: „Çawa nefikirîm û ev yeka t'erc nekir min,
Tu p'adşae Hindistanê nav û dengî bi siyanet,
Heye merî gelo ber te, te r'a neke qulix, h'urmet“.
634. Çi dirêj kim, veger'iyayê ku çûbûn herçar qulba,
R'êke çetin derbaz bûbûn, wan xistibû baran û ba,
Wana salix hilnedabûn, qe tiştê ne gotin mi r'a,
Dîsa ç'e vêm hêsir barîn û xem bûne heval mi r'a.
635. P'irîdon r'a min awa go: „Ev r'oja r'eş r'oja mine,
Xudê şe'dê gotina min, ev yek gotin p'ir' çetine,
Tu k'êleka min nîbûayî, r'ojê li min bibûya şev,
Şabûnê ez bîr kirime, derde ku ez hildame t'ev.
636. Niha îda ne hîviyê me ku ji wêya salixa hildim,
Ez namînim, berde her'im, vê yekê ez t'eweçe dikim“.
Ew ku bihîst bi hêsira wî şil kir wir ç'iya, banî,
Wî go: „Bira, derdê min te t'eze kirin wa bê me'nî“.
637. Lavayî kirin ku bisekinim, lê ez îdî nesekinîm,
Eskerê wî li ser çoka berbi min hatin ku bisekinim,
Ew digiriyay, ez digiriyay, h'ezara ez h'emêz kirim,
„Me dûr nek'ev, em te r'a qûl!“ - xayî wan ez h'esav kirim.
638. Min go: „Boyî min p'ir' çetine ku ez niha we dihêlim,
H'eta wêya ez nebînim, e'mirê hêsa ez nabînim,
T'u car hîva xwe bîr nakim, ez zanim hûn derdêm digrîn,
Badîhewa nebin berge, dilê mi da k'ûre birîn“.
639. Paşê P'irîdon anî cem min, r'ewayî min kir ev hespê han,
Wî go: „Bira, dara çinar, qebûl ke vê p'êşk'êşa han,
Zanim tişt te nelazime, îdî zêde tişkî navêm,
Ewê h'unrê xwe nîşan de, aminiyê r'a ez wê dibêm“.

640. P'irîdon ez ver'ê kirim, me herda jî hêsir dir'êt,
Hev r'amûsa, hev dûr k'etin, dilê min wê agir dibêt,
Esker, ordî t'ev digiriyan, hêsirê wan bûn k'ûraya dil,
Ez P'irîdon ça bav û kur', me hev berda wê dest û mil.
641. Wexta ji wî ez dûr k'etim, dîsa ez li wê diger'iyam,
Welat nema, neda bin p'ê, lê salixa bê guman mam,
Heyîwax, nedî yekî usa, ku salixê wê mi r'a bida,
Dilê m'r'abû, bûme de'be qirafetê meriva da.
642. Min go: „Bese ev ger'a min, min dinê da bin p'iyê xwe,
T'evî de'ba hê nêzikim, bûme de'be îdî bi xwe“.
Min wa got him Asmat'ê, him jî herdu xulamê xwe:
„Zanim, hûn min ner'azîne, cefa da we, him jî da xwe.
643. Niha her'in, min bihêlin, hûnin xayê extiyariyê xwe,
Bese çîqa we dî hêsir min barandiye ji ç'e'vê xwe“.
Wan ku bihîst ev giliyê min, dîtin dilê m't'ije bûye,
Wana gotin: „E'sebanî, me nebihîstiye te çî gotiye.
644. Pêştirî te em navînin ser serê xwe xayî – xudan,
Bira Xudê me şaş neke, tu, hespê te, me r'a guman,
T'imê em li te binhêr'in, bejna tîtal û dêmê te“.
Were binhêr', bext wê yekê diqedîne xastina xwe.
645. Xeberdana wan min bihîst, xwe dûr nexist, hîştin cem xwe,
Min hîşt ew yêr û avayê meriya kiribû hêwr boyî xwe,
Şev û r'o da peyî gak'ûvî û xezalê serê ç'iya,
Ç'iya – banî min nehîştin, t'emam dane min bin p'iya.
646. R'okê min dî ev mix'arêd dêwa li vir, cî min xaş hat,
Min h'icûm kir, tamîş nedan, k'oka wana li vira hat,
Xulamêd min hatin kuştin, wî şer'î da teyax nedan,
E'mir dame ez ber nîza, derd bûn h'ezar, dilê m'hildan.

647. Virim ez ji wê r'oja r'eş û h'eta bê r'oja mirinê,
Ez dik'evim ç'iya, baniya, dikim zarîn h'ê vê dinê,
Ev k'ulfeta min nahêle, mîna min ew dilşewitiye,
Mirinê pêştir tişkî mayîn min bextê xwe nexastiye.
648. T'enê piling bi bedewiyê dêmê wê dike bîra min,
P'ostê piling ez h'iz dikim, p'ostê wiye libas bona min,
Ev k'ulfet k'incêm didrû, bextê mi r'a bûye heval,
Badîhewa şûr saw didim... pê xwe naxim eva çend sal.
649. Pesinê babet nikarin qe bidin meriyê zane, şuret,
Bîranîna undakiriyê e'mir didin ew min feqet,
Îdî de'ba cuda nabim, bûme de'be wê r'ojê da,
Ji Xudê xwe t'eweqe dikim t'enê mirinê bide mi da“.
650. Lêxist dêmê xwe wî qelaşt, sûrtê gulî t'ev kire xûn,
R'engê k'arbar kire şebe, dêmê bîlar kire berhûm,
Ew digiriya, hêsir dir'êt, ji bijanga diniqfî xûn,
Li ser çoka ber dil dida wê k'ulfeta dîle, beyît'ûn.
651. Wexta ew hat ser h'emdê xwe, go Asmat'ê û Avt'andîl:
„Min derdê xwe t'ev bîr kirin, derdê te r'a ez bûme dîl,
Min derdê xwe t'ev te r'a go, - e'mir û we'de min bûn ce'nme,
Niha her'e, gula xwe bibîn, we'deye, ew hîviya teye“.
652. Avt'andîl go: „Te dûr k'evim, zanî bira, tamîş nadim,
Ku dûr k'evim hêsirê xûnê ji ç'e'vê min betal nabin,
R'ast dibêjim ne şîrete, çi dibêjim tu guh bidê,
Wexta ku tu xwe bikujî, bi wê yekê şa nakî wê.
653. Gava h'ekîm ku nexweşe, çîqa bok' be, çîqa zane,
Bona dilê wî binhêr'in gazî h'ekîmkî din dike,
Ku nexweşiya wî bibîne, jê r'a bike derman û ç'ar,
Ze'f hêsaye ku şîret kî bendê nexaş, xayî azar.

654. Çi ku dibêm tu wê bibhê, ne ku dîna, ji aqila,
Ne carekê, tu sed carî guh bidî min bara dila,
Meriyê şewitî û hêrsk'etî r'ê navîne bêyî derd, kula,
Ez dixwezim wê bibînim, min dişewitîne h'uba dila.
655. H'erim h'uba xwe bibînim û wê cardin bicêr'binim,
Çi ku serê min qewimiye yek yek jê r'a ez gilî kim,
Navê Xudê û gola şîn, zanim tu min bihar dikî,
Em sond buxun ku bîr nekin bi biratî yek me yekî.
656. Heger tu ku soz bidî min, ku hêwra xwe naguhêr'î,
Ez sond dixum te bîr nakim, heger tu min nekî bîrî,
Ezê bêm, lê te bîr nakim, boyî te hildim ez salixa,
Xudê şe'de, ez nahêlim tu bigrî boyî h'izkiriya xwe“.
657. Tarîyêl wa go: „Xerîbin em, te h'iz kirim ez wa bidil,
Tu çetin min dihêlî vir, çawa gulê bihêle bilbil,
Te bîr nakim, Xudê şe'de, t'imê tuyê li r'ex min bî,
Ezê hîviya wê r'ojê bim, r'oja cem min tu mêvan bî.
658. Dilê h'esîn dîndara te cardin bizvir'e berbi min,
Dilêm îdî nak'eve ç'iya wek gak'ûviya ew bê amin,
Herge ez te bixapînim, nemam derêm, bêm hêngavtin,
Te binhêr'im, dilê minê xilaz be ji mija demin“.
659. Wira wana soz dane hev çawa bira, dilê sade,
R'engê xweyî dur'guhartî, ada wan ya e'silzade,
Wana usa ji hev h'iz kir û xemê xwe dane bêrî,
T'emamiya şev derbaz kirin bi xeberdan şevbihêrî.
660. Avt'andîl jî t'evî wiya hêsir r'êt ji k'anê ç'e'va,
Ew r'amûsa û da ser r'ê, şebeqê r'a liviya r'ê da,
Tarîyêl sekinî wa p'eşmûrde, tewiya bû bin barê derda,
Avt'andîl ji mêrga buhurî, dêmî melûl, hêsir ç'e'v da.

SOT'A R'ÛST'AVÊLÎ

661. Asmat'ê em ver'ê dîkir, dida sonda bi dilê k'el,
Destê xwe wê t'ewar dîkir, hêsirê wê qul dîkir sel,
Lavayî dîkir: „Zû vegere“, - diç'ilmisî wek pîrozang.
E'gît wa go: „Xûşkê, mi r'a îro şûnda tuyî berbang.
662. Mal da ze'fî ez namînim, we nahêlim wê r'ojê da,
T'enê ku ew vir bimîne, neçe alîkî mayîn da,
Du mehc da neyêmxuyan, bizan be ku soz p'oşmanim,
Yan qeziyak min qewimiye, mirîme, ne e'yanim“.





AVT'ANDÎL VEDIĞERE E'REBİSTANÊ

663. Avt'andîl ji wira dîr k'et, lê derdê wî t'im pê r'a bû,
Dêmê xweyî gul p'encr'û dikir, dest xûnê da wir sor dibû,
Xûn dir'êjiya li ser e'rdê, r'e'wara ew xûn dalast,
R'iya dirêj wî kin dikir, hespê dabû ser r'iya r'ast.
664. Zûtrekê gihîşte wir ku hîştibû eskerê xwe,
Pêr'a – pêr'a ew nas kirin, şa bûn hatina serekê xwe,
E'lamefî dan Şermadîn, ji dîr ew hat berbi wiya,
„Ew hatiye boyî k'îjanî em melûl bûn“, - esker digriya.
665. Şermadîn hat ew h'emêz kir û r'amûsa wir destê wî,
Ji şabûnê hêsirê ç'e'va lê bûn e'ynî ç'em û kanî,
Wî go: „Xudê li îşiyarim ez, ev dîtina min xwe xewn nîne,
Ez hêjayî vî bextî bûm, mirin mi r'a minet nîne!“
666. E'gît bi dil ew silav kir, dêmê xwe da ser dêmê wî,
Wî go: „Şikir ji te Xuda, vê carê jî me hevdu dî!“
Gire – gir wir t'emene bûn, bi e'defî ew r'amûsan,
Biç'ûk, mezin wir şa dibûn, digotin û eşq distiran.
667. Hatin wira ku hîviyê bû birceke bedew narî,
Wir bajarvan bûbûn muhim, hatibûn dîtina wî camêrî,
E'yan, k'ubar, bextewarî r'ûniştin ber t'extê şayê,
Ziman jî bê h'unur bû ku bida met'h'ê wê êvariye.

SOT'A R'ÛST'AVÊLÎ

668. Şêmadîn r'a wî kir gilî, çi dîtibû, çi bihîstibû,
Çawa wî dît ew e' gîta yê ku dêm va e'yînî r'o bû,
Qise dikir, ji ç'e'vêd r'eş te'viya hêsira gur' dibarî,
„Qesir, k'oç'k mi r'a yekin, wexta ezim bêyî wî şêrî“.
669. Şêmadîn awa jê r'a go: „Pê neh'isiyan çûyîna te,
T'u kesî r'a min ew nego, min qedandiye t'emîna te“.
Wî k'êf kir û hêsa dibû, wê r'ojê t'u ciya da neçû,
Paşê r'abû, hespê syar bû, k'et r'ê çawa sibe r'on bû.
670. Çî wî r'a bû k'êf û şayî, hêsabûna wir serê r'ê,
Şêmadîn dabû pêşiyê ku mizgîniyê bide p'adşê,
R'iya deh r'oja sê r'oja da bir'i bêxew û h'îşiyarî,
Wî xwe berbi Şexsê dik'işand, ezrahîlî, şbêt şêrî.
671. Wî wa cab şand: „P'adşê e' gal, xayê t'ext û t'acê miqer'm,
Qursax dikim awa bêjim, t'eslîmim ez û dilî germ,
Ew e'gîtê ku me dî bû, bê salix û sûlix ma bû,
Niha zanim, ezê bêjim, sur'a wiya azir'o bû“.
672. R'ostêvan bû p'adşê e'yan, dilr'e'm bû ew û xwe guman,
Şêmadîn wê t'emam gotê, ser nîga sekinî heman:
„Avt'andîl wê zivir'ie, wî dîtiye şêrê e'yan“.
P'adşê wa go: „Mi r'a xem bû, nehîştîm Xudê bê guman“.
673. Wir Şêmadîn awa gote T'înat'îna nûrşemal:
„Avt'andîlê niha te r'a bîne cavê, h'usulcema!“.
Qîza bik'ir eşqa cewada mîna r'oja nûre nûrtîn,
Wê r'ewa kir meriyê dorê, hedayê baş da Şêmadîn.
674. P'adşa syarî çû pêşiya Avt'andîlê ji dûr hatî,
Wî h'esav kir ew yek xwe r'a borcê xweyî me'rifetî,
Bi h'esîna dilê wana hev h'emêz kir, vekirin mil,
Meriyê pê r'a t'ev k'êfxweş bûn, dilê şabûn bi eşq û dil.

675. Avt'andîl ji hespê banzda, t'emene bû ew ber p'adşê,
R'ostêvan jî bi dil şa bû, ew h'emêz kir mîna bavê,
Eşq û r'azî hevr'a k'etin ew dîwana p'adşê mezin,
Hatina e'gît dilê wan da r'axist gulê geşe pesin.
676. Ew r'oja r'o, şêrê şêra t'emene bû li ber p'adşê,
Bîlar û gul, şeba r'eş wê, bûn t'imt'êla şayê, r'ewşê,
R'oê nûra xwe geş r'o kir, da ser dinê wê r'onayî,
T'extê wî r'a qesir ç'ûk bû e'rd, e'zman bû layîq heqî.
677. R'ûniştin ber t'extê k'êfê, kirin k'êfke babet hêja,
Avt'andîl da ber sîngê xwe, mîna kur'lê şa bû p'adşa,
Bedewiyê herdu usa bûn, kuliye berfê, xûsiya sibê,
Lal û dur'wê bi merdayî bela dikir p'adşê h'ubê.
678. K'êf xilaz bû, wir bela bûn, çûn malê xwe eşq û şayî,
Gire – gir wir bemedan wan, e'gît bal wan bû mêvanî,
P'adşê pirs kir, wî qise kir, çi li serê wî qewimî,
Çawa ewî Tarîyêl dîtiye, ew yeka wî kire gilî.
679. „E'cêvmayî hûn nemînin, bi axîna wî bîr tînim,
T'enê r'oê ez dikarim bengzemîşî dêmê wî kim,
Çi meriyê ku ew didît, h'iş û sewda unda dikir,
Lê ew gula nav sitriya da, h'esîna wî hîva bik'ir“.
680. E'mirê xirav bû p'ara k'ê, sirgûn dibe şayî ji wî,
Qamîşê ter'lê dibe k'elem, unda dibe r'ê li ber wî.
Avt'andîl ku ew bîr anî, hêsira ç'e'vê wî kirin kanî,
Wî digo serhatiya wî, çi bihîstibû ji wî e'yînî.
681. „Ew şikevtê tarî da bû, zorê dêwa sitendibû,
T'enê cariya h'izkiriya wî cem bû, wî r'a dîrek bû,
P'ostê piling wî werdigirt, dest k'işandibû ji r'ih'ela,
Agirê h'ubêd dişewitî, e'mir wî r'a bûye kela.

682. Wî xilaz kir serhatiya Tarîyêlê dili birîn,
Wî qise kir çawa ew dî xayê h'ukum û lut'fê şîrîn.
Wan ku bihîst pesinê gula mîna xûsiya sibaye dur',
Gotin: „Îdî çi diger'î, te mêraniya nebînayî kir“.
683. T'înat'în jî bi eşq şa bû, wê ku bihîst be'sa xêrê,
Avt'andîl xwe neda paş, dûr nek'et ji t'extê şayê,
Û xulamê T'înat'înê herema wî da bû dîsa,
Gazî kiribûyê... eşqa şêr bi ziman bêjim, nayê usa.
684. Bi dilê eşq derk'et û çû, wî xemê xwe sipartibû bê,
Lê r'eng li wî şêrî çûbû yê heval bû t'evî şêra,
Ew e'gît bû, xemila e'mir, mîna dur'ê wî şewq dida,
Bi xasîna dil t'ev h'izkiriyê bi h'ub ewî xeber dida.
685. Aha, wê nûra şemal r'ûniştiye ser t'extê xwe,
Qeyî dibêjî dara çinar avdaye Feratê ava xwe,
Lê dihatin buriyê bedew û p'or'ê r'eş r'engê şebe,
Ez çi... bira zanê Hur'im bidin pesnê wê bê şube.
686. Wê li ber xwe k'ursî danî, Avt'andîl da r'ûniştinê,
Dilê wan da h'ubê fûr da mîna p'êlê be'rê dinê,
Bi dilê şa, zarê şîrin ya dilê xwe wana gotin,
Wê go: „Te ze'f cefa dî, çi digeriyayî te dî çetin“.
687. Wî go: „Wexta xasitina meriya mîaser dike, tu bihar ke,
Ew bîr nayîne cefa dîtî, wê buhurî h'esav dike,
Min dî dara sipindarê ava e'mir hatibû avdan,
E'yan gul bû, diç'ilmisî, sorayî lê nedihat xuyan.
688. Wira min dî dara çinar tewiya bû ew bê guman“.
Wî go: „Ew çû û unda bû bîlara min ez lê guman,
Çi agirî ez dişewitim, dişewite ew wî agirî“.
Bi axîna derheqa Tarîyêl qise dikir wî bi girî.

689. Qise fikir wî derdê xwe, cefa dîtî serê wê r'ê,
Û wî go, - ku çawa Xudê alîk'ar bû ser wê ox'irê,
Heyîwax, çawa vê diniya p'ûç' ew e' gîta kir beyanî,
De'ba r'a ew bûye heval, digrîn t'ev wî ç'iyâ û banî.
690. Tu pirs neke, dikarim ez bidim pesina wî hêjayî,
K'ê carekê wî bibîne, begem nake diniya r'onî,
Wî binhêr'i yan jî r'oê, ç'e'v t'ije dibin hêsirê xûnê,
Gul bû k'irkût, zûtirekê wê şîn bike melûl t'enê.
691. Wî yek bi yek jê r'a go, çi dîtibû, çi bihîstibû,
Go: „Lana wî şêrî wira şikevteke p'ir' mezin bû,
K'ulfeteke t'enê cem wî, ziyaretiye û dilovan,
Heyîwax, diniya didî meriya tu hêsirê, derdê giran“.
692. Wextê ewê t'emam bihîst, go: „Mîaser bû xwestina min“.
Ser dêmê wê nûrê list mîna hîva zere amin.
Wê go: „Gelo bi çi şa kim wî e' gîtê dilî kovan,
Çi dikare bibe derman boyî qedirê wî derdê giran“.
693. Avt'andîl go: „Badîhewa mêrê mêr be, ew soz nade,
Wî bona min xu şewitand, k'ê bona wî serê xwe nade,
We'de ku hat, gere herim, e'mir boyî wî t'exsîr nakim,
Min bi r'oja xwe sond xariye, boyî k'îjanê e'mir dikim.
694. Gere bira bona birê nehêvşîne e'mir û r'uh',
Dilê xwe dil r'a têke p'êşk'êş, h'ubê têne r'iya fer'uh',
Derdê h'izkiriye h'izkirî xwe r'a hesav ke derdkî mezin,
Bêyî wî e'mir mi r'a şîne, e'mirê derd nabe pesin“.
695. R'oja wî go: „Mîaser bûn çi ku xem bûn dilê mi da,
Ya sereke ku tu hatî, te dî şêrê meyî unda,
Dilê te da hê gur' bûye evîniya min û h'iz kirin,
Dîtina te r'a dilê min bi h'ub hate derman kirin.

696. E'mirê meriya tê guhar'tin wek xeyîsetê we'dê salê,
Carna gur'îna e'wrane, carna r'oye k'en ser lêvê,
Xudê cefa zor da bû min, îro bi eşq ez dik'enim,
Ku dinê eşq û h'ub heye, badîhewa çi difikirim.
697. Xeyîsetekî teyî baş heye, tu sonda xwe p'êpes nakî,
Bendekî te jê h'iz kir, h'eta mirinê h'iz dikî,
Birînê r'a lazime derman, dilê xwe vekî dûr binhêr'î,
Ya min çetine bêyî Şexsê xwe, çi be r'oja min, binhêr'î“.
698. E'gît wa go: „Ez bal te me, derda derdêm giran kiriye,
Merî bihêlî germ nake ava sur'ê qer'imandiye,
Badîhewa ji jêrê r'amûsî jor Şexsa e'rşa,
Ku bal te me derdke, ji te dûrim bi h'ezara.
699. Ax, k'ê zane ser van r'îya k'engê h'ubê min bişewitîne,
Li k'u tîrke tûje xedar wê dilê min da cî bibîne,
Vê r'ojê da ji e'mirê min, nîv çarêk wê mi r'a maye,
Dixwezim derdê xwe veşêrim herek'et mi da nemaye.
700. Şîretê te min bihîstin, kir mêzîne xeberê te,
Gula sitrî tuyê bibînî, wan sitriya ez hêngavtime,
Lê tu bibe r'oja nûrt'am, qe deqekê ç'e'v nade hev,
E'mir da ça bîranîn, tu nîşanekê bide ber ç'e'v“.
701. Ew e'gîtê xeber şîrin, hêlma r'e'mê bû ew bi xwe,
Usa berbi r'oê dibû, çawa dersdar şagirta xwe,
T'or'ê sedef wê girt daê ku bal wî bû ça bîranîn,
Xudê bike eşqa îro miqer'm be bin vê te'va tîn.
702. Zeyînete, ew hev tên hûnan bîlar û lal, t'ev şeba r'eş,
Yan r'ex sipndarê da dara bî tê avdanê, vedibe geş,
Yê nabîne bext ne r'azî, yê dibîne, cinetiye,
Yê dilk'etiye dûrk'etiye, bext jê r'a ne dûmandiye.

703. Wana herda hev dinhêr'î, şa dibûn bi evîna xwe,
Hev dûr k'etin û e'gît çû dilî azar dest h'uba xwe,
Şexsa wiya hêsir dir'êt, mîna be'rê dil lê r'abû,
Wê go: „Xudê, bextê min ji xarna xûna min t'êr nebû“.
704. Wa dilkovani k'etibû r'ê, sîng dik'uta û şîn dikir,
H'ub li meriya dil sist dike, çiqe sert be mîna kevir,
E'wr bik'eve li ber r'oê, wê bike sî deşt û besta,
Ji dilk'etiyê yê dûr k'eve, ew navîne r'o r'ojgara.
705. Xûn û hêsir t'evî hev bûn ser dêmê wê r'oja qijî,
Wî go: „Heyî wax, alîm nake îro şûnda r'oja mi jî,
Îdî çima wek almasê dilêm dik'eve tîra buriya,
H'eta car din wê nebînim, tu bêk'arî mi r'a diniya.
706. Bextêm r'okê cinetê da mîna darkê danîm, av dam,
Wî jî îro dam ber tîra, k'êr mi r'a kir, xûnê hildam,
Dilê mi da agir gur' kir, t'ele danî ber nigê min,
Ku ev diniya h'ik'iyate p'ûç', t'eze fe'm kir ew yeka min“.
707. Wa digiriya, hêsir dir'êt, dilerizî ew t'a girtî,
Diçû melûl û serberjêr, fikir axîn mîna girtî,
Dûrk'etina h'izkiryê şewat gur' kir dilê wî da,
Heyîwax diniya, bext meriya dibe k'efen axiriyê da.
708. Hate malê, digiriya, dil sist bûbû, h'iş lê diçû,
Lê bi fikira h'izkiriya xwe bîr nedikir, ew r'ex wî bû,
Zenane bû mîna qîşê, mîna belga qîç'ik bûbû,
Bunhêr'e tu, Şexsa xwe dûr ew gul çawa berhûm dibû.
709. Bê îsafe dilê meriya e'ce ew û e'ce net'êr,
Çiqe derda ze'f dibîne, ew şayê r'a dibe sixbêr,
Dilê kore, naê bendê, hev dernaxe û nas nake,
Ne ber mirinê, ne qewatê t'u cara ew xwe qels nake“.

SOT'A R'ÛST'AVÊLÎ

710. Dilê xwe r'a wexta wî go, - pirsê dile layîqî dil,
Wî da dest xu t'or'ê sedef ku dabûyê r'oja ç'e'v şil,
Mîna cêrga dirana li destê xwe wî ew p'êça bû,
Da ber lêva, ji hêsira, qeyî go, xûsî wê hildabû.
711. Berbangê r'a merîk hat wir, t'eglîf kir ew dîwanxanê,
Ew r'abû çû, xwe k'ubar girt, hê ew qûl bû, qûlê xewê,
Dihatî wê boyî dîtina wî ji her dera û her alî,
Haziriya xwe didît p'adşê boyî nêç'îrê, def, alayî.
712. P'adşa hespa xwe syar bû, kirin zingîn def, k'er'ana,
Ji girmîna def, k'er'ana dengê hev ne dibihîst wana,
R'ûyê r'oê hate girtinê ber teyîrê nêç'îrê wira,
Nêç'îr kirin, xûn wir bû ç'em, deşt û besta r'a k'îşiya.
713. Ji nêç'îrê ew zivir'in, dilê wan da eşq û şabûn,
Gire – gir û serek wira dihatin û hev t'op dibûn,
P'adşa wê ku ser t'ext r'ûnişt, nûr dibarî t'extê p'adşê,
Ji dengê çeng û k'er'ana zingîn k'etibû nava hewê.
714. E'gît li r'ex p'adşê r'ûnişt, şîrin wan xeber da,
Lêvê wan bûn bîlar û lal, diranêd wan cêrgê mircan,
Dûr va esker, nêzîkî wan seresker bûn û qumandar,
Ji her alî û her devî navê Tarîyêl danîn ser zar.
715. Bi dilê xem zivir'î mal, ç'e'v dibarî hêsirê germ,
Ber ç'e'vê wî h'izkiriya wî naz diger'îya aha bê xem,
Mîna sefiya wî banz dida, xew nedik'et ç'e'vê wiya,
K'îjan dile ku şîretê sebrê bike ew guhdariya.
716. K'et nava cî, wa fikirî: „Eşq, gumanê ça bidim dil,
Te dûr k'etîme darî çînar, qamîşê ter'te r'a sûrmil,
Derd û kulî nedîtiya r'a, dîtiya r'a tu îşqa ç'e'va,
Nehêjame dîtina te... carna were xewna şeva“.

717. Xeber dida û digiriya, dikir axîn dilê kovan,
Dil r'a wa go: „Sebre kaniya zanebûnê, ewê bizan,
Derdê xwe r'a ku nenelin, çawa bikin, em çi bikin,
Şayê Xudê neyaz dike, derdê giran gere bibin“.
718. Paşê wa go: „Dilo çiqa mirinê tu neyaz dikî,
Başe, e'mir da tamîş dî, eşq û şayê tu unda kî,
Lê veşêre, nîşan nede tu alava birîna xedar,
Ku h'uba xwe aşkela kir, evîndare îdî bêç'ar“.





**AVT'ANDÎL JÎ R'OSTÊVAN P'ADŞA T'EWEQE
DIKE KU WÎ BERDE.
XEBERDANA WÎ T'EVÎ WEZÎR**

719. Berbangê r'a e' gît r' abû kinc xwe kirin, hewa bû sar,
Go: „Xudêo, usa bikî sur'a min wir nebe dîhar“.
Ji dil sebir t'eweqe kir: „Dilo bibe û tamîş de“.
Syarî ajot, berbi mala wezîr diçe, r'ê hil dide.
720. Pêşiyêda hat wezîr, wa go: „Mala mi da r'oê şewq da,
Eşq nagihîje şabûna min, ev h'esîn bû dilê mi da“,
Wî bi şabûn da pesinê wî, e' gîtê lê bûbû mêvan,
Mêvan gere bi qedir be, şabûn malxwê bike e'yan.
721. Lê wezîrê jarî dilr'e'm mêvanê xwe wî peya kir,
Xalîçêd xas r'axist ser r'ê, baqê gula ser t'ije kir,
Mêvan mal da usa şewq da çawa ku r'o e'rşê jorîn,
Gotin: „Ba ji r'oavê gul, sosina anî vir bîn“.
722. R'ûniştibû, k'ê lê dinhêr'î unda dikir h'iş û sewda,
Xur'a h'urmet h'esab kirin ku qulix kin ox'ira wî da,
H'ezar carî ax k'işandin, xur'a t'eva pesinê wî da,
Go: „Bela bin!“ ... t'ev r'abûn çûn, ew wezîr va mane cî da.
723. Wexta t'emam ji odê çûn, wa berbir' bû bi gotinê,
Go: „T'u şuxul dîwanê da ji te naê veşartinê,
Çi ji bêjî, ez wê zanim, p'adşa t'imê gur'a te dike,
Derdêm bibhê, bibe derman, derdê mi r'a ç'arê bike.

724. Dişewitim ez boyî bextê wî e' gîfî, h' izkiriya wî,
Nikarim ez, tamîş nadim, dimirim boyî dîtina wî,
Wî boyî min r'uh' t' exsîr nedikir, qe tişt nekir min bona wî,
Meriyê te r'a ku momine, tu momin bî gere boyî wî.
725. Dîtina wî dilê min wê kiriye t'or'ê, ez bend kirime,
T'ev dilê min sebra min jî bi guman ez sexîr kirime,
Dişewitîne nêzîkî xwe, r'oja Xudê xuliqandiye,
Asmat' boyî min gendî xûşke, k'engê xûşkê cuda kiriye.
726. Wexta hatim, jê r'a sond xar, ad û qîrar min qesem kir,
Dîsa ez bêm te bibînim, gotina xwe min cî r'uh' kir,
Ezê Şexsa te biger'im, nahêlim te tariyê da.
We'deye, ez gere her'im, agir t'ije dilê mi da.
727. R'ast hatiye ev xeberê min, ne xeberê meriyê virek,
Hîviya mine, ez nagihîjmê, dilê mi da agire berk',
Ez ada xwe p'êpes nakim, dînim, nahêlim wî dîni,
Yê ada xwe ku p'êpes ke, xayî qedir qe dibîni.
728. Her'e dîwana R'ostêvan, bêje çi ku te r'a dibêm,
Ez sond duxum bi serê wî, te wezîrî r'a wa dibêm,
Nebe berge, ez namînim, ku min bigr'e, çir'a me ez,
Her'e bêje, alîk'ar be, ku namînim ox'ira ferz.
729. Jê r'a bêje: „T'une merî ku pesinê te bide bi k'în,
Bira Xudê te e'yan ke h'izkirina mine heqîn,
Lê dilê min şewitandiye wî e'gîtê bejna çinar,
Deqê da wî dil min sitend, xweyîkirina dil nekir dîhar.
730. P'adşae min, r'ojam bêyî wî, ne t'u r'oje li dinê da,
Wî hildaye dilê min wê, bê dil k'ê dijî dinê da,
Alîk'arê wî bim ku ez, ew siyanete navê te r'a,
Heger tişteke min nikar bû, h'elal derêm ada xwe r'a.


731. Ez ku herim, bira dilê te min nemîne û nezûze,
Bira Xudê k'erema xwe bike, çawa ew dixweze,
Xudê bike t'im tu alt' kî, bira yê te bêne cem te,
Ez ku neyê, tu mih'k'em be, bira sist be dijminê te“.
732. Awa dîsa wî got wezîr: „Kin dibir'im xebera xwe.
R'abe her'e tu cem p'adşê, wê ew diçe dîwana xwe,
T'eweqe ke ku min berde, t'enê ew yek te dik'eve,
Çawa r'uşet sed h'ezar zêr'ê zer, bê minet be, ne h'esabe“.
733. Wezîr k'eniya, wî awa go: „R'uşeta te min nelazime,
Te ku berê xwe daye min, boyî min bextî p'ir' mezine,
Ku p'adşê r'a yek - yek bêjim çi ku min te bihîstiye,
Bê hedayî min nahêle... k'ê hedaya zirar dîtiye.
734. Bi serê wî ez sond dixum, cîda ewê min bikuje,
Zêr'ê teyê te bimîne, mirin mi r'a bibe doje.
Min bikuje, heger e'mir çêtir heye dinê da tişt.
Ez navêjim, ne dibêjimê ev şuxula, şuxula ne tişt.
735. Îdî t'u r'ê ber min t'une, t'enê mirin niha min tê,
Ese ewê min bikuje, bêje: „Çi pirs dev te der tê,
Çima tu qe ne fikirî, te ne gotê wezîrê dîn“,
Ji kuştinê, mirin başe, zanim ser min wê bikin şîn.
736. Heger p'adşa ku me berde, lê esker tê xapandinê,
Ça bihêlin tu dûr k'evî, bimînin bê serek dinê,
Tu ku her'î dijminê me şûr û nîze r'abin ber me,
Ew qe nabe, çawa ç'ivîk dikare bibe teyîrê dogme“.
737. Bi ne'lîna e' gît giriya: „T'ek ma dilê xwe xim k'êrê,
Ax, tu wezîr çi dibînî, te nedîtiye derdê h'ubê,
Te nenasin xeberê h'ub, aminayî, soz û qîrar,
Ku nenasî van xebera, te r'a yeke k'ar û zirar.

738. R' o vegeriya, ez nizanim, çi h' ukum kir ku vegeriya,
Ya baş ewe em alî kin ku nûra wê germ be diniya,
Derd û kulêm k'ê e' yanin, t' eva baştir ez wê zanim,
Xeberdana bede' sla r' a dil qul dike, ne nezanim.
739. Ez çi k' arê dikarim bidim p' adşê yan jî eskerê wî,
Wexta mîna meriya sawê derdê xwe r' a me sewdalî,
Başê her' im, r' uh' ê meriya merî sonda dicêr' bîne,
T' une derdek ku Tarîyêl ducarkirî wî nebîne.
740. Niha wezîr dilê şikestî xeberê te çawa derc kir,
Ku dewsa min h' esin bûya wê bibiya mûm li ber agir,
Ç' emê Gêhonê bir' êjim, dîsa hêsirê wîne hê gur' ,
Alîm bike, k'ê zane ku dibe h' ewcê min bî bi sur' .
741. Ku nehêle, ezê herim usa tişkî ew nebihê,
Derdê birê xwe r' a bijîm, agirê dilê xwe bidim bê,
Bi gunê min tu naşewîtî, heger me' niya te negire,
Heger hêrsa xwe bir' êje û te bide r' ih' îna me' .
742. Wezîr wa go: „Ez jî hildam ew agirê te dişewitîne,
Ez ku hêsirê te dinhêr' im, tarî dinê wê hiltîne,
Gotin negotinê baştîre, gotinê te zirar e' se,
Qe xem nîne, ezê bêjim, bimrim, e' mirêm qurbana te“.
743. Wezîr wa go û k' ete r' ê, çû berbi dîwana p' adşê,
Dît p' adşa wê r' ûniştiye, nûr t' erefe mîna r' oê,
Wezîr lerizî, tişt nego, sekinî ew wê bê guman,
Ker' fikirî, bê xeberdan lazime veke vê giriya han.
744. P' adşa ku dî wezîrê wî ker' sekiniye me' de kirî,
Go: „Çi heye, çi qewimiye, çi usa tu melûl kirî?“
Wezîr wa go: „Ez çi bêjim, min dişewitîne derdekî wa,
Be' ske nexêr min aniye, hêjame ez derba şûra.

745. Derdêm haqa mezin nîne, ne jî derdê min girantir,
Sawê digrim, lê ez zanim, qasidin ji sawa dûrtir,
Avt'andîl te t'eweqe dike, gotinê r'a dik'îşe ji te,
E'mirê dinê bêyî Tarîyêl, heyî wax, jê r'a ew mirine“.
746. Bi dilê saw û serberjêr wî go çi ku ewî zanibû,
Paşê wa go: „Ji gotina min te t'erc kir ev çawa bû.
Çi r'ojê da min ku ew dî, hêsir dir'êt wek ç'em – kanî,
Ne niheqî vê hêrsa xwe tu bir'êjî xûnam e'ynî“.
747. P'adşa bihîst, ser dêmê wî hêrs bû p'erdeke tarîstan,
Û r'eng lê çû, mirûzê wî merî dikirin bê guman,
Wa kir gazî: „Te çawa go, k'ê dil dikir bê, be's ke wa,
T'enê nemerî dikarin bibhên kêmaqîla gilîke ha.
748. Tu dilekî usa hatî qeyî dibê aniye be'ske xêrê,
Gotina te hê xirav bû, ça dizîva bêyî min k'êrê,
Zimanê te çawa ger'îya, bêh'îş bêjî wê xeberê,
Ne ku wezîr, tişt dernayê te evsenê hêsir dinê.
749. Çawa merî xwe zevt neke xeberê te'l bêje p'adşê,
Bêh'emdî xwe ew bide der h'ezar û yek giliyê ner'ê,
Ax çima ez ker' nebûm ku ji te bihîst ev xebera,
Te bikujim, gunê teyê min bimîne badîhewa“.
750. P'adşa wa go: „Heger ewî neşandayî bal min qasid,
Minê serê te lêxista ji k'îjanî tuyî wa zid,
Her'e, bice'm, nep'akê dîn, menceneqê bêfe'm, h'eyîwan,
Meriyê baş xebera baş, çi gilî bû te kir beyan“.
751. Wî r'ûniştok hilda avît, li dîwar xist, kir hûr û xaş,
Ew derba wê li dîwar k'et, wezîr tirsîya, ma h'eyîr û şaş,
„Çawa te go ku min dûr k'et, şêrê Xudê ez xapandim“.
Ç'e'vê wezîr hêsir k'etinê, r'eng sipî kir, kir birme – birm.

752. Saw k'ete ser, ziman lal bû, nikaribû wir bisekine,
Mîna r'ûviya ji wir derk'et, ew sews bûbû û evsene,
Eşq k'et hundur', melûl derk'et, zimanê wî lê bû xenîm,
Dijmin nayîne serê dijmin, çi dike zimanê ne t'eklîm.
753. Go: „Xudê çi gere bida, ku layîq biya vî gunê min,
Çima aha min ew xapand, r'eş kir r'oja xweye amin,
K'ê jî hebe, ça qursax ke, negire qedirê p'adşae xwe,
Çiqas dixweze h'izkirî be, nak'ene ew bi bextê xwe“.
754. Wezîr giriya bextê xwe r'a, çû serberjêr, me'de kirî,
Ner'azî gote Avt'andîl, ji dêmê wî je'r dibarî:
„Bona çi min gur'a te kir, yan qasanc kir min r'oja xweş,
Min gotina t'emîya te r'a unda kiriye serê xwe fe'ş“.
755. H'enek dikir, r'uşet dixast, lê dinhêr'i ç'e've hêsir,
E'cêb bû ew, çawa didît xeberê pê loqet dikir:
„K'ê gotina xwe p'oşman be, ew xêrxaza xwe dûr dide,
R'ind gotine, „R'uşeta zor ce'nmê da jî r'onayî dide“.
756. Zimanê min nayîne bêjim, çawa kirim wî ez sosret,
Îdî nep'ak, dîn û e'wt'ar, îdî bêfe'm, h'eyîwan, seqet,
Bê h'işim ez serê vala, merî nînim nav meriya da,
Xudê dest da ber destê wî ez nekirim cêrga miriya.
757. Ne axir min zanibû, ez çi dikim, çiyê şaşîya min,
Min zanibû wê hêrs k'eve, ewe derdê mezin boyî min,
Ji qirara Xudaê min kes nikare ber bir'eve,
R'ih'îna te da serê xwe didim, dîsa dibêm ya xêr eve“.
758. E'gît wa go: „Ne nikarim, ez ku neçim, t'u r'ê t'une,
Gula sor ku diç'ilmise bona bilbil ew mirine,
Gere avê ew biger'e boyî wê gula xwe h'izkirî,
Ku nikar be avê dest xe, bêyî h'izkiriyê çawa bijî.

759. Ne bêyî wiya ez nikarim hêsa r'ûnêm, ne jî r'azêm,
Başe her'im ç'iya – baniya t'evî de'ba li ciyê dêm,
Vî h'alî da ez çi dikarim k'arê bidim esker, welat,
Başe keskî te t'une be, ne ku yekî wa e'lewat.
760. Dîsa ji wî t'eweqe kim çiqa hêrsa xwe ew bîne,
Dibe fe'm ke û hêsa be, ku h'alê min ew bibîne,
Ku nehêle, ezê her'im wexta guman qe t'une be,
Ez ku bimirim, diniya p'aram bibe xwelî û bela be“.
761. Wa xeber dan, wezîr vekir t'exte, sivre, layîq, hêja,
Qedirê mêvanê xwe wî girt bi hedayî û p'êşk'êşa,
Meriyê pêr'a ku hatibûn, ahil, cahil, t'ev r'azî kir,
Hev dûr k'etin wexta ku r'o diçû ava, k'arê xwe dikir.
762. Bejina çinar, dêmê narîn, sed h'ezar zêr'ewî danî,
Sê h'ezar libas û r'ih'elê xas û etles nar hûnayî,
Şêst lal – dur'ê merde mezin, yek ji yekê hê bihatir,
T'ev wê xiznê qasidê xwe berbi wezîr wî ver'ê kir.
763. T'emî wa şand: „Ez nikarim bin deyînê te derêm niha,
Bêje, - deyînê te wek be'ra ser min giran bûye biha,
Heger sax bim, neêm kuştin, te binhêr'im çawa Xuda,
H'izkirina te, bi h'iz kirin, ezê xitim kim deyînê xwe“.
764. Çi xebera niha bidim ez pesinê wî şêr, e'gîtî,
Merî bû ew, şuxula layîqî gotin, kirin yek bû cem wî,
Wa lazime alî hev kin, bi ardimî bibin pişt, war,
Wexta merî tengiyê da ne, bira, pizmam lê bin ît'bar.





XEBERDANA AVT'ANDÎL T'EVÎ ŞÊRMADÎN

765. Şêrmadîn r'a awa dibê ew dêm nûrê şexsê li dinê,
„R'oja îro gumana min şabûn dilêm kiriye xinê,
Ne ku t'enê ardimiyê, te serê xwe r'ih'îna min da“.
Bira xwendk'ar û yê dibhên xwe nedin paş pesnê wî da.
766. Go: „R'ostêvan ez bernedam, nexast giliyê min bibhê,
Ew nizane çi çiyê, k'ê bi k'ê dijî vê hewatê,
Bona Tarîyêl e'mrêm t'une ne hundur', ne li çolê,
Axir Xudê heye jorê, îşr'uh' dîke şuxulê ner'ê.
767. H'elal bim t'ev wî e'gîtî, ewe qirara mine bi ad,
Dilêm boyî wî t'im digirî bi axîna, hêsirê Ferat,
P'ir'ne bane, naxweze ku bibîne ew e'vd û î'san,
Meriyê nep'ak, meriyê qomsî bîr dîke xwe îsaf, xudan.
768. Bi sê cûra dîhar dîke evîndar ew evîna xwe,
Ew dixweze t'im nêzîk be, tamîş nade dûreya xwe,
Ber tiştêkî ew nanihêr'e, merd dide ew hedaya xwe,
Ew dik'eve ç'iya – baniya dice'dîne ardimiya xwe.
769. Çi dirêj dikim xeberdanê, we'deye ku kin bibir'im,
Dilê xweyî k'ana derda bi çûyînê derman bikim,
Lavaya min tu r'ind bibhê, h'eta virim ez li r'ex te,
T'emiyê min mîaser ke, t'imê wê bên ew kêrî te.

770. Îro şûnda tu hazir be qulix bikî boyî p'adşê xwe,
Mominayî, t'emizayî biqedîne qulixa xwe,
Malam xayî ke tu bê zirar, bibe sereskerekî hêja,
Şuxula kirî h'eta niha tu dehcar ke îro şûnda.
771. Sînor xweyî ke ji dijmina, qewata xwe dehcar ke zor,
Cava qencyê qencî bide, nemamê xwe bike kor,
Ku veqer'im, ezê bidim deyîne xweyî borc t'emamî,
Boyî p'adşê çî qencyê bikî, ewê zîl de, bi e'seyî.
772. Şêrmadîn ku ew bihîst, r'ê da hêsira, hêsir r'êt wê,
Go: „T'enê bûm h'ukum nekir ser min ne xof, ne jî sawê,
Ax çî bikim, axir boyî te dilêm hilde p'erda tariyê,
Tu min bibe çawa xulam, kêrî te bêm ez çetinayê.
773. K'ê bihîstiyê xerîbiyê da merî haqa bimîne t'enê,
K'ê bihîstiyê xulam bihêle p'adşê xwe r'a derdê dinê...
R'ûnê dûr ji undakirî... nemerdiye û bê qulpî“.
E'gît wa go: „Min bend nakî, badîhewa bese bigrî.
774. Te t'irê ku bihar nakim, ku bi dil tu min h'iz dikî,
Çawa bikim, şuxul usa lev hatiye, bihar bikî,
Ez mala xwe k'ê guman bim, pêştirî te k'î min heye,
Min bihar ke, tu nexeyîde, vir lazimî, vire ciyê te.
775. Wexta ezî evîndarim, t'enê bik'evim ç'îya, baniya,
T'enê hêsira ez bir'êjim, k'ê dikare min bigire me'niya,
Evîndar r'a ger' jî borçe, ne ku r'ûnê t'enê mal da,
Qayîl be tu e'mirê xwe r'a, diniya wa çê kiriye Xuda.
776. Zanim ku min tu h'iz dikî, ku dûr k'evim min bîr bîne,
Xulamtiyê ezê xwe r'a bikim, dijmin ber min h'esav nîne,
E'gît gere bi qursax be, netirse ew ji derba bext,
Ez h'iz nakim meriyê xirav, dest nak'işîne xiraviya bedbext.

777. Ez ewim yê ku naçine e'mir çawa xiyarê p'ûs,
Yê e'mirê xwe nahêvşîne boyî hevala xilaz ke sûc,
Ji r'oja xwe ez dûr k'etim, wê dilê şa îzina min da,
Min ku T'înat'în hîştiye, k'etime h'eyîra mala Xuda.
778. Ez didim te wesiyeta xwe, wekî bidî tu R'ostêvan,
Te binhêr'e ew dewsa min, wê yekê da ezim guman,
Ez ku bimrim, xwe nekuje, ji xwe dûr xe cinê xirav,
Şînam bike, hêsira bir'êj, bir'êje tu hêsirê av“.





WESIYETÊ AVT'ANDÎL R'OSTÊVAN P'ADŞÊ R'A

779. R'ûnişt nivîsî wesiyeta xwe, wî derdê xwe da ser k'ax'ez:

„P'adşa, r'evîm, wî bigerim yê gere lê big'eşim ez,
Tamiş nadim ez bêyî wî yê dilê mi da agir dada,
Dia'çî be ox'ira mi r'a, bibexşîne mîna Xuda.

780. Gunek'ar nakî tu min, zanim, boyî kirin û xeyîsetê min,

Meriyê zane wî nahêle, yê h'iz kiriye h'uba amin,
Ez şîreta zane Pilaton îzinê bide bêjim fer'ih':
„Qelpî, derew k'af - k'ûn dikin pêşiyê beden, paşî wî r'uh“.

781. Wexta qelpiye serkaniya bedbextiya derdê giran,

Çawa t'erka wî ez bidim, ku biraye, Xudê va e'yan,
Ku şîretê meriyê zane guh nedînê, neqedînin,
Em hîn dibin ku xeyîset va her kesî r'a em bira bin.

782. Te xandiye derheqa h'ubê p'êxembera çî gotiye,

Çî xebera û çî tewnî pesinê h'ubê wana daye:
„H'ub meriya bilind dîke“, - dibe zengil h'eta e'rşa,
Bihar nakî, lê nezanê ku bihar kin van giliya.

783. Yê xuliqandim, da min h'unir ku bê minet dijmin alt' kim,

Yê qewata nebînayî, go: „Îsanet pê r'ih'al kim“,
Yê ku k'ivş kir sînor dinê lê bû xuda, Xudê nemir,
Yê deqê da yek kir sedî, - sed bi yekî wî h'esab kir.

784. Çi ku Xudê min xaş naê, t'u cara ew mîaser nabe,
R'o ku nûrê nede dinê, gul û beybûn wê h'îşk bibe,
Bedewiye ç'e'vê meriya t'ije dike evîntiyê,
Çi hêjaye e'mirê min, ku min dûr xe ji h'izkiriye.
785. Bibaxşîne, hêrs nek'eve ku xastina te neqedand,
Mîna dîla kê m t'aqet bûm, şuxulê xwe t'ev neyîand,
Çûyîn bû t'ek mi r'a derman, av bû bona agirê dilêm,
Bê minetim ku jî hebim, naê girtin r'iya min, dibêm.
786. Ji şînê k'ê k'ar dîtiye, çi cayîze hêsir r'êtin,
Çi ku jorda me r'a bê, çi jî hebe, emê bibin,
Her çetinaya temîş didin mêrê e'gît, eve qanûn,
Bendê serr'eş ji yaziya k'engê r'evîne, bûne qaşxûn.
787. Çi ku Xudê qîrar kiriye wê biqewime li serê min,
Bira her tişt bê, bibhure, nebe du p'arça dilê min,
Ez ku bêm we eşq bibînim, dehçarkirî siyanet, xizne,
Alîk'ariyê bidim Tarîyêl mi r'a bextkî ze'f mezine.
788. P'adşa, eger gunek'arim, bira bimrim bi destê te,
P'adşa, wekî çûyîna min usa h'ukum dike ser te,
Çawa sozê xwe p'oşman bim, wî bihêlim wê r'ojê da,
Bimrim her'im ji vê dinê, cî nabînim li ce'nimê da.
789. Nêzîkê xwe ku deqekê tu bîr nakî çiyê zirara te,
Meriyê qelp, qomsî, nep'ak, qîmetê wî bêh'urmetiye,
Na, ez nakim, wî p'adşayê ez nahêlim, p'adşae min,
Eglebûnê xiravtir t'une boyî e'gîtê mînanî min.
790. Ze'f xirave ku şer'a da mêrê e'gît saw dik'îşîne,
Ditirse û dilerize, lepê mirinê ew dibîne,
Tirsonekê sawê li ser, mîna jina t'eşî li ber,
Ji her tiştî bilindtire mêrê navê qencî li ser.

791. R'îya mirinê nasekinînin ne r'îya teng, ne kevir, zinar,
Ber wê yekê diçin çî mêrê çê, çî hêsîrê zenane, jar,
Bê firçiyê cem xweliyê, dih'emlîne cahil, pîra,
Bê hurmetiyê ze'f baştîre mirina siyanet, mîna mîra.
792. P'adşae min, bi dilê saw ez wan pîrsa wa dibêjim,
Şaşiyê dikim yê her deqe hîviya xwe mirinê nakim,
Yeke wê bê ezrahîlê, r'oê dike şeva tarî,
Tu bizan be, nagihîştîm te, mirin heye û dilsarî.
793. Heger ku bext min unda ke, undakîrê t'emam meriya,
Xerîbiyê da xerîb bimirim ez h'izretê hêsîrê kinêza,
Ez naême k'efen kirinê ne destê heval, ne xêrxaza,
Bira t'enê tu dil bêjî: „R'e'me te be!“, fikira aza.
794. Bê h'esave hebûna min û xizna min ji qedê der,
Bide k'esîb û k'ûsîba, aza ke qûlêd min yekser,
Sêwî, biya tu r'azî ke, bela ke, ber qe nenihêr'e,
Bira r'e'mê li min bînin, herkes r'îya xwe da her'e.
795. Ji xiznê min çî kêr neyê boyî xiznê te, p'adşae min,
T'êve bide êt'îmxana pê çê ke r'îya hebûna min,
Ber nenihêr'e, t'evî xerc ke tu bona bîranîna min,
Pêştîrî te kesîm t'une, avê tê ke ser agirê min.
796. Îro şûnda tu xeberê min nastînî, p'adşae min,
Sidqê h'elal ez dinvîsim, îsaf binhêr' tu r'uh'ê min,
Çî k'arê wê bibîne ew yê bide peyî cinê xirav,
Meriyê çî qencyê bike, r'e'mê bîne tu min hergav.
797. Lava dikim p'adşae min, Şêrmađîne xulamê amin,
Sala îsal derd - kul pê r'a k'etin, lê bûn dijmin,
K'erema xwe jê r'a bikî, çîmkî ew bû h'izkiryê min,
Tu nehêlî hêsîrê xûnê ji ç'e'vê wî ku bibarin.


798. Wesiyeta xwe min xitim kir, nivîsî, dest dilerizî,
Seyîdayê min ji te dût bin, r'uh'ê minî mîna dezî,
Ser min negrîn, p'adşaê min, diniya r'on xwe nekin tarî,
Bibe şewq, ber şewqa te dijmin xwe h'esav ke mirî“.
799. Hilda û da wî Şêrmaîn wesiyeta bi dil nivîsî:
„Me'rîfetî bide p'adşê, bê, Avt'andîl ev nivîsî,
Qulixa xwe da tuyê bimînî, naê ser te xumam û sî“.
Ew h'emêz kir, hêsir barand, mîna te'viya li ker'asî.





DIA'YÊ AVT'ANDÎL

800. Dia' dikir: „Xudaê min, tuyî xayê e'rd û e'zmîn,
Heyî k' eremê mi r'a dikî, heyî didî min k'emala kin,
Tu guhdarî, nebînayî, h'ukumdarî ser her h'ukumî,
Tu qewatê bide min wekî alt' kim derdê didî.
801. Xudaê min, r'e'mê bike, h'ukumdarî li jêr û jor,
Te h'ub anî li r'û dinê û qanûnê wê kire mor,
E'mir r'oê ez dûr xistim, negihîştim mirazê xwe,
Ji dilê min tu dernexî t'oxmê h'ubê bi destê xwe.
802. Xudaê min, r'e'mê bike, pêştirî te kesîm t'une,
R'iyam çetine, bibe sit'ar, k'erema te p'ir' mezine,
Tu min xayî ke ji xiraviyê, be'ra êlk'an, qeziya şeva,
Xulamtiyê te r'a bikim, heger sax mam, qurbana va“.
803. Dia' xwe kir, hespê syar bû, şevêdizî wî da ser r'ê,
Wî Şêrmadîn ver'ê kir, ji hêsira nedidît r'ê,
Xulam digiriya û hêsirê wî r'engê xûnê dihatin xar,
Wexta xayê xwe nabîne, xulam digirî bi hêsirê sar.





R'OSTÊVAN P'ADŞA DÎBHÊ DERHEQA
R'EVA AVT'ANDÎL DA

804. Serhatîke din ez bêjim, derheqa wî e' gîtê şêr,
Wê r'ojê kes qebûl nekir û p'adşa bû wir serberjêr,
Şebeqê r'a r'abû melûl, hêlepîtk bû li ser lêva,
Wî h'ukum kir ku wezîr bê, anîn, r'eng ne mabû pêva.
805. Wexta wî dî wezîr çawa bi tirs hate ew dîwanê,
P'adşê wa go: „Te duh çi go, biwek'line careke dinê,
Ez xeyîdîm û hêrs k'etim, dilteng bûm te wê gotinê,
Te hilatim wezîrê min, tu îsafi boyî min dinê.
806. Dibe bêjî wî çi dixast, çima ser te ez hilatim,
Zana gotiye: „Ner'ih'etiye t'ora derda“, ez wa zanim,
Tiştîkî usa cardin nekî, qencî, xiraviyê tu derc bike,
Niha bêje, tu netirse, hêrsam ser xwe tu r'aneke!“
807. Carke dinê wezîr gotê xeberê duh jê r'a gotî,
P'adşê bihîst, dirêj nekir, cava wî da ner'ih'etî:
„Heger r'astî tu dîn nînî, ez Lêviyê Cihû ber te,
Îdî nebê te çi gotiye, yan na unda kim serê te!“
808. Wezîr r'abû çû lê ger'iya, lê ew e' gît îdî çûbû,
Ç'e'vê girî xulama go: „Ew e' gîta boyî me r'o bû“,
Wezîr wê go: „Cule't nakim, r'ojê çûyî tèn bîra min,
K'ê dixweze p'adşê r'a bêje, dîwanê da nabîne min“.

SOT'A R'ÛST'AVÊLÎ

809. Wexta wezîr ku egle bû, p'adşê merî şande peyî wî,
Ev ku bihîst, sekinî derva, cule't nekir her'e bal wî...
Wê şik k'ete dilê p'adşê û derdê wî bûn h'ezarî,
Go: „R'evî çû şêrê Xudê, bê minet bû ber sed merî“.
810. Wa serberjêr wî bîr danî, dil da xemê h'ezar t'ewnî,
K'ûr kir axîn, jor nihêr'î, h'ukum kir ser xulamekî:
„Her'e bêje wî semeyî, ew bê mi r'a têne gilî!“
Wezîr hate wê dîwanê, sipîç'olkî, kule dilî.
811. Bi saw k'ete ew dîwanê, tirsana ew dit'irt' ilî,
P'adşê wa go: „Gelo ew r'o, mîna hîvê e'wr veşirî“.
Wezîr derheqa r'eva wî da çi bihîstibû, t'emam wî go:
„Îdî boyî me t'une ew r'o, derd dil - h'enav li me diso“.
812. Ew ku bihîst, p'adşa hêrs k'et, mîna e'wra kire xurîn,
Gir'î zariya: „Ewledê min, te navînim, ez dilbirîn“.
Dêm danî xar, p'or' veçir'î, k'ê dî cîda bûne kevir,
„Ax, tu k'uyî, k'uda çûyî, k'u şewq didî r'oja nedîr.
813. Heger serî ser te heye, h'esav nekî tu xwe k'esîb,
Ez çi bikim ewledê min, dilêm kule, lê tu xerîb,
Te ez hîştîm hîviya k'ê, tu dilr'e'mî xayî h'uba merd...
H'eta tu bêyî, ezê çibim, k'ê wê te r'a azr'o ke derd.
814. K'engê ezê te bibînim ku nêç'îrê tu dizvir'î,
T'op listinê va, bejina çinar, tu lal û dur', şewqa nûrî,
Îdî dengê te nabihêm mîna xulîna kaniya zelal,
Heyîwax, bêyî te çi mi r'a ne t'ext û t'acê dur'e û lal.
815. Birçîbûn jî te alt' nake, tu qewatî zend û bilek,
Tîr û kevan dest te da be, bê minetî ordiya gelek,
Dibe Xudê te bê r'e'mê û derdê te xerît bike,
Lê ku bimrim, ewledê min, k'ê hêsira ser min r'o ke?“

816. Deng bela bû, k'om bûn ser hev, bû muhumet cime't bi xwe,
Gire – gira dîwanê da dest davîtin wan r'ûyê xwe,
Yê k'incê xwe diqelaşt, yê t'epa dida serê xwe,
Digotin: „R'o me xeyîdî nade ser me ew nûra xwe“.
817. Wexta ew şîn ku p'adşê dî, hêsirê xûnê ewî r'êtin,
Wî go: „We dî, r'oê çawa em bêyî nûra xwe tîn hîştin,
K'ê bû sebeb, k'ê dilê wî k'et, wî e'gîfî ku em hîştin,
K'ê wê niha bibe serek li ser esker“, - ax r'ahîştin.
818. T'emam giriyan, dikirin axîn, dirêj kirin şîn û mih'êl,
P'adşê wa go: „Pê bih'esin ew t'enê çû, syarê kih'êl“.
Bi dilê saw pêşda hat ew Şêrmaînê xulam amin,
Wesiyeta wî girt da p'adşê û bi girî go: „Weyî li min!“
819. Wa xeber da: „Wesiyeta xwe wî hîştibû heremê da,
Xulama bi îşkîniya t'epa nav ç'e'vê xwe dida,
T'enêye ew û bê heval, bê xulame şêrê t'enê,
Ya baş ewe min bikujî, çî mi r'a ne e'mirê dinê“.
820. Wexta xwendin, haqa giriyan, hêsirê ç'e'va kirin be'r,
P'adşê wa go: „Eskerê min, h'eznî bin hûn pêda yekser,
Bira dia' ox'ira wî kin k'esîb – k'ûsîb, him jin û zar,
Belkî Xudê dergê xêrê ber wî veke, lê bike sit'ar“.





CARA DUDA ABT'ANDÎL DIÇE KU R'ASTÎ TARÎYÊL BÊ

821. Hîv ji r'oê dûr dik'eve, şewqa hîvê hê geş dibe,
Ew nêzikî r'oê nabe, wê bişewitîne ku nêzik be,
Gul bê r'oê ku dimîne, diç'ilmise û h'îşk dibe,
H'izkiriya xwe ku nebînin, derdê me hê t'eze dibe.
822. Niha bêjim ez serhatiya r'êwîtiya e'gîtê me,
Diçe, digirî, hêsirê wî ç'emkî r'ê da leme – leme,
Her deqeyî paş dinhêr'e, r'uh' va diçe bal Şexsa xwe,
Ç'e'vê xwe r'ê naqetîne, diçe, digirî ew derdê xwe.
823. Ew bû h'îşê xwe unda ke, pêşda ziman nediger'iya,
Mîna ç'emê Dicleyê, wir hêsirê wî dik'îşiya,
Heyî dizivir'î, r'ê dinhêr'î, bûbû cefa lê derdê wî,
Wî nizanibû k'uda diçe, k'uda dibe wî hespê wî.
824. Ewî wa go: „H'izkiriya min, ji te dûr ez ne r'ih'etim,
Dilê berbi te dizivir'e, h'îş va cem te, bê t'abetim,
Ç'e'vêm hêsir te diger'in, dixwezin ku te binhêr'in,
Lê h'izkirî gere bibin derdê h'ubê çîwa dikarin.
825. Ez çi bikim h'eta ku ez te bibînim, bi çi şa bim,
Ku zanibim tu naheyîrî, e'mirê xwe ez mirinê şa kim,
Zanim tuyê bih'eyîrî, ku bibhêyî mirina min,
Ku usane, gere bijîn, û bir'ijin hêsirê min“.

826. Wî go: „R’oê te r’a dibên tu sifetê r’o û şevî,
T’enêyî tu r’iya we’de der, t’enê li jor tu derk’evî,
T’emene dibin wê li ber te siteyîrê geş mîna qûla,
Bextê min tu p’êpes neke, negihîştîme mirazê dila.
827. Ulmdara serê – serî da h’esab kirî sifetê Xuda,
Alîm bike, hêsîrim ez, girêdayî me bi p’eneda,
Ez ku lal û dur’ diger’im, min unda kir bîlara xwe,
Nêzîkayî min nedibir, dûr va şewitîm ez derdê xwe“.
828. Awa digriya, dişewitî û dih’eliya mîna mûma,
Bi hêrs dajot mîna dîna, dil da xem bû ku paşda ma,
Bi şev siteyîra geşbûnê va h’ukum dikir ser dilê wî,
Benzemîşî yarê dikir, şa dibû, bi eşq bû k’êlma wî.
829. Hîvê r’a go: „Tu sond bixwe, wî Xudê tu dih’ebînî,
Tuyî didî evîndara derdê be’re bi evînî,
Cem te heye derman e’se, sebra dila tu dibînî,
Alîk’ar be wê bibînim ya mîna te şewqe e’yînî.
830. Şevê hêsa, r’ojê ne şa, hîvîyê bû r’o her’e ava,
Av ku didît, peya dibû, dihêr’î wî nermik p’êla,
Hêsîrê xûnê ç’e’v dir’ijîyan nava avê mîna ç’ema,
Cardin hespê syar dibû diçû, r’iya xwe ew ne dima.
831. Diçû bejna ter’e tîtal, hêsir dir’êt û digiriya,
Deşta fire ber zinêr da, wî kareke xezala da,
Şêrê Xudê kuç’ik dada, goşt qeland, çû r’iya xwe da,
Wa go: „Heyî wax, gula xwe hişt, pîrozang jî min hil ne da“.
832. Bê t’aqetim niha bêjim çi go e’gît ser r’iya xwe,
Çi xebera wî dinvat wê k’ubarî, maqûliya xwe,
Cîna wî berf sor dikir bi xûna sore sûretê xwe,
Wî şikevt dî, berbi şikevtê çû, zevt nekîr şabûna xwe.

SOT'A R'ÛST'AVÊLÎ

833. Asmat'ê ew dûrva ku dî, pêşiyê da çû ç'e'vê hêsir,
Usa şa bû, ji şabûnê ewê t'irê xwe unda kir,
Cahil hespê xwe peya bû, ew h'emêz kir û r'amûsa,
Wexta hîviya yekêyî tu, hatina wîye xastina Xuda.
834. E'gît aha ji wê pirsî: „K'a xweyê te, çawane ew?“
Hêsirê ku Asmat'ê r'êt, li ser e'rdê k'işiya wek cew,
„Şikevtê da teyax nekir, ne go, k'engê wê veqer'e,
Min nediye, bê salixe, peyî îza wî k'ê bigere“.
835. Melûliyê e'gît hil da, mîna tîrê cî kî dil da:
„Bêje, xûşkê, kirina wî kir necayîz bû biratîyê da,
Wî sonda me p'êpes kiriye, nebûye xayê pîrsa xwe ew,
Çima soz da ku nikaribû, soz da xayê soz bûya ew.
836. Ne tu zanî e' mirêm bêyî wî ne hêjaye qe xîç'ekî,
Ewî çawa ez bîr kirim, hîviyam nema qe hinekî,
Ji sonda xwe ew p'oşman bû, sonda ku da wî ber Xuda,
Çima e'cêbmayî mame, bextê xirav t'imê min da“.
837. Asmat'ê go: „Tu dixeyîdî, îzina teye xeyîdê heye,
Lê r'astiyê ezê bêjim, h'esav nekî ku qelpiye,
Dil lazime wekî merî sonda ku xar, bîne sêrî,
Lê ew mirinê neyaz dike, dilê şikestî, sewdaserî.
838. T'imê heva girêdayîne fikir û r'uh'ê her îsanî,
Dil k'iyalî çû, didine peyî ew hogirêd wîye e'ynî,
Bê dil merî ne meriye, ew ne cêrga meriya da ne,
Te dîtîye û tu zanî çi agirî ew şewitandîye.
839. Tu dixeyîdî ku birê te tu hîştîyî, t'enê çûye,
Ez çi teherî te r'a bêjim çi bûye û çi qewimiye,
Dilê min wê bûye k'ûre, zimanê min sitriyê kelem,
Hê nedîtîye min dinê da bedbextîke usa bi xem.

840. Hê derheqa derdkî usa t' u meriya ne bihîstiye,
Ber wî derdî ne ku merî, kevir jî ber leriziye,
Ç'emê Diclê wê r' abûya, ku t' ev bûya haqa hêsir,
Tu jî r' astî, tuyê çi bêjî, herkes aqile şuxula k' esir.
841. Wexta diçû min pirs da wî, dilk' etiyê dilî kovan:
„Avt' andîl bê, ez çi bêjimê, xûşka xwe r' a bêje heman“.
Wî go: „Bira min biger' e van nêzikaya, nehêja me,
Ez naçim dûr, unda navim, p' êpes nakim qirara me.
842. Ji sozê xwe p' oşman nînim, ez ada xwe nadim bin p' ê,
Ezê hîviya birê xwe bim, h' eta hêsir ç' e' vê min tê,
Ku mirîti min bibîne, bira ç' e' l ke, bike şîne,
Ku sax dîtîm, ew jî mi r' a h' eneka bexte li dinê“.
843. Ax, bona min wî e' gîti r' oja ez çûm, ciyê xwe guhart,
Lê niha ku ez digirîm, ç' e' vê girî, hêsirê Ferat,
Didin cefê min e' wt' erî ç' e' vê hêsir, şîn û girî,
Binhêr' e tu, min bextê r' eş, mirinê ez kirime bîrî... .
844. Xebereke heq li Çîna li ser kevirekî nivîsiye:
„K' ê hogirê xwe nager' e, ew dijminê serê xweye“.
Bûyî k' irkût, ew k' îjan ku ber çi bû gul û beyîbûn,
Lê biger' e, tuyê biger' î, cefaye t' ek we r' a hebûn“.
845. E' gît wa go: „R' ast dibêjî, cefa min ze' f h' aşe, bê cî,
Lê bifikir, min çi kiriye boyî wî qûlî, çi cefa dî,
Ji mala xwe ez qetiya me, çawa xezal avê diger' e,
Wî bîr tînim û diger' im, r' o peyî r' ojê venager' e.
846. Bîlar, sedef, lal û dur' li ber r' engê wê dixeyîrin,
Min hîşt hatim, nêzik ne bûm, ne difikirîm wê bixeyîdin,
Ber r' eva xwe ez bûme derd boyî wî yê boyî min Xuda bû,
Dilê wan da ne ku xuşûş, lê derdê min hê mezin bû.

847. T'erbedarêm bav bû mi r'a, boyî min ew bû Xuda mezin,
Hebûna merd, e'zmanê r'e'm, mi r'a bav bû, bavê pesn,
Mixenet bûm, min hîşt dîwan, him esker, him jî hebûn,
Vi guneyî çi dikarim t'eweqe kim, t'ev berhûm bûn.
848. Xûşkê boyî wî, dîtina wî, ev t'emam min hîşt û hatim,
Min ne xapand, daye ser r'ê şev û r'oê, bê t'abatim,
Niha ewî hîştiye çûye, agirê k'îjanî dişewitim,
Badihewa bextê xweyî r'eş vir r'ûniştî şîmê dikim.
849. Xûşkê bona xeberdanê hê ne wexte, t'une we'de,
Ber nak'evim çi buhuriye, pirsane zane bibe şe'de,
Yan gere wî ez bibînim, yan mirina mine erhede,
Ku bext awa qîrar kiriye, Xudê çi bikim t'eweqe“.
850. Avt'andîl wir tişte ne go, ç'e'vê hêsir wî da ser r'ê,
Şikevtê derk'et, ç'em derbaz bû, mêrga berda wî da bin p'ê,
Sur'a deştê li wî dixist, r'engê wî gul mîna şûşê,
Şikiyatçî bû ji bextê xwe: „Çima te dam derdê dinê!“
851. Go: „Xudêo, çîye gunêm, min çi kiriye ku nizamim,
Ji pizmama ez qetandim, ev bextê r'eş te daye min,
Bona duda ez dişewitim, girane, wê çawa bibim,
Bimirim h'eyîfê ez xwe naêm, xûna xwe ez ser xwe hil dim.
852. Pizmamê min strînê gula min xist, dilêm kire birîn,
Min sozê xwe anî sêrî, wî bîr kiribû necamêrî,
E'mir ji wî min biqetîne, kaniya eşqa min bimiç'iqe,
Yekî din r'a bêjim heval, ew yek şuxuleke ne heqe“.
853. Paşê wa go: „Derdê meriya aqil, zane min dih'eyîrîne,
Çi k'are wê yekê da ku ew hêsira dibarîne,
Başê merî ku difikire, şuxulê xwe r'a r'ê dibîne,
Wî Şexsî ez k'u bibînim, yê bejina wî dara şîne“.

854. Bi ç'e'vê şil r'abû û çû, lê biger'e ç'iya, baniya,
Jê r'a yek bû hin şev, him r'o, dikir qûr'in û diger'iya,
Sê r'oja ew usa ger'iya, gelî, geboz da bin p'iya,
Lê wî nedî, bi dilê kul t'u xeberê pê neh'isiya.
855. Ewî wa go: „Gunêm bal te çi mezine, bêje, Xudê,
Ev çi bext bû te daye min, ev çi cole situyê mi da,
Gunek'ar ke min bê îsaf, bibhê pirsêm derheq xu da,
R'ojê e'mirêm tu kin ke wê, ku xilaz bim ez ji derda“.





AVT'ANDÎL TARÎYÊL DIBÎNE

856. Wa digeriya ew e' gîta ç' e' vê girî, dêm bê beşer,
Gir va r' abû, dûr va dî, besteke hêşîn, fire û ber,
Wê bestê da hespa qemer wî dî bê gem û bê hevсар,
Wî go: „Vire ew e' gîta, badîhewa dikim fikir“.
857. Wexta ku dî, dilê e' gît defa sîng da wê lê dida,
Eşqa dil da ne ku deha, h' ezar carî zêde gul da,
Lê gula wî dîsa geş bû, dîlar şebe lê bûn alav,
Bû babelîsk ji cî p' ekiya, ne nihêr' î bext û berav.
858. Wexta ewî Tarîyêl dî melûlî li wî hêwirî,
Mîna miriya k' etibû wê, li ser dêm bû mîra girî,
Ber û berstû lê qelişî, serî xûnê da mewicî,
Îdî wiya tişt ne dibhîst, mirin ber r' a dixer' icî.
859. Alîkî wî laşê şêr bû, şûrê wî bû xûnê da sor,
Aliyê dinê pilingek bû, li ser kevira kiribû mor,
Ji ç' e' vê wî e' gîti wir hêsir dik' işiyan mîna ç' ema,
Alav dilê wî k' etibû derdê giran û ji xema.
860. Ji dest girî, sîng k' utanê bê t' aqet bû ç' e' va veke,
Ew nêzîkî mirinê bû, e' mir wê da ew gav dike.
Avt' andîl wir deng lê dikir, dixast ku wî h' işiyar bike,
Dît ku nabihê, ew nêzîk bû, ku biratiya xwe nîşan bike.

861. Desta hêsirê xwe zîha kir û t'emiz kir ç'e've wî şil,
Nêzik r'ûnişt, kire gazî, wî navê xwe bilind go, dil,
Wî deng lê kir: „Avt'andîlim, bona te ez hatim vira!“
Wî ne dibîst, ku bihîsta, bê seda bû boyî wî bira.
862. Bê şubeye çî ku min go, û r'astiye ew e'seyî,
Hêsirê ç'e've wî t'emîz kir, hinkî ser h'emda ew anî,
Wexta nas kir, ew h'emêz kir, bîna bira ew r'amûsa,
Xudê heqe, ku mîna wan ne xuliqîne meriyê usa.
863. Wî go: „Bira, nexapan dî, min qedandiyê qirara me,
Min tu dîtî, hê ne mirime, e'seyî kir min ada me,
Bihêl bigrîm h'eta dîmirim, bi dilê kul tu deyîn nekî,
Soz bide min, nebim xurê de'bê çolê, tu min ç'e'l kî“.
864. E'gît wa got: „Çî dibêjî, çî serê xwe dikî gêjê,
Derdê h'ubê k'ê nediye, k'ê nek'etiye alava wê,
Bêje, gelo heye merî ku kiribe tiştê usa,
Cmê xirav tu hildayî bi mirinê xwe bikî r'isas.
865. Aqilî tu, hema aqila wa gotiye eva gilî,
E'gît ewe yê ber derda tamîş dide û nagirî,
Derd gere wî qevîn kin, mîna kevirê h'im û h'ecar,
Ji aqilê meriyane, ku dimînin dinê bê ç'ar.
866. Aqilî tu, lê tu giliyê aqilbenda nar'icimînî,
Çî k'ar te r'a r'ex de'ba da vê bestê da dilûbînî,
Boyî çî dimrî, ez nizanîm, dest dik'işînî ji vê dinê,
Serê bê êş çî girêdî, birînê vekî ser birînê.
867. K'ê nabûye evîndar, k'ê h'ubê ew dax' nekiriye,
K'ê ne biriye ew derd û kul, k'ê bona k'ê ne ne'liyaye,
Bêje neheqî çî da bûye, ku dixazî r'uh'ê xwe ç'e'l kî,
Tu nizanî, h'eta niha k'ê çiniye gul bê sitrî.

868. Gulê pirsîn: „K'ê xuliqandî haqa bedew, haqa nazik,
Çima haqa bi sitrûyî? Destanîna teye bi r'ik“, -
„Şirin te'liyê tê dîtîne, dîtina çetin hê şîrine,
Ku bedewî erzan dibe, ew hêjayî qeyîskê nîne“.
869. Wexta gul ku wa dibêje, t'ûmeke bi biç'ûkiya xwe,
Lê eşq şayê k'ê dest bîne, bê cefa, bi hêsirê xwe,
Lê bê cefa k'ê dîtiye şuxula qenc, bêje hela,
Çima bextê xwe dik'ifirî? Çi te kiriye, çi bûye bela.
870. Giliyem bibhê, tu syar be bajo, em herin hêsa,
Nebe qûlê fikirê xwe, ji xwe dûr xe fikirê r'isa,
Miqabilê xastinê her'e, wê bike çi zanî xirave,
Ku qenc nebiya, min ne digo, bê şubeye, r'astî eve“.
871. Wî go: „Bira, ez çi bêjim, ez bê ç'arim bêjim ziman,
Ez sews bûme, bê t'aqetim fikira, pirsî bînim e'yan,
Çi hêsaye ber ç'e'vê te derda bibim, bimah'înim,
Nêzîkî dergê mirinê me, mirinê wa ez dibînim.
872. Eva dia'm ber mirinêye, ne ku pirsê betalin ev,
Vê dinê jî hev dûr k'evin, wê dinê emê bibînin hev...
Hema wira hev bibînin, wir hasil be mirazê min,
Niha werin kinêzê min hûn xaliyê tê kin ser min.
873. Bê h'izkirî h'izkiriya xwe ça nebîne, derxe ji dil,
Bi dilê şa berda h'er'im, wê bê bal min bi eşq û dil...
Emê r'astî hev bîn wira, bi dil emê hev h'emêz kin,
Ji sed merî ezê pirs kim, ji r'iya dil em naxalifin.
874. Aha bibhê te r'a bêjim ez qirara xweye axriyê,
Ez dimirim, bihêl her'e, çi cayîze bisekinî hîviyê,
Bimirim ji min çi k'ar te r'a, ku bimînim hê bê k'arim,
Wê ser hevda xuximî me, îdî ez wê ber r'uh' da nim.

875. Çi dibêjî, tişkî nabhêm, we' dêm t' une te bibhêm,
Mirinê çok daye ser min, ser deqane wê e' mirê min,
R'ojêm usa çetin nîbûn, çawa niha bûye çetin,
Ezê her'im bin xweliyê, ser k'îjanê hêsir r'êtin.
876. Çi aqilbend, k'êye aqil, ji meriyê sews çi dixwezî,
Wî çaxî te şîret kirama, ser h' emdê xwe bûm hê r'azî,
Zanî ku gul najî bê r'o, ewê h'îşk be wekî bijî. . .
Her'e derdêm t'ev r'aneke, vêsiyame ez, ûca min jî“.
877. Avt'andîl bi zora ziman dixast h'ukum têke ser wî,
Ew dibêje: „Bi mirina xwe bêje, k'ê r'a qencyê dikî,
Neke çi ku ne cayîze, mîna dijmin xwe dikuji!“
Berga tişkî wira negirt şîret û xeberê wî jî.
878. Ç'e'vê girî ewî wa go: „Wekî haşin t'ev pirsê min,
Û îdî ez xeber nadim, badîhewa bû gotina min,
Ku mirine ber ç'e'vê te, bimire, bira gul biç'ilmise,
T'ek xeberke min tu bibhê“, . . . hêsir ç'e'v da diteyîse.
879. „Ji bal gula xwe delalî, mîna horiya t'er' xweyî kirî,
Ez dûr k'etim hatim bal te, lez hatim ez ç'e'vê girî,
Pêşiyam negirt p'adşa bi xwe, yê ku bav bû ew bona min,
Niha min ji xwe dûr dixî, tamîş nadim derd bê amin.
880. Ver'ê neke min dilşikestî, dixwezim ku min bibhêyî,
T'ek carekê r'uh'ustînêm, hespê syar be, min dibhêyî,
Derdê minê t'ev bela be û her tiştî ezê bîr kim,
Te bihêlim, ezê her'im, zêde de'wa tişkî nakim“.
881. Lavayî dikir: „Hespê syar be“, hêsira sûretê wî şil dikir,
Baş zanibû ku syar be, derdê dil wê bela be wir.
Qamîşê ter' wê bih'ejiya, p'er'lemîş bûya mîna şebe,
Wî ku fe'm kir, derdê dil wî hat guhartin ew bê şebe.

882. Tarîyêl wa go: „Ezê syar bim, tu hespê min virda bîne“.
Wî hesp anî, û ew e' gît fesal r' ûnişt li ser zîne,
Wê bestêd hêsa ajot, lê bi zengiya nak' udrîne,
Hinkî ku çûn, meşa hespê wî ser h' emdê wî da tîne.
883. Bend kiribû fikira birê, bi serhatiyê aqil, sewda,
Disêwirand boyî wî gilî, lal û dur' bûn serhatiya da,
K'ubar e' gît bibhîstana, extiyarê wir cahil bûna,
Xemê Tarîyêl wî bela kir û eşq k'ete dilê wana.
884. Ku bihar kir êş seqirî, ew bû derman boyî êşa wî,
Wî dî çawa dêmê e' gît mîna r' oê vep' eşirî,
Ew bû h' ekîm û aqilbend, bû guman boyî wî sewdalî,
Pirsa aqil wa jê r' a got: „Çetinayê alt' dike gilî“.
885. Wexta şîrin xeberdanê Avt' andîl wa ji wî pirsî:
„Tişkî bêjim, veneşêre, tu wê sur' a xwe dikî sî,
Ew bazinê destê te da, wê da k'ê ku tu hêngavtî,
Xizna te da t' une t' u tişt, dilê te da wî qîmetî“.
886. Wî go: „Wê ya eva da min, ewe t' enê ziyareta min,
Wêya t' enê borcdar kirime, him boyî e' mir, him derdê min,
Vê qîmetir boyî min t' une ne li e' rdê, ne e' zmana,
Xeberdana te arzan bû mîna dewê tirş arana“.
887. Avt' andîl go: „Xastinam ew bû, min ji devê te bibhîsta,
Wexta te got, niha bibhê, zû yan dereng minê bigota.
Bêje, Asmat' yan ew bazin, k'îjane boyî te p' ir' biha,
Napesinim te çi bijartiyê, bifikire hinekî niha.
888. Ev bazinê ku xemiliye bin t' iliyê zêr' kera da,
Tişte nîne, bê r' uh' e ew, bê zar – ziman fikira te da,
Lê te Asmat' bîr kiriye, bêje tu r' ast difikirî,
Dilk' etiya te r' a nêzîk bû, te r' a xûşk bû zar şekirî.

889. K'ê ku t'imê alî we dikir, e'mir da te gotiyê xûşkê,
Wê ya ku hûn dighîhandin hev, ku nek'eve kes we şikê,
Wê h'izkiriya te xayî dikir, t'ev te gihîştiye ew vê r'ojê,
Te ew hîştiye t'ik û t'enê, te sîlih'a xwe kiriye dojê.
890. E'gît wa go: „Çi dibêjî, tu r'astî, wê sîlih'a r'astiyê,
Asmat' t'imê wê bîr tîne, mi r'a digre qedirê biratiyê,
Min bihar nekir ezê r'abim, tu mi r'a bûyî delîl vira,
Lê ez heme, em her'in mal, hinekî sistim, her'in bira“.
891. Destûr da bû û k'etine r'ê Avt'andîl û Amîrbar,
Boyî pesinê wan ze'f hindikin pirsê mine dur'e k'arbar,
Diran şirdana mircana, lêvê nazik belgê gula,
Lut'vê şîrîn ku xeberdin, ewê me'ra derxin ji qula.
892. Avt'andîl go: „Ox'ira te da him r'uh'ê min, fikir û sewda,
Tu jî îdî usa neke, xwe nekuje bi wan derda,
Tu ku gur'a zana na kî, çi k'ar te r'a ji zanbûnê,
Zanebûnê ku ez xerc nekim, boyî çi bidim veşartinê.
893. Ji axîna t'u k'ar t'une, çi k'ar hêsirê bidine te,
Çi yaziya me nivîsiye, mirin naê nêzikî me,
Gul sê r'oja teyax dike, r'ûê r'oê ku nebîne,
Bext û yazî... alt'indarî xayî ku xast, wê bibîne“.
894. Tarîyêl wa go: „Dersa te da, mi r'a hêjaye diniya vir,
Boyî aqîla t'im şîretk'ar, boyî axmaxa derba kevir,
Lê tu bêje çawa bibim ez vî derdê ji h'esab der,
Tu jî mînam derdlûyî, min fe'm dikî tu beranber.
895. Mûma agir bişewitiya ku r'eha wê ne agir biya,
Av û mûm ze'f ji hev dûrin, avê da mûm zû vêsiya,
Ku derdê te derdê mine, derdêm tuyê derman bikî,
Tu baş zanî çi agirî da me, gere bibînî îlackî“.



TARÎYÊL GILÎ DIKE DERHEQA KUŞTINA ŞÊR Û PILING DA

896. „Çi min qewimî ez hûrgilî niha yek – yek te r’ a bêjim,
Qenc û xirav tu bibjêre, sîlih’ am bike ez dibêjim,
Hîviya te bûm, ser dilê min e’wrê derda hev berev bûn,
Tamîş neda şikevtê da, syar bûm, r’ê li ber min vebûn.

897. Ji vê bestê ez derk’etim, gihîştîm ez girê mezin,
Min dî şêr û pilingek wê hev şa dibin û dilîzin,
E’ yînî mîna dîlk’etîya bûn, dîtina wana ez bend kirim,
Hinkî şûnda kirina xwe va e’cêbmayî wan ez hîştîm.

898. Pêşiyê lîstina wan h’enek bû, paşê herdu r’abûne hev,
Ç’e’vê wan da xûn t’ijî bû, bi lepa wan usa da hev,
Piling hinekî paşda r’evî, ew belengaz ma bû çimkî,
Şêr da peyî, wê kire h’urîn, alava dil bîn lê ç’ikî.

899. Min xaş nehat kirina şêr: „Bêfe’ m, aqil te unda kir,
H’izkiriya xwe tu dik’ufî, t’û kim ez ser te e’gîtî“.
Min şûrê xwe wira k’işand, biriqî şulfa şûrê min wir,
Sêrîda da, e’rdê kir zend, xilaz kir ew ji derdê wir.

900. Min şûrê xwe wêda avît, piling girt me’zmanê piştê,
Ax, min xast ku wê r’amûsim, h’izkiriya xwe bîr anî wê,
Dikir o’r’în, pencr’û dikir, lepê xûnê berbi min dikir,
Tamîş neda, derbek lêda, xwe unda kir, çi bû min kir.

901. Ç'are t'une, hêsa nebû, ew bû agir, mîna dîna,
Û wî wextî min hilbir'î, bir û anî e'rdêda da.
Ax, min t'irê wê lêxistinê, min h'izkiriya xwe dida...
Giriyê min çi, tu navînî, hê dinhêr'im r'oê dinê da.
902. Te bihîst bira, hê nizanî çi derda ez ha hildame,
Gere niha mirî bûma, lê e'cêbe ku sax mame,
R'aste, e'mir ez qetiya me, mirinê jî bîr kirime".
Paşê ker bû, dîsa giriya û hêsir rêt e'gîtê me.
903. Avt'andîl jî t'evî wiya ç'emê hêsira wir dibarand,
Go: „De bese, dilê mi xî zerga derda, got û biland,
Bextê te tu nehêvşandî, Xudê wê te bihêvşîne,
Pêşiyêda tu nêzîk nedikirî, ku bixasta we nebîne.
904. T'im bedbexte h'izkirî ji nav qeziya da ç'e'vî hêsir,
Ku ber derda ew tamîş da, bextê ker'be, nave kevir,
H'izkirin t'im cefê tîne, lê mirinê ew aşt dike,
Aqil, sewda dide sewsa, aqilbenda ew dîn dike“.





TARÎYÊL Û AVT'ANDÎL DÎÇIN ŞIKEVTÊ ASMAT'Ê DÎBÎNIN

905. Ew giriyan, dane ser r'ê, berê xwe dane wê şikevtê,
Ku ew dîtin ji şabûna hêsir barand wê Asmat'ê...
Pêşiyêda çû, kaniyê ç'e'va şil kirin zang û mix'are,
Hev r'amûsan, baristan bûn, fikirê wana bûn dubare.
906. Asmat'ê go: „Xudêo, çi naê gotin zarê meriya,
Bi nûra xwe t'ije dikî diniya r'engîn, ç'iya – baniya,
Pesin bidim, çi teherî pesin ku hêja be mezinaya te,
Siyamet te r'a ku sax hiştim, ç'e'vê girî boyî vana, te“.
907. Tarîyêl wa go: „Xûşkam bibhê, çiqas hêsir min r'êtiye,
Çiqa Xudê şayê dide, bext bi hêsira hê zêdeye,
Neyînesiya dinê ewe, ew tişteki t'eze nîne,
Weyî r'oja te, yan na xûşkê, mirin boyî min çetin nîne.
908. K'îjanê t'î, ku dîn nîne, avê çawa bir'êjê e'rdê,
Zendegirî mame, çima zîha nabin ç'e'vê min hê.
Bê av bûna ew dimirin, hêsir jê tèn ç'emê avê,
Sed h'eyf, gula min ç'ilmisî, unda dikim bê sih'avê“.
909. Avt'andîl wir bîr anî wî Şexsa xweye dil h'izkirî,
Wî go: „H'ubam, beyî te çawa dijîm, heme ez nemirî,
Wê ji te dûr ez e'mirê xwe, xwe r'a e'mir h'esav nakim,
Yek hebûya wî te r'a bigota, dil va ez çi agirî da nim.

910. Diç'ilmise gul bêyî r' oê, bêje bibhêm, gul wê zane,
Lê h'alê me wê çawa be, me dûr k' eve r' oja tîne,
Dilo başe tu qewîn bî, mîna zinar berk' û meh'k'em,
Dibe bigîjî me r'okê, ku mirazê xwe şa bin em“.
911. Hêsa bûn ew, hinkî ker' bûn, vênesiya agirê dilê wan,
Asmat' t' evî wan çû şikevtê, dişewitî bi derdê wan,
P'ostê piling e'rdê r'axist û r'ûniştin nêzîkî hev,
Pêşberî hev r'ûniştin, hev r'a vekirin dilê wek şev.
912. K'ibab çê kir ji nêç'îrê, vekir sivre hêjaye wan,
Nanxarina bê nan bû wê, ne jî feraq hebû ber wan,
Gotne Tarîyêl bi t'eweqe: „Buxwe, îlac ser te t'une!“
Xarina Tarîyêl wê haqa bû, wek ç'ivîka ne êgine.
913. Çiqa başe wexta dibêjî tu meriya r'a gilîkî xaş,
Wexta merî wê dibihê, badîhewa nabe ew şaş,
Vedpesire agirê dila, çiqa jî gur' be û t'êj,
Meriv wexta dilûbîne, hêsa dibe ji derdê xêj.
914. Wê şevê ew cîkî bûn, e'gîtê me şêrê Xudê,
Dilê xwe ber hev vekirin, derdê xwe bi sond û adê,
Sibe r'on bû, t'eze kirin xeberdana xwe hêvişandî,
Dîsa bihîstin ad û qirar, pirsêd şîrîn wek'ilandî.
915. Tarîyêl wa go: „Çi lazime xeberdanê merî dirêj ke,
Çi bona min te kiriye, Xudê deyîne minê wê e'fû ke,
Ev ne sonda vexariyane, ev bû ada ziyaretî,
Gere t'imê em bîr bînin, pîzmamê xwe yê dûr k'etî.
916. Were xwe navê agirê min, agirê mi da tu neşewite,
Ne agirê çeqmeqane, agirê dojê ew bê semte,
Vênasînî, tuyê bişewitî, usane qirar vê dinê,
Bizivir', here dîsa li wir, hîviya teye Şexsa t'enê.

917. K'ê xulqandim derdê mi r'a hê t'u derman nedîtiye,
K'ê ku bibhê bira zan be, çi e'wterî p'aram k'etiye,
Min jî wextekê ew yek dikir çi babetî aqila bû,
Noba sewsiyê gihîştiye min, bêxem mi r'a veşartibû“.
918. Avt'andîl go: „Wê gotinê r'a nizam ez çi bidim cavê,
Xeberdanê tu ku dikî, nake tu ulmdar vê gavê,
Çima Xudê nikare ku qenc ke birinê wî ku daye,
Ne ewe ku şîn dike wî t'oximê dinê ajir'o daye.
919. Çima Xudê usa kir ku xuliqandin hûn wî teherî,
Dan giriyandin û dîn kirin, nehîşt şa bin wî mirazî,
Ne cuda ne qeziya û h'ub, ewê yekê tu bîr nekî,
Hergê hûn hev ku nebînin, bi şûrê xwe min xilaz kî.
920. Çi e'gîte ew e'gîta, tamîş nede li ber derda,
E'yane ew, em natewin, em naşkên li ber derda,
Tu netirse merde Xuda, hinkî diniya wa çikûse,
Tu guhdarî, guh bide min, axmaxe ew yê dinik'ise.
921. Çi te bihîst, te r'a ders be, guhdar be, tuyê k'arê k'evî,
Min xatirê xwe Şexsa xwe xast, hatim tu ber xwe nak'evî,
Min te r'a go: „Wê dilê min kiriye k'ozî h'uba xwe r'a,
Badîhewa xeberdanam, jî mayîna min çi k'ar te r'a“.
922. Wî go: „Ji te r'azî me, te mêranî ew yek kiriye,
Ox'ira wê da tu çi bikî, hesav dikim mi r'a kiriye“.-
„Ez hatime bi xastina wê, nevexarî me, ne k'êfxaş,
Paşda her'im, ez çi bêjim, ku r'evî me çawa nexaş...“
923. Xeberdana me bir'icmîn, bibhê çi ku ez dibêjim, -
Şuxulê çetin k'ê alt' dike, mêrê mêr wî h'esab dikim,
Gul ku ma bêyî nûra r'oê, wê e'seyî biç'ilmise,
Bêt'abî tu, alîk'ar bim, bira dilê me hev nequse.

924. Her'e wira, wir bimîne, çawa dilê te dixaze,
Dixazî tu bi zanefî, dixazî dînkî wir bibeze,
T'imê bejna xweye tîtal ber bedenê xwe mêranî,
Teyax ke tu ku vênêsî, ku neh'elî, wê tu zanî.
925. Tiştî zêde te naxwezim, h'eta saleke din vê r'ojê,
Vê şikevtê da min bibînî, min bibhêyî salxê dinê,
Bîra xwe da tu baş xweyî ke, ku bibînî gul vebûne,
Mîna dengê sa bibhêyî, min bibînî h'îşiyarbûne.
926. Heger te dî we'de buhurî, şikevtê da te ne dîtîm,
Bizan be ku ez mirîme, yan bê herek'et, bê t'aqetîm,
Bîra ew be nîşana me, heger dixazî bigrî boyî min,
Wî çaxî dixazî bik'ene, dixazî bigrî, birayê min.
927. Çi ku min go: „Birayê min, xema neke, nebîn cefê,
Ez wê diçim, dibe neyê û mîna bim mîna k'efê,
Na, bê gotin ew yek nave, negotine ew h'eyîwantî,
Nîzam Xudê wê çi bike, yan çerxa dinê bi e'yînatî“.
928. Tarfîyêl got: „Te a'ciz nakim, badîhewane gotina han,
Yeke îdî min nabihêyî, çîqa dirêj be xeberdan,
H'izkiriya te ku te nebhê, biqedîn tu xastina wê,
Axiriyê da wê aşkela be, çî ku nedixast bibhê dinê.
929. Bîhar nakim ku zanibî, çî h'alekî giran da nim,
Yeke biger'im yan r'ûnê, gotina xwe îcr'uh' dikim,
Çî ku bêjî, bê gumanî, e'se ezê gur'a te bikim,
Bêyî te çî be, çî jî hebe, birê e'zîz ezê bibim“.
930. Xeberdan ku xitim kirin, soz û qîrar wê dane hev,
Hespa syar bûn, r'ik'êv kirin, r'ê va nêç'îr wana kir t'ev,
Ji nêç'îrê ku zivîr'în, hêsir r'êtin bê xeberdan,
Fikira wan da çîhêbûn bû, derda dilê wan da şax dan.

931. Yê xwendevan, ji ç'e'vê te bira hêsir r'obin hê gur',
Ax, çi bike dilê bê dil, wexta dil nabîne buhur,
Ew mirine boyî meriya, ji pizmama wa dûr k'etin,
K'ê nedîtiye, k'ê nizane, ku çiqase ew r'o çetin.
932. Sibe r'on bû, hespa syar bûn, hîştin Asmat' ç'e've girî,
Tarîyêl, Asmat' û Avt'andîl dîsa bi ç'e'vê hêsirî,
Sûrtê wana hêsira şil kir, biriqîn bi r'engê k'itan,
Herdu şêrê wê beyanî, beyantî xwe kirin e'yan.
933. Şikevt hîştin, ji wira çûn bi dilê kul û ç'e'vê şil,
Asmat'ê go: „We e' gîta ça bipesnim, - giriya bi dil, -
Hûn kirine k'ozi r'oê, hûn siteyîrê r'û e'zmana,
Weyî li min û van derda, weyî li r'oja bê gumana“.
934. Wan e' gîta hevr'a ajot, r'iya r'okê ew buhurîn,
Ew gihîştin devê be'rê, peya bûn û xwe xurdilîn,
Wan t'evayî şevbêr kirin, nedîtin wan dû û derman,
Sibe r'on bû, ew bi girî hev dûr k'etin wa bê guman.
935. Avt'andîl wa gote Tarîyêl: „Hêsirê ç'e'vê min miç'iqîn,
Çima te P'irîdon hîşt, ewê e' gîta, şêrê bê k'în,
Emê ji wî salix hil dîn, alîk'ar bin boyî Şexsa te,
Ezê her'im wî bibînim, bêje k'uye birakê te“.
936. Tarîyêl yek – yek wa jê r'a go, çawa bigîje P'irîdon,
Wî salix kir ça bibîne, li wî te'l bû dêm û gon...
„Berbi r'ohilatê here, ji k'endar tu dûr nek'eve,
Ku dibînî, jê r'a bêje derheqa min, ku pirs bike“.
937. Xezala ku wan lêda bû, wêda birin, agir dadan,
Goşt qelandin û goşt xarin, derdê xwe kirin xeberdan,
Wê şevê jî mane wira, k'etine xewê ber bax'a wir,
Ner'ih'etî tu bextê min, heyî tu merdî, heyî tuyî gur.

938. Sibê r'abûn, hev dûr k'etin, bi dil hev h'emêz kirin,
K'ê bidîta wê bih'eliya, çi teherî hev h'iz dikirin,
Ç'e'vê wan bûne ç'e'vkanî, çîqa hêsir wan r'o kirin,
H'emêzkerî sekinî bûn, bext û felek wan bîr kirin.

939. Bi girî ji hev dûr k'etin, wana dêmê xwe vedir'û,
Ji wê derê hev qetîyan, r'îya wan hev cihê dibû,
H'etanî hev didîtin, dikirin gazî dengê melûl,
Ku r'oê ew bidîtana, ji derdê wan wê bibûya qûl.





AVT'ANDÎL BERBÎ P'ÎRÎDON R'Ê DÎK'EVE

940. Heyî wax dîniya, tu çi dikî, çi difikirî,
K'ê mîna te gumane, t'im axîne ç'e'vî girî,
K'uda dibî k'ê ji k'uya û axiriyê ku hasê dikî,
Îdî Xudê wî nakuje, k'îjanî ku tu bend dikî.
941. Avt'andîl li jor dinhêr'î, dil da h'ezar derd bê derman,
Digo: „K'engê negirîya me, ku negirîm ez bê guman,
Çawa dîtî ku çetine, dûr k'etin jî sed car çetin,
Ji meriv h'eta merivayê çetine r'ê, zore çetin“.
942. De'ba vedixar hêsirê wî, t'evî xûnê ç'e'v r'ijîya bûn,
Agirê dil da dişewitî, alavî wî kê mî ne dibû,
Wî T'înat'în bîr danî û derdê wî hê zêde dibûn,
R'onayî bû ser lêvê gul, k'ûra r'oê kê mî ne dibû.
943. Gul ç'ilmisî û xeyîrî, dara çinar xemil danî,
Lal û bîlar r'eng guhastin, lerzek lê bû birqa e'yînî,
Li ber derda sekinî bû, sîng k'uta bû dergê mirinê,
Bira tarî nebe zende, wexta Şexsa xwe hîşt t'enê.
944. R'oê r'a go: „R'oê, dibêm nûra te ya T'înat'înê,
Ew mîna te, tu mîna wê, dixemilînin hûn vê dinê,
Dûr va wexta te dinhêr'im, boyî min safî, dibî guman,
Çima ji min xeyîdî, dilêm qer'imî, heme heman.

945. Heger r'ojê dîr dik'evî, dil p'eyîda dibe zivistan,
Min wê du r'oj unda kirine, dilêm çawa neke e'yan,
T'ek zinarê ker'î bê r'uh' nalerize ber derdane,
Birînê r'a k'êr dermane, wexta wex'em birînê da ne“.
946. Berbi e'zman wî dinhêr'î, ç'e'vê girî r'oê r'a go:
„Bêje r'oê, bê hevalî, lavayî dikim, te dil min sot,
Tu ku nimza bilind dikî, dighînî bextê p'adşayî,
Ji h'izkiryê min dîr nexê, r'oja geş min neke tarî.
947. Were Satûrn ser derdê min derd zêde ke giriyam – girî,-
Dilêm kula tu hê r'eş ke, derda li min bike tarî,
Çawa merk'ev tu min bar ke, derdê dinê be barê min,
T'enê ku tu wê r'a bêjî: „H'uba me r'a ewe amin“.
948. Êh, Yûpîtêr t'eweqe dikim bike sîlih'a r'ast Xudêti,
Were r'astî sîlih'ê bike, h'izkiriya hev neqetîni,
Gune xwe r'a qazanc nekî, p'êpes nekî r'astiyê dinê,
Ez bê sûcim, sîlih'ê bike, daxê nedî ber birînê.
949. Were tu Mars bi hêvşandin şûrê xweyî tûj dilê min xe,
Bi zerpa te, xûna sor r'eng ke, sîngem bê qedaxe,
Jê r'a bêje tu derdê min, bi zimanê vê xûna min,
Tu xwe zanî wa h'eliya me, eşq û bext ne p'ara min.
950. Were Vênêr tu hênîk ke r'uhê minî wê şewitandî,
Ya şirdana dur'ê bibira lêvêd mircan nitirandî,
Tu bedewa dixemilînî bi nûra xweye bîlarî,
Sews kî yekî mînanî min belengazî, hêsîr, jarî.
951. Bê Mêrkûrî xêncî te, mîna k'êye bextêm tarî,
R'oya ku min dizêrîne, dişewitîne bê ît'barî,
R'ûnê derdêm bide k'ax'ez, tu hêsirê min bike h'ubr,
Ezê bibim mîna mûkî, qelem destê te da bik'ir.

952. Hîvê tu min gunek'ar ke, dibînî wê ez dih'elim,
Ji r'oja xwe t'ije dibim, vala dibim û dişewitim,
Jê r'a bêje tu derdê min, bi k'eserê fikira dikim,
Ez ya we me, min nekuje, t'enê bona wêya nemirim.
953. Wê şe'dê min miqer'imîn hevt siteyîrkê li e'rşê jor:
R'oj, Satûrn, Yûpîtêr, Mars mi r'a digrîn bi hêsirê zor,
Hîv, Vênêra û Mêrkûrî şewqa xwe va bibin şe'de,
Jê r'a bêjin çi agirî şewitandime ez bê we'de“.
954. Ew wa berbi dilê xwe bû: „Namiç'iqin hêsirê te gur',
Bêje mirinam çi k'ar te r'a, ku cina r'a biratî kir,
Keziyê yaram usa r'eşin, mîna baskê teyîrka r'eş,
Ku ber derda tamîş nadî, ku tamîş dî ber r'oja xaş“.
955. Go: “Baş ewe ku ez bijîm, dibe derdê min sahil be,
Dibe Şexsa xwe bibînim, dibe cefam giran nebe“.
Dengê bilind ewî sitira usa zelûl û usa xaş,
Dengê bilbil ber dengê wî mîna dengê qijka r'eş.
956. H'eta de'ba ji dengê wî banzda bûn û dihatin wê,
Ji h'unurê k'ubra wî bû, kevir r'adibûn ser r'ûyê avê,
Ew jî dibhên zendegirtî, digrîn ew jî mînanî wî,
Şi'êrkî distirê ji hêsirê wî, av dibe gol li dora wî.





AVT'ANDÎL R'ASTÎ P'İRÎDON TÊ

957. Ç'e've girî ew e' gîta h'evt r'oyî k'ener r'a çû.
R'okê wî dî gemîk wêda wê be'rê da xuya dibû,
Derk'et k' enar wî wan pirsî: „Mi r'a bêjin, k'ê k'êne hûn,
Çi dewlete, çi welate ew welatê mêvanin hûn?“
958. Wana wa go: „H'usilcema, bejin – balê va e' gîfî tu,
Bedewî tu, em nikarin te nepesinin, hêjayî tu,
Eva heye ser sînore, wîyalî t'urke, vîyalî P'irîdon,
Emê bêjin em k'î alî ne, tu me bûyî şemala r'on.
959. Vir Nûradîn – P'irîdone p'adşê welat û p'adşê me,
E'gît, t'ûre, merd û bêşaw, syarê hêjaye xayê me,
T'une yek ku bikar be alt'ke e'gîte meyî nûr,
Me r'a xayîye, bi dîndarê gendî r'oye ew bê qisûr“.
960. E'gît wa go: „Birayêd min, r'astî meriyê çi r'e'm hatim,
Hema p'adşê we digirim, bêjin çawa wî bibînim,
Çiqa her'im ku bighîjimê, çiqazime r'ewîtiya min“.
Gemîçî bûn jê r'a r'êbir, r'ê nîşan dan sitqê amin.
961. Jê r'a gotin: „Ev r'ê diçe h'eta şêherê Mûlx'azanzar,
E'gîte me wir dimîne, p'adşa P'irîdon r'e'm, bê azar,
Dême k'ubar, bejina çinar r'îya deh r'oja tuyê her'î,
Birê xerîb te dîndarê şewitandin em çi teherî“.

962. Avt'andîl go: „Ew çawa bû hûn şewitîn bi bextê min,
Ew çawa bû hûn bend kirin gula betreng ser dêmê min,
We bidîta wexta ku hê ez k'ubar bûm gendî wek şêr,
K'ê didîtîm, dîgo, wele nûre, neder, eve sitêr“.
963. Ew çûn, t'enê wî da ser r'ê, li ox'ira xwe wî r'ik'êv kir,
Dilê h'esîn e'gîtê me bejina xwe ser hespê mêl kir,
Aza hespê xwe berda bû û bîr danî r'ojêd buhurî,
Qeyî te dîgo, gul dibarin, şil dikin dêmê bîlarî.
964. K'ê ku r'ê va ew ku didît, r'ezadilî dibûn xulam,
Dihatî ku wî sêtî kin dîndara wîye bê xumam,
Ne dixastî jê dîr k'evin, deqekê wî bihêlin t'enê,
Yekî beled pêr'a dadanîn, yan jî pêr'a dik'etin r'ê.
965. R'iya dirêj wî zû bir'î, gihîşt şeherê Mûlx'azanzar,
Besta berda t'ijî bûn wê nêç'îrvanê sîlih'azar,
Deng didan hev, bi h'ezara nêç'îrvana r'ê digirtî,
Mîna te'viya davîtin tîr, teyîrede û de'be dîkuştî.
966. Wira yek dî û jê pîrsî derheqa wî leşk'erî da:
„Çi leşk'ere û k'ê ne ew, çi fûrîne wê bestê da?“
Cav wê sitend: „P'irîdone, p'adşaye li Mûlx'azanzar,
Eva ciyê nêç'îrêye, binhêr', naê gotî bi zar“.
967. K'ubar k'et r'ê, hesp r'ik'êv kir, çû ew berbi wî leşk'erî,
Eşq k'ete dil, bi çî teherî bidîm pesîne wî camêrî,
K'ê ku nêzîk lê dihêr'î, dişewitî tîna roê,
Jê dîr dik'et, diqer'imî, unda dîkir sewda li wê.
968. Ser leşk'er r'a teyîrkî mezin zor da baska, bilînd fir'î,
Avt'andîl hesp zengû kir wê, carkê hewa wî nihêr'î,
Tîrek avît û ew teyîra jorda anî li ser e'rdê,
Peya bû, bask lê bir'î, dîsa banzda li ser hespê.

969. Ew ku dîtin, nêç'îrvana nêç'îr hîştin, t'op bûn ser hev,
Ji her alî berbi wî hatin, r'ê li ber kirin neqev,
Û dora wî k'etin çerxê, t'u alî va r'ê nedanê,
Zar, zimanê wan neger'iya, „K'êyî tu?“ - qe pirs nedanê.
970. Wê bestê da girek hebû, P'irîdon bû ser wî girî,
K'ubar sekînî, çil nêç'îrvan ersawil bûn dora wî,
Avt'andîl berbi P'irîdon çû, nêç'îrvana wir da peyî wî,
P'irîdon e'cêvmayî wa go: „Çi leşk'erê min qewimî?“
971. Xulamek şand: „Here, binhêr', çî qewimiye, ne e'yane,
Çima wana nêç'îr hîştîye, mîna kora hev civiyane!“
Xulam çû û gihîşte wan, gava wî ew e'gîta dî,
Ç'e'v fire bûn, ew bû heyîkel, xeberdanê r'a r'ê ne dî.
972. Avt'andîl ew yeka fe'm kir, ku dixweze bibhê k'êye,
Avt'andîl go: „Her'e, p'adşê xwe silav ke, bê, r'êviye“.
Go: „Merîkî r'êwî me ez, mal hîştîye k'etime çola,
Ji bal birê wî Tarîyêl têm, loma îro hatime vira“.
973. Xulam ku ew yeka bihîst, ajot berbi p'adşê xwe,
Çû go: „P'adşa, min r'o dî li wir, nûr û neder bi şewqa xwe,
Ulmdar jî wî bibînin, wê unda kin sewdayê xwe...
Go: „Ez birê Tarîyêlim, her'e bêje tu p'adşê xwe“.
974. Çawa navê Tarîyêl bihîst, derdê P'irîdon wir bask danî,
Dilê wî zerp usa k'uta, ç'e'v hêsira r'a kire kanî,
Gula dêmê wî ç'ilimisî, jî bijanga borizî bager,
Hatin ser hev, bûne pesin, hazirê wir bûne ewt'er.
975. P'irîdon ji gir peya bû, çû pêşiya wî e'gîfî,
Lê nihêr'î, go: „Ev r'oye, benîademe, yan fêriştî?“
Ew pesinê xulam wî da, ne t'ubû-ber wî e'gîfî,
Ji ser hespê ew peya bû, h'emêz kirin hev e'detî.

976. Usa wana hev h'emêz kir û bîr kirin ku xerîbin,
Yek ber ç'e'vê yekî bedew, usa heva xuya kirin,
Yê didîtin wa digotin, r'o bê şewqe li ber wana,
Min bikujin, dur'ê mîna wan nedîtiye t'u dik'ana.
977. Beranberî P'irîdon navin tu qûl – bende, mêrê mêrxas,
Lê Avt'andîl jî hêjaye pesinê bêqusûr û pesinê xas,
Nûra r'oê mina dike li e'zmana siteyîrê geş,
Mûma r'oê şewqê nade, şevê şewqa wêye guleş.
978. Hespa syar bûn, r'ik'êv kirin, berê xwe dan k'oç'k û sera,
Îdî nêç'îr wira t'erk dan, çi kuştibûn hildan xwe r'a,
Boyî dîtina Avt'andîl wê t'emam hatin h'eta serê,
Gotin: „Gelo, Xudê çawa xuliqandiye ev ji xweliyê“.
979. Avt'andîl wa got P'irîdon: „Zanim, lezî ku bibhêyî,
Ku k'î me ez, ji k'î alî hatime vira çawa r'êwî,
Niha bêjim, ez Tarîyêl xwe r'a bira h'esav dikim,
Ew jî mi r'a dibe bira, ez xwe xulam h'esab dikim.
980. Ez ewledê R'ostêvanîm, nisla p'adşê e'reba me,
Gazî min dikin Avt'andîl, sereskerê dewleta me,
Ez ji nisla p'adşa me, p'adşê çawa kur'hilda me,
Bêsawiyê û mêrxasiyê beranberî ordiyê heme.
981. R'okê p'adşa hespê syar bû, derk'et çolê r'aw – nêç'îrê,
Me Tarîyêl dî li wê derê ç'e'vê hêsir, nêzîkî r'ê,
Zendegirtî em man wira, p'adşê şand peyî, lê ew nehat,
Em xeyîdîn, me çi zanibû, ku wî derdê xwe dinvat.
982. P'adşa bi hêrs esker r'a go: „H'ukum dikim, bigrin, bînin!“
Usa hêsa ew r'et kirin, nexast wira ku şer'vekin.
Hilda yek – yek wî e'rdê da, wan şikênand situ, p'arxan.
Paşê fe'm kir me li wira, şewqa r'oê me bûye e'yan.

983. Wexta p'adşa ew yeka dî, ji hêrsa wî tamîş neda,
Bi xwe syar bû û da pêşiyê, guman bû xwe zende û benda,
E'gît dûr va p'adşa nas kir, sîlih'a xwe bilind nekir,
Hesp zengû kir, demekê da ji ber ç'e'va xwe unda kir.
984. Geriyan, îza wî hil nedan, me go, cin bû yan miliyak'et.
P'adşa hêrs k'et û zivir'î, xwe xurdilî dil ne r'ih'et.
Min qirar kir, h'eta salix jê hil nedim, hêsa nabim,
Xwe vedizî û lê ger'iyam, agirê wî ez dişewitandim.
985. Ez sê sala lê geriyam, t'erka mal û xewê min da,
Sê birê k'urd alîm kirin, yê derba wî ser xwe hil da.
Min dî gula zer ç'ilmisî, nûra kê m wa çetinayê da,
Wî h'iz kirim, h'emêz kirim mîna ewled, mîna bira.
986. Şikevt dêwa sitendibû, bi şer' û xûn r'êtinê va,
Pêştirî wê ew naxweze binhêr'e r'ûyê t'u qûl, beniya.
Agirê h'ubê dide cefê û derdê wî hêsa nave,
Yê ku ew derd wî hêwirand, ce'nime p'ara wî bik'eve.
987. Asmat'e t'ek wê şikevtê da, t'imê hêsir li ser ç'e'va,
Mîna şêra wê xayî dike, ew e'gîta, nêç'îrê va.
Ne r'ih'ete, sewdaliye, t'im digêr'e çol û baniya,
Pêştirî wê ew naxweze binhêr'e r'ûyê t'u qûl, beniya.
988. Em xerîb bûn, lê wî usa dilêm bend kir, ku wî bibhêm,
Serhatiya xwe, h'izkiriya xwe, wî mi r'a go, niha dibêm,
Gelo zimanê min e'vt'erî wê pêk bîne çî kir gilî,
Wî dişewitîne h'esîna k'ûr h'izkiriya wî unda kirî.
989. Mîna hîvê ew digêr'e, bê h'udûre û bê sekne,
Hespê qemer peya nabe, k'îjan p'êşk'êş ku dayê te,
Niha t'u kesî ew nas nake, meriya dir'eve, bûye de'be,
Weyî li min, ku wî bîr finim, r'uh'êm wî r'a t'exsîr nabe...

990. Agirê wî min dişewitîne, hêsir ç'e'vêm dip'er'tîne,
Wî hêsirî e'wt'er kirime, r'uh'êm dînkî dilûbîne,
Ç'iya, baniya derbaz bûme ku wî r'a bibînim ç'arê,
Zivir'im, min p'adşê xwe dî, ew hil dabû melûliyê.
991. Min ji p'adşê t'eweçe kir, ser ox'irê me ku min berde,
Eskerê xwe bê guman hîşt, axîn wan r'a kire p'erde,
Şevedizî ji wir r'evîm, hêsir ç'e'vê min nebarin,
Niha her cî ez diger'im, boyî birînê wî derman bin.
992. Tarîyêl got hûn herdu, wira çawa hevr'a bûne bira,
E'gîtî tu, min tu dîtî, tu hêjayî pesinayî, bira,
Min şîret ke, ku bibînim ez Şexsa wî mîna r'oê.
Dîtîya r'a ew t'ek şabûne, nedîtîya r'a derdê dinê“.
993. P'irîdon jî wir şewitî, Avt'andîl ku ev pîrsa got,
Digirîyan, hêsirê herda dihatin xar mîna sirsot,
Du dilê ku wî bîr nakin, digirîyan bi k'êla dil,
Cewê ji hêsirê wan dik'îşîyan, pê av dan beyîbûn û gul.
994. Û wî wextî eskerê wî dest pê kirin şîn û girî,
Navê sit'ar xwe nehîştin, xûn dik'îşîya dêmêd narî,
P'irîdon wir digirîya, dil da h'esîna h'évt salî:
„Ê, heyî diniya, p'ûç'î, derew, çiqa e'mir dikî xalî!“
995. P'irîdon got: „Ez çi bêjim, çi teherî pesin, bi çi zarî,
Boyî r'eşayê gendî şexsî, tu hê geşî, siteyîrî,
Bo kinêza şabûnî tu, kaniya e'mir û sebrî tu,
Tu r'onaya siteyîranî, e'mir didî, distîmî tu.
996. Çawa ku ji te dûr k'etim, e'mirê min bû min ce'cime,
Boyî te çi heme yanê na... bi h'esîn agirê te da me,
Wexta dûrim, melûl nabî, t'ek dilê min k'ûr dinale,
Ax bêyî te min h'erame ev diniya r'on, k'ûrê da me“.

997. P'irîdon usa me'rifet got ev giliyane bi nivandin.
Hêsa bûn, ker' bûn, k'etine r'ê bê xeberdan û bê gotin.
Avt'andîl bi dîndarê cime'ta wir xwe gêr' kiribû,
Golê h'ubrê bûn ç'e'vê r'eş, bijangêd zerg derxûn kiribû.
988. K'etin şêher, wira dîtin bircke bedew nebînayî,
Hatîn pêşiyê bi p'aşayî, bi qanûnêd merivayî:
Lele, wezîr, bejnêd bilind bi ç'ek, sîlihê kildayî,
Wan Avt'andîl qebûl kirin, h'emêz kirin omidayî.
999. K'etin bircê, k'imk'imî bû bi meriyê her celebî,
Her alîkî pêncî xulam t'ev gire – gir sîlih' h'erbî.
Herdu r'ex hevda r'ûniştin, pesinê wan bidin çi teherî,
Nûra lal, dur' wan difûr'iya, werq dik'et dêmê bîlarî.
1000. Li ber sivrê ew r'ûniştin, h'ezar naz û ne'met li ser,
P'irîdon ber qulix dîkir, qeyî te digo xizme li ber,
Bi derdanê r'eng awazî naz, ne'meta dibin tînin,
Lê k'ê Avt'andîl dinhêr'e, ji bedewiyê dil dişewitînin.
1001. Wê r'ojê kirin xarin, heta şevê k'işand nefes,
Berbangê r'a birin h'imamê û lê kirin gêyîma etles,
Ew libasê ku lê kirin, qîmetê çendik çend h'ezara,
K'ê dikarîbû qîmet daniya ser k'emiyane piştê zêr'a.
1002. Bi dil nedixast wira bima, lê çend r'oja ew ma wira,
T'ev P'irîdon nêç'îr dîkir, wî dilîst bi nîze, şûra,
Teyîr ku hewa wî bidîta, danî xarê derba gûcilî,
Tîravêj ber unda dibûn, ew yekê ku wana didî.
1003. R'okê ewî go Nûradîn: „Niha dengê dilêm bibhê,
Te dûr k'etin mi r'a mirine, ji çûyîna min zirarê bê,
R'êke mayîn ez nabînim, agir da me, nasekinim,
R'iya min dûre, şuxulê ferz, gere her'im, ez namînim.

1004. R'aste ezê te dûr k'evim, hêsirê bên ji ç'e'vê min,
Lê ku neçim, ez nikarim agirê alava dilê min,
K'etin r'abûn ya r'êwiyane, bira bibe dersa r'êwiya,
Tu min bibe wir ku te dî ew nazika Şexsa Xuda“.
1005. P'irîdon go: „Ez nikarim ji ox'ira te te bidim paş,
Zanim, nikarî bisekinî, derd ser dilê te biye beraş,
Her'e te r'a ox'irê dixwezim, dijminê te binik'isin,
Lê tu bêje, ezê bêyî te çawa, bira, tamîş bidim.
1006. Îzinê bide te r'a bêjim, neheqiye t'enê her'î,
Mêrê mêrxas te r'a dayînim, çawa hogir, çawa merî,
Hespkê te r'a û qant'ir'kê ku big'r'îne nvînê te,
Ku hilnedî, tuyê p'oşman bî, wê biç'ilmise gula te“.
1007. Çar e'gîtê ît'bar daê çawa xulam ser ox'irê,
Ç'ek, r'ih'alê cengê danê, t'eve zirî, mxerm, girê,
Wî şêst lîtr zêr'ê zer da, hela hinekî ji wê zêde,
Hespek daê bi zîn, mûsat ya mîna ba ku qil dibe.
1008. Û qant'ir'ek ewî bar kir bi nvînê xas qûş t'ûkî,
Ew kire r'ê û P'irîdon ver'ê kir ew hemanekî,
Hev dûr k'etin, ber ç'e'va bû û dilê wî dizariya:
„Wekî r'o me dûr nek'eta, zivistan me nedihawirîya“.
1009. Dengê çûyîna wî e'gîtî nava wan da bû şar'ewar,
Hatîn, hatîn şihelû wir, hatîn qihar, hatîn t'ucar,
Dengê wanî şîn û girî mîna e'wra net'ebitî,
Go: „Em hîştin wî e'gîtî, dilê xuşûş, ç'e'vê girî“.
1010. Şiher qetiyar, çûn gihîştin ew k'enarê be'ra li wir,
P'adşa P'irîdon ku dîtibû ew şemala mînanî dur',
Û wir wana ji hêsira ç'emê xûnê wana r'okir,
Û carke din P'irîdon wê serhatiya r'oê gilî kir:

1011. „Xulamêd zeng anîn vira bi gemiya mîna Şexsa,
Diran sedef, navê narî, dêmê xeyîrî mîna qûla,
Min kû dîtî, hesp zengû kir û şûrê xwe bir û anî,
Dûrva dîtî, r'evîn û çûn, min ît'bar be'rê neanî“.
1012. Herda wira hev h'emêz kir, wana r'êtin hêsirê gur' ...
Bi h'esîn wan hev r'amûsan, wir t'eze bûn derd bê buhur.
Herdu li wir hev dûr k'etin ew bi h'esîn mîna bira,
P'adşa ma wê, ew k'ete r'ê, milmilî mîna şêra.





AVT'ANDÎL DIÇE NÊSTAN – DARÊCANÊ BÎGERE. R'Ê DAR'ASTÎ KAVRAN TÊ

1013. R'ê da diçû, xeber dida wî e' gîtê mîna hîvê,
R'onayîke t'eze da dil, bîranîna T'înat'înê,
Wî digo: „Em hev dûr k'etin, gunê teye bextê qomsî,
Ç'ara birînam destê teye, dewsa derman min bûyî sî.
1014. Çima dilêm bi sê agira gere awa bişewitiya,
Çima gere zinarkî berk' ser sê p'ara bela bûya?
Ax sê birîn bi nîzekê dilekî da k'engê vebûye,
Heger e'mir wa te'l bûya, ew yeka bi destê teye“.
1015. K'endarê be'rê r'a diçû, çar xulam bûn hewal pê r'a,
H'iş, sewda t'enê ew bû derman, diger'îya Tarîyêl r'a,
Hêsirê ç'e'va mîna lêyê şev û r'oê dihatin xar,
Ber ç'e'vê wî diniya qirş bû, qirş bê fiyat, qirşkî bê k'ar.
1016. Wexta r'astî yekî dihat, yan r'êwîkî xerîb didit,
Pirsa Şexsa xwe wî dikir, sed r'o awa wêda avît,
R'okê sekinî ber girekî, di kavrane, gemîke wir,
Kavranvan wir sekinî bûn, me'dekirî, t'ercbe kir.
1017. Devê be'rê sekinî bû kavranekî p'ir'î giran,
Belengaza turiş nedikir ku ji ciyê xwe bih'ejiyan,
E' gît dûrva silav daê, silava wî wana vegirt,
Go: „K'êne hûn, hûn t'ucarin?“, xeberdanê r'îya xwe girt.

1018. Ûsam bû serekê kavran, extiyar bû ew û p'ir' aqil,
Qedre e' gît ewî girt wê, dia' li wî fikir bi dil,
Paşê gotinê: „R' oja nedîr, tu me r'a bûyî e' mir û dîrek,
K' erem ke hespê peya be, salix, sûlix hene gelek“.
1019. Ew peya bû, wana wa go: „Em t' ucarin, Bex' dayêne,
Em Mih' emed dih' ebînin, şerav ayîn ne p' ara me,
Ew şehere p' adşê be' ra, gere em wê bibin mêvan,
Çux û zerbab me aniye, eşiyayê baş bikin e' yan.
1020. Hema vira, vî k' enarî, me merîk dî seh' et buhurî,
Wexta wî r' a bûn alik' ar, ser h' emdê xwe ew zivir' î,
Me go: „K' êyî, bêje bira, çima vira çi qewimî?“
Wî go: „Be' rê da wê we bikujin, qaçaxin fena agirî“.
1021. Ji Misirê k' etine r' ê bi kavrankî p' ir' î giran,
Em derk' etin ser be' rê bi eşiyayê qîmet giran,
Gemîçiya bi kêrana sêrî va gîsn usa me dan,
Em t' ev k' etin, nizam çawa ez gihîştîme li van deran“.
1022. Eve me' ne, şêrê Xudê, çima vira em sekinîne.
Wekî niha em r' ê k' evin, h' esav ke hebûn ya me nîne,
Ser be' rê wê me bikujin, qewata me şer' a t' une,
Îdî ne virda, ne wêda, r' ê ber me unda bûne“.
1023. E' gît wa go: „K' ê ku tirsîya, ew dîde der, wê bizan be,
Çi ku Xudê h' izkiriye, ewê e' se biqewime,
Ez wek' îlê xûna we me, bira xûna min min şil ke,
Şûrê mine şûrê heqiyê, dijminê we qet – qetî ke“.
1024. Şabûn k' et nav karvanvana, eşqê dilê wan da fûr da,
Go: „E' gîte eva şêra, ne mîna me qirafetda,
Ew qewata xwe begeme, em jî hinekî bibin mêr“.
K' etin gemiya li ser be' rê, dîr nek' etin ew ji k' enêr.

1025. R'oke xaş bû, te'v û hêsa wan be'rê r'a r'ê diqedand,
Wan r'a pişt bû Avt'andîl wê, wana minet nedik'işand.
Nişkêva gemîk hate xuyan bi beyîraqê r'eşe û mirq,
Wana dîtin ew k'ênarê gîsin, gemiya ku dike xirq.
1026. Dihatin ew bi k'er'ana, qûrîn, qûjîn, hewarza bûn,
Cime'ta ser hate xuyan, t'ucar îdî tirsîya bûn,
E'gît wa go: „Hûn netirsîn, saw ku heye ew mirine,
Îro gere ew vir qir'bin, yan na, îro mirina mine.
1027. Wexta Xudê min h'iz bike, ordîkê ber yekî qir'be,
Wexta Xudê nedûmîne, zerga minê destê min be,
Min xayî nake ne bira, ne birc û kela, na jî t'abî,
K'ê vê zane, wê mîna min şer'ke, e'gîtî r'ih'a bî.
1028. Hûn merîne alvêrê ne, hûn nizanin şuxulê cengê,
Xwe sepe kin, xwe veşêrin, ku we negrin derbê h'erbê,
Hûn binhêr'in bi van zenda çawa wana bînim r'aê,
Bi xûna wan gere sor be ev gemiyê hane qet'ilê.
1029. Mîna piling sivik r'abû, xwekir k'incê xweye zirî,
Gurzê pola da destê xwe, li ser gemiyê ew fitilî,
Wî banzda ser pêşîya gemiyê bê saw, mînanî ezrahîl,
Wî şûr k'işand, k'ê ku ew dî, t'urê derba şûre ser wî.
1030. Kirin qûr'în wan hereviya, qûr'îna wan ker'ne dibû,
Bilind kirin k'ênarê gîsin, serê wê berbi gemiyê dibû,
E'gît ser pêşîya gemiyê, k'incê zirî bê minet bû,
Gurzek lê da k'ênar şikênand, boyî t'emama ew e'cêb bû.
1031. K'êran ku k'et, e'gît cîda mîna şêra sekinî bû,
Saw k'ete ser heraviya, r'îya r'evê h'ezarî bû,
Wî banzda ser gemiya wan û heravî dan ber şûra,
Wî kes nehîşt li ser niga, yê sax jî cî nedih'ejiya.

1032. Mîna bizina ew qir' kirin, îdî wan da sut'ar nehîşt,
Hinek digirt davît be'rê, hinek bin p'iya kire benîşt,
K'om – k'om digirt, li hev dixist, fikir qisîl wî heravî,
Yê birîndar r'ex ciniyaza vedileziya, nedir'evî.
1033. Û ew cenga ewî alt' kir çawa dilê wî ku dixast,
Yê sax mabûn lava dikirin, ku wan berde „nûra almast“.
Ew nekuştin û kirin dîl, k'îjan nefes hebû berda,
P'êxembera r'ast gotiye: „Tirs h'izkirinê dide benda“.
1034. Bende, mîna k'êfxaşa, tu t'u car qewat xwe nepesine,
Qewata te çiyê, Xudê ku ardimiyê ew nede te,
Dar e'sh'ebe wê bik'eve, ji pirîskê bibe xwelî,
Xudê h'iz ke darê bibir'e, birînê veke wek şûr e'ynî.
1035. Avt'andîl wê gemiyê da dî him xizne, him eşya bê h'ed,
Gemiya xwe va ew girêda, wan fire kir mezîl wek e'rd,
Dêmê Ûsam geş bû li wir û sawa wan bû eşq, şayî,
Siyamet xastin Avt'andîl r'a û dil dan wê pesinê wî.
1036. Bona pesinê Avt'andîl wê h'ezar dev wir hevr'a vebûn,
Bona cenga ku ewî kir, ziman jî wê bê h'unur bûn:
„Siyamet te r'a r'oja şemal!“ – kavran t'emam hevr'a deng da
„Tu r'oyî, te r'onayî da me, şeva tarî tu bûyî şemdan!“
1037. H'emêz kirin û r'amûsan dest û nigê wî e'gîfî,
Pesinê hêja r'ewa kirin yê heravî kirin p'irtî – p'irtî,
Zana jî ku ew bidîta, wê unda kira h'iş û sewda,
Gotin: „Em bûn çetinayê da, kirî dîrek me r'a Xuda“.
1038. E'gîf wa go: „Şikir Xuda, guhdare ew şikevta xu da,
Xastina wiye vê diniya me çî diqewime pêda – pêda,
Xêr û şer'ê vê diniyayê bi xastina wî mîaser dibin,
Bihar bikin, ku t'ev zane li ber wî kunde dibin.

1039. We dî Xuda ça xilaz kir hûn t'emam ji qeziyayê,
Ez çime, xaliya nigê wî, minê çi k'ar bida gaziye,
Dijmin qir' kir, xilaz kirin, ew qirar bû, min soz dabû,
Niha hildin vê gemiyê barê wî xizna eşiya bû“.
1040. Çiqa başe mêrê e' gît ku şer'a da ew alt' dike,
Nava k'oma hevala da navê baş ku qazanc dike,
Nenihêr'e ku şerm dikin, lê zor dikin pesinê wiya,
Heger birîn ku ser heye, p'adşatiye qedirê wiya.
1041. K'etin gemiya ku hilda bûn, şuxulê r'oê nema sibê,
Lê nikaribûn h'esav kirana, bê h'esav bû xizna li wê,
T'ev k'işandin hebûna wan, kirin gemiya xwe wê r'oê,
Hûrxaş kirin û xirq kirin, h'esav nekirin qîmetê wê.
1042. Ûsam ji navê t'ucara awa wî gote Avt'andîl:
„Saya teye, ku em hene, Xudê me r'a kirî delîl,
Çî me heye, t'ev ya teye, em jî bendene xayî hurmet,
R'ezadîlî çi bidî me, ber te nave xeberdan qet“.
1043. E' gît wa go: „Geli bira, hinekî pêşda min aha got,
Xudanê hêsirê we nihêr'î, dilê neferê we nesot,
Xudayê min xilaz kirin, çi me ez, min nepesinin,
Ez çi hildim, çî mi r'a ne, t'enê ezim û hespê min.
1044. Min bixasta dewlet, hebûn, xizna zêr'a û t'ent'enet,
Min ne dihîşt hebûna xwe, bê h'ed lal, dur', kevirêd qîmet,
Çî mi r'a ne eşiyayê we, min çawa got, we ver'ê kim,
Ser ox'irê me, bi şuxulê xwe mirazê xwe ez hasil kim.
1045. Ev hebûna ku min hil da ber ç'e'vê we bi mêranî,
Çawa dixwezin hev bela kin bi sitqê sax û e'dlayî,
T'enê tişkî neyaz dikim, herkes ji we giliyem bibhê,
Nav we da ez t'ucarkim, kes sur'a min bira nebhê.

1046. H'eta ku we'de neyê, hûn nevêjin ku ne serekim,
T'u car nevên sereskerim, t'enê bêjin t'ucarekim,
Ezê mîna we li xwekim, t'ev we bikim al û vêrê,
Hûn sur'a min dîhar nekin boyî xatirê biratîyê“.
1047. Xeberdana wî e' gîfî dilê t'ucara ze'f xaş hat,
T'eva serê xwe ber danî, jê r'a gotin dilê r'ih'et:
„Tu guman bûyî, tu bûyî te em xilaz kirin ji xezayê,
Em t'emam jî te r'a xulam, nûrî tu şewqa r'oê“.
1048. Gemî diçû, egle nedibû, we'dê xwe wan unda nedikir,
Hewa xaş bû, be're hêsa, gemiya be'r meqes dikir,
Wan Avt'andîl h'emêz dikir, didan pesinê mêraniya wî,
P'êşk'êş kirinê dur'ê sipî, sipî mîna diranê wî.





SALÎX DERHEQA GIHÎŞTÎNA AVT'ANDÎL GULANŞEROYÊ

1049. Avt'andîl be'rê derbaz bû, bejin bilindê, bejin tîtal,
Gihîştin şîher, dorê bax' bû, gulistana bi gulê al,
Her cûreyî gul û beyîbûn bûbûn xemil li bestê wê,
Çi zimanî ezê bidim met'h'ê hêja, bedewiya wê.
1050. Bax'êd wir va gemî girêdan bi şîrîtê mih'k'em, qewîn,
Avt'andîl wir cube xwe kir, r'ûnişt ser k'ursîkî mit'în,
Çend dehanî p'ale anîn û k'ivş kirin r'oheqa wan,
Avt'andîl wê alvêr dikir, mîna t'ucarekî e'yan.
1051. Xayê wî bax'î hate wir, ber k'îjanî hêwirî bûn,
Li Avt'andîl wî nihêr'î, dêm va k'îjan e'yîni r'o bû,
Avt'andîl wê gazî wî kir û xeberdan wa dest pê kir:
„K'ê ne hûn û çi miletî, k'êye p'adşê vî welatî?“
1052. „Niha yek – yek mi r'a bêje, deba vira tu r'ind zanî,
Çi vê derê qîmet dike, çi bihayê, çi erzaniî“.
Wî go: „Vira min tu dîtî, r'oyî, hêjayî pesinanî,
Çi ku zanim ezê bêjim, pirsaxê xelîfe bi gumanî.
1053. Be'rê r'îya deh mehane e'rd û xweliya vî welatî,
Ev şîherê Gulanşero qhare bi her ne'metî,
Çi dinê da qîmet biha bi be'rê tê vî welatî,
Melîk – Sûrxave xweyî r'ecal, ewe p'adşê vî welatî.

1054. Çi extiyariyê ku tê vira, nikare ku cahil nebe,
K'êf û r'eqas, eşq û şayî, wê çawa be ku şa nebe,
Sal donzde meh lê şîn dibin h'ezar t'ewnî gul û beyîbûn,
Her kes xaziyê li me tine, dijmin – e'ciyê îdî r'et bûn.
1055. T'ucarê baş ku bibîne, yêreke wa vê qirarê,
Al û vêre, heger ku yek zirarê dike, deh dike k'arê,
Vira be'ra hebûnêye, k'esîb zû dibe dewletî,
Salekê da mêrê xîret bibe xayî xizne, e'detî.
1056. Ez bax'vanê H'usênim, ewe serekê t'ucara,
Niha ezê te r'a bêjim qirara wî eve vira,
Ewe xayê vî bax'î û hebûna vir p'ir' bê qeyas,
Pêşiyê gere bibî cem wî nîşandêyî eşiyayê xas.
1057. Pêşiyê t'ucar bi hedayî digrin qedirê wî maqûlî,
Ber wî vekin barê eşiya, çi qîmete babetî wî,
Ew hil dide, qîmet dide xiznedar ji xizna wî,
Paşê îzina wana dide ku alvêrê bikin sêfî.
1058. Borcê wiye ku t'eglîf ke mêrê mîna weyî maqûl,
T'emam karvan cî û war ke, û xulam ber bibin dax'ûl,
Ew ne vire, bîranînê bi vê yekê çi bide me,
Kes nikare mînanî wî ku hurmetê we bigire.
1059. Fatman xatûn t'enê male, jina H'usên, gendî xatûn,
Qedirgire û mêvanh'iz, dêmî eşqe, ziman alt'ûn,
Derheqa wê da ezê bêjim, wê t'eglîf ke ew we malê,
Ewê meriya bişîne, lê mêvan bî e'se li wê“.
1060. Avt'andîl go: „Usa bike, çawa dilê te dixweze“.
Bax'van bi eşq r'abû û çû, xûdan dêmê wî dibeze,
Çû Xatûnê r'a kir gilî: „Xatûn, mêvanek hatiye,
Gendî r'oye ew e' gîta, t'ercibê wî te ne dîtiye.

1061. T'ucarakî xerîbe ew xayê kavranekî mezin,
Bejin çinar û şîşmanî, dêm va şemal, r'oye pesin,
Libas û cuba usa lê tên, îlahî ew e'ba ber wî,
Gazî min kir, ji min pirsî qanûnê alvêrê ewî“.
1062. Fatime xatûn wir p'ir'şa bû, deh xulam şand, her'in bînin,
Karvansera wê hazir kir û eşiyayê wî cî didin,
Ew e'gît hat, bîlar bû, lal, p'or'ê sêrî mîna şebe,
K'ê lê nihêr'î, go: „Pilinge, bengzemîşî şêra dibe“.
1063. Deng bela bû, hatin t'op bûn wê ehliyê wî şîherî,
Vî alî – wî alî dikirin gazî: „Bihêl, bibînin wî şêrî!“
Dilê hinka agir pê k'et, hinka wir unda kir sewda,
Jina qerf mêrê xwe kirin, dik'eniyan agir dil da.
1064. Pêşiyê da hat ber dêrî Fatima xatûn, jina H'usên,
Bi dil ewê silav dayê, k'en ser dêmê wêya bû deyîn,
Pirs û cava k'etin serê, herdu r'ûniştin r'ex hev,
A'ciz nebû ji hatina wî Xatûna meye bedew.
1065. Cahil nîbû Fatima îdî, lê cahîla hê jîrtir bû,
Dêmê gulover', dêmê qemer, bejin tîtal û nazik bû,
Wê h'iz dikir meriyê dengbêj, şerava r'ind, k'êf û şayî,
Xwekirina libasê bedew, p'erç'êd biha h'ezar r'engî.
1066. Fatima Xatûnê wê şevê hurmeteke baş jê r'a kir,
E'gît jî bi merdaya xwe hedayê baş ew r'ewa kir,
H'erda jî bi qedir, hurmet, me'rîfetî hev şa kirin,
R'ind k'êf kirin, dereng r'abûn, qesta hereina xwe kirin.
1067. Sibê r'a wî eşiya vekir, wî nîşanî Xatûnê da,
Çi ku baş bû jê r'a bijart, wê qîmetê wî da ser da,
„Bibin!“ – wî go xulama r'a, xulama hil da ku her'in,-
Go: „Her'in alvêra xwe bikin, lê sur'a min dîhar nekin“.

1068. K'incê xwe wî veşartibû, wir k'incê t'ucara bû lê,
Carna Fatimê gazî dikirê, carna wî gazî Fatimê,
R'ûniştin, xeber didan, xeberdana wan bû şîrin,
Fatiman usa hîviya wî bû, çawa hîviya Vîs bû R'amîn.





DİLÊ FATMANÊ DİK'EVE AVT'ANDÎL

1069. Ku fesale, başe merî xwe k'ulfetê dûr bigire,
Pirsê şîrin dike t'elê, diêlimîne, r'ê digire,
Hew te dî, bi xayîntî, mert'alê te pola hûr kir,
Ku usane bira mêr qe ît'bara xwe jinê neyînin.
1070. Dilê Fatimê t'ijî bûbû bi evîna Avt'andîl wê,
H'ub mezin bû, bû kuç'ikê gur', bû hêlepîtk k'îşîya jê,
Wê cefa dî ku veşêre, bê t'aqet bû xayî ke h'ubê,
Hêsirê xûnê wê wir dir'êt: „Bibhê, dilê min çi dibê...
1071. Bêjimê, tu were hêrs k'eve, bê îlacim, ç'aram t'une,
Ker'bim, ez tamîş nadim, h'uba min hê gur' dibe,
Bêjim... çi dibe, bira bibe, yan bimirim, yan bimînîm,
Derdê xwe ku ez zanim, derdê xwe r'a ez h'ek'îmim“.





NE'MA FATMANÊYE H'IZKIRINÊ
AVT'ANDÎL R'A

1072. Ne'me nivîsî wêya bidil, ne'me şand wî e' gîtî r'a,
Wê h'uba xwe aşkela kir, ç'are nekîr îdî dil r'a,
K'ê guh bida ne'ma wêya, wê bi h'ubê xwe ç'e'l kira,
Hêja bû ku bê veşartin, ne layîq bû unda kira.
1073. „Bi qirara Xudayê min, çawa r'o tu hafî dinê,
K'ê ku ji te dîr dik'eve, dilê xwe dike nava k'ûrê,
Tu dikarî nêzikî xwe bişewitînî ava gur',
Siteyîrê nûr r'onaya te ew hîlfînin bê sêr û sur'.
1074. K'ê te dibîne, te h'iz dike, bê sewdaye û belengaz,
Gulekî tu, çima bilbil ser te nakin ew gaze – gaz,
Wê h'uba te gula vedike, lê gula min diç'ilmise,
Ku nûra xwe nedî ser min, tu mirina min bih'ese.
1075. Xudê şe'dê min vî gilî, bi tirs dibim evê yekê,
Ez p'erîşanê, çî bêjim, teyax nakim li vê dinê,
H'eta k'engê bijangê te dilê min xin zergû tîra,
Heger dixazî min xilaz kî, zû were tu hema vira.
1076. H'eta ji te ez bistînim cava mi r'a ku binvîsî,
Dixwezim bibhêm, min dikujî, yan vê cefê xilaz dikî,
Îdî ezê wa tamîş dim, bibim cefa birîna dil,
Yan bimirim, yan bimînim, tê kim zarîn bi ç'e'vê şil“.

1077. Fatman xatûnê nivîsî, pêr'a – pêr'a wê ne'me şand.
Lê wî usa hêsa dixand, qeyfî te digo, xûşkê ew şand;
Wî go: „Heyî wax, ew nizarîe bi derdê k'ê ez dişewitim,
Bi çi wê xwe bengzemîş ke t'ev wê, ya ku jê h'iz dikim.
1078. Çi qijkê r'a ne gula al, bêje, bi çi ew heqlebin,
Bilbil gulê dûr dik'eve, k'îlamê eşq nake hebin,
Kine, dirêj r'îya şuxul, bext t'u xêrê wê r'ê nayîne,
Çi ne'meye binhêr' nivîsiye, çi teherî ew hev aniye“.
1079. Wa fikirî, gunek'ar kir fikira xwe da ewî Xatûn,
Wa fikirî: „T'enê ezim xu r'a dîrek, heyî bê kes bûm,
Bona wêya, k'ê diger'im, bûme teyîrkî ez bê hêlûn,
Çi bixaze, ewê bikim, ort'a min dil t'une yekbûn.
1080. Ew k'ulfeta vir dimîne, r'astî gele, geleka tê,
P'ir' r'êwiya sit'ar dike, hurmet dike ew boyî Xudê,
Dibe salixekê bike, çima derd r'a ez bûme qûl,
Borcê xwe biqedînim, şuxula bêkêr bibim dex'ûl.
1081. Heger k'ulfet ku yek h'iz kir, dil bi ît'bar ew dispêrê,
Şerm û e't'bê ew bîr dike, dîle bona şuxula kêrê,
Sur'a xwe t'ev aşkela ke, wê dilê xwe ber te veke,
Başê her'im û nişkêva, te dî, salixkî jê se kim.
1082. Nikarî tu tiştî bikî ku sitêra te jor nak'ene,
Çi dixwezim, wê nabînim, çi naxazim, pêşîya mine,
Diniya dibêyî mije, tarî, ji wê mijê em dernaên,
Bi çi cêr'ê teye t'ijî, ewê jê bê, dur' jê naên“.





AVT'ANDÎL BÎ NE'MÊ CAVA FATMANÊ DÎDE

1083. Wa nivîsî: „Min xand ne'ma te bi r'uh' va şandibû mi r'a,
Ez bend kirim, dişewitim, ez bûme qûl h'uba te r'a,
Ez jî mîna te dixwezim, ku cem hev bin bi evîntî,
Bê şubeye, ku h'uba me evîntiye û ziyaretî“.
1084. Zimanê min kêmh'unire, bêje, Fatman çiqê şa bû:
„Bese, - nivîsî, - ku bêyî te mam, hêsir ç'e'vêm zîha nebû,
Vê êvarê heremê da ezê t'enê bim r'ûniştî,
Bextê minî, tu zû were, wexta te dî ku bû tarî“.
1085. Xulam hema wê êvarê ev ne'ma han da Avt'andîl,
E'gît diçû, xulamekî din r'astî wî hat, kin bû mezîl,
Xulam wa go: „Fatmê gotiye îro neyê, hazir nînim“.
E'gît fikirî, ber xwe nek'et, go: „Vî gilî bicêr'bînim“.
1086. Ew ji wê r'ê veneger'îya, nenihêr'î ku cav sitandibû,
Çû hundur'wê dara çinar, jin p'êşmûrde r'ûniştibû,
Avt'andîl ku wê nihêr'î, t'ercbe kir, bê me'de bû,
K'ulfetê xast jê veşêr'e, lerizî, h'ukumê h'ubê bû.
1087. K'îp r'ûniştin, hev r'amûsan û xeberdan dirêj kirin,
Xortek sekinî li ber dêrî, melkemot bû weke mirin,
K'ete hundur, xulam pê r'a bi şûr, mert'al sîlih' kirî,
Avt'andîl ku ew dî, t'urê hasê bû ç'iyakî zirî.

1088. Fatmanê li xort nihêr'î, r'eng lê çû û ew lerizî,
R'ûniştina usa nêzîk xort dî, cî da ew tevizî,
Go: „Hurmetê te dinhêr'im, dibînim çî r'ojê da nî,
Sibe r'on be, ezê r'eş kim şeva teye eşq, nûranî.
1089. Qeh'be, tu bi min k'eniyaî, îdî te ez kirim sosret,
Sibê tuyê bighîjî wê çî ku heqe, wa bê minet,
Sibê usa bikim ser te, goştê lawê xwe tu bicûyî,
Ku ez nekim, t'û ke r'ûyê min, bêje, ku tu nemêr bûyî“.
1090. Got, dest avît wî r'ûyê xwe, dêrî va ew derk'et û çû.
Fatmê dêmê xwe anî xar, herdu desta wê p'or' ver'û,
Hêsirê wê bûne kanî herdu ç'e'va k'îşyan xwexwe,
Wa kir gazî: „Min bikujin, ev çî anî min serê xwe“.
1091. Digiriya: „Min kuştin him mêrê xwe, him jî zar'o,
Hebûna xwe min t'ev da bê, unda kir xiznê xwe îro,
Ji h'izkiriya ez dûr k'etim, him mêrê xwe, him zar'ê xwe,
Min mal û h'al da bin p'iya, min unda kir şerma r'ûyê xwe“.
1092. Dibhîst şîna wê Avt'andîl, e'cêvmayî ma bû wira.
Go: „Bêje, çî te qewimî, çî bû, mi r'a bêje çira?
Wî cahilî ew çî bû got, boyî çî ewî tu tîrsandî.
Hêsa be tu, k'ê bû, çima, boyî çî şuxulî tu lûbandî?“
1093. K'ulfetê go: „Şêrê Xudê, ji girî ez bûme e'wt'er,
Tu pirs neke, çî qewimî, çawa qalbê min wê bê der,
Ewledê xwe bi xwe min kuşt, niha hêsira dibarînim,
H'uba te r'a tamîş neda, ez e'mirê xwe unda dikim.
1094. Ev yekayê k'arê bide bendê ziman, gilî ger'in,
K'ê nikare sur'ê xweyî ke, bê sewda ew dike qîr'in,
Ser min bigrîn, ezê bêjim, k'ê derdê min diricmîne,
H'ek'imê çî birînê qenc ke, ku merî xûna xwe veçîne.

1095. Tu ji herda yekê bibjêr, badihewa difikirî,
Heger dikarî r'abe her'e, îşev bikuj tu wî mêrî,
Tuyê qeziyê me xilaz kî, min, hebûnê, ocaxa min,
Tu ku hatî, ezê bêjim, ew çi derde li dilê min.
1096. Yan na, hema bin şevê va eşiyayê xwe bar ke, her'e,
Ji van dera tu dûr k'eve, hebûna xwe bibe, here,
Dibe boyî min bêyî kuştin, ku ew bighîje dîwanê,
Goştê zar'êm e'se ewê sibê min bide xarinê“.
1097. Ew ku bihîst Avt'andîlê, xayî dilê r'e'm, şêr, e'gît,
Ji cî r'abû qamçî hil da, destê xwe hev kire k'ilît:
„Necamêr bim, ku ez neêm, nebhêm gilî bi neyînesî,
Gendî mîna wî merîkî tu nabînî dinê qomsî.
1098. Merîkî tu bide min, nîşan de ew hêwra wî,
T'enê bizan bim li k'uye, ne lazime ardimiya wî,
Ez wî mêrî hink'ûfê xwe h'esav nakim, çi jî hebe,
Ez ku hatim, ezê bêjim, lê tu hinekî hêsa be“.
1099. Fatmê xulamekî amin da Avt'andîl û ver'ê kir,
Wê go: „Dilê min nak'ute, te dilê min baristan kir,
Wekî wîya tu bikujî, şabûnê têkî dilê min,
Gistîlkeke t'iliya wî da, derxe bîne tu bona min“.
1100. Avt'andîl ji şehar der k'et, hesp avîtîbû çargaviyê,
Devê be'rê nav mêrga da k'oç'k û serak wî dî li wê,
Herçar aliya şûşebend bû, bedew bûn t'ev r'ewaqê wê,
Qeyî te digo, kevirêd wê xemilandiye hostê h'ubê.
1101. Wî xulamî Avt'andîl bir wê derê k'u ku wî dixast:
„Eve birca ewî xortî, k'îjanî tu dixazî r'ast“.
Wî go: „Binhêr' vê p'encerê aliyê r'oê û p'ir' bedew,
Yan r'azaye herema xwe, yan jî niha h'îşiyare ew“.

1102. Bextê xirav, ber derê wî vezeziya bûn cot ersawil,
Û ber wan r'a ew derbaz bû, r'açandin wî, wê herdu mil,
Herdu xulam xeniqandin wî, bi wan destê wek k'elpetan,
Serê wana usa hev xist, mejiyê wan ji ç'e'va r'ijiyan.
1103. Heremê da ew cahil bû t'enê, bêxem vezeziyayî,
Avt'andîl ew bilind kir wê, nehîşt bike ew lavayî,
Pê r'a negîhand ji cî r'abe, yan deng bidê mîna mêra,
Avt'andîl sîng û berê wî cahilî wir da ber k'êra.
1104. Ewî r'o bû bi nederê, li ber dijmin de'bê devxûn,
T'îlî bir'î gîstîlkê va, ji vê dinê kire qaşxûn,
Avît be'rê ji p'encerê, xîzê da ew çû unda bû,
Bona wiya ne ç'e'l kirin, tevr û bêr jî lazim nebû.
1105. T'u deng û h'is wir dernek'et, kesî nebihîst çi qewimî,
Zivir'î ew bi dêmê gul, xûsî gulê ne qer'imî.
E'cêvmayî ez dimînim, ser wê xûna ku ewî r'êt,
Zivirî ew cem Fatmanê, wî ji lêvê wê hunguv mêt.
1106. Wexta şêrê mîna r'oê, hat mala wê ku evîne,
Wî go: „Binhêr', k'ê ditirsiyayî, îdî r'oê ew navîne,
Ev xulama şe'dê mine, bira gilî ke bona te,
Aha, k'êra mine bi xûn, t'îliya wî û gîstîlka te.
1107. Niha bêje çima ewî xwe unda kir, sebeb çi bû,
Sebram t'une, niha bêje, çima ser te ew hêrs dibû“.
Fatmanê xwe avît ser nig: „Nizanim, çawa bêjme te,
Agirê dilê min temirî, birîn k'ewiya bi destê te.
1108. Ez û H'usên, ewledê me, hatin dinê bi destê te,
Şêrê Xudê çi celebî, çi teherî bidim pesinê te,
Te ku xûna wî r'êtiye, bi wê e'mir te daye me,
Niha bibhê ezê bêjim, ku zanibî serhatiya me“.



FATMAN SERHATIYA NÊSTAN
– DARÊCANÊ DÎBÊ

1109. Vî sheherî da qanûne ev, r'oja Nevroz hersal vira,
Kese t'u ciya da naçe, t'ucar nakin al û vêra,
Em t'emam xwe dixemilînin, xwe dikin k'incê çux û zerbab,
P'adşa jî xwe r'a k'êf dikin şayî, şayîye û bê e'zab.
1110. Çiqa t'ucar mal mezinin, hedayî dibin bona p'adşê,
Layîqî me ew jî wira, r'ewa dikin me bi sirê,
Wa deh r'oja def, k'er'ane, k'îlam, lîstin em şa dibin,
K'êf û r'eqas, eşq û şayî, lawik cirîdê dilîzin.
1111. Serekê t'ucara vir mêrê mine, ku k'ivş kirine,
Serekîya k'ulfetê wan hurmet, ew jî qulixa mine,
R'ewa dikin jina p'adşê bi xîşir û bi hedaya,
Wîr dilîzin, dir'eqîsin, dizivîr'in mal bi dilê şa.
1112. E'yîda Nevroz wexta hat, me p'êşk'êşê layîq birin,
Me da wana, wana jî em bi p'êşk'êşa r'ewa kirin,
We'dê xwe da em hatin mal, dilê me eşq û em r'azî,
T'exte, sivre mal da vekir, sitira me bi serfîniyazî.
1113. Wê êvarê ez der k'etim ku nav bax' da serlamîş bim,
Xatûn birin min t'evî xwe, borcê min bû ku wan şa kim,
Dengbêj t'ev me hatin wira, em şa kirin k'îlam, miqam,
Distiran û dir'eqîsîn, p'or'berda bûn ser namlê kam.

1114. Bax'ê me da k'oç'k hene, p'ir' bedewin û p'ir' fesal,
Bilind mîna hêlûna wir, p'êlê be'rê t'ev wanin qal,
Ez k'etime avayîkî û xatûn min t'ev xwe hil dan,
Dîsa t'exte me wir r'ast kir, xwe r'a k'êf kir, şayê guman.
1115. Min ji wan r'a hurmet dikir, çawa xûşk min qedir digirt,
Lê vexarinê r'a t'evayî, fikirê xirav berge min girt,
Mêvana ew t'ercibe kir, hev bela bûn, r'abûn û çûn,
Wexta t'enê ez mam wira, fikirê xirav li min gêr' bûn.
1116. P'encere min ve kir hêdî, wî alî r'ê min nihêr'î,
Ez fikirîm, gelo çima melûlî wa min hêwirî.
Dûr va tişkî biç'ûk min dî, li ser p'êla dih'ejiya,
Mîna de'ba dihat xuyan, mîna teyîra dimeşîya.
1117. Ew çi dûr va jev der nexist, hate nêzîk, qeyk bû ew,
Wê qeykê da du merî bûn, ez fikirîm ku k'êne ew,
Yek kiribûn wana nav xwe, t'enê serî dihat xuyan,
Wexta der k'etin ew k'enar, zendegirtî mam bê guman.
1118. Wana qeyk k'işand k'enar, danî gendî ber bax'ê me,
K'ivş bû ku ew ditirsiyan û dinhêr'in dor – berê xwe,
Wexta kese wana nedî, baristan bû dilê wana,
Min usa li wan dinhêr'î, ku min nebînin ewana.
1119. Qutîk der xistin ji qeykê, vekirin derê wê qut'iyê,
Derî vekirin, şemçiryaxek derxistin mînanî r'oê,
Şe'ra r'eş bû li ser sêrî, k'incê k'esk bûn li serda wê,
R'oj jî wê r'azîbûya, ku bedewiyê bighîştî wê.
1120. Bedew zivir'î aliyê min, şewqa wê da zanga pêşber,
E'rd û e'zman bû k'eskesor ji şewqa wê nazik, dîlber,
Ç'e'vê min wê hatin girtin, min t'irê ku r'o bû der k'et,
P'erde, k'incêd ber p'encerê, kesî ew yek nedî feqet.

1121. Pêr'a – pêr'a min gazî kir çar xulamê xwe anî wir,
Min go: „Binhêr', k'ê kirine dîl e'rebêd zeng mînanî gur'’?
Dizîva her'in, nêzik bin, silav kin û pê bih'esin,
Ku difroşin, hûn bik'ir'in, ser qîmet xeber nedin.
1122. Heger nadin, hûn netirsîn, lêxin, wana hûn bikujin,
Bînin cem min hûn wê hîvê, mêraniya xwe îro k'ivş kin!“
Xulamê min r'abûn û çûn, mîna teyîra peya bûn wê,
Kirin – nekirin hev nehatin, bûn çengirçî ewana wê.
1123. P'encerê r'a min nihêr'î, min dî ku ew nafroşin,
Min kir gazî: „Wan bikujin, eyde – feyde îdî boşin!“
Herdu kuştin, dane p'êla, ew şemçiryax li wira ma,
Ez gihîştîmê, milê wê girt, berbi malê anî xu r'a.
1124. Çawa bidim ez pesinê wê, çi nazikî, çi bedewî,
Ez sond dixum, k'ê bidîta, r'oê ber wê bibiya sêwî,
K'ê tamîş da ber nûra wê, sifetê wê k'ê bik'işanda,
Ser destê wê ku min can da, ezê r'azî bûma Xuda“.
1125. Vê gotinê r'a Fatmanê wir herdu desta da serê xwe,
Avt'andîl jî ber xwe k'et û wî r'ê da hêsirê ç'e've xwe,
Hev bîr kirin bona wêya, unda kirin h'iş û sewda,
Bi hêsirê germ wan h'elandin berfa sipî sîngê ç'iyâ.
1126. Ew giriyan û e'gît go: „Bêje, giliyê xwe bîr nekî“.
Fatmanê go: „Min anî mal, jê r'a bûm xûşk, derdekî,
Min r'amûsa ç'e'v, biriyê wê, şemçiryaxa mîna r'oê,
Ser t'ext min ew da r'ûniştin, h'emêz kir ew, anî r'aê.
1127. „Bêje, r'oê k'êyî tu û ewleda k'îjan malêyî?
Evan zenga k'u tu dîtin, tu ne dîla xepenekêyî“.
Wê xwe negirt cavam bide, û pirsê min wa man bê cav,
Ji ç'e've wê r'eşe mezin hêsir k'işiyân wek ç'emê av.

1128. Wexta pirsê aha necî, ew şemçiryax a'ciz kir,
Îskîn jê hat, ew giriya, hêsira sîngê wêya şil kir,
Hêsirê ç'e'vê wê mîna lal, dur', xulxulîn hatin berjêr,
Ax dêmê wê şewitandim, derd li dilê mi da bûn k'êr.
1129. Wê go: „Daê, tu bona min niha dêyî, ji dê zêde,
Çi te r'a ne serhatiya min, ewê pirsê qe hil nede,
Ez xerîbim welatê dûr, bextê min min bûye dijmin,
Bêje, Xudê tuyê gunek'ar kî, boyî vî bextî û derdê min“.
1130. Ez fikirîm, ne we'deye ez wê r'oê a'ciz dikim,
K'ê bibîne bedewiya wê, h'iş û sewda wê unda kin,
Bona bêje serhatiya xwe we'de gere ez bibînim,
Çima pêşda ne fikirîm, hê ne wexte çi pirs dikim?
1131. Min bir bal xwe ew şemçiryax, hîva zere, nûra zêrî,
Bedewiya wê nûra şemal, çi teherî tuyê veşêrî,
Min da dorê çux û zerbab, xas û qumaş h'ezar t'ewnî,
Bijanga bager difûriya, ç'e'va teyîrok hêsirê xewnî.
1132. Û min xayî kir ew r'oja geş, şemçiryaxa bejin çinar,
Min odeke başqe dayê, ku ber ç'e'va nebe dîhar,
Min sur'a xwe k'ûr veşart wa, ku qûl – bende pê neh'ese.
T'enê ez û xulamkî min wê dibînin, ew jî bese.
1133. Çawa bêjim, ax çi teherî, xeyîset va ew nebînayî,
Miqîm girî şev û r'oê, hêsira r'a k'u hebûye şayî,
Min lava kir, ku hêsa be, deqekê wê guh da ser min,
Bêyî wê e'mir li vê dinê ew mirine t'ek bona min.
1134. Ez diçûm wê û min didît, hêsirê ç'e'va ber bûne gol,
Nava wê gola xûnê da tîrêd şebe girtibûn yol.
Ava gola û mîna h'ubrê p'êlê şebe dixulxulîn,
Lal û dur' lê bûne şirdan, mircan tê da dibiriqîn.

1135. We'de nedî pîrsa wê bikim, usa bê h'ed ew digiriya,
Bigotaê: „Lê k'êyî tu, çi derdî ew dizêrî?“
Sîngê zeriye şil bûn t'imê, hêsirê xûnê ser p'êl didan,
Ber wî derdî k'ê tamîş da, teyax nedikir kevirê sндыan.
1136. Wê ne dixast k'inca xwe ke, ne jî r'azê ser nivîna,
Ew şe'ra wê bû li sêrî, k'incê wê lê mîna dîna,
Westiyayî ew dik'et xewê, destê xwe dida ber serê xwe,
Çiqa gere lavayî bikira ku parî nan hema bixwe.
1137. Niha bêjim çî wê hebû, lê k'incê wê e'yînî e'cêb.
Min dinê da her tişt ditiye, cara pêşin mame e'cêb,
H'eta niha ez nizanim k'incê wê çi bû hûnayî,
Mîna p'erç'e ew nerm bûn, r'okirî bûn û kildayî...
1138. Ew bedewa mala mi da we'dekî dirêj usa ma,
Mêrê xwe r'a min negotibû, ditirsyam nizam çima,
Min go: „Bêjimê, venaşêre, dîwanê da têke gilî“.
Fikira mi da şev, r'o ew bû, dilê mi da saw xurdilî.
1139. Fikirîm, ku nevêjimê, bi çi teherî alî wê kim?
Min nizan bû boyî vî şuxulî ez çi bikim, berbi k'ê bim,
Mêr zanibe jê vedişêrim, e'se ewê min bikuje,
Vê r'oê çawa veşêrim, r'oya nûr ji dêm dir'ije.
1140. Ez çi bikim t'ik û t'enê, agirê min hê geş û gur' bû,
Were mêr r'a têkim gilî, çiqqa fikirîm, tişte nebû,
Ez mêrê xwe bidim sondê, bicêr' bînim çi difikire,
Ew r'uh'ê xwe naşewitîne, ji sonda xwe venager'e.
1141. T'enê çûme bal mêrê xwe, bi h' eneka gilî vekir,
Paşê min go: „Tiştîkî bêjim, heger te sond egle nekir,
Tu wê sur'ê nedî der, sondê berk' ke mîna kevir“.
Wî sondeke awa xar: „Ez bê r'uh' bim mîna demir...”

1142. Çi jî bêjî, ez navêjim t'u qûl, benda agah, mirin,
Tişkî t'u kes ji min nabhên, ne kal, cahil, na dost, dijmin“.
H'usênê r'em awa got, t'emam jê r'a min kir gilî,
Min go: „Were tu jî bibîn wê şemala dême gulî“.
1143. R'abû û hat, min xwe r'a bir û em çûne herema wê,
Nişkêva dî şewqa r'oê, zendegirtî hêsîr ma wê,
Wa go: „Bêje çi e'cêbe, ev horiye yan jî p'erî?
Heger ku ev benîademe, Xudê dilêm bike kerî“.
1144. Min go: „Mi va ne e'yane, gelo k'êye ev benîadem,
Çi ku min go, wê zêdetir tişkî mayîn nizanin em,
Were pirs kin em ji wêna, k'êye, çima gihîştiye vira,
Dibe me r'a têke gilî, emê bêne bi lavaya“.
1145. Em çûn hundur', em herdu jî cûrekî wa ne r'ih'et bûn,
Me jê r'a go: „R'oê, bêje, bi agirê te em jî r'et bûn,
Bêje heger heye derman, boyî te hîvê em p'eyîda kin,
Çima usa bûyî kirkût, nûra te em çi sep'e kin?“
1146. Ez nizanîm, wêya dibîst ew giliyê me bi lavayî,
Belga gulê li belgê k'et, cêrga dur'a dî azayî,
Dême wê gul veşartibûn, guliye wêye mîna me'ra,
Li ber r'oê ziya r'eş bû, çi şebeq bû wir ji me r'a.
1147. Giliyê me bûn badîhewa û cava xwe me nestend,
Mir'ûzkirî mîna piling, bi dilê kul wê ax k'işand,
Carke dinê me jê pirsî, wê hêsirê xûnê r'êtin,
Paşê wa go: „Tişteki ez naxwezim, min bihêlin“.
1148. Em li r'ex wê r'ûniştin, me jî t'ev wê hêsir r'êtin,
Ber xwe k'etin kirina xwe r'a, feyîde çi, hatibû gotin,
Ancax me ser h'emda anî, lavayî kir ku hêsa be,
R'ez û fêkî me danî ber, wêya nexar ew e'zabe.

1149. H'usên wa go: „Dilê mi da wê bela kir h'ezara derd,
Sûrtê wêya gendî r'oje, çi bendeyê r'amûse merd,
Heyî wax, k'ê ku wê nebîne, h'ezar daxê bik'eve dil,
Ewledê xwe ox'ira wê da ezê bidim bi eşq û dil“.
1150. Hemanekî lê dinhêr'in, û veqer'iyan ç'e'vê girî,
Dîtina wê şabûn bû, jê dûr k'etin derd bû e'yînî,
Em diçûne dîtina wê, hê al û vêr dest pê nekirî,
Wê dilê me bend kiribû, dil va bûbûn em h'izkirî.
1151. We'de aha zû derbaz bû, r'oj û şev wa fir'in peyî hev,
H'usên go: „Min û p'adşê xwe me zûda nedîtiye hev,
Çi dibêjî, bi p'êşk'êşa ez neçim wî bibînim bêm“.
Min go: „Bira gotina te be, miqabilî te ez dernaêm“.
1152. H'usên sinîk anî wira, dagirt bi dur' û cewahir,
Min lava kir: „Binhêr'e, tu k'êfxaş nebî, nebî agir,
Ji devê te pirs derneyê derheqa vê r'oja hana“.
Dîsa sond xar: „Heger bêjim, ez nemînim diniya hana“.
1153. H'usên çû dîtina p'adşê, dît ser k'êfê r'ûniştiye,
Û nêzikî p'adşê bû ew, p'adşê r'a hevaltî kiriye,
P'adşê hil da p'êşk'êşa wî, pêşberî xwe da r'ûniştin,
Tu binhêr'e çi dike îç'ike, sond û qirar tên bîr kirin.
1154. Berî hatina H'usên wira p'adşa îdî vexaribû,
Dîsa t'as û cam t'ijî bûn, îç'ike wira mîna be'r bû,
Ewî bîr kir sonda xwe û ad, qirarê ewî da bû,
R'ast dibêjin, qijik û gul, k'er û sturu, qe ew yek bû.
1155. P'adşê mezin, wexta îdî vexaribûn, wa go: „H'usên,
Zendegirtî dimînim, ev dur', cewahir te r'a k'u tên?
Ev cewahirêd wa mezin û ev dur'êd wa p'ir' qîmet,
Min nikaribû dest banîna nîvê wana bida fiyat“.

1156. H'usên ber wî t'emene bû: „Bijî p'adşê minî mezin,
R'oyî ji e'rşa bona me, kaniya e'mirî, hêjayî pesin,
Yê k'êne ew xiznê min t'ev, û zêr'ê mine bê h'esab?
Hemla dê da xwe ne aniye, we daye min destê eznav.
1157. Ne hêjayî pesinê te me û wê r'e'mê mi r'a dikî,
Bûkek aniye boyî kur'ê te, ewê p'êşk'êş h'esab bikî,
Wî çaxî tuyê r'azî bî ku bibînî tu wê r'oê,
Bira gul de bax'çê te da, ew dara şîn, dara jîyînê“.
1158. Ez çi bêjim, wî p'êpes kir ew sonda ku mi r'a dayî,
Yek – yek dibê çawa dîtiye wî ew r'oja nûr, hêjayî.
P'adşa dibê: „Ez şa bûme, bê h'esave şabûna min,
H'ukum dikim, her'in bînin, bikin xemil dîwana min!“
1159. Ez wa hêsa r'ûniştibûm û dilê min îskîn jê hat,
Serek qewaz derî vekir, t'ev qewaza dêrî da hat,
Bi qirara p'adşatiyê şêst xulam xwe r'a anîbû,
„Ev qirara Xudê mine“, - fikira mi r'a wa derbaz bû.
1160. Silav kirim, gotin: „Fatman, h'ukumê p'adşê, h'ukumê Xuda,
Bîne vira tu wê r'oê ya H'usên soz p'adşê r'a da,
Bibin kur'ê p'adşê xwe r'a, ji r'ênga xwe em nemînin“.
Min t'irê diniya h'edimî û ç'e'vê min tişt ne dîtin.
1161. Min bi fen wa pirsî ji wan: „Ew çi qîze hûn dixwezî?“
Gotin: „H'usên ew r'oja nûr kur'ê p'adşê r'a da pesin“.
Min dî îdî ç'are t'une, mirina min bû gilîkî din,
Ez r'icifim li ser p'iya, zerp dik'uta wê dilê min.
1162. Car din çûm wir û min dî, ew bedewa digriya,
Min go: „Te dî, bextê xirav qumsîfî kir, me k'eniya,
R'oê berê xwe me guhartiye, e'mirê mine bin qeziyayê da,
P'adşê bi xwe gazî te kiriye, H'usên em dane der îda“.

1163. Wê go: „Xûşkê ber xwe nek'ev, çîqa derdê min zanibî,
Bextê mine mi r'a dijmin, nahêle ew ji cî r'abî,
Zende bigire wexta p'akim, ku xiravim, negire zende,
Ev derdê min t'eze nînin, derd min p'ir'in wek p'enede“.
1164. Ji ç'e'vê wê hêsir r'ijiyay mîna dur'ê gir û mezin,
R'abû ser xwe ew bê minet, mîna piling, hêja pesin,
Ne şabûna wê şabûn bû, ne jî derd bû mîna derda,
T'ifteke wê xast û xwe p'êç'a ji sêrî da h'eta p'îya.
1165. K'etîme xîznê û min bijart kevirêd dur'e wa p'ir' qîmet,
Haqa, çîqa min ku hil da, ji kesekî negirt minet,
Her kevirêkî şeherek bû, kela kevira pê dihat k'ir'în,
Û min pişta wê girê da, îdî ji min nehat k'ir'în.
1166. „Han delalam, - min gote wê, - dibe cîkî kêrî te bê“.
Min t'eslîmî xulama kir şemçiryaxa mîna r'oê...
P'adşa r'abû pêşiyêda hat, def, k'er'ane wî k'êf danî,
Ker'eker' ew diçû hêsa, hêsir dir'êt mîna kanî.
1167. Bê h'esab hatin dîtina wê bi qûje – qûj, hewar, gazî,
Xulama berge wan girt, ji r'oja xwe nebûn r'azî,
P'adşa ku dît ew bedewa, bejna çinar, bik'ra horî,
Wî xwe şaş kir û aha go: „K'î alî derk'et r'oja narî“.
1168. K'ê ku didît, ç'e'v digirtin ji îşqa nûra wêya,
P'adşê go: „Ez dinê dî bûm, k'etîme cêrga nedîtîya,
K'ê pêştîrî Xudê bikira ev k'erema bona p'adşê,
Hêjaye ku h'izkiriyê vê dîn, e't'er bik'eve çolê“.
1169. K'êleka xwe da r'ûniştin, pê r'a maqûlî xeber da:
„Bêje, bibhêm ku k'êyî tu, çî millet, ji çî e'rdî?“
Wê bê cav hîşt wira p'adşa, çimkî ewê xeber ne da,
Serberjêr û dilê melûl, difikirî dîwanê da.

1170. Wê nedibîhîst xeberê p'adşê şîrîn, ne jî ferman,
R'uh' va cîkî mayîn bû, ew derdê wê bû derdekî giran,
Lêvê gulîn anî bû hev, cêrga dur'a nedihat xuyan,
Zendegirtî ma bûn t'emam, çi difikirî ew bê guman.
1171. P'adşê wa go: „Em tişteki çawa bibhên, ku hêsa bin?
Gere hebe vir du me'ne, me'na sisiya em nabînin,
Yan ew yekî p'ir' h'iz dike, difikire şev û r'oê,
Ku ew keskî me nabîne, naxweze xeber de li vê.
1172. Yan merîke p'ir' zaneye, keskî tişkî h'esav nake,
Ne eşq eşqe bona wêya, derdê xwe aşkele nake,
Çawa h'ik'yat wê ew dibe, cefa û bext bi awakî,
Fikira difir'e cîkî mayîn, mîna kewa kedî nakî.
1173. Xudê bike ewledê min zû vege' e xêr û şayî,
T'eslîmî wî kim vê r'oê, ku xayî dikim ez delalî,
Veke zimanê vê bedewê, bixûne sur'a dilê wê,
Hema h'etanî wî çaxî xayî ke nûra xweye r'oê“.
1174. Kur'ê p'adşê me t'ûreye, cahil, zîrek, him jî bedew,
Bi dêmê xwe û xeyîset va, bejin balê va e'gîte ew,
Ew çûbû şêr' û wê derê r'astî gere eglê bûya,
Û bavê wî ew şemçiriyax xayî fikir bona wiya.
1175. Anîn libasê bihayê xas, lê kirin û xemilandin,
Dibiriqîn nexşê libasa ku li wêya hêwirandin,
T'acê r'okirî bi dur'a xas danîn serê wê bedewê,
Usa bedew lê dihatin mîna gula ji bîlarê.
1176. P'adşê wa go: „Hûn herema ewledê min bixemlînin,
Hûn t'extekî megrîbî zêr' dîwana wî binitirînin“.
R'abû bi xwe p'adşê e'gal, xayê h'ukumê zor û giran,
Da r'ûniştin ser wî t'extî, dil va şa bû, bi eşq k'eniyan.

1177. Wî h'ukum kir, ber heremê neh dergevan dan sekinandin,
Paşê r'ûnişt li ser k'êfê, salixê k'êfa naê gotin,
Wî r'ewa kir H'usên wira bi p'êşk'êşê p'ir'û biha,
Yê ku ew r'o anî wira, k'êf xemilî def, k'er'ana.
1178. Kirin xarin û vexarin, dirêj kirin k'êf wê demê,
Wê bedewê go: „Bextê min, te qumsîfî kir vê demê,
Bêje, ji k'u gihîştîm k'u, bextê h'izkirî dame k'ê,
Ez çi bikim, çawa bikim, çi neyaz kim ez ji Xudê“.
1179. Wê dirêj kir: „Ez nakujim gula e'mirê h'izkiriyê xwe,
E'se gere ez tamîş dim, gumanê nebîr'im Xudê xwe,
K'îjan zane berî mirinê xwe sipartîye mîrê mirinê?
Merî dik'eve tengasiyê, paşê kêr tê h'iş boyî kirinê“.
1180. Gazî xulama kir, wa go: „Min bibhên, bifikirin,
Hûn xapandine, sekinandine vir, ku miqatîyê hûn min bikin,
Badîhewa dice'dîne p'adşa xwe r'a min têke bûk,
Badîhewa def, k'er'ana dixemlîne bajêr û sûk.
1181. Çî we r'a me çawa xatûn, ez r'êwîke r'êke dinim,
Mirazê wî kur'ê wî be, kur'ê wî r'a ez ne jinim,
Hûn xiyalîkî, ez xiyalîkî, p'adşa cefê ew dibîne,
Ez nikarim vir bimînim, bextê min min dicêr'bîne.
1182. Bêşubeye xwe bikujim, k'êrê ezê dilê xwe xim,
P'adşê weyê we bikuje, wî guneyî ez xwe dûr xim,
Başê hebûnê bidim we, va piştî min girêdayî,
Hûn min berdî ezê her'im, hûn bifikirin merivayî“.
1183. Wê ber piştê derxist, r'o kir li ber wana gendî xizne,
T'acê serê xwe danî ser, r'anedigirt herd destê xwe,
Go: „T'eweqe dikim hil din, boyî we ev ne hindike,
Hûn min berdî, ezê her'im, Xudê mirazê we jî bike“.

SOT'A R'ÛST'AVÊLÎ

1184. Dilê wan da xiznê vêxist kuç'ikê k'ulfa gur'e a'ciyê,
Wana îdî p'adşa bîr kir, wek gizîrê niheqiyê,
Qîrar kirin ku r'ê bidin wê bedewa mîna r'oê...
Binhêr'e tu, zêr'çi dîkin, kevezane dest niheqiyê.
1185. Heyî wax, t'u car şayê nayîne zêr', k'ê wiya dih'ebîne,
A'cî dirana diç'ir'kîne, h'eta qebrê r'a dighîne,
Al û vêra zêr'a dike, meriyê a'c jê t'êr nabe,
R'uh' xaliyê va ew germ dike, berbi wê dinê ew dibe.
1186. Wan xulama miyaser kir xastina wê şemçiryaxê,
Yekî k'incê xwe êxist da, go: „Bes bik'işînî tu axê“.
Derîkî din r'a der k'etin, şabûn bû, k'ê hebû haj k'ê,
Hîv devê me'ra xilaz bû, ew şuxulî wek dur'ekê.
1187. Xulam ji wir r'evîn û çûn, ji ber ç'e'va beta vebûn,
Hew min nihêr'î derî xistin, ez çûm, xulam wira nîbûn,
Wê keç'ikê navê xwe da, derî vekir, min h'emêz kir,
Nehat hundur', wê go: „Boşe“, ewê dilê min t'ev r'akir.
1188. Wê go: „Ez xilaz bûm bi wê xizna te dabû min,
Bira Xudê te r'a r'e'm be, ev dia'ye xastina min,
Îdî nikarî min xayî kî, hespekê bide, ezê her'im,
H'eta p'adşa ku bibhê, ezê îdî gele dûr bim“.
1189. Pêr'a – pêr'a çûme t'ewlê, bijart kih'êleke lape baş,
Zîn, mûsat kir, anî wira, wê bedewê beşer bû xaş,
Lê syar bû, te go, r'oye danizilî ser piştâ şêr,
Çi min çandibû, min nedirû, destê fir'î ek'inê kêr.
1190. R'o çû ava, hewar, gazî, t'emam şîher lê ger'iya,
H'esar kirin şîher t'emam, k'etin h'eta k'oxê sêwiya,
Min jî pîrsîn, min go: „Bira, mala min va, lê binhêr'in,
Heger we dî, h'ukumê p'adşê min bikujin û darda kin“.

1191. Ze'f ger'iyân, tişte nedîn û p'oşman ew vejer'iyân,
Ji wê r'ojê dîwanê da t'ev h'eznîne, nek'eniyan,
R'eş û mişot li xwe kirin dîwanê da h'emû kesî,
Ji me dûr k'et ew r'oja nûr, diniya me bû meleme, sî.
1192. Niha bêjim ku çerxa bext k'uda avît ew hîva zer,
Niha bêjim çi tirsandim ewî mêrikê xalî ser,
Ez bizina wîye mê bûm, nêrî bû boyî min bijare,
Bê ît'bare mêrê nemerd, jina qeh'be bê ît'bare.
1193. Ez mêrê xwe qe h'iz nakim, him jare, him jî ne bedew,
Ew cahila dîwanê da bona p'adşê saqî bû ew,
Me hev h'iz kir, lê bona wî r'eş nagrim û şînê nakim,
Ax, niha jî ku xûna wî t'askê bidin, ezê fir'kim.
1194. Mîna k'ulfeta kêmaqil, min ev yeka jê r'a go,
Çawa ew r'o hate cem min, min verê kir çawa ew r'o,
Wî tirsandim ku wê yekê wê her'e bêje p'adşê,
Niha îdî miriye ew, xilaz kirim te ji zulmê.
1195. Pirsî me ku hev dibhurî, bi wê yekê ditirsandim,
Min nizanîbû ku ew vire, min nizani bû dicêr'bandim,
Îdî min gazî te kiribû, wî jî cav kir, ku ez va têm,
Cara duda min go: „Neyê!“, lê tu hatî, bûm me r'a dêm.
1196. Lê tu hatî, veneger'iyayî, te nûra xwe min dîhar kir,
We vir hev dî r'ûyê mi da û we hev r'a dijminî kir,
Ez tirsiyam, axiriya mi bû, îdî minê çi bikira,
Ne bi ziman, wî bi dil, wê mirina min e'seyî kira.
1197. Bi destê te ver'ê nebiya, e'se wê biçiya dîwanê,
Wê bal p'adşê bidama der, hêsabûya wê ziyânê,
P'adşê a'ca dilê xwe ûrt', ocaxê me bida bê,
Goştê zarêm wê bida min, bênamûs kirama dinê.

1198. Bira Xudê wê bide te, çi ji Xudê r'eca dikî,
Xilaz kirim ji me'rê r'eş, h'ezar salî e'mir bikî,
Îro şûnda ez r'azî me ji bextê xwe û yaziyê,
Îdî mirinê ez natirsim, te xilaz kirim cefa mirinê“.
1199. Avt'andîl go: „Tu netirse, badihewa ne nivîsîne: -
„Wexta dijmin meriyê teye, ser wî r'a dijmin t'unîne“.
Zane t'u car meriyê usa ît'bara xwe ew pê nayîne,
Îdî ji wî tu netirse, ce'nime jî wî nah'emlîne.
1200. Tu wê bêje, ji wê şûnda te ku ew keç'ik ver'ê kir,
Te qe salix jê hil neda, tişteki ji wê te se nekir?“
Fatmanê wir hêsir r'êtin, ç'e'va k'îşyan hêsirê xûnê:
„Ew şemala wa unda bû, diniya maye bêyî nûra wê“.





SALIXÊ DERHEQA NÊSTAN – DARÊCANÊ Û DÎLTÎYA WÊ CEM CÎNA

1201. Go: „Êhêyî bext, bi qomsîtiyê tu mîna cinê xiravî,
T'u kes tişkî te fe'm nake, bi qomsîti k'uda divî,
Ew k'ulfeta mîna r'oê te k'uda bir û mina kir?
Ez dinhêr'im ku axriya xwe, vê diniyayê p'ûç' h'esav kir“.
1202. Fatmanê go: „Ji min dûr k'et ew nazika mîna r'oê,
Ew sik'ana dilê min bû, bext kiribû mi r'a t'or'ê,
Û peyî wê r'a dişewitim, hêsabûna xwe nabînim,
Hêsirê ç'e'vêm zîha nebûn, çimkî hêsirê dibarînim.
1203. Mal û zar'o min bîr kirin, dilê min bû hêwra derda,
R'azayî bûma yan jî h'işiyar, t'enê ew bû bîra mi da,
Lê H'usênê soz p'êpes kir, ber ç'e'vê min bû me'rê r'eş,
Qursax nake ew e'lewat nêzîkî min be fikira fe'ş.
1204. Êvarekê r'o westiyayî diqulibî diçû ava,
Ez der k'etim ber vê k'oç'kê û ç'e'vê min ser derge ma,
Min bîr anî, zerga derda dilê mi da cî bû û ma,
Min xwe r'a go: „Ne'let' li wî, k'ê bihar ke sonda mêra“.
1205. Qûlek hat vir, xerîb bû ew, sê heval bûn li dora wî,
Qûl libasê qûla da bû, lê hevalê wî gendî r'êwî,
Îç'ike, xurek anî bûn wan, ji şeherê me hil da bûn,
Hevr'a r'ûniştin nan xarin, ew herçar jî xeberdan bûn.

1206. Ez sekinîm, min wan bihîst: „Wele vira em r'ind şa bûn,
Em nenasin, lê bextê me, vî şcherî da em hev nas bûn,
Em nizanin ji k'une em, herkes ji me k'u, çi yêrî,
Neynesiya hev em bibhên vir me'rîfet û camêrî“.

1207. Şevbihêrî xwe r'a kirin, ew e'detê r'êwiyane,
Wî qûlî go: „Gelî bira, e'cêba min dî, kes nizane,
Heger barê we garise, ezê t'êxkim dur'û lala,
Hûn guhdar bin vê serhatiyê, bi xastina Şexs û Ela.

1208. Ez qûlê p'adşê cina me, wî p'adşae mezin, e'gît,
Nexaşîk k'et nava êlê, nexaşîke berk'e aqît,
P'adşê mezin temirî, mir, ew bû xayê êla giran,
Niha xûşka wiye dewşê, xayîtiyê dike li wan.

1209. Dûlardûxte navê wêya, zanga berk'e, kevir serttir,
Heger ew neçe ser dijmin, qursax nakin ber me çêtir,
Lê niha cem wêne R'osan û R'odî, kur'êd birê,
Niha ewe p'adşa e'gal li welatê cina li wê.

1210. Me bihîst ji be'rê wêda miriye xûşka Dûlardûxtê,
R'oje şayê mina bûn û wezîr bûne qûlê nixtê,
Gotin: „Ewa bêjine wê, cava nebixêriyê bidinê,
Bira ew wê cavê bidê R'oşak'ê qûl, sereskerê wê“.

1211. R'oşak' wa go: „Ez nikarim wextê şînê vir bimînîm,
Ez bik'evim ç'iya, baniya, bê h'êd gere t'alan bînîm,
Bizvir'im mal we'detî da, xizne, defina t'ijî kim,
Wextê p'adşa her'e şînê ç'iya, baniya va ver'ê kim“.

1212. Zivir'î berbi me xulama: „Ez va diçim, hûn jî werin!“
Sed qûl ewî xwe r'a hil da, yek ji yekî e'gîtirin,
R'oê ew t'alana dîkin, şev miqatin h'eta sibê,
Kavran wana xeza dîkir, hevr'a dibûn birê p'arê.

1213. Şev bû tarî, em bihurîn bestekê r'a bi syarî,
Hew me nihêr'î, p'erê bestê hate xûyan nûra siteyîrî,
Me go, dibe r'o peya biye, li ser e'rdê hêlûn daniye,
Em şaş man û bi fikira me h'ezar e'cêb hilaniye.
1214. Hineka go: „Şewqe li wir“, hineka go: „Hîve wira“,
Bi syarî em nêzîk bûn, binhêr'in wê sêra ç'ira,
Herçar aliya me h'eşar kir, kire nav xwe ew r'onayî,
Ji wê nûrê me deng bihîst, dengê nazik û merivayî.
1215. „Gelî syara bêjin k'êne, hûn navê xwe mi r'a bêjin?
Qasidim ji Gulanşero, berbi cina hûn r'ê bidin“.
Me ku bihîst, em nêzîk bûn, me kir nava xeleqa xwe,
Me syarkî nebînayî nêzîk dî wir ber ç'e'vê xwe.
1216. Lê dinhêr'î, ji dêmê wê nûra r'oê difûrfûrî,
Şewqa wê ya r'oê bû, şemal bû wê, ew dişuxulî,
Lê ewê kêm xeber dida, li dêmê naz me dinhêr'î,
Nûra sedefê diranê wê ser bijangê wê ditemirî.
1217. Me jî mîna wê şîmayî cava wêya wira wa da,
Me t'ercibe kir qasid nîne, ne jî mêre xeber dida,
R'oşak' dî ku ew jine, wî syarî h'icûm kir ser,
Me nehîşt ji cî bileqe, bûne h'eşar em wira li ber.
1218. Me go: „R'oê, me r'a bêje tu serhatiya xwe, ne derew,
K'î welatî, tu ya k'êyî, k'ê xapandî, kirî gerew?“
Cî da r'abû, wê xwe negirt cavê pirsê me ku bide,
Çi webale wexta hîva, ziyayê r'eş ku hil dide?
1219. Wê qe tişte me r'a nego, k'êye yan ji k'uye,
Tişte nego, gelo k'êye, yanê k'ê ew xapandiye,
Berk' ker' dibû, wê ne dixast pirske bêje yan xeber de,
Şvêta me'ra wê dinhêr'î, ber ç'e'vê me kiribû p'erde.

1220. R'ošak' wa go: „Ew navêje, dibe derdê wê p'ir' berk'e,
Tiştî mayîne, binhêr'e, qe me tiştî h'esav nake,
T'une bende li vê dinê xaziya xwe neyîne p'adşê me,
Çi bedewe û çi qence, Xudê didê bi destê me.
1221. Xudê eva me r'a şandiye ku em bibin p'adşê xwe r'a,
Vê bedewê ku em bidine wê, hurmet be ew ji me r'a,
Ku veşêrin, wê pê bih'ese p'adşê meye e'gît, k'ubar,
Emê ber wê r'ûr'eş derên û wê me r'a ew bibe qar“.
1222. Me jî pirsar wî r'icimand û gotina wî qebûl kir,
Em zivir'în şherê cina, ew şemçirax me xu r'a bir,
Em jî qedirê wê nek'etin, xwe r'a qedir me h'esav kir,
Û wê demê hêsirê xûnê dêmê wêyî gulîn şil kir.
1223. Wî waxtî min R'ošak r'a go: „Tu min berde, ezê zû bêm,
Li şherê Gulanşero şuxulekî min ferze, dibêm“,
Wî ez berdama, we r'a bêjim eşyaê min heye vira,
Gere her'im, t'ev xwe bibim, ku bighînim hevala r'a“.
1224. Serhatiya wî qûlî kir li wan r'êwiya gele xaş hat,
Ez tevizîm û zîha bûm, qe hêsir ç'e'vê min nehat,
Min tê derxist, wan k'ê girtiye, gumana min wîrda baske,
Şabûnek k'ete dilê min, min deyîn nekir, dest da k'îska..
1225. Min ew qûla anî bal xwe, pêşberî xwe da r'ûniştin,
Min go: „Bêje, ez jî bibhêm ew giliyê te wana r'a kirin“.
Wî yek bi yek kire gilî çi ku pêşda min jê bihîst,
Te go, t'eze e'mir da min, gumanê r'uh'ê mi da list.
1226. Du xulamê mine zengin, sêrbaziyê da hostane ew,
Mîna tîrê ew zû diçin, mîna tîrê vediger'in ew,
Min ew şandin şherê cina, min go: „Her'in, zû vegeer'in,
E'se wêya hûn bibînin û salixê wê mi r'a bînin“.

1227. Bûn teyîr fir'în, sê r'oja da çûn, zivir'în, hatin serê,
Go: „Birine ew bal p'adşê, p'adşa diçû wî alî be'rê,
Me nikaribû lê binhêr'îya, gendî r'o bû li r'û dinê,
Bona R'osanê xweyî e'gît, ew xayî dike çawa bûk wê.
1228. „Emê wêya bidin R'osan, - h'ukumê p'adşê wane eva, -
Hê ez ne ya de'watê me, derdê mine weke ç'îya,
K'engê zivir'im wî çaxî jî ezê têkim wê bûka xwe“,
K'oç'ka xwe da daye ser t'ext, daye dorê cariyê xwe.
1229. P'adşê xwe r'a birine t'emam hostayêd sêr û sêrbaziyê,
R'ê çetinin, sawe niha, xwe neçûne wir diziyê,
Ber wê bircê wê hîştîye ji qedrê der mêrê dest p'ê,
Bihar bikî, t'eze çûne, venager'in zûtîrekê.
1230. Şeherê cina h'eta niha t'u qûl, benda hil nedaye,
Ort'a şeher da girek heye bilind û t'îk, wek kelaye,
Wî girî da zêrzmîne, r'îya wêya zirav, yekp'ê,
Tê da qesire, h'ukumê p'adşê qesirê da ne nûra r'oê.
1231. Ersewîlin ber zêrzmînê xortêd cahile p'elewan,
Deh h'ezar mêrê bijare, t'êve sîlih' û xwe guman,
Ber sê dergê wî şeherî neh h'ezar esker sekinî,
„Dilo, dinê tu hêngavtî, gumana çi tu sekinî“.
1232. Ew ku bihîst Avt'andîlê bîlek h'esin, fenê r'oê,
Dil lê şa bû, cîda ker' bû, tişte ne go ewî li wê,
Wî ji r'oja bûyîna xwe dar'azîbûna xwe gote Xudê,
„Ew xûşka Nêstanêye, k'ê mi r'a kir salixê wê“.
1233. Fatmanê go: „Bêje e'zîz, salixa r'a tu hostayî“.
„Ew serhatiya min te bihîst, ez bend kirim bi şîrnayî,
Lê dixwezim yek – yek bêjî tu derheqa wan cina da,
Ne dibên, cin t'enê r'uh'in, çawa k'etine dilqê benda.

1234. Bextê ewê qîza bedew şewitandin min dil û h'inav,
Çi wan r'a ne qîzê bedew, ne ew r'uh'in cinê xirav“.
Fatmanê go: „Min dibhêyî, çima usa tu sar bûyî?
Ew ne cinin, merîne ew, ku dimînin wî ç'iyayî.
1235. Navê cina wan derxistiye çimkî t' ifaq hevr'a yekin,
Sêrbaziyê da ew hostane, hostatiya xwe îcr'uh' dikin,
Ew zîrarê didin meriya, lê bê zîrar ew dimînin,
K'ê ku derê miqabilî wan, seqet – soqet û kor dikin.
1236. Şuxulê wana, wa e'cêbin, dijminê xwe ew kor dikin,
Dikin bager, ba r'adikin, gemiya be'ra da xîrç dikin,
Ser avê r'a ew dibezin, golêd ava dimiç'iqînin,
Bixazin wê r'o bikin şev, şev r'oê biguhêzin.
1237. Boyî vê yekê dor – berê wan navê cina dane ser wan,
Ew jî mîna me merîne, ew jî goşt, xûn heye ser wan“.
E'gît wa go: „Ze'fr'azî me, te av kir ser agirê dilêm,
Bi şabûn ez guh didim te, giliyê teye dur' dibhêm“.
1238. Avt'andîl wa hêsir dir'êt, şikirîma xwe Xudê danî,
„Ze'fr'azî me ji te Xuda, ev k'erem bû mi r'a anî,
Tu t'im heyî, tuyê hebî, tu cebarî, nebînayî,
Tu bext didî qûlê serr'eş, tu him sebirî, him sik'anî“.
1239. Şikirîma xwe Xudê anî boyî wî salixê ku wî bihîst,
Fatmanê t'irê boyî wêye û şabûnê dilê wê da list.
E'gît çîqa xwe digirt wê, ber k'ulfeta evîn birî,
Lê Fatmanê ew r'adimûsa, h'iş û sewda unda kirî.
1240. R'ex Fatmê da veleziya, Fatman şa bû h'eta sibê,
Wan situyê xwe dida ser hev, xema da bû e'gît li wê,
T'înat'îna xwe bîr danî, diqer'imî mîna mûmê,
Dilê wî lê bûbû de'be, de'ba r'a dike hevaltîyê.

1241. Ji ç'e'vê wî hêsir dik'îşiyana mîna ç'ema dihatin xar,
Gola h'ubrê da gemiya r'eş sovayî fikir birqa aza,
Difikirî: „Binhêr'k'êye, dewsa gulam p'aşla mi da,
Ez bilbil bûm, bûme qijik ser qelaxa sergîna da“.
1242. Kevir jî wê bih'eliana ji ber hêsirê hatin xar,
Besta r'eş da ew bûne gol, pê av da gulistana nar,
Bi wê yekê şabû Fatman ku ew bûye bilbil e'yînî,
Qijik dadine ser gulê, t'irê bilbile nebînayî.
1243. Sibe r'on bû xêr û şayî, e'gît çû ku xwe avê xe,
Fatmanê bê h'esab libas p'êşk'êş kirê bi dilê xwe,
Libasê usa ku hatibûn her yek ji wan welatekî,
„Çi dixazî wî jî xu ke, pirsana, tu min se nekî!“
1244. Avt'andîl wa r'o kir, pîva, -, „Îro sur'a xwe azr'u kim,
Çima gere h'eta nuha libasê t'ucara ez xwe kim“.
Û wê r'ojê k'incê xweye sereskeriyê xwe hêwirand,
Heger şêr bû, bi nûr, neder wî r'o ber xwe temirand.
1245. Fatmanê jî sivre danî, ew hîviya Avt'andîl bû,
Bi dêmê k'en hate hundur', ew e'gîta ezrahîl bû,
Fatman wira e'cêvmayî ma, wexta ku dî wan libasa da,
Go: „Wê geyîmê tuyê dîn kî her bendeyî h'uba dila“.
1246. Nûra wî şa dibû, Fatman ç'e'vê xwe jê ne dibir'î,
Dik'eniya Avt'andîl wê, e'sabanî ew ne didî:
„Ez dibînim ku fe'm nake, k'ê me ez, tê dernaxe,
Êh, çi bikî, gere bivî, r'ê ji r'iya ew dernaxe“.
1247. Nîvr'o şûnda hev dûr k'etin, e'gît çû li hêwira xwe,
R'ind vexarî bû, r'aza, hil da t'êr xewa xwe,
Êvarê ku ew hişiyar bû, dilê wî da r'oê şewq da,
Wî gazî Fatmanê kir, go: „T'enê me, tu were wira“.

1248. Fatman ku hat û Avt'andîl bihîst dengê wê bi axîn,
Fatmanê go: „Ew bedewê min ewt'er ke, yanê jî dîn“.
E'gît k'êleka wê r'ûnişt, belgîkî xas da wêya,
Siya buriya wê kire kon li ser gulêd herdu r'ûya.
1249. Avt'andîl go: „Bibhê Fatman, vê serhatiya ez ku bikim,
Mîna meriyê me'r pê vede, usa h'ukumî ser te bikim,
H'eta niha derheqa xwe da r'astî min tişt ne gotiye te,
K'anêne ew ç'e'v buriyê r'eş, ku dilê min jê hebete.
1250. Te jî t'irê ez t'ucarim, dewletî me û xayî kavran,
Sereskerim ez zanibe, li p'adşatiya zor R'ostêvan,
Sereskerim xayê esker û welatê wîyî giran,
Xayê xizne defîna me, cebirxanêd zore, e'yan.
1251. Tuyî mi r'a nêzîk, kinêz aminî û wa dilovan,
Qîzeke p'adşê min heye, nûre e'ynî wek r'oja han,
Dişewitim û dih'elim, bê xewim, lê heye guman,
Bi xastina wê hatime, hîştîye p'adşê xweyî e'yan.
1252. Bi xastina wê hatime, diger'im wê qîza te dî,
Çiqa welat derbaz bûme, îz û t'oza wê min nedî,
Min ew şêra dîtiye, yê ji h'uba wê sewdaliye,
Bona alîk'ariya wana min jî îro guman heye“.
1253. Wî salixê xwe t'emam kir, ji Fatmanê tişt venegirt,
Salixê Tarîyêl ku bona çî p'ostê piling ewî wergirt,
Go: „Tu boyî wî derman, ç'arî, r'aste ewî tu ne dîtî,
Ç'e'v buriyê wî baskê teyîra, nûr li ber wî dibe girtî.
1254. Were, Fatman alîm bike, wan bighînim em miraza,
Alîk'ar bin boyî bextê wan, bona me ew nîne ceza,
K'ê bibhê, wê me bipesine, şuxula baş k'ê h'iz nake,
Dibe dîsa hev bibînin, şuxulê xêr zeyîneteke.

1255. Tu gazî wî qûlê xwe ke, wî bişînin şêherê cina,
Mizgînîkê bide qîzê, ku salixê wê me hil da,
Ji wêya jî pîrskê bike, çawa dixweze, em wê bikin,
Xudê bike zû bibhêyî, şêherê cina ku em alt' kin“.
1256. Fatmanê go: „Şikir Xuda, ev çi yek bû, min ç'e'va dî,
Ew çi îro ku min bihîst, nemirinê r'a berenber dî“.
Wêya gazî wî qûlî kir, yê ku r'eş bû mîna qîrê:
„Gere her'î şêherê cina, çîqa dikarî kin kî r'ê!“
1257. Tu nîşan de çi dikarî bikî tu bi sêrbaziyê,
Agir îdî şewitandime, t'eze vêxistiye kuç'îkê şaiyê,
Wê r'oê r'a bêjî tu, ku derdê te r'a heye derman“.
Wî qûlî go: „Sibê ezê cavê bînim, heye guman“.





NE'MA FATMANÊ NÊSTAN – DARÊCANÊ R'A

1258. Fatmanê wa ne'me nivîsî: „R'oja geş, tu nûrî dinê,
K'ê ji te dûre dişewitin, dest bernade malê dinê,
Xaş xeberî û zar şîrîn, xeberê qend ser lêvê te,
Dur'î, bîlar, dinê da t'une bedewek mînanî te.
1259. Heyî wax, te ku derheqa xwe da mi r'a nekir qe t'u salix,
R'astî min t'emam bihîstiye, dil min bûye sitêra qurix,
Derheqa xwe da salixekî bide Tarîyêl, wî silav ke,
Bighîjin hev, tu gulek be, ew pîrozang be bona te.
1260. E'gîtek va te diger'e, t'evî Tarîyêl bûye bira,
Avt'andîle navê e'gît, e'rebe ew fenî şêra,
Sereskerê t'emam ordiya R'ostêvan p'adşaye ew,
Derheqa xwe da xeberekê tu bişîne, zaneye ew.
1261. Me ew qûlê xweyî amin şandiye te r'a ku xeber de,
Salixekî cina bîne, eskerê wan paşda hatiye,
Ku h'esavê eskerê wan, ew yeko – yek pê bih'ese,
K'êye serek, te xayî dikin, ku kese wê te neh'ese?
1262. Jê r'a bêje çi ku zanî, çi ku wira te e'yane,
Aliyê xwe da nîşanekê tu bişîne, hîviya te ne,
Tu derdê xwe bide bê, eşqê tê ke tu dilê xwe,
Heger Xuda ku lev bîne, bighînim hev bi destê xwe“.

1263. Fatmanê ew ne'me hil da û da destê sêrbazê xwe,
- „Tu vê ne'mê bi destê xwe bidî r'oja xatûna xwe!“
Ewî qûlî li xwe werkir e'bê xweyî r'eşî, şebe,
Wî banzda ser bana r'a û unda bû wek teyîrê qube.
1264. Fir'î mîna tîra agir ji kevana e'sh'ebekî,
Gihîşt şeherê cina, ew hê meleme bû hinekî,
Ber esker û ersewila r'a derbaz bû ew, keskî nedî,
Wê r'ojê r'a salixek bir, ji r'oja wê nûr û xewnî.
1265. Dergêd kelê r'a derbaz bû, teyê bigota qest vekirin,
Bi e'bê r'eş, p'orê bela k'ete kelê, ew ne dîtîn,
R'oê ku dî, veciniqî, t'irê bext derd jê r'a anî,
Ewê gula berr'o li wê r'eng guhast bû, k'irkût e'yînî.
1266. Wî qûlî go: „Tu netirse, niha bibhê ku k'ê me ez,
Gendî qûlê Fatmanê me, wê şandime ez bal te lez,
Vê ne'ma wê hil de bixûn, tuyê binhêr'î ku r'astim ez,
Tu hîviya r'oja xwe be, berhûm nabî mînanî r'ez“.
1267. Derheqa Fatmanê da bihîst, ew şexsa ma zendegirtî,
Badem terikî û vebûn, bijangê wêye r'eş kil girtî,
Wî qûlî ew ne'me dayê û serberjêr ber sekinî,
Wêya dixand, hêsir dir'êt, k'ax'ez şil kir bi axînî.
1268. Ji wî qûlî ewê pirsî: „Bêje, k'êye min digere,
Yan k'ê zane ku ez heme, yan k'ê gotiye ku digere?“
Wî qûlî go: „Çi ku zanim, ewê yekê ezê bêjim,
Wê deqa tu dûr k'etî, hêsirê xûnê em dir'êjin.
1269. Wê r'ojê da dilê Fatmê, qeyî dibêjî, dan ber tîra,
Wek hêsirê avê r'etî, hê ç'em nek'etine be'ra,
Carekê jî salixê te dîsa min Fatmanê r'a kir,
Wê r'ojê da h'eta niha giriyê xwe wê zêde kir.

SOT'A R'ÛST'AVÊLÎ

1270. Niha e' gîtek hat bal me, bedewiya xwe r'oye e'yînî,
Derheqa te da Fatmanê r'a wî yeko – yeko kire gilî,
Zendê wî yê e' gîtane, te diger'e qûlê derda,
Mi r'a gotin zû vejer'im, egle nebim li t'u e'rda“.

1271. Qîzikê go: „R'ast dibêjim, çi ku te go, min bihare,
Lê Fatmanê çawa zanibû k'ê kirime dîl bi azare,
Zanim ku ew berxwe dik'eve, h'uba k'ê ku ez dizarim,
Ezê binivîsim, tu jî bêje bi çi derdî ez dinalim“.





NE'MA NÊSTAN – DARÊCANÊ FATMANÊ R'A

1272. Wê dêm nûrê wa nivîsî: „Xatûna min, dê amintir,
Binhêr', dinê ez kirim qûl, da min derd ji derd zêdetir,
Ser wî derdê minî p'ir' da dîsa derdek lê zêde bû,
Îro sitend ne'me ji te, dergê gumanê dilêm vebû.
1273. Te du cara xilaz kirim ez ji qeziyê mezin,
Niha cina ez girtime û kirime qut'iya hesin,
Dewletek bi eskerê xwe ser min kirine wê ersewil,
Dewsa fikir, xastina min, bextê xirav qevz kiriye dil.
1274. Salixê vira çî min karibû, t'emam min va nivîsiye,
P'adşê cina hê ne hatiye, eskerê birî cem wêye,
Lê bê h'esab esker vira min dînhêr'in ser hev gava,
Hûn dixazin min aza kin... ew haş da ne, k'efa avê.
1275. Badîhewa r'ê diger'e ku xilaz ke min vê qeziyê,
Badîhewa ew dinale, dişewite agirê biratîyê,
Ewî ç'e'va r'ojam dîtiye, ez dibêjim xazil li wî,
Heyî wax, r'ojê min r'eş bûn bêyî r'oja min, bêje wî.
1276. Derheqa xwe da min tişt nego, ze'f tişt veşartibû min ji te,
Zimanê min girêdayî bû, dixeniqandim bext hêbete,
Bêje r'ojam, gune me ez, besî mine bextêm t'ecal,
Bira îdî peyî min neyê, nebîne mirinê bê mecal.

SOT'A R'ÛST'AVÊLÎ

1277. Ev derdê min besî mine, hinkî zêde, ezê bimrim,
Ku mirîfî wî bibînim, qe deqekê ez namînim,
T'u dest vira alîm nake, axiriya mine, ez r'ind zanim,
Ku nebihê, bi kevirê r'eş min bikuje, ku ez bimirim.
1278. Te nivîsiye, nişanekê ku bişînim, va dişînim,
Eva p'erç'aji xêliya min, p'êşk'êşa wî ku xwe dikim,
E'mir da ew xêliye çawa bîranîn, ziyereta min,
Ew jî usa r'eş hûnaye çawa ku r'eşe bextê min“.





**NE'MA NÊSTAN –
DARÊCANÊ H'IZKIRIYÊ XWE R'A**

1279. H'izkiryê xwe r'a nivîsî bi dilê kul, ç'e'vê girî,
Wê agirê dilê xweyî gur' vepesirand hêsir girî,
Ne'me nivîsî, ne'ma usa, dil xandevan bîne xarê,
Wê bişkokê gula vekir, cêrga bîlara birq da serê.
1280. „H'izkiryê min, te r'a ne'mê ez dinvîsim destê r'icaf,
Ez xwe bûme qelema xwe, bi xûna xwe h'ubra eznaf,
Kiryê k'ax'ez boyî vê ne'mê min dilêd meye hêngavtî,
Dilê min r'eş girêdayî, tu venebî necayîztî.
1281. Êh, r'uh'ê min, tu divînî, dinê çi tîne serê me,
T'im tariye ber ç'e'vê min, dor min be'ra r'onayê be,
R'astiyê zane dibînin û bi avir' dinê dinhêr'in,
Ax, bêyî te e'mir ce'nime, dihoke ew bona min.
1282. Te dî r'uh'ê, diniya bê r'e'm destê min te ji hev qetand,
Ez ne k'eniya û min ne dî, h'izkiryê min ça k'en h'eland,
Bêje, bi zerga h'uba te birîndarim ez, çi bikim,
Min sur'a xwe ber te r'eşand, tişte nema aşkela kim.
1283. Ez sond dixum bi nûra te, bihar nedikir tu hê saxî,
Ya xwe bêjim, îdî min h'esav dikir xwe mirîtî,
Min ku salixê te hil da, şikrîma xwe Xudê anî,
Ser mêzîna bextê xwe dewsa hêsira min eşq danî.

1284. Çawa guman besî mine, şikir saxî, lê ji min dûr,
Dilê minî hêngavtî jî wê gumanê sitand destûr,
Tu bîr bîne ku bona te çi ce'nimê vir ez dibînim,
R'ûniştîme bi destê xwe, dur'a h'uba te dih'ebînim.
1285. Çi binvîsim bidim k'ax'ez derdê dilê xwe t'emamî,
Bihar nakim ku biweste, h'işk be, zimanêm vî qedemî,
Fatmanê ez ji sêrbaza xilaz kirim, Xudê xayî ke,
E'mir usa hev anî, ku qenciya xwe dîsa bike.
1286. E'mir usa ser dilê min derd ji derda zêdetir kir,
Bextê min pê şibh'an nabe, çîqa derdê giran min bir,
Ez avîtime destê cina, dinê da tişt wan alt' nake,
H'izkiriye min, bext daye me, îdfî t'u tişt ç'are nake.
1287. Qesrekê da r'ûniştîme, qet'er nake ç'e'vê meriya,
Neqeva ç'iyê r'a tên vira, ersewîlin ser her gava,
Şev û r'oê sahil nabin, r'ê dinhêr'in h'ezar ç'e'va,
Yê berbi wan tên, dikujin, t'oza wana didine ba.
1288. Te jî t'irê ew şer' dîkin bîna hine e'gîtê çê,
Giliyêm bibhê, ku derdê min zêde nekî tu li dinê,
Tuyê bêyî kuştin, ez bişewitim wek alava pembû ber bê,
Dilê xwe têke ç'iyakî berk', tu min bîr ke, qeda dinê.
1289. H'izkiriye min, fikirê bêxêr tu şandîyî, xwe nede cefê,
Derheqa mi da tu navêjî, ezê bibim bûk ber defê,
E'mir bêyî te mirine mi r'a, sed h'eyîf, heme nava zêndiya,
Yan zangê da xwe bavêjim, yan bi k'êrê cêrga miriya.
1290. Te sond dixum, pêştirî te kes hîva te nabe xayî,
Min bend nakin xemilê e'rşa, ku peya bin, bèn xazginî,
Vira zangê bilind hene, xwe bavêjim, bal min çîye,
Tu ji Xudê neyazkê bike, baska bîdem, ew hîviye...

1291. T'eweqe ke tu ji Xudê, min xilaz ke cefa dinê,
Agir, avê, xwelî, hewê r'a nebim qûl wek mirinê,
Baska bidem, ez bifir'im bighîjim hêlanê fikira,
Şev û r'oê ez binhêr'im nedîra geş mîna ç'ira.
1292. Na, bêyî te r'o ne r'oye, tuyî p'erç'ek ji wê r'oê,
Zanim miqîm t'evî wêyî, çawa dorger' li r'ûyê dinê,
Li wê dinê r'astî te bêm, dilê min te baristan be,
E'mirêm te' lî wa derbaz bû, dibe mirinê ew şîrin be.
1293. Îdî mirinê ez natirsim, min r'uh'ê xwe sipartîye te,
Dilê mi da k'ûr r'ûniştiye, mîna berê va h'uba te,
Hev dûrk'etina me bîr tînim, derd ser derda zêde dibe,
Îdî negirî, şîne neke, nelûbîne tu h'uba me.
1294. Her'e dûr welatê Hinda, dê, bavê min bibe sit'ar,
Ji her alî miqabilî wî r'abûne dijminê h'ar,
Tu ber dilê wan da were, unda kirine ewled bêç'ar,
Tu bîr bîne h'izkiriya xwe, te bîr nakim bi hêsirê sar.
1295. Bese çiqa ber Xuda bûm şikiyatçî bextê xweyî r'eş,
Belê, ji dil derbaz dibe, berbi dila derdê nexaş,
Boyî te mirinê ezê hil dim, bira qijik ser min bigrî,
Ne ez zanim ku hê heme, tuyê boyî min biçerçirî.
1296. Vê nîşana min tu hil de ji xêliya te da min p'êşk'êş,
Min qilç'ekî wê bir'iye, p'êşk'êşa te bi dilê êş,
Ev dimîne te r'a guman, şe'dê h'uba me t'evayî,
Me bûn dijmin h'evt tebekê e'rşa, ser me da derd barî“.
1297. Wa xilaz kir, bi dilê kul h'izkirî r'a ne'me nivîsî,
Wê qilç'ê xêliyê bir'î ya ser namlê dîteyîsî,
Gurzê guliyê wê wir vebûn, li ser dêmê wê kirin sî,
Qeyî te digo, çinar hejiya, nûra dêm da ser ker'asî.

1298. Qûl nesekinî, lez k'ete r'ê, berê xwe da Gulansero,
Ew gihîşte mala Fatmê, hela bejneq hê hebû r'o,
Dilê Avt'andîl zerp k'uta, wexta ku wî salix hil da,
Herdu destê xwe bilind kir, ji Xudê xwe ew r'azî ma.
1299. Ew zivir'î berbi Fatmê: „Bi h'esîna dil min r'o dî,
E'mir da borcdarê te me, deyîndarê te me ez îdî,
Saleke min t'emam bûye, we'deye ku bik'evim r'ê,
Gere herim, e'fat bînim, welatê cina bide ber bê“.
1300. Xatûnê go: „Êh, şêrê min, agirê dilêm hê gur' dibe,
Wexta r'oê dûr dik'evim, dil hêsîr û bê t'ab dibe,
Tu lez k'eve, min nenihêr'e, sewdalî k'engê aşî dibe,
Wexta ku cin veqer'îyan, şer'ê weyê giran bibe“.
1301. Wî gazî wan xulama kir yê Nûradîn pêr'a danî:
„Em mirî bûn h'eta îro, e'mirê r'astî îro me dî,
Me salixeke şîrîn bihîst, k'îjan xewn bû bona me,
Gere em bibînin çawa xûn bir'ije dijminê me.
1302. De hûn her'in P'irîdon r'a têkin gilî çî ku we dî,
Sed h'eyîf, wîya ez nabînim, r'êwiyê lezim ez îdî,
Bira niha bi dengê xwe têke qîr'în alt'îndarî,
Ezê niha r'ewayî we kim ji hebûna xwe t'ucarî.
1303. We deyînê xwe p'ir' giran kir, kire serbar ser milê min,
Ezê qedirê we bigirim, ez P'irîdon ku hev bibînin,
Çî ku t'alan kir ji gemiyê, didime we, xur'a bibin,
Paşê nebên ku nemerîd bû, tişte t'une ber destê min.
1304. Mal da nînim ku bidim we ez p'êşk'êşê layîqî we“.
Wî lal û dur' k'ulma r'o kir, da xulama merdaya xwe.
Go: „Xudê ox'ira we r'a be, herin şa bin vê dîniya r'on,
Vê ne'ma min bi destê xwe e'se bidin hûn P'irîdon“.



NE'MA AVT'ANDÎL P'İRÎDON R'A

1305. Wa nivîsî: „P'adşê p'adşa, e' gîtê P'irîdon, e' fatî tu,
R'oyî, dor xwe şewq didî, şêrî qewat cule'tî xu,
Dinê li ber te dilerize, dijmin alt' dikî bi şûrê xu,
Birê teyî biç'ûk niha berbi te dibe vê ne'ma xu.
1306. Min cefa dî, lê cefa min bû k'ifaretê ax'retê,
Ew qewimî boyî çi dişewitîm, dih'eliam li hewatê,
Min salixê wêya hil da, k'îjan r'o bû, şemal û nûr,
Xilazkirê wî şêrî r'a, k'îjan hîviya mirina ne dûr.
1307. P'adşê cina dîl hil daye, ew şêherê cina daye,
Hê t'u esker nek'etiye wê, boyî min şivêta lîstinêye,
Beybûn xûsiyê dibarînin, şil dikin belgê gulêye,
Esker wira bê h'esabe, ordiya t'am veneger'iyaye.
1308. Aha boyî çi ez şa dibim û nar'êjim hêsirê germ,
Hêsa dîke çetinayê wê k'u biratiya meye miqer'im,
Bê şubeye yaniş nabim, wê mîaser be çi dixazin,
Merî çine, ç'iya ber we nerm bin, mîna germ kî h'esin.
1309. Bibexşîne birayê min, ji te dûr çûm, te nabînim,
Ser ox'ir'a xwe namînim, hîva dîl r'a gere bighînim,
Emê şayî hev bibînin, tu jî hîviya wê yekêyî,
Aha t'emam çi min te r'a go, alî bira ke, tu birayî.

SOT'A R'ÛST'AVÊLÎ

1310. Ev xulamê te dane min, bin deyînê wan dernek'etim,
Wan bê qisûr qulixî min kir, gunê wana çawa hil dim,
Ne h'ewceyê p'eyane, yê ku dirêj cem te mane?
Ji şêra şêr diwelide, - ev yek gotina zanane“.
1311. Wî e'gîtî misk û mawer, ne'ma xwe wa xitim kir,
Ew bi qîrar hev p'êç'a û dirêjî xulama kir,
Wî bi zar go, çi ne'mê da pêr'a negîhand binvîse,
Wexta ewî devê xwe vekir, cêrga mircana dit'eyîse.
1312. Geriya û wî gemîk dî, k'îjan diçû wê, ku dixast,
Ew r'o k'ete r'ê, bi nederê e'yînî r'o bû, r'oja r'ast,
Lê çetin bû, bona wî ku Fatman hîşt wê r'ojê da.
Ji wan qetiya, ji ç'e'vê wan hêsira mîna ç'ema fûr da.
1313. Dik'ewgirî û digiriyan Fatman, H'ûsên û xulam:
„Bêje, r'oê çi bû te kir, derdê alav me bû xumam,
Bi çûyîna xwe me kir tarî, wê tariyê da em sêfil man,
Bi destê xwe me ç'e'l dikî, me tariye e'rd û e'zman“.





**ÇÛYÎNA AVT'ANDÎL JÎ GULANŞERO
Û R'ASTHATÎNA T'EVÎ TARÎYÊL**

1314. Avt'andîl bi wê gemiyê meqes dikir ew be'ra hêşîn,
Diçû hêsa, dil da şabûn û bê xem bû cara pêşîn,
Gere Tarîyêl wî bidîta, zû bidayê ewî mizgîn,
Destê xwe berbi e'zman kiribû, Xudê neyaz dikir h'esîn.

1315. Îdî baharê bar dikir, şînayî dinê zer dibû,
Vebûna belgê gulê sor ew nîşana havînê bû,
R'oê îdî fitila xwe kiribû, ew berbi pêwr û mêzînê bû,
Wî e'gîtî kulîlk ku da, ew h'izreta kulîlka bû.

1316. E'rş kir gur'în, ji e'zmana barana bîlar hate xar,
E'gît gul da ber lêva xwe, xwe bû gul, dil da bihar,
Wa go: „Bi dil te dinhêr'im, bûme ez qûlê siya te,
Ez ku te r'a xeber didim, dilê xwe ber wî vedikim semte“.

1317. Wî bîr danî ew e'gîta û dir'ijand hêsirê germ,
Bi r'îya hêsa r'a diçû, berbi birê xweyî dîl'r'e'm,
Bi şiver'ê yekp'ê r'a wî dabû ser r'ê, r'ê diqetand,
Şeqîva da nêç'îr dikir, şêr û piling wî weldiger'and.

1318. Dûr va şikevt hatine xuyan, wî nas kirin û dil avît,
„Van ç'îya da ew dimîne k'ê diger'im îşq mêlît,
Hêjaye ku wî bibînim û mizgîna xêrê bidimê,
Dibe berbi mal zivir'î be û dengê min îdî nabê.

1319. Ku her'e mal, bê şubeye, ew nikare mal da r'ûnê,
Wê bik'eve ç'iya, baniya mîna de'ba gazî ke dinê.
Başê vê şewlê r'a her'im“, - wî dinhêr'î dor – berê xwe,
Car din r'iya xwe dirêj kir, berbi bestê guhast r'iya xwe.
1320. Wî hespê xwe r'ik'êv dikir, bê xof distira bi dengê zîl,
Heyî carna gazî birê dikir, deng dil r'a nedibû dîl,
Hinkî şûnda ewî r'o dî, nûr û şemal dabû dor xwe,
Tarîyêl bû wê şewlê da, şûr bi xûn girtibû destê xwe.
1321. Wî e' gîfî şêr kuştibû, hela şîl bû hê şûrê wî,
Devê şewlê sekinî bû, nedihat xuyan wir hespê wî,
Dengê heval bihîstibû, şabûn k'etibû dilê wî,
Ewî ku dî û nas kir, bê h'emd r'evî pêşiya wî.
1322. Tarîyêl şûrê xwe wêda avît, berbi birê firqas kir,
Mîna wana t'enê siteyîra li e'rşê hev h'emêz dikir,
Dest situyê hev r'a birin, hev r'amûsan herdu e'gîta,
Gul ku belgê xwe vedike, xeber dibin şer'et îda.
1323. Tarîyêl bi girî, wî digot xeberê dur'û fikirê k'ûr,
Niqitkê hêsirê xûnê wê bestê da sitandin destûr,
Û kaniyêd hêsirê gur' av didan dor – bérê wan wir,
„Min tu dîfî birayê min, bê xofim ez ji derdê gur“.
1324. Heta Tarîyêl ku digiriya, Avt'andîl eşq wir xeber da,
Ew ku k'eniya, diranê sedef şewqa r'oê wê şewq dida,
Go: „Hatime, salix aniye ji wê boyî k'ê dişewitî,
Dîsa ew gulê geş be, k'îjan r'o ku diç'ilmisî“.
1325. Tarîyêl wa go: „Biraê min, şaya îro besî mine,
Çi şayî vê mestir, îro em r'astî hev hatine,
Dermankî din Xudê nade, îdî çi te bibhêm,
Merî dinê da wî dibîne, çi k'erem kiriye Xudêm“.

1326. Avt'andîl dî, bihar nake, îdî ew li wir ker' nebû,
Sebir nekir, t'emam wî r'a kire gilî çî ku zanibû,
Wî derxist p'erç'ê xêliyê ya bedewê dabiyê bi xwe,
Tarîyêl hil da, kire qîrîn, ew p'erç'e da ser ç'e'vê xwe.
1327. Wî lê nihêr'î û nas kirin ew p'erç'e û ne'ma wêya,
Xwe va guvaşt û k'et e'rdê, lê xeyîrî r'engê wiya,
H'işê wî çû, p'or' bela bû mîna şînaya mêrga wira,
Ew cefa ku ewî k'işand Keyên, Saleman nedibirin, bira.
1328. Avt'andîl ker' lê dinhêrî, Tarîyêl k'etibû mîna miriya,
Ew nêzîk bû, alî bike ku bira r'ake ew ser p'iya,
Êh, çî feyîde ji wê yekê, boyî dîlk'etiyê h'ubê birî,
T'ercibe kir bi nîşana û h'esav kir îdî mirî.
1329. Dilê Avt'andîl t'ijî bû, dengê şewat got û giriya,
T'ûncik, t'emorî xwe ver'û û r'eşande li ser dir'iya,
Bi çakûçê almast qelaşt sûretê lale nebînayî,
Ku k'etibû fenê mircan kaniya gur', e'rş hildayî.
1330. Dêm diqelaşt, xûn dik'işiya û li Tarîyêl wî dinhêr'î,
Digo: „Heyî wax, çî ku min kir, dîn ne dîkir bi nezanî,
Agirê gur', agirê alt'ûn çîma hêdî av ser da kir,
Dilê meriya tamîş neda, şabûna bêh'ed ku ew bir.
1331. Min kuştiye pizmamê xwe, gune xwe r'a qazanc kiriye,
Vî şuxulî da pêştirî min t'une gunek'ar, te derc kiriye,
Şuxula giran boyî meriyê sivik - barê bê h'ed, nîrê giran,
Şuxulê sebre şermî, çêtire şuxula leze, pesinî e'yan“.
1332. Qeyî te digo, agir şewitî, bêh'iş k'etibû Tarîyêl li wir,
Avt'andîl çû avê bine, mêrg meqes kir mînanî gur,
R'ê va ewî xûna şêr dî, dewsa avê hil da anî,
Li ser sîngê wî da r'eşand mîna dena sore e'yînî.

1333. Ewî xûna şêre hê germ li ser sîngê e' gît r' eşand,
Buriyê nîze ji cî leqiyân û Tarîyêl xwe cî da h' ejand,
Ç'e'vê xwe vekir, ser xwe da hat, r' ûnişt, hinekî hêsa bû,
Nûra r' oê da ser hîvê, nûra hîvê hê hêşîn bû.
1334. Zivistanê gul h' îşk dibin û belgê wê diwerin jê,
Û şorana havînê berk', dixeyîre gul bê avê,
H' eta ku ew diçerçirî destê derdê kevin û t' eze,
Bilbilê çî zanibû ew h' ub distra bi hêwerze.
1335. Usa dilê meriya hêsa derdê xweyî kevin ew bîr nake,
Derdê giran, şabûna gur', qeyî dibêjî, e' wt' er dike,
Birîndare k' ûraya dil k' ê e' mirê şa derbaz dike,
Ew gumanê dinê bîne, xwe r' a dijminayê dike.
1336. Tarîyêl wira dinhêr' î ne' ma h' izkiriya dilbirîn,
Dixand, xandinê dîn dibû bi xeberê wêye şîrîn,
Ç'e'v digirt ber hêsirê şor, r' oja nedîr dibû tarî,
Avt' andil ji ciyê xwe r' abû, berbir' bûne bi dilsarî.
1337. Go: „Bizan be, kirina te ne cayîze mêrê zane,
We' deye ku em dil şa bin, girî qedir me r' a nayîne,
R' abe, her' in wê bibînin, wê şemala dûre – deraz,
Were bibim ez te cem wê, derdê ger' ê bibî xilaz.
1338. Were îro emê şa bin çawa me r' a layîqe niha,
Hespa syar bin, bidin ser r' ê, şeherê cina bikin xeza,
Em piştî wan bidine xwe, bikin beled şûrêd hêşîn,
Ser ciniyaza r' a derbaz bin, bizvir' in bi dilê qewîn“.
1339. Tarîyêl îdî h' îşiyar bûbû, dibîst qisa wî bi şayî,
Ku dinhêr' î, qeyî te go, dihingêve e' rşê sayî,
Û r' engê wî diç' ilvilî hêlepîtka agirê zêr' in,
Hêja bû ew nexşê e' rşa, yê wî e' gîtî hêwirîn.

1340. Wî xeber da bi r'azîbûn û fikirê xwe gote heval:
„Ez pesinê te çawa bidim, tu hêjayî e'gît h'elal,
Gula qirac te av da, bûyî kaniya sar û zelal,
Te hêsirê min zîha kirin, belgê gulê sore, lal.
1341. Ez nikarim, bira te r'a k'eremê bike yekî Jor,
Bira xêrê ew bide te, şabûnê li te bike mor“.
Hespa syar bûn berbi hêwrê çûn, salixê eşq ser lêva,
Bira Asmat' jî şa be, ew qûla hîviya wan salixa.
1342. Asmat' t'enê r'ûniştibû ber şikevtê, dûr va dîtin,
Nas kir Tarîyêl syarê kih'êl, herd melkemotê e'gîtin,
Wana distira k'ubra şîrin mîna bilbilê baharê,
Te'na kiras ji cî p'ekiya, pêşiya wan da çû wê k'arê.
1343. T'imê wêya Tarîyêl dî bû ç'e'vê girî dihate mal,
Zendegirtî ma vê carê, bi sitran tê, çiyê h'ewal.
Mîna meriyê serxweş ewê pêşiya wan da r'ê dilezand,
Ne axir ne bihîstibû, salixê wana pê r'a digîhand.
1344. E'gîta ku ew dîtin, bi devê k'en lê kirine gazî:
„Êhêyî, Asmat', Xudê da me, xastina me serfiniyazî,
Me dî hîva unda bûyî, ox'ir li me dike gazî,
Bext qevz kiriye derdê me, e'mirê me r'a werguhêzî“.
1345. Avt'andîl ji hespê banzda, kir Asmat'ê ku r'amûse,
Asmat'ê ew h'emêz kir, kir r'amûsana lê r'êz ke,
Bû îskena wê û giriya, hêsira r'ê ne dane hev:
„Çiyê bêje, te çi kiriye, hîviya te bûm ez r'oj û şev“.
1346. Da Asmat'ê wî ew ne'me ya Nêstanê nivîsî bû,
Dil û r'uh'ê xwe kiribû wê, wê horiya xerfîbiyê bû,
Go: „Binhêr'e tu ne'ma wê, çiqra derdê giran dîtiye.
Niha nedîr gihîştiye me, siya derd jî unda bûye“.

1347. Asmat'ê ku ne'me nihêr'î, destnivîsar ewê nas kir,
E'cêbmayî ma, zar, ziman k'et, sewdê xwe wê wir unda kir,
Dest û nig lê lerizîn û r'icafê ew kire lerzek,
Wê go: „Gelo dîtina min r'aste yanê derewe delk“.
1348. Avt'andîl wê k'eniya û go: „R'aste çi ku te ç'e'va dî,
Şabûn k'ete dilê me, derda k'oç'a xwe bar kir îdî,
Nûra r'oê daye ser me, tarî ji me dûr êxistiye,
Qencyê xiravî p'êpes kir, qencî namire, te bihîstiye“.
1349. Hev h'emêz kirin, dik'eniyan, ç'e'va r'ê ne dida hêsira,
Baskê qir'kê xûsî weşand ji ser belgê gula nazik,
Xudê meriya unda nake, ku zanîn lê nake r'ik.
Awa berbi Asmat'ê bû p'adşê Hindî eşq û dilşa.
1350. Şikirîma xwe Xudê anî: „Ya baş ew bû, ku me r'a kir,
Û me fe'm kir, ku t'ev cefê ew k'erem bû me r'a dikir“.
P'adşê Hinda awa digot û r'azî bû ji bextê xwe,
K'etin şikevtê, Asmat'ê wir sivre vekir hebûna xwe.
1351. Avt'andîl r'a birê wa go: „Niha giliyê bibhê, bêjim,
Ev şuxula qewimiye, h'esav nekî ezî gêjim,
Dêwa r'a ku bûme qesab û ev şikevta min ku hil dan,
Xizna wana vir'da heye, dilê wan r'onayî nedan.
1352. Venekiriye, nedîtiye, nedixast destê xwe bidimê,
Were niha emê vekin, bibînin çi kirine xiznê“.
Qayîl bûn, pêşda çûn, Asmat' jî hil dan t'evî xwe,
Çil dergeyî k'ilît vekirin, e'cêb dîtin bi ç'e'vê xwe.
1353. Wan xizna da wana dîtin tiştê e'cêb nebînayî,
Qûç'ê lal, dur', weke gira, t'eve mixer'm, zelal, sayî,
Her dur'ekê wek t'opekê, qûç' kiribûn li her alî,
Xişirê zêr' wê bê h'esav bû, zêr'ê sik'e lod h'eta banî.

1354. Ew çil ode t'ev t'ijî bûn bi e'maret ç'ilk ç'e'va r'a,
Goşekî da cebirxane, ç'ek û sîlih' dîn wan xwe r'a,
Qeyî te digot, kirine tirşîn her bêşeyî ç'ek û r'ih'al,
Lê ort'ê da qut'îk hebû, morkirî bû ew bi r'ûqal.
1355. Ser nivîsî bû: „Virda hene sîlih'ê e'cêb cî – war kirî,
Mert'alêd xas, şûrêd r'isas, yê besrayê, k'incê zirî,
R'oja cin ku bêne ser me, wê ser bigrîn, p'or'kur'î bin,
K'ê pêşda dest bide wan, p'adşa bi destê wan serbir'î bin“.
1356. Derî vekirin, tê da dîtin wana sê dest r'ih'alê cengê,
Boyî sê mêra ç'ek, sîlih'ê bijareye yê wê hingê,
K'incê zirî, mert'alêd xas, şûrêd r'isase xemilî,
Qeyî te digo, k'efen kirine ew sîlih'ê mor ser gulî.
1357. Her yekî wan destek hil dan, lê nihêr'in û xwe kirin,
T'u sîlih'a ew ne dibr'in, usa hatibûn çê kirin,
Şûrê h'esin usa dibir'î, çawa dûzan p'orê seriya,
Wekî diniyak bidan xaya, nedi firotin t'u çarsûya.
1358. Wana wa go: „Ev nivîsar bextê me me r'a nivîsî,
Jorda Xudê bi ç'e'vê r'e'm îro ewî li me pirsî“.
Xwe hêwrandin ç'ek û r'ih'al û kirin ku hundur' derên,
Gotin: „Ev jî P'irîdon r'a, birakê meyî e'gîtî, zên“.
1359. Hil dan hine zêr' ji xiznê û dur'ê zer, nûr wek r'oê,
Derk'etin û derî dadan, bi jimar çil derî bûn wê,
Avt'andil go: „Îro şûnda şûr nak'eve ji destê me,
Îşev cîkî da em naçin, şebeqê r'a ser ox'irêne“.





TARÎYÊL Û AVT'ANDÎL DIÇIN CEM P'IRÎDON

1360. Sibe r'on bû, herdu e'gît t'ev Asmat'ê dane ser r'ê,
Ew avîtibûn terkiya xwe, berbi P'irîdon ser ox'irê,
T'ucarekî xerîb dîtin, wan bi zêr'a hespek k'ir'în,
Avt'andîl bû beledê wan, şuxula dikir wî serwêrî.
1361. Diçûn, r'ê da nişkêva wan r'evoyê hespê Nûradîn dîn,
Dîtin û ze'f begem kirin, hêjaye P'irîdon – Nûradîn.
„Laqirdîkê werin bikin, - Tarîyêl wa go li wê derê, -
T'ev r'evoçiyê Nûradîn emê şer'kin mîna cerda berê.
1362. R'evo bajon, ewê bibhê, wê bixaze me şîret ke,
Bi esker wê bide ser me, ku xûna me e'rdê r'eng ke,
Paşê ewê me nas ke û bi r'uh' va ewê şa be,
Hema bi wê laqirdiyê va derdê dilê me bela be“.
1363. Wana hespê Nûradîn dan pêşiya xwe û ew ger'andin,
R'evoçiya agir vexist û hewariyê wan lezandin,
Wa deng danê: „Gelî xorta, we tişteki ner'êtî kir,
Xayê r'evo we va derê, e'se we r'a bibe serbir“.
1364. Ev bihîstin, tîr, kevana bi hewarî dane peyî wan,
R'evoçî dir'evîyan, best t'ijî bû qûr'îna wan:
„Hewar werin, me dikujin, me xilaz kin van heraviya!“
Hewar gihîşte P'irîdon, paşê ew wê yekê h'isiya.

1365. P'irîdon hil da ç'ek û sîlih', hespê syar bû, nûr bû e'yînî,
Deng bela bû, esker civiya, qeyî te go, mêşe cî livî,
Pêşda hatin du şemala, e'gîtêd bok', şêrê Xudê,
Dê mê xwe wan sep'e kir, ku nas neke P'irîdon wê.
1366. Tarîyêl berbi Nûradîn bû beşera xweş, eşq k'eniya,
„Min k'ê dixast, ew jî min dî“, - k'umê xwe hil da nişkêva,
Wa h'enek kir: „Çi qewimiye, dibe hatina me ne r'azî?
Bi şer' tu me qebûl dikî, em ne cerda şevadizî“.
1367. P'irîdon hespê banzda e'rdê, t'emene bû, silav da wan,
E'gîtêd me jî peya bûn, hev h'emêz kirin, r'amûsan,
Nûradîn li jor dinhêr'î, şikrîma xwe danî Xudê,
Xulama jî hev r'amûsa, hevr'a nas bûn bi qîrarê.
1368. P'irîdon wa go: „Dereng hatin, zûda ez wê hîviya we bûm,
Hazirim we r'a qulix kim, t'embeliyê tima ne bûm“.
Du r'o hîvkê wira hev dîn, dilê wan da eşq û şabûn,
Dane ser r'ê û nûra wan dor û berê wan hil da bûn.
1369. Ew peya bûn ber qesira Nûradîne nûr û şemal,
Wî birê xweyî Avt'andîl da r'ex xwe ser t'extê e'gal,
Tarîyêl li ser t'ext r'ûnişt, t'extê bedew û h'ik'iyatî,
Anîne wir deste libsê eskeriyêye nebînayî.
1370. Gotin: „Îdî em nabînin hedayîke din, layîqî te,
Lê me cîkî veşartîye xizna hêja, babetî te“.
Wî e'niya xwe gîhand e'rdê, herdu destê xwe bilind kir:
„Ev p'êşk'êşa layîqe, ku te birê xwe pê r'ewa kir“.
1371. Û bin banê Nûradîn da wê şevê ew şîrin r'azan,
H'imamîş bûn, qedir û hurmet, libasê layîq r'ewa hil dan,
Libas ji libasa naziktir bûn, bedewtir bûn û p'ir' hêja,
Bi t'asa zêr', him lal, him dur', kevirê qîmet wî p'êşk'êş da.

1372. Malxwê wa go: „Dibe pirsam we şa ne ke, mêvanh'îzî,
Zanim mêvanê mîna we t'u car nabin ew ne r'azî,
Gerekê em bilezînin, bidin ser r'ê ox'ira xêrê,
Heger ku cin vege'ir in wir, şer'ê bide me ze'metê.
1373. Eskerê p'ir' ne lazime, bira hindik, lê e'gît bin,
Sêsid eskerî va her'in, bengzemîşî xerîba bin,
Şiherê cina da bik'işînin em şûrê xwe wek birûskê,
E'se gere em bibînin û xilaz kin ewê xûşkê.
1374. Ez wir bûme û min dîtiye birca wane kela qewîn,
Her alî da zêzemîne, r'ê napirse wir t'u t'emîn,
Heger dizîva nek'evinê, çetin ber wan em tamîş din,
Ah, bona çi eskerê p'ir' r'oja îro xwe r'a nabin“.
1375. Giliyê wî r'a t'ev qayîl bûn, giliyê h'elal û bê şube,
Û Nûradîn Asmat' wir hîşt, hedaya r'a h'esab nabe,
Hespêd kih'êl t'enê birin, sêsid mêrê mîna şêra,
Axriya wan Xudê xêr ke, dewsa derdê dîtin bira.
1376. Usa hersê bira hev r'a derbaz bûn be'r û qerayê,
Şev û r'oê r'ê k'udrandin, lê beled bû Nûradîn wê,
P'irîdon go: „Derbaz dibin r'ex şiher r'a bi h'erbê va,
Û vir wada em dikarin fesal her'in bin şevê va“.
1377. Ew şireta P'irîdon jî hersê bira dir'icmînin,
Şevê diçin, bona r'oê hevr'a r'ih'et ew dibînin,
Ew gihîştin wî şherî ku esker bû lê nobedar,
Nobedara fikir gazî, zang û gelî dihatin zar.
1378. R'îya bine'rd xayî dikirin wek deh h'ezar xortêd t'ûre,
Û şêra dî, nûra hîvê şiher şewq dide, difûre,
Gotin: „Ber me çetinayêye, lazime r'ind bifikirin,
Sed h'ezarî zêdetire, ku aqilayî şuxul bigirin“.



ŞÊWRA NÛRADÎN – P'İRÎDONÊ

1379. P'irîdon wa go: „Pirsa xwe got, ez zanim ku şaş nebûme,
Bi h'esav va em hindikin, şîherê ha alt' nebûne,
Em nikarin cembrê vekin, qur'ebûnê k'ar ne dîne,
Ku ber me derî dadan, îdî kes me wê nabîne.
1380. Zar'otiyê da ez hîn kirime, p'elevanim ser şîrîtê,
Ser dir'evim û banz didim, ew hostatî destê min tê,
Ser şîrîtê usa dir'evim, ç'e'v nagihînin bidin peyî min,
K'îjan cahil xaziyê nayîne ser şîrîtê dibîne min.
1381. Niha ji we k'ê dikare k'ebendê bavê bê şaşî,
Bavê h'eta serê bircê vê k'ebendê bi a'taşî,
Ezê ser r'a bir'evim, ça li besteke fire aza,
H'eta hûn bèn wê bircê da, t'eva ezê bikim xeza.
1382. Mi r'a ew yek ne çetine, ç'ek – sîlih'a va ku bibezim,
Mînanî ba her'im hundur', ciyê cîda ez birûskim,
Wan t'emama ezê qir'kim, deriya pêşiya we va vekim,
Werin wira, herça dimîne, t'evayî emê xeza kin“.





ŞÊWRA AVT'ANDÎL

1383. Avt'andîl go: „P'irîdon bira, gotina te me baware,
Tu gumana zendê xweyî, qala da kes te nikare,
Ze'f çetine şewra te, kûzîna wan tu dibhêyî,
Binhêr' çîqa nêzîk dengê nobedara tu dibhêyî.
1384. Tu ku r'evî, nobedarê dengê sîlih'ê te hilînin,
Wê fe'm bikin, wê k'ebendê bibirin, yan jî bişewitînin,
Badîhewa r'oda her'e ew emekê em bibînin,
Ev yeka me r'a dest nade, şuxul sebrê bice' dînin.
1385. Ya baş ewe cîkî fesal xwe veşêrin, me nebînin,
R'êwî ku diçine şîher, cin wana naêşînin,
Ezê bibim t'ucarekî dewletîyî, xayî p'ir' hebûn,
Bara da ezê veşêrim sîlih'ê xwe ser, zirî, zebûn.
1386. Em ku bi şer' her'in ser wan, me bibînin, wê me ze'yî kin,
Usa libsê xwe guhartî, t'ik, t'enê bim, wê r'ê vekin,
Nişkêva ç'ek – sîlih'a hil dim û r'abim ez pêşiya dijmin,
Bi xastina Xudê ber şûrê m' ç'emê xûnê wê bik'îşin.
1387. Ezê qir' kim nobedara yê bircê da nobetê ne,
Hûn h'icûm kin ser wan deriya yê pêşiya we dadayî ne,
Ezê hûr kim k'ilîta wê, deriya bidim ser piştê,
Hergê r'êke din hûn zanin, bêjin em guh bidinê“.



ŞÊWRA TARÎYÊL

1388. Tarîyêl wa go: „Gelî bira, hûn e' gîtin, şêrêd mêrxas,
Çi ku we go, mêranî bû, dil, ceger we polayê xas,
Zanim cebrê hûn dixazin û şingînê şûrêd hêşîn,
K'ê xaziya xwe nayîne we r'a hevaltiyê bike bê k'în.
1389. Lê xêlekê min bibhên û gotina min hil din h'esav,
Dengê we ku ew bibhê, jêr nebîne şêrê qesav,
T'enê ewê we bibîne, ez ne cêrga e' gîta bim,
Beranberî wê yekêye navê xwe teniyê lek'e kim.
1390. Niha bibhên gotina min, aha hê baş tê sitandin,
Her yek ji me bi sed merî şebeqê r'a emê r'abin,
Hersê aliya da h'icûm kin, dengê hespa qûr'în, qûjîn,
Ewê me kêh h'esav bikin, ji piştta wan bikin xirmîn.
1391. H'icûm kin ser, ew nagihînin deriya pêşiya me dadin,
Yek we r'îya dêrî bigre, yê din wana em xeza kin,
K'etine hundur', wan xeza kin, ber xwe lod kin ciniyazê wan,
Şingîna şûrêd hêşîn wê bibe sawa giran serwan“.
1392. P'irîdon go: „Şer'ê sibê me e'yane wek pênc t'îliya,
Ber hespa te ew nagihînin deriya dadin herdu aliya,
Min hesp da te, min nizan bû, kêrî te bê şêherê cina,
Min bizanbûya dibe neda... tima me ez, bizan be, ha“.

1393. P'irîdon wa laqirdî kir û k'enê wan wê bû leyîlan,
Beşera xweş dik'eniyan e'gîtêd guh didane wan,
Bi h'eneka gul diçinîn û davîtin ça kewkanî,
Sîlih' girêdan û bin wan da hespa t'aba xwe na danî.

1394. Beşera xweş, pirsêd şîrîn û h'enek bûn ser lêvê wan,
Hevr'a, hevr'a gotina Tarîyêl begem kirin, begemî dan,
Her yekê sed esker hil da, t'eve e'gît mîna şêra,
Şûr k'işandin ji kalana û nig kirin li r'ik'êva.





HILDANA KELA K'ACÊT'Ê Û AZA KÎRÎNA NÊSTAN – DARÊCANÊ

1395. Aha, wê ew sê e'fatin, sê r'o ne ew, sê e'gîtin,
Xweyîkirê wan h'evt siteyîrin, h'evt sitûnê e'rşê jorîn,
Li ser kih'êl dimilmilin Avt'andîlê mîna r'oê,
Avr'ê wana dibûne zerg, şûrê wana bir'a bûn wê.
1396. Ez dixwezim bi gotina xwe, bidim pesinê dêmê narî,
Wexta e'wrê r'eş dicivin, lêyî ç'îya dikin kerî,
Geliya da ew gur'dibe, bi girmîn dik'işe bê sewda,
Wexta ew dik'eve be'rê, hêsa dibe nav be'rê da.
1397. P'irîdon û Avt'andîl va mêrê mêr bûn fenê şêrî,
Li ber zerpa Tarîyêi wê tamîş ne dida t'u merî,
Siteyîrê geş unda dikin şewqa xwe nûr li ber r'oê,
Lê guhdar be, wê xirmîna şer'ê girane tê li wê.
1398. Sê e'gît sê t'ax'bûra va sekinîn ber hersê deriya,
Sêsid merî t'eva e'gît, t'ev jî mîna şêrê ç'îya,
T'emamiya şev t'abiyê da bûn, şêwir kirin h'eta sibê,
Şebeqê r'a r'abûn, t'eva hil da ç'ek û sîlih'ê h'erbê.
1399. Hêsa diçûn wê r'ê da ew, mîna r'êwiyê ku ne lezin,
Dijminê wan fikar nekir, fe'm nekirin çi ew dixwezim,
Ne tirsîyan, hazir nîbûn, t'u minet wan nedik'işandin,
E'gîta e'ba vekirin, h'icûm kirin, êriş k'işandin.

1400. R'ik'êv kirin û ajotin, bû şîrqîna qamçî li wir,
Ew ku dîtî, derî vekirin, ba dengê hewariyê bir,
Ji sê aliya k'etin şeher, hersê derî ji ber kirin,
Dengê dabdaba zîl bû, noba û bûka sewda birin.
1401. Cina fe'm kir ku Xudê wan li wan hatuye xezebê,
Kronos mir'ûzê xwe kir, unda kir şîrmaya r'ôê,
Aliyê wan da ç'ep zivir'î ji e'rşa çerxa felekê,
Bû weke be'r zeviya mirinê, ciniyaz lod bûn ji wê yekê.
1402. Ji qûr'îna Tarîyêl wir esker dik'et, dibûn mirî,
Bi şûrê xwe wî dibir'î mert'al û k'incê wane zirî,
Hersê derî wana hil da bê cefa û bê qeziya,
Birc hedmandin û derk'etin ort'a şîher hewar, gaziya...
1403. Wê bircê da r'ast hev hatin P'iridon û Avt'andîl,
Wexta îdî xeza kiribûn, kes t'unekbû ku hildin dîl,
Deng dane hev bi şabûn, şingîn kirin dor û bera,
„Tarîyêl k'uye?“ – ewana go, deng ne bihîstin wan t'u dera.
1404. Wexta wana Tarîyêl nedî û hil nedan wan îza wî,
Berbi bircê k'etine r'ê, bê saw bûn ew dijmin îdî,
Wana dît, wê mîna me'sî ciniyaz bûn lî herdu aliya,
Deh h'ezar wir bê r'uh' bûn, k'etibûn serê wan r'îya.
1405. Wir ciniyazê nobedara qet – qetî bûn ji zerpa şûr,
Xûnê da ew mewijî bûn, sîlih'ê desta p'ekiya bûn dûr,
Derê bircê vekirî bû, derge bû hûrxaş kirî,
„Eva şuxulê Tarîyêle, eve şenga wiya birî“
1406. Wana r'ê dî bin e'rdê r'a, çûn gihîştin ew wê bircê,
Dîtî hîva ziya xilazbûyî, çûye gihîştiye wê r'ôê,
Wî k'umê xwe derxistibû, p'or' lê bûbû xemil li wê,
Usa wan hev h'emêz kiribûn, bi h'esîna dîla li wê.

1407. Hev r'amûsan, ç'e'vê hêsir bi dil hevdu h'emêz kirin,
Siteyîrê geş e'rşê jorîn usa bi nûr hev dibînin,
Gul ku r'oja xwe dibîne, hê geş dibe û vedibe,
Derî ser derd tê dadanê, dergê şayê wan vedibe.
1408. Usa wana hev h'emêz kir, hev t'êr nebûn bi dîndarê,
Lêvê k'aget ku terikî bûn, ser hev bûn wek gul baharê,
Hatine wê û hev dîtin, hersê bira hevr'a amin,
T'emene bûn, silav kirin r'oja nûre, e'rş bê hebin.
1409. Silava wan e'gîta wê vegirt r'oja nûr û neder,
Xilazkirêd xwe r'amûsa bi şabûna p'ir', bê qeder,
Ji şabûna lêvê nazik nûra h'esîn jê dibarî,
T'evî wan herdu e'gîta xeberdan kir zanîndarî.
1410. Wana li wê silav kirin Tarfîyêlê bejin çinar,
Bimbarekî dan wê r'ojê, bîr anîn ceng û qal,
Bê minet bûn ku peyî şêr' r'a hê diger'in sîlih'ê giran,
Ne ew şer' bûn, kirina xwe va dijmin ber wan naxra h'eyfwan.
1411. Sêsid mêrê wane mêrxas, nîvî k'etin şêherê cina,
P'irîdon wir ber xwe dik'et, neda k'ivşê wî bi e'ma,
T'ev qir' kirin, xeza kirin, h'eta yê ku cî dih'ejiya,
K'ê wê bêje, k'ê h'esav ke, çi xizne dîn şêherê cina.
1412. Wan bê h'esab qant'ir', barbir deve, delîl xwe r'a hil dan,
Bi lal û dur', kevirê qîmet, zêr' bar kirin li barbiran,
Dîsa lal, dur' û cewahir, destê hosta taraq kirî,
Sîdangê da dan r'ûniştin r'oja geşe aza kirî.
1413. Şêst esker wira hîştin ku xayî kin şêherê cina,
Ew r'oja nûr xwe r'a birin, paşda birin çetin bû îda,
„Neniher'e ku r'ê dirêj bû, em her'in bal p'adşê be'ra,
Fatmanê em bibînin, ne deyîndarê wêne bira“.



TARÎYÊL DÎÇE CEM P'ADŞÊ BE'RA

1414. Berbi p'adşê be'ra ewî qasid şand bi salixê şayê:
„Tarîyêlim, têm, dijminê xwe bi destê xwe kiriye xweliyê,
Min h'izkiriya xwe hil daye şherê cina, têm berbi te,
Hurmetê ez te r'a tînim, çawa bay, ez tême cem te.
1415. Niha welatê cina t'ev t'apiya mine, hebûna xwe,
P'adşê dilr'e'm, t'enê qencî bi destê te min dî bi xwe,
Fatmanê r'ojam xilaz kir, mi r'a bû xûşk, dayîka amin,
Ez h'iz nakim pirsê vala, çi qencyê pêşva bikim.
1416. Were em vir r'astî hev bîn, yêra te r'a derbaz dibim,
Welatê cina didim te, bi dil r'ewayî te dikim,
Kela xwe wir tu qewîn ke, bişîn wira eskerê xwe,
Pêşiya mi da hinkî were, ez nikarim, kine we'de.
1417. Aliyê mi da tu h'ukum ke ser H'ûsên, h'izkiryê xwe,
Bira jina xwe bişîne, bibîne azakira xwe,
Pêştirî wê k'ê bixweze, dil bibîne ew vê gavê,
Ew k'îjan nûra r'oêye, bilare, zelaliya avê“.
1418. Wexta p'adşê be'ra dî ew qasidê Tarîyêl şandî,
Dil lê k'uta, hîviyê nîbû salixeke usa gendî,
Şikrîma xwe ewî anî û ber Xudê serê xwe danî,
R'abû li hespê syar bû, pêşiyêda çû bi mêranî.

1419. Deve, delîl wî bar kirin, ku de'wata wana bike,
Ne ku şebe, kevirê qîmet, e'maretê dila bend ke,
R'iya deh r'oja derbaz bû, Fatman jî biribû xwe r'a,
Dîtina wî şêrî, wê r'ojê, h'esav kir ew bext xwe r'a.
1420. Hersê bira beşera xweş pêşiya p'adşê da hatin,
Peya bûn û hev r'amûsan, esker dûr va hev civandin,
Wexta pesinê Tarîyêl da, Tarîyêl sekinî serberjêr,
P'adşê gava ku ew r'o dî, nizanibû r'o jore, yan jêr.
1421. Fatman xatûn lê dinhêr'î, dişewitî alava nerm,
H'emêz kir û r'amûsa dest û dêmê nîgar, qelem,
Go: „Xuda, çi h'unurî ez qulixî te r'oê bikim,
Xiravî kin diçe zanî, qencî dertê ser r'iya mezin“.
1422. Nêstanê ew h'emêz dikir, jê r'a digo dengê şîrin:
„Tariya dilê min bela kir, Xudê r'onayî da dilê min ,
Beranberî derdê min ez şa kirime Xudayê min,
R'o ku gulê h'emêz dike, gul t'u cara naxeyîrin“.
1423. P'adşê be'ra hema li wê t'extê de'watê wî vekir,
Welatê cina bû xayî, h'evt r'oja şayî dirêj kir,
Çiqa lal, dur'ê anî bû bi destê merd wî bela kir,
Haqa zêr' r'o kire e'rdê, mîna xaliyê wan p'êpes kir.
1424. K'inc û libasê xas û qumaş nix'nac kiribû mîna gira,
T'acek Tarîyêl r'a xemiland, ku t'une bû li t'u yêra,
Wî dur'eke sore mezin tê da cî kir mîna r'oê,
T'extê wî ji zêr' da çê kirin, dur'a da zêr' nedihat xuyanê.
1425. Wî r'ewayî Nêstanê kir qolikekî xemila dur'a,
Lal û p'îrûz lê kiribûn gul, bê t'u bû ew li herdera,
E'gît û qîz ku r'ûniştin, r'o bûn, xuliqandibûn Xuda,
Çi bendê ku lê dinhêr'î, şabûn dibû xaziya dila.

1426. Usa jî wî r'ewa kirin him P'irîdon, him Avt'andîl,
Her yek wana hespek dayê, e'rebî bûn bi r'ext û zîn,
Her yek ji wan e'bek dayê k'eskesor bûn lal û p'îrûz,
Gotin: „Em ji te r'azîne, Xudê li te neke mir'ûz“.
1427. Tarîyêl r'abû bi r'azîbûn wî xeberê aha gotin:
„P'adşê mezin bi qedirê xwe dîtîne va em şa kirin,
Bi merdayî û mêrk'îmî hedaya em xelat kirin,
Te guman bûm, mervaya te, dîtina te em bend kirin“.
1428. P'adşê be'ra wira wa go: „Şêrê Xudê, p'adşayî r'e'm,
Nêzîka r'a e'mirî tu, k'ê te dûre, derdî û xem,
Min çî daye ku layîq be dêmê teyî nûr xudayî,
Ku dûr k'evî bi çî bêje, baristan bim ez zûziyayî?“
1429. Tarîyêl wa go Fatmanê r'a: „Min xwe r'a xûşk h'esav kirî,
Xûşkî r'astî deyîndar kirime, çî e'fû kim ez çî teherî,
Ev xizna ku şêherê cina bar kiriye xwe r'a aniye,
Hil de p'êşk'êş, tu qebûl ke, h'esav nekî deyîne daye“.
1430. Fatman xanim bi r'azîbûn xeberê xwe wê awa got:
„P'adşa, min ku tu dîtî, dilêm hil da agirê sirsot,
Çawa bijîm ez ji te dûr, ezê dîn bim, min ya xwe got,
Xazila li wan yê nêzîkin, ne xazî wan, sewda firot“.
1431. Aha gotin p'adşê be'ra, herdu r'oê xemila nûrîn,
Diranê sedef, lêvê gulîn mîna agir t'ev şuxulîn,
„Çî me r'a ne bêyî te diniya, def û zur'ne, k'êf û şayî,
Lê we'deye, îzinê bide, em ser r'êne bi lezayî.
1432. Te bona me bavtî kiriye bi qirara yekê jorîn,
T'eweçe me te heye, bide me gemîke qewîn“.
P'adşê wa go: „Ez bona we e'mirê xwe jî t'exsîr nakim,
Hûn ku lezin ox'ira we r'a serfîniyazî neyaz dikim“.

1433. Devê be'rê p'adşê bi xwe wan r'a gemîk ewî bijart,
Wî ew e'gît ver'ê kirin, yê man hêsir wana nivat,
Dilê şewat ew digiriyan, p'or'ê xwe wan danîn xarê,
Lê hêsirê Fatmanê wir ç'emkî êriş dibir be'rê.
1434. Aha gemiyê hersê e'gît, hersê bira k'etine r'ê,
Carke mayîn îşr'uh' kirin, sozê xweyî biratiyê,
Wan distira û dik'eniyan, şayî dila kiribûn bahar,
Li ser dêmê wanî bîlar r'engê gula bûbû dîhar.
1435. Qasid şandin cem Asmat'ê ku mizgîniya xêrê bidê,
Gire – girê P'irîdon r'a tê ke qise şer'ê dît wê,
Bêje: „T'evî siteyîrêd geş, r'oja me jî bi şayî tê,
Sur' û serma me derbaz kir, îro şûnda şaye ku tê“.
1436. Ew r'o danîn ser t'axûkê û peya bûn devê be'rê,
Eşq bûn wekî cefa dîtin, mina bû ber felek zerê,
Ew gihîştin sînorê Nûradîn – P'irîdonî bê qeyas,
Bi k'îlam û def – k'er'ana dihatin pêşiyê nas û nenas.
1437. Gire – gir hatin berav bûn, bû cejneke eşq û şayê,
Bi devê k'en Asmat' hat wir, xwe dûr xistibû derdê dinê,
Bi şûr hev nediqetandin usa Nêstan h'emêz kiribû,
Ne axirê cefa wêya bû k'îfaret, mîaser bû.
1438. Nêstanê ew h'emêz kiribû û r'adimûsa dev, lêvê wê,
Go: „Weyî li min, min daye te derdê xweyî mîna tariyê,
Wê Xudê me hate r'e'mê, şikir r'e'm û k'erema wî,
Çi qenciya ku te kiriye, t'a dermaê ç'iyayê sêwî“.
1439. Asmat'ê go: „Şikir Xudê, min gul dî, ew neç'ilmisî,
Axiriyê da Xudê me r'a kir r'e'ma xweye gul teyîsî,
Beşera te şa dibînim, mirin boyî min e'mire niha“.
Ji her h'ubê bilindtîre h'uba qûl û qihara biha.

1440. Gire – gir wê t'emene bûn, bi pesna va pêşda hatin:
„Oh, şabûna dinê da me û r'e'ma xwe xizna batin,
Em hêjayî dîtina we bûn, derd dilê me neşewitînin,
Bi destê xwe ewî qenc kir, birînê wî bit'er kirin“.
1441. Cime'ta wir destê Tarîyêl r'amûsan, axîn r'ahiştin.
Tarîyêl wa go: „Bona me bû gele bira hatine kuştin,
Boyî xîretê e'gîtiya wan cime'tê r'a bûye mik'an,
Sîyanet bi h'ezar sewtî bûye r'e'met, ew bona wan.
1442. Mirina wan bû derdê giran, wek zerga dilê mi da man,
Navê nemir wan qazanc kir, navê nemir li dinê man“.
Got û giriya, te'viya hêsira t'evî berfa herd ç'e'va kir,
Baê beyîbûna lê r'abû, r'engê gula xeyîr qarş kir.
1443. Wexta giriyê Tarîyêl dîtin, wan t'emama hêsir r'êtin,
Xayê k'etiya mihêl dikir, hêsira derdê xwe dir'êtin,
Paşê gotin: „Gendî r'oyî, wa dibêjin zanêd dinê,
K'ê te dibîne gere negirî, bi dilê eşq gere bistrê“.
1444. Heye gelo bendê usa , ku hêjayî hêsirê te be,
Başê boyî we merî bimore, badîhewa ne li dinê be“.
Lê P'irîdon wa jê r'a go: „Ber xwe nek'ev, derdê giran,
Xudê dewsa wî derdê te r'e'mê bike boyî wan biran“.
1445. Avt'andîl jî ber dil da hat, bi xebera ew bû dilêş,
Wir t'emama pesinê wî dan: „Şa bin, bira nebin dilêş,
Ne axirê Şêrê Xudê r'oja xwe wî dîtiye dinê,
Çima ç'e'vê me wa şil bin, t'une me'ne boyî girînê“.
1446. Çûn gihîştin şêherê mezin, şêherê giran Mûlx'azanzar,
Def – k'er'ane wir lêxistin, cime't muhum, h'ezar – h'ezar,
Dengê def û zur'na zîl bû, ûrmîş dibû dep'dep'a r'a,
Cime'tê hîşt sûk û bazar, hatin û t'op bûne wira.

1447. Dik'ançiya dik'an hîştibûn, derk'etibûn, dihatin wê,
Lê serh'ingêd eskeriyê qulix dikirin nobedariyê,
Cime't nefera va dihat, k'olixayî didan serh'inga,
Lava dikirin, t'ek bihêlin em carekê bibînin wiya.

1448. Cem P'irîdon ew peya bûn, dîtî birca xemilandî,
Pêşiya wan da qûl hatin, k'emberê zêr' nitirandî,
Mêvana bin nigê xwe da dîtî xalîçê xas gendî,
Jêrê cime'tê t'op dikir zêr'ê jorda wan r'eşandî.





P'IRÎDON DE'WATA TARIYÊL Û NÊSTAN – DARÊCANÊ DIKE

1449. Bona bûk û ze'vê wana t'ext û t'acê sipî danîn,
Xemilandibûn kevirê qîmet sor û qîç'ik qaşê nûrîn,
Boyî Avt'andîl t'extek danîn qîç'ik û r'eş bû t'ev hûnayî,
Anîn ew ser dan r'ûniştin, cime'ta wê dil da şayî.
1450. Aşiq, dengbêj wir berev bûn, bû zingîna sewt û saza,
Et'les qut'nî anîne wê, k'êf dest pê bû, k'êfa baza,
P'irîdon ew p'êşk'êş anîn, mêvanh'iz û merdê mêra,
Ze'fli Darêcanê dihat şewqa qaşa wan kevira.
1451. Ji Nûradîn dîsa anîn p'êşk'êşêd xas mîna r'eza,
Neh kevirê qîmet anîn, her yek weke hêkê qaza,
Qaşek anîn, p'ir'bedew bû, tariyê da wê r'onayî dida,
Sifetk'êş ber şewqa wêya, şevê sifet bik'işanda.
1452. Wî da wan t'or' û gerdenî, kevirê qîmet xemilandî,
Serdilkê wan taraqkirî, dur'êd sore zelal gendî,
Aha anîn wira bolmek, ancax xulama r'agirtibû,
Ew p'êşk'êşê giranbiha P'irîdon Tariyêl r'a anî bû.
1453. Cêrge kevirê lal, dur'nix'nac kiribû P'irîdon wê,
Ew t'emam wî da Tariyêl, dilê wî da hindik bû hê,
Ew avayî t'ijî kirin, xas û qumaş gozê sera,
Tariyêl pîrsa xwe wira got û r'azî ma ew ji bira.

1454. H'eyşt r'oj û şev eşq û şayî P'irîdon wir de'wat dikir,
Û herr'o wî bi hedaya cime'ta wir r'azî dikir,
Şev û r'oê def û zur'ne, eşq û şayî, zingîn bû wê,
Qîz û xorta hev didîtin û şa dibûn bi de'watê.
1455. Tarîyêl r'okê P'irîdon r'a wî dilê xwe aha vekir:
„Ax, dilê te bona min gendî dilê birê nuxur,
Ku e'mirê xwe boyî te bidim, dîsa te r'a ez deyîndarim,
Derdê mi r'a we derman dî, wexta k'etibûm, ez dimirim.
1456. Tu baş zanî ku dilê xwe Avt'andîl p'êşk'êş daye min,
Niha dixazim deyînê xwe sivik kim, sivik be barê min,
Tu jê pirs ke xastina wî, bira ji me veneşêre,
Agirê dilê min wî vêsand, bizan bim çî derd wî dihêre.
1457. Bêje, bira ez çî bikim dewsa haqa cefa wî dî,
Xudê xêrê wê bide te, be'ra cefê te miç'iqî,
Heger xastina te ez nekim, mîaser nekim çî dixazî,
Bira mal û h'al nebînim, ne k'ox, ne jî birc, p'adşayî.
1458. Tu h'ukum ke ez çî bikim, bi çî bim te r'a alîk'ar?
Were bibe beledê me, yêra e'reb bibin dîhar,
Bi zarê xaş qencyê pirs kin, xiraviyê r'ê da nuxs kin,
Ez r'oja xwe nabim xayî, tu r'oja xwe hev nebînin“.
1459. Wexta P'irîdon Avt'andîl r'a gotina Tarîyêl kire gilî,
Ser dêmê wî beşer bû nûr, beşera xaş vep'eşirî,
Wî go: „Alîk'arî, çir'a k'ê çî zirar gîhandiye min,
Ne cina r'ojam girtiye, ne derdê wê heye mezin.
1460. Niha hêsa r'ûniştiye ser t'extê xwe r'oja nûrîn,
Bê minet û bê xeme, k'erem kiriye yekê jorîn,
Cin jî wêya nadin cefê, sêrbaz wêya navên benda,
Çî alîk'arî lazime, badîhewa gur' kin derda.

1461. Qirara Xudê mi r'a bê û bigîjim ez wê r'ojê,
Xudê bide ez bik'enim û dûmka derdê min bê,
R'oja geşê boyî min qûlî, bext bîne ew bi nûra xwe,
H'eta çaxê ne lazime, çima cefê em bidin xwe.
1462. Here bêje Tarîyêl r'a ew çî ku te ji min bihîst,
Ji r'e'mê tu xeber nede, r'e'ma te wê dinê bihîst,
H'eta mirinê te r'a xulam, ji diya xwe usa bûme,
Bira Xudê min bikuje, t'u p'adşayî, şaş ne bûme.
1463. Te gotiye: „Ku dixwezim, wî dilk'etiyê bighînim hev“,
Ew xebera nîşan dide aminaya wek îşqa ç'e'v,
Niha li wir lazim nîne ne şûr, ne jî zimanê hosta,
Başê hêsa hîviyê bin h'eta sîlih'ê dike Xuda.
1464. Çî dixwezim, neyaz dikim, derheqa çî da difikirim,
Li ser t'extê Hindistanê ez r'ûniştî te bibînim,
Li r'ex te da r'ûniştî be r'oja teye nûr û şemal,
Dijminê te wir bit'eqin, h'ub te bibe kaniya zelal.
1465. Wexta ev yek mîaser be û nemîne xewin û xazî,
Herim welatê e'reba bi h'uba xwe bibim r'azî,
Agirê dilêm wê vêsîne, çî wextî ku miraz bike,
Tiştê jî we ez naxwezim, Xudê miraza hasil dike“.
1466. P'irîdon ku gote Tarîyêl wexta pirsê wî e'gîfî,
Wa go: „Nabe, ez wê nakim, ne cayîze bi biratî,
Çawa ewî e'mir da min û gîhandim ez miraza,
E'se gere ez jî wîya bigîhînim mirazê aza.
1467. Her'e bêjê tu bê şube gotina min, aliyê mi da:
„H'eta xayê te nebînim, hêsa nabim r'uh'ê xu da,
Ji xulamê wî wextekî gelek k'etin bi destê min,
T'eweqe kim min e'fû ke, paşê nase r'îya mala min“.

1468. Aha bêje: „Îro şûnda tiştî ji me veneşêrî,
Sibê e'se ser ox'irêne, bê bergaye, nebî dêrî,
Gotina min p'êpes nake ew p'adşaê we e'reba,
Ezê jî wî t'eweqe kim destê qîzê bi melh'eba“.
1469. Çi ji Tarîyêl bihîst P'irîdon Avt'andîl r'a kire gilî:
„Tarîyêl nikarî serwext kî, wê gotina xwe bîne sêrî,
Ew ber xwe k'et, dil şewitî û alavê hil da serî,
Bê feyîdeye, e'gît gere bik'işe p'adşê bi camêrî“.
1470. Avt'andîl ku Tarîyêl dî, ber wî k'ete li ser çoka,
Herdu nigê wî h'emêz kir û serberjêr wî r'amûsa:
„Bese çîqa min R'ostêvan sipartîye derd û xema,
Îdî tu min niheq neke, merivatî û hurmet k'u ma.
1471. Xastina te miqabilî qirara Xudê ziyaretiye,
Çawa, bêje, xayîkirê xwe sek'esiz kim kirina xweye,
Çawa r'abim pêşberî wî yê cefa ber mi da diye,
Bêje, qûlê çî dilî şûr bik'işîne ser xayê xweye.
1472. Ew kirina, ez wa zanim, Şexsa min jî xaş naê,
Dibe ew ber xwe k'eve û hêsirê xûnê ji ç'e'va bê,
Îdî mi r'a tiştî nebê, bişînim ez h'izreta wî,
Wî wextî k'ê bibaxşîne, e'fû ke gunê min dinê“.
1473. Tarîyêl destê Avt'andîl girt, bi şabûn ewî bilind kir,
Beşera xaş mîna r'oê, ev giliyê han wa jê r'a kir:
„Bi alîk'ariya te bext jî her tişt merdayî daye min,
Ya baş ewe vê şaya han, nîvîkî tu jî t'evî min.
1474. Ez h'iz nakim wexta bira xwe ji birê vedigire,
Me'de, mir'ûz û xwe r'azî xeyîsetê xwe diguhêr'e,
Heger biraye, sitqê h'elal t'evî bira şa be,
Ne ku ez xwe r'a, tu xwe r'a, biratiya usa nabe.

1475. Ez zanim ku h'izkiriya te te h'iz dike h'eta mirinê,
Nexeyîde ku her'in mêvan em du birê h'elal dinê,
Çima gere ez p'adşê r'a pirsê e'k'is, net'ê bêjim,
Wexta t'enê ez bi h'esîn dîtina wî neyaz dikim.

1476. T'enê tiştî ezê bêjimê, t'emene bim bi lavayî,
Wekî qîza xweye bedew bide te ew bi e'seyî,
Çi sebir kin, axirî ewe, hev bistînin bi h'izkirin,
Îdî usa neç'ilmisin, ji hev dûr hûn nexeyîrin“.

1477. Avt'andîl dî ku p'adşâe e'se her'e, ew qirar bû,
Cî da ker' bû, tişte nego, gotina wî r'a ew qayîl bû,
P'irîdon esker kire cêrgê, t'eve syar, e'gît, mêrxas,
Û t'evî bira wî da ser r'ê bi k'er'ana, bi def û saz.





ÇÛYÎNA HERSÊKA LI ŞIKEFTÊ Û JI WIR LI E'REBÎSTANÊ

1478. Dîvnosê zane aha zelal dike sur'a Xudê,
Xudê t'im baş disuxrîne, e'mir nade t'ucar xiraviyê,
Dûmka xiraviyê kin dike, miqer'm dike baş û qencyê,
Bilinda hê bilind dike, qencyê dighîne miqer'miyê.
1479. Aha hev r'a dane ser r'ê şêra û r'oja t'evayî,
T'ev xwe birin ew şemçiriyax, t'eve h'esîn lê dinhêr'î,
Guliyê r'eşe ser namilê diteyîsîn r'engê şevê,
Delalî û nazikayî dibû xemila wê zeriye.
1480. Dibirin ew nazika bi t'axûkê nerm dih'ejiya,
R'ê va nêç'îr wana dikir ji xezalê serê ç'îya,
Çi şênayê derbaz bûna, meriya qedirê wan digirtin,
Bedewiya wan dipesinîn, bi hedaya r'ewa dikirin.
1481. Gendî r'o bû, r'oja e'rşa li r'ex hîva dişuxulî,
R'îya dirêj ew derbaz bûn, xeberêd xaş digulgulî,
Wan besteke dêmê mezin peyî xwe hîştin û derbaz bûn,
Ew gihîştin ç'îyaêd bilind, k'îjan t'apiya p'adşê Hind bûn.
1482. Tarîyêl wa go: „Borcê mine îro hurmetê ez bikim,
Miher'in wir ku ez mame, e'mir ku sewdalî kirim,
Bira Asmat' sivrê dayîne, goştê dûrme t'im hebû wir,
Paşê ezê we r'ewa kim xas û qumaş û kevirê dur“.

1483. Wexta gihîştin şikevta wan k'îrşê sirte hasê,
Asmat'ê şa sivre danî, goştê dûrme danîn t'aşê,
We'dê buhurî bîr danîn wan, eşq û şayî bû ç'emê dêş,
Şikrîma xwe Xudê danîn, ku mina kir derdê bê êş.
1484. Usa bi şa wan şikevta ew bê minet xu r'a ger'iyân,
Ewana dî şikevtê xizne ku Tarîyêl bû xayî – xudan,
Kesî ç'e'va ne dîbû û nizan bû, çî xizne bûn ew,
Dil ne dik'işand lê binhêr'e, ne jî dil va h'ewce bû ew.
1485. Her yek ji wan çî layîq bû Tarîyêl daê p'êşk'êşê gur',
Û meriyê Nûradîn wî r'ewa kirin bi lal û dur',
Wî r'azî kirin ew merî, yê r'êber bûn h'etanî wir,
Xizne usa ciyê xwe da man, qeyî te digo, tişt jê nebir.
1486. P'irîdon r'a go: „Zanim, deyînê te situyê mi da wê bimîne,
Pirsa mezine: „K'ê qenciya dike, e'se qenciyê dibîne“,
Ev xizna vir çî ku heye didime te bi r'eva xwe,
T'ev ya teye, çî wextî ku dixazî, bibe xizna xwe“.
1487. P'adşa P'irîdon t'emene bû, bi r'azî bûn ewî wa got:
„H'esav nekî p'adşae min, ku bi pirsa min dil te sot,
Dijminê te ku çomaq be, ber te ewê bibe wek zil,
Şabûna min ewe t'enê, te bibînim bi eşq û dil“.
1488. P'irîdon wir merî şandin, ku her'in ew deva bînin,
T'emam xizne wê bar kirin, berbi yêrê ver'ê kirin,
Ew berbi E'rebistanê k'etine r'ê wê k'oma xwe,
Avt'andîl dil nazik bûbû hîviya dîtina h'izkiriya xwe.
1489. Usa dirêj ew r'ê da çûn, hat xuyan xaliya e'reba,
R'ê va dîtin gund û bajar nêzikî hev mîna şeba,
Ehliyê wira şînê da bûn, t'eve h'eznî, r'eşe, mişot,
Şîna Avt'andîl dikirin, t'eva dinvat û digot.

1490. Wir berbi p'adşa R'ostêvan Tarîyêl qasidê xwe ver'ê kir:
„T'eweqe dikim p'adşaê min, bibaxşînî çi ku min kir,
Ez p'adşaê Hindistanê sitqê h'elal berbi te têm,
Ku gula nîşanî te dim, gulê ziyaret, ne gulê dêm.
1491. Wî wextî hûn p'ir' hêrs k'etin, wexta hatibûm ser xaliya we,
We r'ast nekir, we cêr'iband ku min bigrin ça dilê xwe,
Min nîşanî mêrxasa da, ne r'ih'etim û hêrs k'etime,
Ze'f xulamê te min kuştin, niha hil didim gunê xwe.
1492. Niha wê r'iya xwe guhar'tiye, nig daniye welatê te,
Bibaxşîne tu hêsa bî, ku dayîne p'erç'a dilê te,
Bira P'irîdon, heval bêjin, xizne ne aniye bona te,
T'enê aniye min Avt'andîl, ewe layîq hedaya te“.
1493. Wexta ew mizgîniya şayê ku gihîşte zor R'ostêvan,
Şabûna p'adşê bêqeyas, hev nayîne t'u zar û ziman,
Li ser dêmê T'înat'îne dişuxulî nûra r'oê,
Lêvê k'ax'et, ç'e'v – bur'iyê r'eş, h'ewce bûn hênkaya sibê.
1494. Def lêxistin eşq û şaya, dengê şayê wira pêl da,
Esker dir'evî vî alî, wî alî, diçû pêşiya mêvana da,
Bê h'esab hesp danîn wira, nedihat h'esab zîn û bûsat,
Bi h'ezara xortê tûre hespa syar bûn, eşq bû r'ia't.
1495. P'adşa syarî pêşiyê da hat lela, wezîr û esker va,
K'ê bihîstibû, k'etine r'ê, bi dilê eşq şabûnê va,
Li wê şa dibûn û distiran, lê dixistin def – k'er'ane,
„Xudê, unda dikî xiraviyê, tu r'ê didî qenciyê niha“.
1496. Dûr va ewan hev qet'er kir û hev dîtin, mezîl bû p'ir',
Avt'andîlê wa gote Tarîyêl: „Tu dibînî bê sêr û sur',
Hela binhêr' t'oz – xubarê wê hil daye best û dinê,
Ewe ku ez ne r'ih'etim, r'uh' va k'etime h'alê mirinê.

1497. Xayîkirê min wê r'abûye, bi heyîtehol tê pêşiya min,
Ez nikarim her'im bal wî, binhêr', dik'ute dilê min,
Gelo kese mînanî min dinê da bûye pêk'enî,
Niha tu û P'irîdon va ya xwe bikin, bi çi fenî“.
1498. Tarîyêl wa go: „Tu jî r'astî, kirinê te ew pesnîne,
R'astî bimîn, neyê wira, ew hê başe û r'astiye,
Derheqa wî qedirê te da ezê bêjim p'adşê te,
Bi qirara yekê jorîn, ezê bidim te r'oja te“.
1499. Avt'andîl pêr'a qayîl bû, çadira xwe wira lêxist,
T'ev Nêstanê, k'ê lê dinhêr'î, dilê wana agir pêxist,
Hênikaya baharê birû û bijanga difûr'îya,
P'adşê Hinda ew hiştin wir, k'ubar da ser r'ê û liviya.
1500. T'ev P'irîdon ew k'ete r'ê, besta fire ew derbaz bûn,
R'ostêvan dûr va Tarîyêl dî, bejina bilind wek çinar bû,
Hat peya bû mîna şêra, ew ber e'gît t'emene bû,
Wî qedirê p'adşê Hinda girt, ew wek qedirê ewleda bû.
1501. Tarîyêl jî wir t'emene bû, silav dayê û nêzik bû,
P'adşa dêmê wî r'amûsa, dev û lêv lê şîrin dibû,
Ewî wa go, - bi dilê şa, zendegirtî, çawa merî:
„R'oyî tu, bêyî te r'oj jî wê betr'eng be, bibe tarî“.
1502. P'adşê dinhêr'î bejin û balê, ç'e'v û buriya bend bûbû ew,
K'ubar dibû zendê qewîn, hêjayî pesina dikir wî ew,
P'adşa P'irîdon, ew e'gîta, ber p'adşê wir t'emene bû,
P'adşa k'îjan bêsebir hîviya dîtina Avt'andîl bû.
1503. Tarîyêl bend kir p'adşê e'gal pesinê xweye layîq, hêja,
Tarîyêl wa go: „Te dilê min bend kiriye r'astî, p'adşa,
Zendegirtî ez dimînim, çima heqa min dipesinî,
Avt'andîlê te ku heye, yekî din ça bih'ebînî.

1504. Tu şaş nebe, ku navînî wiya vira, dereng dik' eve,
Were p' adşê vê mêrgê da hinkî r' ûnên, gilî eve,
Ezê niha te r' a bêjim çima t' evî me ew nehat,
Ev fermana hatina me, bi destê xwe ewî înat“...
1505. Û r' ûniştin herdu p' adşa, esker dor wan hatibû h' esar,
Dêmê Tarîyêl guleş bû, qeyî te digo, r' o hate zar,
Xeberdana wî k' ê bihist, unda kirin h' iş û sewda,
Bi zanebûn, bedewiyê, xeberdana xu r' a gul da.
1506. „P' adşa, aha berbi te bûnê, ez xwe hêja h' esav nakim,
Bi lavayî berbi te dibim, t' eweqe borc h' esav dikim,
T' ev min ber te lavayî dike r' oja mine nûr û şemal,
K' îjan ya ku e' mirê mine, derd h' elîna h' usilcema.
1507. Ji te p' adşa em herdu çi t' eweqe dikin, ew lavaye,
Avt' andîl sefera xwe va, wî e' mirê min xilaz kiriye,
Wî derdê xwe bîr kiribû, ji derdê min ne kêmtir bûn,
Kin bêjim, ze' f dirêje ew, olecax me ze' f p' ir' bûbûn.
1508. Avt' andîl û qîza te jî herdu, bê şube, hev h' iz dikin,
Haqa giriya, derd k' îşandiye, sûreta r' eng xwe guhastin,
Serberjêr t' eweqe dikim, wî agirî t' ev r' aneke,
Qîza xwe bide Avt' andîl, ew e' gîte û layîqe.
1509. Îdî pîrskê ez navêjim ne kin, ne jî dirêj dikim“.
Got û situyê xwe girêda dezmaleke pê sebrê dikin,
Paşê k' ete ew ser çoka, çawa şagirt lavayî kir,
K' ê ew yek dî û bihist wê, p' ir' melûl bû, xwe unda kir.
1510. P' adşa îdî xwe unda kir, dît ku Tarîyêl ber çok daye,
Ew p' adşa çû t' emene bû, ner' ih' etiyê ew hil daye,
Wa go: „Heyî wax, p' adşê min, te eşqa min kir net' êye,
Bi qedir te xwe nimiz girt, hêngavtim ez wê yekêye.

1511. K'ê be wekî neqedîne vê xastina te p'adşayî,
Dest te nagirim, bavê avê, naxeyîre li min şayî,
Ne digiriyam, ku te bibra dîwana xwe çawa carî,
Wê mêrekî usa nedidî, ku e'rşa bikira seferî.
1512. Ji Avt'andîl baştir ze'va t'u cî t'u car ez navînim,
Min p'adşatî daye qîzê, çawa lê tê, wê dibînim,
Gul wê t'eze bişkok dide, kulîlka min wê ç'ilmisî,
Çima gere bibim berge, xastina mine ew bi nefisî.
1513. Min ne digo na, te bigota, qîza xwe bide qûlekî,
Miqabil k'ê wê xeber de, pêştirî kêmaqilekî,
Haqa bîra wî nedikir, ku Avt'andîl h'iz nekira,
Min ber te û ber Xudê çima dilê xwe vekira“.
1514. Wexta Tarîyêl wira bihîst ev xeberê p'adşê gotin,
Ser da mêl bû qedirê mezin, cava wî da ser hêngavtin,
P'adşa jî, bi ser hêngavtin, e'seyî kir gotina xwe,
Herdu ji hev r'azî man wir bi yektiya qirara xwe.
1515. P'irîdon syar bû û da ser r'ê, ew bû qasidê be'sa xêrê,
Ku Avt'andîl zûtirekê şa ke r'uh' va wê qirarê.
Çû gihîştê, gotê, anî, ne axir ew pêşik'ar bû,
Çi dikaribû ewî bikira, li Avt'andîl r'eng nema bû.
1516. P'adşa wira pêşiyê da hat, e'gît zûzka banzda e'rdê,
Wî ji şerma, ber ç'e'vê xwe dezmal kire mîna p'erdê,
R'o qulibî piş e'wira da, gul cemidî û ç'ilmisî,
Çi dikaribû qayîl kira, nûra dêmê wîyî şemsî.
1517. P'adşa dixast wî r'amûse, îdî hêsir wî ne dir'êt,
E'gît nigê wî h'emêz kir, nûra xwe wî berjêr dir'êt,
P'adşa wa go: „R'abe, îdî te nîşan da zor û aqil,
Ze'vê minî, çi şerm kirin, tiştî şermî nema bidil“.

1518. P'adşa Avt'andîl h'emêz kir û r'amûsa dêmê narî:
„Agirê dilê min te vêsand, yepesirand ava sarî,
Şêro, were ez bidme te Şexsa teye geşe nûrîn,
Wê ya li hev alandiye birû, bijang, h'uba şîrîn“.
1519. P'adşa bi xwe h'emêz kiribû situyê wî şêrî, e'rfûtî,
Bi xeberdan wî r'amûsa, t'êr nedibû wî e'gîtî,
Wî dêmî yê bûbû xayê wî welatî û wê r'ojê,
Şabûn niha hê lazim bû, ne ku derdê mîna dojê.
1520. E'gît wa go: „Difikirim, çima nadî fermanke wa,
Çima p'adşa egle dikî, naxazî ku ew bê vira?
Bira pêşiya me da bê ew şemçiryaxa nûra r'oê,
Bi dêmê xweyî nûranî şewq t'ijî ke vê r'ast – bestê“.
1521. Tarîyêl jî go: „Ku pêşiya Şexsa wî da bira her'in,
Dêmê p'adşa bi nûra xwe bira ew nûr p'erwede kin“,
Ew gihîştin mirazê xwe, dîtin çî ku lê diger' iyan,
K'etine cengê û şer' birin, badîhewa ç'ek hil nedan.
1522. Ça nêzik bûn, wir peya bû, r'oja xwe silav kir p'adşa,
Dêmê p'adşê nûrê hil da, vebeşîrî ew nûrê da,
T'axûkê da berva r'abû, mîna ewled ew r'amûsa,
P'adşa bi libasa r'ewa kir ew bedewa mîna şexsa...
1523. Go: „R'ojê çî bidim p'aya, tuyî r'oja sayî bê e'wir,
Aqil ji aqila distînî, dîna dikî sews û e'wt'er,
Gendî r'oyî, gendî hîvî, ber te çine t'ev îşiqdar,
K'ê te dibîne ew bîr dike gul, sosina, dibe bêk'ar“.
1524. Zendegirtî ewê hîştin gurzê p'or' va p'er û bela,
Ew kor dive, çawa ku r'o bi nûra xwe, xastina ela,
K'ê agirê wê dişewitî, xwe r'a wî bext h'esav dikir,
K'îyalî diçû cime't t'emam berbi wêya çîrpaz dikir.

1525. Hespera syar bûn dane ser r'ê û berê xwe dan heremê,
Gotin: „H' evt îşiqdar dinê ne hêjane t'ek nûra wê,
K'ê azr'o ke bedewiya wê bi sur'a xwe nebînayî“.
Zûtirekê gihîştin wê ku danîbû t'ext p'adşayî.
1526. K'etin hundur', T'înat'în dîn, k'ê dî xewa xwe unda kir,
Lê dihatin t'ac û wek'az û libsê wêya xwe kir,
Îşq dida dêmê îsan ji dêmê wê nûra Şexsî,
Hate hundur' p'adşê Hinda, qeyî go, r'o bû diç'ûrisî.
1527. T'ev jina xwe k'ete hundur', t'emene bû, silav danê,
Pêşda çûn û hev r'amûsan, bi eşq k'etin xeberdanê,
Bi nûra wan bû r'o nîvro, r'onayê zêde vêsîyan,
Birû, bijang bûne şebe, sûretê sor e'yînî mircan.
1528. T'înat'înê t'eweqe kir, ku ew r'ûnên ser t'extê wê,
Tarîyêl wa go: „Xudê heqe, layîqe, tu r'ûnêyî wê,
Îro t'ext ew t'extê teye, tu hêjayî e'seîye,
Şêrê xwe tu bide r'ex xwe, ser t'extê xwe ew hêjaye“.
1529. Herdu hêsa dan r'ûniştin, ew r'oja nûr wê li ser t'ext,
Û r'ex wê da ew Avt'andîl, yê hil dabû gel derbê bext,
Ev dîdema nebînayî bû, îna nedikir yê nedîfî,
Bi h'izkirin nedighîştin wan Vîs û R'amê h'ub ziyarefî.
1530. T'înat'înê dil bû h'ezeq, Avt'andîl bû r'ex r'ûniştî,
R'eng avîtîbû, dil lê k'uta, şerma xwe da bûbû girtî,
P'adşê wa go: „Qîza min, tu şerm neke, e'niya xwe veke,
Ulmdarê baş gotiye: „Axiriya h'ubê bext r'ast dîke“.
1531. Niha lawo, Xudê bide we h'ezarsalê eşq û şayî,
Bext bide we û siyanetê, derd nizan bin hûn t'evayî,
Bira e'mirê we miqer'im be mîna e'rşê jorî sayî,
Hêjayî xaliya destê we bim, Xudê dikim ez lavayî.

1532. E' gîtê min t' emene bin ber Avt' andîl, - wa go p' adşê, -
Eve p' adşê weyî niha, usane xastina Xudê,
Eve îro xayê t' extêm, min girtiye êş, extiyariyê,
Hûn şîretê min bibhên, qedirê wî hurmeta Xudê“.
1533. T' emene bûn gire – gir û eskerê p' adşê t' emamî,
Gotin: „K' ê ku e' mir da me, em bibin xaliya nigê wî,
Ew şûr be ber xiraviyê, e' mir be boyî qencî, r' astiyê,
Sist ke milê dijmina ew û dîrek be bona dostiyê“.
1534. Wa bi guman Tarîyêl wira şîkrîma xwe Xudê anî,
Go: „T' înat' î n hûn gihîştin mirazê xwe, gulin e' yî nî,
Ez û mêrê te birane, usa te r' a dibêm xûşkê,
Peyk' efî û dijminê we destê min najî li dinê“.





**P'ADŞÊ E'REBA DE'WATA AVT'ANDÎL
Û T'ÎNAT'ÎNÊ DIKE**

1535. Avt'andîl ser t'ext r'ûniştibû çawa xayî ji Xudê da,
Tarîyêl r'ex wî bend kiribû dilê benda wî nerge da,
T'înat'în û Nêstanê, te digo, dinê kirine qûl,
Te digo, e'rşa peya bûbûn çar r'onayîdar, şewq wan destûr.
1536. Dest pê kirin anîn wira bê h'esab îç'ike û xarin,
Goştê pêz û dêwêr bû k'êş, t'ext û sivre ber dinalin,
Û p'êşk'êşê layîqî wan ew didine wan mêvana,
Nûra r'oê şewqê dide bi nûra geş dêmê wana.
1537. Fîncanê lal anî bûn wir û derdanê xemila dur'a,
Derdanê nexş ter' û bedew werq dik'etinê mîna ç'ira,
K'ê met'h'ê wê şayê bide, bi xwe hêjayî met'h'ane,
K'ê ku didît, xwe r'a digo: „Ev sert'aca k'eremane“.
1538. Bê h'esab sazband hatin wir, dest k'er'ana hewa lerizî,
Kevirêd qîmet, zêr'ê sade bûbûne gir h'ezar terzî,
Ji sed cîyî, sed kanîyî şerav bû ku wê dik'işiya,
Êvarê da wan vedixarin, sitêrka sibê îdî r'ijiya.
1539. Bê hedayî neman wira ne şil û şe't, hêsîr, te'zî,
Kevirêd qîmet k'işiyên li wê, mîna ç'ema ew dibezî,
Li hineka çetin dihat çawa bibin ew haqasî,
Sê r'o Tarîyêl Avt'andîl r'a bû biraze'va bi dilxazî.

1540. R'ostêvan hê newastiya bû, ew k'êfa wî wê t'eze kir,
Tarîyêl r'a go: „Bedewa te bi bedewiyê sewda me bir,
Heger tu p'adşê p'adşayî, ew ji p'adşa hê zêdetir,
Em gere têkin guhar, ser r'iya xwe çî ku te kir.
1541. P'adşê mezin ne layîqe ku bibîne me fêza xwe“.
Got û danî t'extê zêr'în, xemilandî r'ex t'extê xwe,
Da k'êleka xwe Avt'andîl t'evî jinê, wê Şexsa nûr,
Pêşiyê p'êşk'êş dane Tarîyêl, p'êşk'êşê hêja bê qusûr.
1542. R'ostêvan wir qulix dikir çawa bira li ber birê,
Borcê p'adşatiyê bîr kiribû, qulix dikir wî bi sirê,
T'emama wê dipesinî ew hebûn û merdaya wî,
R'ex Avt'andîl r'ûniştibû P'irîdon mêvanê wî.
1543. Pesinê p'adşê Hinda dida û jina wî h'usilcema,
R'ostêvan wir xizne dir'êt ber nigê wan, r'o bûn şemal,
Ji deha yek nedihat h'esav, çîqa xizne bû ç'em k'îşiya,
Wî da wana t'ac û wek'az, e'bê dur' bûn li ser r'îşiya.
1544. Dîsa p'adşa p'êşk'êş da wan, bextê h'ubê wan bûbû derd,
H'ezar qaşê mezine birq, yê r'omanî bi destê merd,
Dîsa h'ezar dur'ê mezin, zelal, weke hêka kewa,
H'ezar hespê kih'êle cîsn, bi meşa xwe difir'iyana hewa.
1545. Wî neh bolme t'ijî kirin bi dur'ê xwe boyî P'irîdon,
Neh kih'êlê bi zîn, bûsat, ji xemila wan xaş dibûn gon,
P'adşê Hinda t'emene bû ber R'ostêvanê hurmet kir,
Wî ze'r'azîbûna xwe got, vexarî lê merivayî kir.
1546. Ez xebera xwe kin bibir'im, k'êf û şayê meh ver'ê kir,
Şa dibûn û wan dilistin, vexariya k'êf xaş dikir,
Dane Tarîyêl kevirêd qîmet, mîna agir alav bûn ew,
Şewqê davît dêmê benda nûra kevira, nûra bedew.

1547. Qeyî te digo, Tarîyêl gul bû, mîna gula xûsî li ser,
Wî Avt'andîl ça qasid şand cem R'ostêvan, sekinî ber,
E'lam kirê: „Çiqa cem te mam, t'enê min kinêzayî dî,
Lê wet'enêmin dijmin niha p'êpes dike bi nemerdî.
1548. Bira h'unurê zana t'imê bibe berge boyî nezana,
Zanim ku te ez şa nakim derdê xwe wek bê mik'ana,
Her'im bighîjim yêra xwe, qeziya neyê ser yêra min,
Zanim bi xastina Xudê, dîsa tuyê bibînî min“.
1549. R'ostêvan go: „P'adşae min, badîhewa dik'îşî ji min,
Çawa dilê te dixaze, e'se emê mîaser kin,
Avt'andîlê jî te r'a bê bi ordiya xwe bijare,
Xêrnexaz û dijminê te li ber p'iyê we wê bizare“.
1550. Avt'andîl r'a Tarîyêl wexta ev xeberê hana gotin,
Go: „Te çi go, - usa bike cêrga mircan neê dîtin,
Te hîva xwe t'eze dîtiye, çawa tuyê jê dûr k'evî“,
Wî go: „Bi wan xeberê xwe zanî, dilê min dik'evî.
1551. Dixazî min t'enê bihêlî her'î, ew yek şerme mi r'a,
Bêjî: „Bona h'uba jinê, r'ê pê nebû ew ji mi r'a“,
Ez jî ji te dûr bimînim, bêje, ç'arê ewê bike?
Yê bira t'enê bihêle, wê gunê xwe ça e'fû ke“.
1552. Tarîyêl wira usa k'eniya, te go, mawer gula r'ijiya,
Wî go: „Derdêm ji te dûrtir, ji derdê te k'ûrtir ne'liya,
Ze'f dixazî mi r'a were, gune ser min tu bar neke“,
Avt'andîl awa h'ukum kir: „Esker zû k'arê xwe bike!“.
1553. Eskerê E'reb wir t'op bûn, t'ex'bûr – t'ex'bûr sekinîn wê,
H'eyîştê h'ezar esker t'op bû, t'ev sîlih'ê cengê bûn lê,
Hespêd kih'ele birincî, zîn, bûsatê xorzêmi lê,
Herdu gava hev dûr k'etin, R'ostêvan hil da melûliyê.

1554. T'înat'în û Darêcan jî dilê kovan hev dûr dik'etin,
Ferza xûşkiyê wan dabû hev, herdu jî ber xwe dik'etin,
Usa hevdu h'emêz kiribûn, bûbûn yek sîng, berê wan,
Ew digiryan, k'ê lê dinhêr'i, dişewitî bi derdê wan.
1555. Wexta hîv û benda hîvê hev r'a dertên e'rşê jorîn,
Herdu hev r'a dibin şemal, hev dûr kême şewqa nûrîn,
Ew naxazin hev dûr k'evin, lê e'rş wana hev dûr dixe,
K'ê dixaze wan bibîne, zeraye ku ç'iya dixe.
1556. Wî yê ku ew qirafeta, r'uh' û nefes dabû wana,
Niha dixweze hev dûr xe, dûr k'etin ne xastina wana,
Dêmê xweyî al dane ser hev, naxazin ku hev dûr k'evin,
Dûr k'etina xwe h'esab dikin cefa lape – lape mezin.
1557. Nêstanê go: „Xazila min xûşka delal nedîtayî,
Ji r'oê ku dûr k'etama, nedma gula min xeyîrî,
Ne'mê binvîs, çi biqewime, e'lametiyê tu bide min,
Çawa ez bi agirê te, tuyê jî bişewitî agirê min“.
1558. T'înat'înê go: „Şexsê, k'ê te dibîne, bext dibîne,
Ji te dûr çawa bimînîm, cefa mezin bih'esbîne,
Başê mirinê ez neyaz kim, ne ku bijîm h'izreta te,
Haqa bijî, çiqê hêsir ç'e'vêm bir'ijin bona te“.
1559. Dîsa wana hev r'amûsa, melûl qetiyên ewan ji hev,
Hev dûr k'etin dilê k'eder, ç'e'vê wan ne qetiyên hev,
Hev dinhêr'în, hev diger'yan, bi dil va hêsa ne dibûn,
Çi qelemê met'h'a bidim, nabe çarêkê derdê zebûn.
1560. Derdê cihêbûnêyî giran h'iş û sewdê R'ostêvan bir,
H'ezar dengî axîn, h'izinga h'izing unda kir,
Qeyî te digo, ç'emê hêsira dik'işê ji sitîla ser agir,
Lê Tarîyêl sekîni bû melûl, dêm lê sipîç'olkî dikir.

1561. R'ostêvan bi r'amûsana dêmê wîya gulîn hil da,
Digo: „Hatın çûyîna we bû xewnekê, lê ne unda,
Ezê cefa zor bibînim, çi teherî te cihê dibim,
Te e'mir û r'o daye min, cihêbûnê çetin bibim“.
1562. Tarîyêl hespê xwe syar bû, p'adşê r'a go: „De xatirê we“.
Esker digiriya, bi hêsira av dan bestê ber gewgewe,
P'adşê wa go: „Bi e'gîfî p'adşa bêyî, r'oja şemal“.
Tarîyêl wa go: „Ji hêsira dilêm dik'îşe dûkî şemal“.
1563. Bi eskerkî giran k'et r'ê, usa derk'et wî şherî,
Tarîyêl, P'irîdon û Avt'andîl ku aqil bû ji her merî,
H'eyîştê h'ezar syarê mêrxas ç'ek, sîlih'ê cengê bûn lê,
Hersê bira amin, ît'bar, hersê bira şêrê Xudê.
1564. Sê meh diçûn, - bendê usa Xudê degme dixuliqîne,
K'ê wê ber wana tamîş da, her kes wana dih'emlîne,
Berbanga r'a peya dibûn, li mêrga da dihêwirîn,
Sivrê layîq wan vedikir, ne ku dew, şerav vediç'inîn.





DE'WATA TARÎYÊL Û NÊSTAN - DARÊCANÊ

1565. Xastina Tarîyêl û jina wî bi syanet mîaser bû,
 H'evt t'ac gihîştibûne wana, h'evt dewlet wan hil dabû,
 Şaya h'evt qat li ser derdê buhurî wê derî dada,
 Şîmayê wê çawa t'êr be, yê te'layê baş hil neda.
1566. Herdu r'ex hevda r'ûniştî bengzemîşî r'oê dibin,
 Def û k'er'ane lê xistin, ew ser t'ext dane r'ûniştin,
 K'îlîtê xiznê dewletê t'ev anîn dane destê wana,
 „Eve aha p'adşae me!“ – bû zîwîna dengê wana.
1567. Du t'ext anîn boyî P'irîdon û Avt'andîl, danîn wira,
 Dan r'ûniştin bi p'adşayî û syanet xastin wan r'a,
 Hê mîna wan Xudê t'u kes ne t'ifaqandibû r'û vê dinê,
 K'ê nizane, t'une h'esav, derdê dîtine wan vê hênê.
1568. Her alî eşq û şayî bû, pîrsê şîrin û k'ubra xaş,
 Ça layîq bû de'wat kirin, t'exte, sîvirê şene û baş,
 Û hedayî gendî bû be'r, r'ewa dikirin pê ew herdu,
 K'esîb neman t'ev qihar bûn, yek yekî r'a nebû e'du.
1569. P'irîdon û Avt'andîl r'a Hinda digotin: „Azadar!
 Bi h'unurê we em xayî bextin“, - digotin eşq û bê azar,
 Qedir û hurmet wan r'a digirin, çawa xayê xwe h'izkirî,
 Bê h'ed dihatin digotin, wan r'azî bûn şîrin zarî.

1570. P' adşê Hinda got Asmat'ê, ya bona wî emekdar bû:
„Çi ku te kir boyî nevsî min, dê û bava ew nekiribû,
Ji h' evt p' arê Hindistanê, p' arekê tu bibe xayî,
Ser t' ext r' ûnê û e' mirê xwe derbaz bike bi şîrnayî.
1571. K'ê dixazî wî bistîne, serwêr be ser xaliya xwe,
Bi h' elalî tu qulix ke û berk' be tu h' elaliya xwe“.
Asmat'ê nig wî r' amûsa: „Tuyî ç' ar û mik' anê min,
Cariya te bim, ji wê çêtir tişte t' une xastina min“.
1572. Çend r' oja wir k'êf dikirin hersê bira dilê şa,
Dilîstin û şa dibûn, ew a' ciz bûn ji p' êşk'êşa,
Îdî kevirêd qîmet baha, hespêd k' ih'êl, r' ext û r' işme,
Lê li ser dêmê Avt' andîl melûlî lê dihêwire.
1573. Tarîyêl fe' m kir ku wî şêrî bîra jina xwe kiriye,
Jê r' a wa go: „Vê şayê da bira min xwe bîr kiriye,
Ev çend r' oje birayê xwe min vê derê bend kiriye,
Te ver'ê kim, bi dil her'î, p' adşê bîra te kiriye“.
1574. P' irîdon jî r' abû û go: „Ez jî her' im wet' enê xwe,
Carna ezê bidim ser r'ê, bêm bibînim biraê xwe,
Çawa bira berbi min be, heger tiştê h' ewce bî,
Xastina te biqedînim, wê yekê da tu bihar bî“.
1575. Tarîyêl awa wir xeber da: „Her' e bighîj mal, h' alê xwe,
Me bîr nekî, heyî carna tu mêvan bî bal biraê xwe“.
Avt' andîl r' a ewî wa go: „Zanî, bêyî te ez ne şa me,
Dibînim tu jî lezî, her' e bighîje hîva xwe“.
1576. R' ostêvan r' a ewî şandin k' urkêd nerm û libsê hêja,
Wî derdanêd layîq şandin xemilandî kevirê biha,
Wa gote wî: „Aliyê mi da vana bidê, jê r' azî be“.
Avt' andîl go: „Ez nizanîm, e' mirê minê bêyî te çî be“.

1577. Lê Nêstanê xûşkê r'a şand qebaçek û xirxe, zebûn,
K'îjan t'enê bi k'iriyamet hêjayî wê bedewê bûn,
Serdilkeke dur'e bi şewq, k'îjan dil bend dikirin,
Mîna r'oê bi şewqa xwe tariyê da r'ê k'ivş dikirin.
1578. Avt'andîl wê îzina xwe xast, syar bû, wî r'ê r'ik'êv kir,
Dilê herda wê bû alav, cihê bûnê agir gur' kir,
Hind digiriyar û wê gavê ç'emê hêsira besta k'îşiyar,
Avt'andîl go: „Je rê dinê t'op bûn, dilê mi da r'îjîyan“.
1579. Avt'andîl û P'iridon jî t'evayî wir dirêj neman,
R'îya wana ji hev qetîya, her yek r'îya xwe bû guman,
Nêt, merem wan mîaser bû û şuxulê wan hate sêrî,
Avt'andîl gihîşt yêra xwe, arçoq bû ox'ira wî mêrî.
1580. Xaliya e'reba qebûl kir ewledê xwe zor Avt'andîl,
Wî dî Şexsa xweye bi nûr, h'esîna dil kire bertîl,
Ew r'ex wê da ser t'ext r'ûnişt, e'rşa hêsa bîn r'ah'îşt,
Bi siyanet t'ac xemiland, qewateke h'unur buhuşt.
1581. Ne xeyîrî h'uba h'elal, hersê birê şêr û e'gît,
Zû – zû wana hevdu didît, h'uba wan bê berge - k'ilît,
Wana qomsî, nemamê xwe nedihîştin dinê bijîn,
Welatê xwe wan şên dikir, ku ew bê xem, bê saw bijîn.
1582. Ek'in û mal mîna berfê beranber wan p'ar dikirin,
Êt'im û bî kirin xayî mal, k'esîb jî dewletî kirin,
Berxa hêsa mak dimêtin, xenîmê wan xeza dibûn,
Gur û berx t'ev diç'êriyan, e'dlayî ser e'rdê xwe bûn.





XITIMBÛN

1583. Wa xitim bû serhatiya wan mînanî xewneke şeva,
Hatin, buhurîn, mina bûn, p'irîskêd bext, e'mirê wana,
K'ê va e'mir dirêj tê xuyan, r'oja wî jî kine buhrî,
Va dinivîsim, aşiqim mêsx, nav hil daye R'ûst'avêlî.
1584. Bona Davît' xudanê gurca, k'îjan r'oj ber qulix dike,
Ev serhatiya min bi şêrkî, pesinê wana îcr'uh' dike,
Sava k'îjanî r'ohilat h'eta r'oava bûye deng,
Amina ew r'uh'dar dike, qumsiya dike xeza bi ceng.
1585. Çawa bidim met'h'ê Davît', şuxulê wîye merd, mêranî,
Û derheqa p'adşê mayîn serhatiya wan min bîr anî,
E'fe'detê wana berê û pesinê wanî p'adşafî,
Mîn dî, hil da û welger'and, boyî min ew bû şevbihêrî.
1586. E'mir aha dibuhure, t'u car gumana xwe nedin ser,
Deqeye ew, mina dibe li ber ç'e'vê îsanî ter',
Çi digêr'in û bona çi? Wexta bexte xayî – xudan,
Şa dibe ew bê qeyas, k'ê r'a doste bext bê îman.
1587. Amîranê Darêcan r'a pesin da Mosê Xonêlî,
K'ilama Şavt'êlî bê qusûr Abdûl Mêsî kiriye gîfî,
Dîlargêt' r'a sitira Sargîs T'imogvêlî, hostê pirsî,
Tariyêl r'a xwe R'ûst'avêlî bi ç'e'vê hêsir sitira.



FERHENGOKA HINE NAVAN

- ABDÛL MÊSÎ - Bi t'exmîni, li vir be'sa dast'ana „Derheqa T'amar p'adşê û Davît“ tê kirinê ya ku şayîrê gurc İoanê Şavt'êli (sedsala XII) e'frandiye.
- AMÎRAN - Cindiye gurcaye afsaneyî dewra qedîm, k'ijan jî bi cora Xudana zinarê ç'iyayê Qavqazê va pê zincîra hatibû girêdanê. Derheqa wê yekê da nivîskarê gurca Mosê Xonêli (sedsala XII) di e'firandina xwe da „Amîran – Darêcanîyanî“ nivîsiye.
- AMÎRBAR - Wezîrê dîwana p'adşeye pêş yan wezîrê, serekê eskerê be'rê.
- DAVÎT' - Davît' Soslanî, mêrê p'adşê T'amarêye duda, serekeskerê e'yan; e'slê xwe da Os bû.
- DÎRAHKAN (DÎRAMA, DÎRAXMA) - p'erê hûre zîv; çapa giraniyê, k'işandinê.
- DÎLARGÊT' - Bi t'exmîni, bin vî navî da e'gîtê serhatiya nivîsk'arê gurca Sargîs T'imogvêliye „Dîlargêt'iyani“ (sedsala XII) tê fe'm kirinê.
- DÎONÎS (DÎVNOS) – Felsefîzanê xaç'p'arêz (sedsala V), bin zêdenavê Dîonîsiyî Arêopagît dinivîsî.
- GABAON – Navê ç'iyakî pîroze (moqedes) nêzîkî bajarê Yêrûsalîmê.
- GEHON – Navê ç'emê Amû – Darîyaye (Cêyîxûn), bi gurcî Cêon nav didin.
- KEYÊN (KEYÎN, KEYÎS) – Mecnûn, şexsê (e'gîtê) dast'ana Nîzamî Gencevî „Leylî û Mecnûne“.
- KÊYÎSARÎ – Qeyîsar, împêrator, p'adşae p'adşan.
- KRONOS – Navê sitêra (nûra) e'zmîne, dibêjine Satûrn.
- K'AC – Cin, heyîna efsaniyê, ç'frongiyê, r'uh'ê xirab. Di dast'anê da be'sa wan tê kirinê çawa cin di dilqê benda da.
- K'ACÊT'Î – Welatê K'aca, cina, li k'u jî Nêstan – Darêcan dîl girtibûn.
- LÊVÎ – Cihûye, çawa tê xwiyên şexsê „Încîlêye“, kurê (pisê) Yakob – Aqû p'êxembere.
- MARS - Navê sitêra (nûra) e'zmîne.
- MÊRKÛRÎ - Navê sitêra (nûra) e'zmîne.
- MÛLX'AZANZAR – Welatekî afsaneyê ber devê be'rê.
- PÎLANÊT – Dibêjine sitêrka (siteyîra, nûra) e'zmanêye gerîde.
- PÎLATON – Felsefîzanê H'irûmayî dewra qedîme navdare (s.s. 427 – 347 b.z.).
- R'AMÎN, R'AM – Şexsê dast'ana şayîrê Farsaye e'yan Gûrganî (sedsala XI) „Vîs û R'amîne“ ya ku Sargîs T'imogvêli (sedsala XII) wergerande ser zimanê gurcî.
- ROSTEMÊ ZAL – Şexsê dast'ana şayîrê fars Fîrdoûsî „Şah – namêye“ (sedsala XI).
- SALÊMAN – Şexsê dast'ana Farsa „Salaman û Absale“.
- SARGÎS T'İMOGVÊLÎ – Nivîsk'arê gurcayî sedsala XII, e'frandarê dast'ana derheqa Dîlargêt'ê.
- SATÛRN - Navê sitêra (nûra) e'zmîne.
- ŞAVT'ÊLÎ – Şayîrê gurcayî sedsala XII, e'frandarê dast'ana „Abdûl – Mêsî“.
- VÊNÊRA - Navê sitêra (nûra) e'zmîne, „Siteyîra sibê“.

SOT'A R'ÛST'AVÊLÎ

VÎS – E' gîtê dast'ana şaîrê Farsaye e'yan Gûrganî (sedsala XI) „Vîs û R'amîne“ ya ku Sargîs
T'imogvêlî (sedsala XII) wergerande ser zimanê gurcî.

XATAÊT'Î – Bin vî navî da welatekî ku başûrê ji Çînistanêye t'exmîn dikin, lê bawariya t'am derheqa
wê yekê da t'une.

XORÊZM – P'adşatiya zor qewî di Aziya Navîn da ya ku digihîşte p'adşatiya Farsa (sedsala XII –
XII).

YÊZRAS (ÊZROS) – Şayîrê cihûaye di detspêka sedsala XII da.

YÛPÎTÊR - Navê sitêra (nûra) e'zmîne.



S E R E C E M

HÎNE GILÎ DERHEQADAST'ANA ŞOT'AR'ÛST'AVÊLÎ „WERGİRÊ P'OSTÊ PİLÎNG“ Û T'ERCMEÇİYÊ WÊ BÎ SER ZİMANÊ K'URDÎ	5
რაგდენივე სიტყვა შოთა რუსთველის „ვეზისტყარუნისა“ და მისი ქართულ შესაზე მთარგმნელის შესახებ	10
A Few Words about Shota Rustaveli's The Knight in the Panther's Skin And its Translator into Kurdish	16
JÎ ALYÊ T'ERCMEÇÎ DA	21
DESTPÊK	23
SERHATIYA R'OSTÊVANÊ P'ADŞÊ E'REBA	28
NÊÇ'ÎRA R'OSTÊVAN P'ADŞA Û AVT'ANDÎL	34
P'ADŞÊ E'REBA DÎBÎNE WERGİRÊ P'OSTÊ PİLÎNG	36
T'ÎNAT'ÎN AVT'ANDÎL DIŞÎNE KU WÎ E'GÎTÎ BİGRE	42
NEMA AVT'ANDÎL R'ÎE'TA XWE R'A	49
AVT'ANDÎL DIÇE WÎ E'GÎTÎ BİGER'E	51
XEBERDANA AVT'ANDÎL T'EV ASMAT'Ê ŞİKEVTÊ DA	59
R'ASTHATÎNA TARÎYÊL Û AVT'ANDÎL	67
TARÎYÊL SERHATIYA XWE AVT'ANDÎL R'A DÎBÊJE	72
QÎSA DERHEQA H'ÎZ KÎRÎNA TARÎYÊL DA	77
NE'MA NÊSTAN - DARÊCANÊYE E'WLÎN DÎLK'ETIYÊ WÊ R'A	83
NE'MA TARÎYÊLE E'WLÎN DÎLK'ETIYÊ R'A	84
NE'MA TARÎYÊL XATAYÊT'ÎYA R'A Û ŞANDÎNA QASID	86
NÊSTAN TARÎYÊL T'EGLÎF DİKE	87
NE'MA P'ADŞÊ XATAYÊT'Ê TARÎYÊL R'A NÎVÎSÎ	89
R'ASTHATÎNA TARÎYÊL Û NÊSTANÊ	91
ÇÛYÎNA TARÎYÊL BERBÎ XATAYÊT'Ê Û ŞER'Ê MEZİN	94
NE'MA TARÎYÊLP'ADŞÊ HÎNDAR'A. VEGER'ANDÎNA WÎYE ALT'ÎNDARIYÊ	101
NE'MA NÊSTAN - DARÊCANÊ H'ÎZKÎRIYÊ WÊ R'A	106
GİRİYÊ TARÎYÊL Û XWEVAÇÛYÎNA WÎ	108

NE'MA TARÎYÊL H'IZKIRIYÊ R'A	110
ŞÊWRÊ DİKİN KU NÊSTAN – DARÊCANÊ BİDİN MÊR	111
ŞÊWRA TARÎYÊL Û NÊSTAN – DARÊCANÊ. QIRARA WAN	113
HATİNA KUR'Ê XOREZMŞAHLİ HİNDİSTANÊ BOYÎ ZEVACÊ Û KUŞTİNA WÎ BÎ DESTÊ TARÎYÊL	118
TARÎYÊL DİBHÊ DERHEQA UNDA BÛNA NÊSTAN – DARÊCANÊ	121
TARÎYÊL R'ASTÎ NÛRADÎN – P'İRÎDON TÊ	125
TARÎYÊL ALİYÊ P'İRÎDON DİKE	129
P'İRÎDON SALİXÊ NÊSTAN – DARÊCANÊ DİDE	131
AVT'ANDÎL VEDİGERE E'REBİSTANÊ	139
AVT'ANDÎL JİR'OSTÊVAN P'ADŞAT'EWEQE DİKE KU WÎ BERDE. XEBERDANA WÎ T'EVÎ WEZÎR	148
XEBERDANA AVT'ANDÎL T'EVÎ ŞÊRMADÎN	155
WESİYETÊ AVT'ANDÎL R'OSTÊVAN P'ADŞÊ R'A	158
DİA'YÊ AVT'ANDÎL	162
R'OSTÊVAN P'ADŞA DİBHÊ DERHEQA R'EVA AVT'ANDÎL DA	163
CARA DUDA ABT'ANDÎL DİÇE KU R'ASTÎ TARÎYÊL BÊ	166
AVT'ANDÎL TARÎYÊL DİBÎNE	172
TARÎYÊL GİLÎ DİKE DERHEQA KUŞTİNA ŞÊR Û PİLİNG DA	178
TARÎYÊL Û AVT'ANDÎL DİÇİN ŞİKEVTÊ ASMAT'Ê DİBÎNİN	180
AVT'ANDÎL BERBÎ P'İRÎDON R'Ê DİK'EVE	186
AVT'ANDÎL R'ASTÎ P'İRÎDON TÊ	189
AVT'ANDÎL DİÇE NÊSTAN – DARÊCANÊ BİGERE. R'Ê DA R'ASTÎ KAVRAN TÊ	198
SALİX DERHEQA GİHÎŞTİNA AVT'ANDÎL GULANŞEROYÊ	203
DİLÊ FATMANÊ DİK'EVE AVT'ANDÎL	208
NE'MA FATMANÊYE H'IZKİRİNÊ AVT'ANDÎL R'A	209
AVT'ANDÎL BÎ NE'MÊ CAVA FATMANÊ DİDE	211
FATMAN SERHATİYA NÊSTAN – DARÊCANÊ DİBÊ	215
SALİXÊ DERHEQANÊSTAN – DARÊCANÊ Û DİLTİYA WÊ CEM CİNA	229
NE'MA FATMANÊ NÊSTAN – DARÊCANÊ R'A	238
NE'MA NÊSTAN – DARÊCANÊ FATMANÊ R'A	241
NE'MA NÊSTAN – DARÊCANÊ H'IZKIRIYÊ XWE R'A	243
NE'MA AVT'ANDÎL P'İRÎDON R'A	247
ÇÛYÎNA AVT'ANDÎL Jİ GULANŞERO Û R'ASTHATİNA T'EVÎ TARÎYÊL	249
TARÎYÊL Û AVT'ANDÎL DİÇİN CEM P'İRÎDON	256
ŞÊWRA NÛRADÎN – P'İRÎDONÊ	259
ŞÊWRA AVT'ANDÎL	260
ŞÊWRA TARÎYÊL	261
HİLDANA KELAK'ACÊT'Ê Û AZA KİRİNA NÊSTAN – DARÊCANÊ	263
TARÎYÊL DİÇE CEM P'ADŞÊ BE'RA	266

P'İRİDON DE'WATA TARÎYÊL Û NÊSTAN – DARÊCANÊ DÎKE	272
ÇÛYÎNA HERSÊKA LÎ ŞIKEFTÊ Û JÎ WÎR LÎ E'REBÎSTANÊ	277
P'ADŞÊE'REBADE'WATAAVT'ANDÎL Û T'ÎNAT'ÎNÊ DÎKE	286
DE'WATA TARÎYÊL Û NÊSTAN - DARÊCANÊ	291
XÎTÎMBÛN	294
FERHENGOKA HÎNE NAVAN	295



ŞOT'A RÛST'AVÊLÎ
WERGİRÊ P'OSTÊ PİLİNG

T'ibîlîsî
2007

Qalibxistê p'irtûkê li ser kompûtêrê

ÎRAKLÎ ŞÊŞÊLÎZÊ

Rêzvana li ser kompûtêrê

ÎRÎNA MÎRAN

NAVENDA GURCÎSTANÊYE PEYÎVENDIYÊD ÇANDÊ
„MALA QAVKASIYÊ“

Gurcistan, T'ibîlîsî, k'ûç'a Galaktîon № 20

შოთა რუსთაველი

ვეფხისტყაოსანი

(ქართულ ენაზე)

თბილისი
2007

დამკაბადონებელი ირაკლი შეშელიძე

ოპერატორი ირინა მირანი

საქართველოს კულტურულ ურთიერთობათა ცენტრი
„კავკასიური სახლი“
თბილისი, გალაკტიონის ქ. № 20

